ABDULAH OCALAN

# DI SOSYALÎZMÊ DE ISRAR

# DI MIROVBÛNÊ DE ISRARE

**ABDULAH OCALAN**

# Di Sosyalîzmê De Israr Di Mirovbûnê De Israre

**Weşanên Komîteya Rêbertî**

**Werger:** Sozdar Serbilind

**Cihê Çapê:** Çapxana AZADÎ
**Dîroka Çapê:** Gulan 2019

# NAVEROK

**Pêşgotin**

**DI SOSYALÎZMÊ DE ISRAR**
**DI MIROVBÛNÊ DE ISRARE**
**Pêdivî Bi Modelên Ku Li Hember Kedê Nexerîbin Heye**
**Ne Kesayetek Evdal Û Çêkirî**
**Kesayetek Dihizire Û Biryar Dide**
**Dema Artêş Domdar Bû, Vediguhere**
**Rewşa Serdest Û Çîna Mêtînger**
**Di Navbera Civak Û Xwezayê De Valehiyek Mezin Heye**

**DI ROJA ME DE HINEK XISLETÊN NÛ**
**YÊN PÊNGAVA SOSYALÎZMÊ**
**Çînek Karker A Weke Di Sedsala 19. De Nemaye**
**PKK Tevgerek Kedê Ye**

**EM DERBASÎ QONAXÊN ŞOREŞÊN NÛ DIBIN Bi Kapîtalîzmê Re Têkoşînek Demdirêj Hewce Ye Bîrdozî û Dilxweşî Ji Mirovê Destpêkê û Ji Mirovê Dawî Re Jî Hewce Dike**
**Di Dîroka Bîrdoziya Sosyalîst De Qonaxên Girîng**

**Sosyalîzm Bi Dewletbûnê Nagihe Armancên Xwe**
**Enternasyonalîzmek Nû Dikare Bi**
**Sosyalîzmê Pêngavê Bide Avêtin**
**Di Sosyalîzmê De Rastiya Rêber û Milîtan Cîhan Dabeşî**
**Du Bendan Kirin Ne Raste û**
**Ev Hatiye Derbaskirin**
**Sosyalîzm Wesfe**
**Pirsgirêka Ku Mirov Xwe Bi Civakî Kirinê Ye**
**Em Rast Dihilberînin, Dijîn û Têdikoşin**

**WÊ DYE Û KT TI CARÎ GOTINA “TÊKOŞÎNA EM DIMEŞÎNIN TERORÎZME” JI MIN NEBIHÎSIN EM DIXWAZIN MIROV RIZGAR BIKIN Û EM Ê QET RADESTÎ KAPÎTALÎZMÊ NEBIN**

**ÇARESERIYA GERDÛNÎ YA DI SOSYALÎZM Û PKK’Ê DE PÊŞ DIKEVE**
**Lenînîzm Bi Giştî Sedsala Me Bandor Kiriye**
**DYE Hem Dizê Malê Ye Hem Jî Terorîstê Nav Malê Ye**
**Li Tirkiyê Çepgirî Kemalîzme**
**Ûtopya Sosyalîst Ji Bo Hêvî û Serkeftinek Bi Îdîa Esase**
**Modela Cîhanê Ya Kevin Ji Bo Mirovahî Xiftanek Tenge**

**LI DIJÎ MIRINÊ JIYAN LI DIJÎ KOLETIYÊ AZADÎ**

**FAŞÎZMA TIRK BI PIŞGIRIYA SOVYETÊ PÊŞ KET**
**Ji Bo Gelê Rus Jî Pirsa “Çawa Bijîn” Hewce Dike**
**Rus û Kurd Dikarin Bi Hev Re**
**Şovenîzma Tirk Rawestînin**
**Îtîfaqa Kurd û Rus Dikare Gelek Pirsgirêkan Çareser Bike**
**Avakirina Mirovê Sosyalîst**

**Ji Damezirandina Dewletê Hêjatire**
**Rexnedana Sosyalîzma Pêkhatî Ez Didim**
**Sovyeta Kesayetek Ji Xwe Hezkirî Ava Kir**

**PKK DI SOSYALÎZMÊ DE QONAXA HERÎ MEZINE**
**Yan Sosyalîzm Yan Qet!**
**Sosyalîzm Hem Xeyal Hem Jî Zaniste**
**Êrîşa Rojavayî Bi Îtifaqa Asya Ve Tê Bersivandin**
**Di Sosyalîzmê De Feraseta "Besbûnê" Nabe**

**HÛNÊ JI BO ÛTOPYA BIJÎN**

**BAWERIYA MIN BI MIROV Û**
**MIROVÊ HERÎ BAŞTIR HEYE**

**Azadî Bi Kûranî Bûyera Xwe Pêkanînê Ye**

## Pêşgotin

Wexta mirov li konjektura cîhanê ya salên ku sosyalîzma pêkhatî li ser piyan bû, bi emperyalîzmê re hevrik bûn û lewra cîhan weke du seriyan dabeş bibû dinêre, hêz û venêrîna hevbendên sosyalîzma pêkhatî û emperyalîzmê ya li hember pêşketinên ku rû didin, ji niha hîn zêdetir bibandor bûn. Tevgera serkêş a her pêşketina ku di cîhana dubendî de çêdibûn, ji ber vê rewşê neçar mabû, ku yek ji welatên hevbend hilbijêre. Nêzîkbûna xwe ya ji pêşketinên ku li her çi cihê cîhanê rû didin re pîvana sereke, ji berjewendiyên giştî yên gelan, netewan û çînan zêdetir, çiqas xizmet ji berjewendiyên van her du pergalan û berfirehiya qadên şêniyên wê re dike yan jî nake girîng bû. Ev polîtîkayên serdestiyê, pêşketinên nav-netewî dixeniqînin û

xetimandinek di navbera pergalan de derdixist holê. Di encamê de, ji mezinbûna pirsgirêkên weke çiyan ên mirovahî û xwezayê re rê vekir.

Bi helweşîna sosyalîzma pêkhatî ya ku bi Rêbertiya Yekîtiya Sovyetan dimeşiya re, dubendiya li cîhanê ji holê radibû û ji hêla rizgariya gelan û têkoşînên serxwebûnê ve pêvajoyek nû ya ji hêla mercên destdayî ve destpê dikir. Ger ev pêvajo nehatiba venêrîn, polîtîka û stratejî nehatiban pêşxistin, wê pêşketinên pir cidî yên li emperyalîzmê bizirivin ava kiriba. Jixwe polîtîkaya "Sazûmaniya Cîhana Nû" jî di pêvajoyek wisa de dixistin rojevê. Lê mixabin wê emperyalîzm jî tişta li bendê bû nedîtiba û bi serxweşiya serkeftinê ve hesabên ku kirîn pêk nehatiba. Hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, wê nebûya serkeftina emperyalîzm û kapîtalîzmê.

Îro em pir vekirî dikarin vê bêjin: Cîhana me di pêvajoyek derbasbûnê de ye. Piştî sovyeta ku cîhana salên 90'î destnîşan dikir, ji nav hevsengiyên cîhanê xwe vekişand, hema cîhan ji rê derket û di encama vê de jî valehiya derketî holê, tevgerek zêde ku hêzên cur be cur dixwazin vê valehiyê dagirin derketiye pêş.

Di navenda giraniya hevsengiya kevin de du hêzên bingehîn DYE û Sovyet hebûn. Bi sedema yek ji navendên giran, giraniya xwe winda kir, hemû hevsengî serûbin bûn. Ji hevsengiyê derbasî bêhevsengiyê veguhertinek çêbû. Di rewşa heyî de pêşveçûna ber bi salên 2000'î ve, em dikarin cîhana xwe weke cîhana di lêgerînek hevsengiyek nû de pênase bikin.

Tenê li herêmek cîhanê yan jî di avabûna hevsengiyê de weke alî ne li qadên ku Sovyet lê ye, zêdetirîn li welatên Rojhilata Navîn, Kafkasan, Balkanan, Emerîkaya Latîn, li welatên Emerîka û kurtasî li her aliyê cîhanê hevsengiyên hêzan ji nû ve tên avakirin. Ev rewş jî nexasim ji salên 90'î ve hîn zêdetir xwe bi şêweya şerên nû, dostaniyên nû, îtîfaqên nû û dijminatiyên nû dide der. Ev neçariyeke rû bide. Di navbera hêzên ku dixwazin valehiya otorîteya derketiye holê û li qadên ku nayê zanîn kî otorîteye de, xwezayî pevçûn rû didin.

Navê pêvajoya derbasbûnê ya din jî şer û pevçûnin. Şêweyên şer ên vekirî, şêweyên polîtîk û diplomatik û rêya dewletên bi hev ve girêdayî dana şerkirinê jî di nav de, her cure rêbaz tê bikaranîn.

Her kes dixwaze ji derfetên van pêvajoyên derbasbûnê derxistine holê sûd werbigire. Her kes beriya xwe bigihîne hevsengiyan, hewl dide pêşî sekna xwe ya li naverastê bihêz bike.

Her dewlet û hêza siyasî vê baş dizanin: Piştî ku hevsengî hat sazkirin, ne hêsane bi yek pêngavê hevsengiyên heyî li gorî berjewendiyên xwe xirab bike. Lê belê ne tenê ji bo giştî cîhana me, ev qural ji bo hevsengiyên herêmî jî derbasdarin. Vaye, dewletên li ser bingeha van rastiyan tevdigerin û hêzên siyasî hewl didin bi ketin û rabûn, şer ve ji xwe re qadên nû vekin û berjewendiyan bidest bixin.

Hemû hêzên emperyalîst ên li cîhanê hewl didin bi îtîfak û gavavêtinên nû ve, sekna xwe ya heyî xurt bikin. Di qonaxa şerê sar de hevgirtina di navbera wan de heyî, îro şûna xwe ji –her çendî veguhere şerek tam beramberî hev jî- rakêşan û pevketinê re hiştiye. Mirov dikare vê pevketinê li cewaziya polîtîkayên emperyalîzmê yên di derbarê Rojhilata Navîn, Kafkasya, Rojhilatê Ewrûpa û Efrîka de bibîne.

Ji pêkhatina hilweşandina sosyalîzmê heta niha zêde wextek derbas nebûye. Di nava vê pêvajoya kin de çi li welatên sosyalîzma pêkhatî yên kevin û çi jî li welatên emperyalîst, dîsa li gelek herêmên cîhanê yên cur be cur rewşên ku diqewimin bên lêkolînkirin, wê bê dîtin ku polîtîkayên li hember sosyalîzma pêkhatî alternatif hatine destnîşankirin gavek pêşve ne avêtine, venêrîna emperyalîzmê jî ya li ser cîhanê ji wan salên berê zêdetir kêm bûye. Hema li her qada cîhanê, li her parzemînê, pêşketinên weke şer, pevçûn û bê aramî rû didin, weke li pey hev bikevin, hev dişopînin û diqewimin. Dema welatên emperyalîst hewl didin yek ji wan venêrîne, bi zehmetiyên mezin, berxwedaniyên gelan re rûbirû dimînin. Li gel pêşketinên derve, pirsgirêk, nakokî û bê aramiya hundur jî zêde dibin. Berê "serkeftinên" ku bi çewsandina pirsgirêkên derve re dihatin bidestxistin, li ser pirsgirêkên hundurîn digirt, lê mixabin îro li pêş vê serkeftinê astengiyên mezin tên avakirin. Di vê manê de bi emperyalîzmê re jî rewşek paşketinê ya cidî tê jiyîn.

"Beşek mezin a mirovahiya cîhanê hema bêje li ser agir dijî. Emerîkaya Latîn, Başûrê Asya, Kafkas, Rojhilata Navîn, hemû parzemîna Efrîka û beşek girîng a welatên sosyalîzma kevin, bi qeyranên siyasî û aborî yên hûrûkûr ve dijîn. Emerîka û Ewrûpa jî di naverasta vê cîhana ku dikelê de, weke du giravên bihuştê ne. Her herêma cîhanê ya girîng bi ragêşiyê barkiriye. Êdî bûyer weke ku ber bi hesabxwestinekê ve biçe hêdî hêdî kom dibin.

Li beramber sosyalîzmê, DYE nûnertiya navenda hêza emperyalîst dikir. Ev ji her hêlê ve wisa bû. Di wateya aborî, mezinbûna çekan û pêngavên polîtîk de bê nîqaş DYE serok bû. Piştî nîvê salên 1970'î ev rewşa ku hêdî hêdî hat guhertin, bi hilweşîna sosyalîzmê re hîn leztir hatiye jiyîn, emperyalîzmê jî di navbera xwe de hêz dabeş kiriye. Îro mirov dikare sê navendên emperyalîzmê destnîşan bike. DYE, Ewrûpa û Japonya ne. Bêguman hêjî ji van her sê navendan a herî xurt dîsa jî Emerîka ye. Ancex êdî DYE ji aliyekê ve 'di navbera wekhevan de ya yekemîne.' Ango weke berê di mijara bûna rêberê cîhanê de nemijara nîqaşê ye.

Di pêşeroja nêz de, wê du hêzên cîhanê yên din jî li gel van her sê navendan bê servekirin. Ev jî Rusya û Çîne.

Berê li hember 'gefa sovyetan' hêzên emperyalîst ên heman polîtîka pêk tanîn û di stratejiyên hevpar de lihev dikirin, di roja me de ji bo helwestên polîtîk ên hevpar pêş nexin, gelek sedemên wan hene.

Rewşa hêzan li gorî hev gelekî cewaze. Lê ev cewazî çi dibe bila be, pêvajo neçar dike ku di navenda hêzê de dabeşbûnek rû bide."

Di mijara berfirehkirina qadên serdestiya xwe û dewlemendkirina çavkaniyên mêtîngeriyê de hevriktiya van dewletên di pêşbaziyê de, di navbera wan de nakokî ava dikir û her ku diçû ev jî kûr dibû. Her çendî ne di asta pêş de be 'dijminê hevparin', her wiha serve bi hev ve mijûl dibin û em ê di sedsala 21. de bi giranî bibin govanê têkoşîna siyasî û aborî ya van hêzan.

Ev pêşketinên ku li welatên emperyalîst derketin pêş, di raya giştî ya wan bi xwe de jî tê destnîşankirin. Mirovê Rojava yê ku berê bi 'xeternakiya komînîzmê' ve hatîn rahênandin, êdî heta ku rêbazên nû

neyên pêşxistin, nayên tevizandin. Emperyalîzm ji bo şiyarbûna civakê asteng bike û çavên ku vebûne cardin bigire, bi taybet çapemeniya ku yekdestdare û amûrên ragihandin û karbidestiyê yên teknîkî pêş dixe. Beriya destwerdana li pêşketinên cîhanê bike neçar dimîne ku raya xwe ya giştî –her çendî di vê mijarê de zehmetiyê nejî jî- qane bike. Hewl dide dagirkeriyên xwe yên bêmaf, destwerdanên xwe yên di bin nave têgehên weke “demokrasî”, “mafê mirovan” û hwd de, bi gotinên “humanîst” ve rewa bike. Weke din êdî nikare weke berê pirsgirêkên xwe yên navxweyî ji nedîtî ve bê û pir rehet hêza biryardayîna destwerdana qadên derve bide. Bi fikare ku bertekên raya giştî hem yên hundur hem jî yên derve rabigre.

Ji aliyek din ve jî gelên ku li ser wan destwerdan dihat kirin jî êdî weke berê yekser radestî hêzên emperyal nabin. Hîn zêdetir xwe dispêrin hêza xwe ya cewherî û rêya serfiraz a berxwedanî dihilbijêrin. Di vir de rista herî girîng jî nasname û polîtîkayên emperyalîzmê yên dijminatiya gelan pir baş hatiye dîtin. Pevçûnên li her qadên cîhanê yên weke Rojhilata Navîn, Balkanan, Kafkasan, Efrîka, Emerîkaya Latîn, Rojhilatê Dûr didomin, bêçaretiya ku tê jiyîn, pir baş destnîşan dike ku êdî emperyalîzm di serîtewandina gelan de çiqas paşve ketiye.

Di van salên dawî de baştir derket holê ku emperyalîzm pilingek ji kartonê ye, xwe nahilberîne, berovajî wêneya bêhempa ya hewl dide ava bike, xwedî binyatek çiqas binî vale ye. Jiyana ku tê gotin azade, li ber çavane ku jiyanek di rastiyê de hatiye tevizandin, bi teknîkê ve hatiye girêdan, bi kumandayê ve hatiye girêdan û pir vekirî hatiye hiştin ku ji her hêlê ve bê arestekirin. Ev jiyan hatiye dîlgirtin, ji baweriya cewherî û hêza serbixwe ya biryar dayînê hejar hatiye hiştin. Şêweyek jiyanek nejidil hema bi bombebarana sînema, tv, mina reklaman erdê re kirine yek. Bi heybera ku ji dûr ve weke hedef destnîşan kirîn ve, manewiyat û pîvanên exlaqî bi jiyanek hatî kuştin û yek alî ve mirovên li vir jî veguherandine weke lîstokvanên ku rola miriyan dilîzin.

Bi vî şêweyî emperyalîzma ku mirovê xwe bi xwe dixe û bi xwe ve girê dide, mirovên welatên sosyalîzma pêkhatî jî bi teknîk, reklam, gotinên weke demokrasî û azadiyê ve li hember rejîmên “komînîst” ên wê demê dixist tevgerê. Ji ber sosyalîzma pêkhatî mirovên xwe li hember mirovên civaka kapîtalîst weke alternatîf ji nû ve ava nekir, rêya emperyalîzmê ya xwe gihandina hedefên xwe hêsan kir. Jixwe di ceribandina sosyalîzma pêkhatî de hat dîtin, heta ku mirovê sosyalîst neyê avakirin, dewletên mezin jî bên damezirandin, ji şeşan yekê cîhanê jî sosyalîst bin, her çendî xebatên fezayê jî bên meşandin, di encamê de ew dewlet mehkumî rûxînê ye. Di sosyalîzma pêkhatî de diyardeya dewletê zêde derxistin pêş. Pêdivî bi meyla pêşketinên ruhî yên girseyî û hêmana dilxweşiyê nehat dîtin. Lewra hewce dike em bêjin sosyalîzma ku di Yekîtiya Sovyetan de pêk hatî, jirêderketinek mezin a ji sosyalîzma zanistî bû.

Ji ber teknîka ku pêş ketî pir cinawirî û çavsorî li dijî mirovahî hat bikaranîn, dîsa zanista heyî mirov ditevizîne, ji hêz dixe û ketiye halek cinawirê tinekirinê û bûye ne ti tiştek, neçare ku mirov jî serî li sosyalîzma zanistî bide. Emperyalîzm xwe dispêre hêza teknolojiyê û wisa baskê xwe bi serbestî dirêjî her aliyê cîhanê dike, bi vî rêbazî dikeve nava mejiyê hemû gelan, mirovahiyê û xebatên xwe dana pejirandinê. Ji ber van ev jî pêwîstiya perspektîf û berfirehiya şoreşên ku bersivê bide vê û heta gav bi gav bikare bi erdê re bike yek derdixe holê. Li ser bingeha encama ji ceribandina sosyalîzma pêkhatî bên derxistin, pêwîste bi nêzîkbûnên nû yên rastiya emperyalîzma heyî baş didahûrîne sosyalîzm bê esasgirtin û ev jî peywira herî pîroz a li hember mirovahiyê bê pêkanîne. Rêya yekane ya rizgarkirina mirovê ku di nava pêşketina teknolojiyê de fetisî û hatî kuştin, ew ji nû ve avakirin, aliyên mirov ên dilxweş û mirovî derxistina holê ye. Sosyalîzm an jî sosyalîstbûn ji bilî vê ne tiştek dine. “Sosyalîzm zanistek mirove. Zanistek ku her tim mirov dilxweş, bawermend û hêvîdar dihêlê ye.”

Ya rastî xisleta sosyalîst a PKK’ê jî, di vê xalê de derdikeve holê. Tişta ku nahêle PKK bin bikeve, hewl dide mirov ji xisletên hatiye xistin, ji bawerî û hêviyê dûr ketiye, kesayeta mêtîngerî û

emperyalîzmê ya kêrî tiştekê nayê û bûye belayek rizgar bike. Ev jî, di nêzîkbûna ji mirov re rêbazek nû ye, zanista sosyalîzma ku qalibên heyî derbas dike. Ji gotina mirov zêdetir, cewher û çalekiya wî esasgirtin, kesên ku tevlî refên şoreşê dibe weke heyî neyê pejirandin û teqez veguhertinek li ser ferzkirin, têkoşîna hîmdar a avakirina mirovê sosyalîst bi xwe ye. Li vir nêzîkbûna ji mirov re rêbaza rast hêza sosylîzmê derdixe holê.

Di cîhanê de mirovahî di bin dorpêça “newazên teknolojiyê” de hatiye girtin, hewl tê dayîn cewhera pêşketina wê bê tinekirin. Di mercên wisa de rêbaza PKK’ê ya sosyalîzma zanistî, bê ku rê bide ti jirêderketinan bikaranîna wê, di têkoşîna sosyalîzmê de gavek nû û qonaxek nû ye. Asta netewbûn û heta çînayetî derbaskirin û xwe gihandina xisletek asta nav-netewî ne tenê ji bo mêtîngeriya Komara Tirk, ji bo emperyalîzmê jî xeternakiyek cidî ye. “Tirs û xofek” ku li kêleka hêzên şoreşên dijber digerê ye. Xisleta PKK’ê ya herî bingehîn ku, ji hêla mêtîngerî û emperyalîzmê ve nayê pejirandin jî eve. Gerîlayek jin a ji Almanya beşdarî nava refên Artêşa Rizgariya Gelê Kuridstanê ARGK’ê bûyî û li çiyayên Kurdistanê şer dike, li hember pirsa nûçevanek TV ya Alman ku dibêje; “Ma hûn di van mercên jiyanê de zehmetiyê dijîn?” Bersiva ku dide dibêje; “Ji bo min pêwendiyên mirovên Ewrûpa yên sar, ji mercên vê jiyanê zehmetirin.” Ev mînak vê mijarê ronî dike.

Di hemû şerên ku di dîrok û roja me de derketine holê de ger bê lêkolînkirin alî çawa ser dixin an jî çawa winda dikin, wê baştir bê dîtin ku serkeftin çawa tên bidestxistin. Hêzên ku xwe li gorî taktîk û stratejiyên dijminê xwe bicîh nakin û rojane li ser rêyên serxistinê lêhûr nebin, nikarin xwe ji têkçûnê rizgar bikin. Şertên serxistinê bicîhanîn û ji bo zemîna binketinê ji holê bê rakirin, pêwîste mirov bikare, mirovê ku biryarê bide û bikare rol bilîze derbixe holê. Yê ku xeta pêşketinan diyar bike, wê mayînde bike û veguherîne hêmana mirovê bawermend a sosyalîste. Teknîk, tenê dikare di mercên ku mirovên xurt û azad lê neyî de encam bigire. Mirov dikare bersiva

pirsên sosyalîzma pêkhatî çima hilweşiya û PKK çawa ser dixe di vê çarçovê de bide.

Li welatên Rojava ku teknolojî lê pir pêşketiye vîn, bawerî, dilxweşî û hêviyên mirovan hatiye tinekirin. Mirov li hember teknîka di destê serdestan de têk çûye. Ferdperestiya sînornenas a di kesayetên Rojavayîyan de, yek jê sedema bingehîn a bê eleqeya li hember pirsgirêkên mirovahiyê ye. Teknîka ku ji aliyê serdestan ve li vir tê pêşxistin, li ser mirovê heyî hukum dike û di bin bandora wê de kesayeta wî bê îrade dike.

Nêzîkbûna mêtîngeriya Tirk a ji mirov re jî, bi qasî dewletên emperyalîst re neyê berhevkirin kesayet dişkîne û dikuje. Niha jî tişta herî zêde hewl didin bikin, mayîndekirina kesayeta şerê taybete. Mêtîngerî mirovan ji bûna lîstokvanekê wêdetir dike meymûn û tine dike. Mirov ji bo têrkirina zikê xwe hatine rewşek ku xwe bifiroşin. Di cîhana mirovê ku evqasî hatiye xistin û ruh hatî rûxandin de, cihê têgeh û nirxên hîmdar tine ye. Ya herî xirab jî, cîhana kesên di vê rewşa miriyan dijîn de jî tê belavkirin û tinekirin. Dema wan a niha û pêşeroja wan ji hole tê rakirin. Di encamê de baweriya li beramberî xwe heta dawî winda dikin û li begek ku pê ve bên girêdan, radest bibin û ji bo têrkirina zikê xwe li cem kar bikin digerin. Jixwe şerê taybet a ku Komara Tirk li ser civakê ferz dike jî eve. Lewra ev komkujiyek dine ku şerê taybet li ser gelan pêk tîne.

Tenê komkujiyên ku emperyalîzm û mêtîngerî bi rêbazên çors ve pêk tîne dîtin, tê wateya ku rastî ji her hêlê ve nefêmkirine. Jixwe ev rêbaz jî hatiye eşkerekirin û ji ber bertek hatine raberkirin êdî zêde li ber xwe nade û encam nagire. Ya girîng li ser bingeha encamên binkeftina vî rêbazî, dîtina komkujiyên ku bi rêbazên zirav û veşartî tên pêşxistine. Weke din ji vê hêlê ve rêbazên ku di bin de fêhl heyî qetilkirina mirovahiyê, fetihkirina dil û mejiyan û wisa bêxem hiştinê berçav bê girtin, wê jixweber bê fêmkirin ku sosyalîzm şêwe û baweriyek jiyanê ya bi qasî nan, av û hewayê pêdivî pê heye.

Hedefa bingehîn a têkoşîna PKK’ê, mirovek nû û jiyanek nû ya ku ev mirovê nû derbixe holê ye. Ev xisleta şerê ku li ser axên Kurdistanê tê meşandin pir şênbere. Ji bo jiyanê tê şerkirin an jî di vî

şerî de jiyanek tê derxistin. Pêşketin, destkeftin û nûbûn li ser vî bingehî pêk tên. PKK û nexasim Rêbertiya wê ji dijminê derve zêdetir, li ser vê qadê lêhûr dibe û li pey hev dahûrînan pêş dixe. Bêguman li vê qadê, di mijara mirov û jiyana nû de lêhûrbûn, di heman demê de rêya sereke ya herî baş bi dijminê derve re şerkirine. Ger ev rêbaza ku navê wê yê din têkoşîna hundurîn û çînayetî ye neyê domandin, encamên vê di kesayet û jiyana mirov de bi diyardeyên şênber ve neyê veguhertin, ne gengaze ku PKK bikare li hember şerê taybet a mêtîngeriya Komara Tirk û hewldanên emperyalîzmê yên fetihkirina mejiyê mirov li ber xwe bide. Di demê dawî de bi lezek zêde û rêbazên dewlemend ve dahûrînên di derbarê zilamê nû, jina nû, kurtasî mirovê nû û jiyana nû de pêş dikevin. Êdî kesayetên ku serkeftinê bidest bixe tê avakirin. Ya ku pêdiviya têkoşîna me ya rizgariya netewî jî pê heyî ev kesayete. Her çendî sedîsal jî derbas bibin avakirina mirovê nû, li gorî pêvajoyan xwe nûkirin û têkoşîna veguhertinê girînge.

PKK, bi avakirina kesayetên sosyalîst a “Ne milke, ne jî dikare bikin milk”, xwedî bawerî û dilxweşî ava dike, têkoşîna pêkanîna şoreşa mezin a Rojhilata Navîn, mirovahî û sosyalîzmê, tevî her cure astengiyên paşverû yên emperyalîzm û mêtîngeriyê bilind dike û di rêya avakirina serkeftinê de bi gavên ku cîhanê dihejînê ve pêşve diçe. Ev serkeftina wê ya rê lê nayê girtin, serkeftina sosyalîzma zanistî ye.

**Şubat 1998**

## DI SOSYALÎZMÊ DE ISRAR DI MIROVBÛNÊ DE ISRARE

Di dîrokê de mîsyona Lenîn bêguman bi navê kedkaran çalekiyek mezine. Xweseriya wê partiyek çalekiyê ya ku vîna wê zêde ye, di encama çînayetiya ku şêweya hilberîna kapîtalîstê pêş xistiye, mercên mêtîngerî û merheleyek wê ya jorîn emperyalîzm destnîşan kirî li Rusya û bi giranî jî ya ku berhemek mercên kapîtalîzmê ye marksîzîm û kapîtalîzm li gorî vê qonaxê sazûmankirin, tengavkirina pergalê ye. Pergal ji parçeyek wê veqetandin û di vê mijarê de bûna yekemîn, ji hêlekê ve destpêkirinek sosyalîzmê ya yekemîn rave dike.

Ya rastî her şoreş hinekê jî dişibe hev. Lewra gotinên weke gelo modela partiya Bolşevîk ji vê berpirse, yan jî hinek tiştên din wê zêde babetê ronî neke. Şêwaza pêkana tundiya Şoreşa Fransa, ji ya Bolşevîkan nekêmtire. Li gel vê gelek şoreşên burjuva hîn zêdetir wehşî hatine pêkanîn. Dîsa kiryarên tundiya serdemên feodalî û koledariyê ji vê zêdetir di asta pêşde ne.

Ev hilweşîna pêk hatî weke hinek dihizirin çavkaniya xwe ji feraseta partiya Lenînîst nagire. Di vê manê de modela partiya Bolşevîk jî, nabe ku berpirsê vê hilweşînê bê dîtin. Weke ku dikariya bi vê modela partiyê ve sosyalîzmek pir baş hatiba damezirandin, ger pêwîstiyên wê pêk neyên dibe ku veguhere dijberê xwe jî.

Di dema Marks û Engels de zanyarên civaknasî yên herî baş, ango em dikarin pir rehetî bêjin raveyên herî baş ên pêşketina zanistî yên

civakê ne. Heta wê demê teoriyek civakê wisa evqas zanistî rave bike nehatiye dîtin. Nirxandinên li ser felsefê, sosyalîzm û aborî hene, lê yekem care xwe gihandina teoriyek wisa hevgirtî û di nava xwe de yekbûyî pêk tê. Her wiha Lenîn jî teoriya şoreşê, ango polîtîka, partiya şoreşger a sosyalîst û taktîkên wê bi serve destnîşan dike. Em ji hilweşîna sosyalîzma pêkhatî zêdetir, dibînin ku ji ber ceribandina destpêkê di bin dorpêça emperyalîzmê de bû, hêj hewldana kapîtalîzmê pêş neketibû, bandorên feodalî û tebeqeyên navberê pir xurt bûn, di nava teşegirtina civakî de nasnameya Rus xwedî xisletên hişk bû. Di rûxîna dewletê de jî, neçar bû Bolşevîkan xwe bispêrin bermahiyên vê dewletê û heta bi polîtîkayên aboriya nû ve bikarin bi pîvanên aboriya kapîtalîst ve bijîn. Li vir jî rexneyên Troçkî yên piştre pir hatin nîqaşkirin, heta di derbarê kiryarên Stalîn di vê hilweşînê de çiqas berpirsyare de gelek tişt tên gotin. Li gorî min pirsgirêka esasî ne eve.

Ji hêla aborî ve tiştên hatine kirin, bi aboriyek pir paşketî ve xwe gihandina aboriya kapîtalîst a herî pêşketî, heta hêza derbaskirina wê jî raberkirin, ne rewşek ku zêde bê rexnekirine. Her wisa hilweşîn jî çavkaniya xwe ji vê nagire. Jixwe nabe ku mirov bêje ev aborî aboriya sosyalîste.

Em bi kapîtalîzmek dewletek pêşketî re rûbirû ne.

Weke tê zanîn kapîtalîzma dewletê, rêbaza kapîtalîzma hevbeş a welatên paşketî serî lê didine. Ji bo lez kapîtalîst bin, ev model zêde tê pêkanîn. Tişta ku li Tirkiyê jî tê sepan ji vê ne cudatire. Hêjî kapîtalîzma dewletê, rêjeyek zêde bi giranî aboriya Rusya ava dike. Ji ber ku kapîtalîstên taybet ji vê zêde bûn –dîsa di gelemperiya cîhanê de li gelek welatan hatiye dîtin-, ev li Rusya berfirehtir tê jiyîn.

Ger me ev kapîtalîzm hîn zêdetir pêş xistiba, ma dibiya ev bihata wateya sosyalîzmek baştir? Na. Heta me ev veguherta aboriya gelemperî ya sosyalîst jî, ma wê sosyalîzm bihata damezirandin? Ev jî mijara nîqaşê ye. Gelo aboriya yekane ya dibe sosyalîzmê, ev dewleta kapîtalîste? Ev jî dikare bê nîqaşkirin. Gelo ev tam

sosyalîzme? Gelek pirsên ku bên kirin hene û gelo ya esasî sosyalîzmê diyar dike binesaziya kapîtalîzmê ye?

### Pêdivî Bi Modelên Ku Li Hember Kedê Nexerîbin Heye

Ev pir vekiriye: Sosyalîzm, ji bilî keda kes, yên wisa yan jî welê mêtîngeriya xwe bi vê rêyê dike hedef, diz îlan dike. Teoriyek xwe ya daneheva semyanê heye. Ji aliyekê ve jî ger daneheva semyanê rast neyê dabeşkirin diziye. Ev jî bi destê dewletan û bi destê taybet dibe, ew jî evqas negirînge. Li vir ya girîng parkirinek girêdayî hilberîna kedê ye. Ya girîng çi bi destê dewletê, çi bi rêya koperatîfan an jî bi rêyek din dibe, hem di hilberînê de hilberînerî, hem jî parkirin weke radeya kedê pêşxistine. Dikare gelek şêweyên vê bên ceribandin. Bi qasî aboriya gelemperî, ewqas aboriyek taybet jî dikare nêzî sosyalîzmê be. Bi qasî aboriya koman, ewqas jî di hejmarek kêm de em ji aboriya kesan bigirin heta aboriyek gelemperî, dikare di nava modela sosyalîst de bê ravekirin. Divê mirov ne hişk be.

Her kes kirina karkerek dewleta kapîtalîst nabe sosyalîzm. Ger kes jî xwediyê amûrên hilberînê bin, di bin her şertî de ne kapîtalîzme.

Hinekê bûna xwediyê axê, amûr û alavan, bi keda xwe ew hilberandin, belê dikare bibe sosyalîzm.

Bi gelemperbûna amûrên hilberînê ne sosyalîzme.

Heta weke di mînaka Rusya de hatî dîtin, ev ketina destê birokrasiyek pir teng, ji avabûna çînek burjuva ya nû re rê vedike. Lewra xeternake. Dibe ku ji kapîtalîzma taybet hîn zêdetir xeternak be. Li gel vê bi radeya keda xwe ve avabûna kesan, koma kesan jî ji kesan avakirin, di hejmarek kêm de kom bibin xwediyê amûrên hilberînê, dihizirim ku di sosyalîzmê de gengaze. Weke tê zanîn sosyalîzm ne tenê berhemê, di navbera amûrên hilberînê û berhemê de pêwendiyek dijwar heye.

Ma çima parvekirina berheman bi şêweya parvekirina amûran pêş nekeve?

Hem bûna xwediyê amûran û hem jî berheman dikare bibe sosyalîzm. Li vir ya girîng destnîşankirina asta herî dawî ya hilberîneriyê ye. Ger kedek yekbûyî ya deh kesan di radeyek têrkar de dikare bi amûrên xwe ve berhemdar be, ev dikare bibe bîrîmek sosyalîst. Amûr jî yên wan e, berhem jî yên wan e. Her wiha dê pêvajoya van a guhertina bi bîrîmên din re jî pêk were.

Yeqîn dikim li ser van şêweyan rawestîn wê hîn zêdetir aboriya sosyalîst ronî bike. Nêrînên weke; "Em axê pêşî bikin a dewletê paşê dabeş bikin, amûrên hilberînê pêşî bikin ên dewletê paşê dabeş bikin" hene. Ev weke di mînakên pratîkî de jî hatin dîtin, ber bi encamên pir xeternak ve dibe. Li şûna vê bi taybet pêwîste kesên ku di amûrên hilberînê de pispor bûne, misoger berhemdariyê berçav digire û modelên vê yên xerîbî kedê neketine bên dîtin.

Ya rastî sedema nepêkhatina sosyalîzmê, xerîbiya partiyê û paşê jî dewletê beramberî xwe jiyayî ye. Piştî ku di binesaziya jêr de hinek dane pêk hatin ev kiriban sosyalîstî, wê ji neçarî bîrdoziya partiyê re dewlet veguheriya birokrasiyek teng an jî bibûya xwediyê daneyek hûrûkûr û dê ev jî weke çîna jor a kapîtalîstek nû derketiba holê. Jixwe ya pêkhatî jî eve.

Ji ber ku hilberîn û parvekirin nebû xwedî kedê, nexasim demokratîkbûna kedê, her ku çû di partiyê de birokratbûn û di destên pir kêm de jî hêza ku kom bûyî di dewletê de jî veguherî serweriya teqez, di encamê de hemû pergala Sovyet bû karker, li kêleka vê jî di astek pir jor de hevbeşiyek burjuva derket holê. Ti hêmanek ku vê jî venêrîne nîne. Her ku çû bîrdoziya sosyalîst, siyaseta sosyalîst û demokrasiya sosyalîst veguherî li paş pîvanên burjuvaziya kapîtalîst û emperyalîzmê an jî weke rewşek qet pêş neketî.

Ji ber di derve de gefa emperyalîzmê, di hundur de jî nêzîkbûna tenê giranî da aborî, mirov tenê dan karkirin, nirxên wan ên dilxweşî û demokratîk pêş nexistin, ji rista sendîkayan û heta amrazên dewletê, xirabûn, birokratbûn û burjuvabûn ava dike. Hem jî bi şêweyek pir xeternak û heta serberedayî. Ji ber ku kapîtalîstên taybet zêde girêdayî karê ku dikine û zêdetir jî bi encamên wê ve mijûl dibin. Li vir ew jî tine ye. Tenê raye desteser dikin û nirxên ku kom bûne desteser dikin. Pêşbazî jî wisa çêbû û ya pêk hatî jî wisa bû.

Her ku çû hemû rêgezên sosyalîzmê ji çav ketin. Di nava dewletê de ji bo armancên komek birokratên ku kûr bûyîn bû amûr. Ne pêşî li ked û kedkarên xerîb ketîn hat girtin, ne enternasyonalîzm û ne jî şoreş berçav hatin girtin. Her tim gotin; “Berjewendiyên Sovyetê.”
Berjewendiyên Sovyetê jî, vaye qevdek birokrat û şarezayên teknîkê yên partiyê ne. Vaye niha jî vê semyanê parve dikin. Rêjeya birokrat îro vê daneya mezin dixwe, tine dike. Hem jî pir beredayî û xirabkarî.

Dikarim ceribandinên ku me jiyane berçav bigirim û pêşketinên hîn balkêştir bilêv bikim. PKK weke çi partiyê bê nirxandin bila be, her partî di encamê de tevgerek kedê ye. Hêza mejiyê hinek mirovan tê cem hev, çi bi navê vê çînê, çi jî wê çînê, çi bi navê neteweke yan jî kêmneteweke derbasî çalekiyê dibin.

Mînak, ger bi navê burjuvayan şoreşek bê kirin, ev partiyek hilberînere. Wê li gorî çîna xwe rakin asîmanan. Wê rista xwe ya dîrokî bilîze û partiyên wisa jî pirin. Hinek jî bê ku xizmetê ji nakokiyên çîna xwe re bikin, şoreşê ber bi serkeftinê ve bibin, dibin komek çeteyên teng ên berjewendiyan û her tim jî bi şêweyek xembar dawiya wan tê.

Bêguman partiya kedê pir cuda ye. Ked, nexasim di nava mercên netew û civakî ya hejar de, mînak di nava rastiya Kurdistana me de ava dibe û ger tu naxwazî naveroka vê ya kedkar xirab bikî, heman weke tu nebatekî her du roj av bidî û jiyana wê ewle bikî xwe neçarî vê dibînî, bi hestiyariyek wisa ve lê nêrîn hewce dike. Nexwe dê ew partî ji dest biçe û veguhere dijberî te. Ev quralek giştî ye.

Di şoreşa Îslamê de ji bo xirab nebin, têgehek weke têkoşîna nefsê ya mezin derxistin holê. Menqibeyên arif û ewliyan hene. Yên di hemû jiyana xwe de li dergehan êşê dijîn hene.

Wateya vê jî eve: Bidestxistina giraniya bîrdozî ye. Ger bandora van şoreşan heta roja me hatiye, çavkaniya xwe ji pêkanîna rêbazên wisa digire. Ji bilî dewletê, gelek dergehên wisa bîrdozî hene. Jixwe van dergehan şoreşa Îranê pêş xist. Hêjî gelek dergeh pir rehetî ber bi şoreşê ve diherikin. Ev cihên ku giraniya bîrdoziyan lê heye. Li dijî malê dinê ne û çav bernadinê. Her tim li gorî rêgezan dijîn. Vaye, di sosyalîzmê de saziyên wisa pêş neketine. Her tişt di nava partiyê de û her ku çûye di bin fermana komek teng de maye.

Lewra qetla bîrdoziyê pêk hatiye.

Ji ber ku ger her tişt di rewşa xizmetkariya wê kêliyê yên polîtîkayên siyasî û aborî de bin, rêgez û qural namîne. Di Îslamiyetê de jî ji dervî erkên dewletê Şeyhûlîslam hene. Lê belê di ceribandina Sovyetê de cîh ji van re nehatiye dayîn. Her wiha, dema rexneyek cuda pêş diket, weke gunehek mezin dihat dîtin û ji serdema navîn xirabtir bi ser de diçûn. Hema bêje nîqaşên bîrdozî hatine qutkirin. Nîqaş ji asta nîqaşên mezhebên serdema navîn paşketîtirin. Heta dikare bê gotin nîqaş cemidîne. Yek deng û yek vîn derxistine holê. Elbet ev jî dijberî xwezaya mirove.

Ger hêjî bilindbûnek kapîtalîzmê ya diyarker heye, sedema vê ya herî bingehîn “demokrasiya” ku pêş xistiye. Mînak, kapîtalîzmê faşîzm pêş xist, lê zêde pişta xwe nedayê. Jixwe ger faşîzm pêk were, zêde siûda pêşketina jiyîna kapîtalîzmê jî nepêkane. Ancex di pêvajoya dîrokek taybet de, bi armancên taybet derxistine holê û paşê

jî hatine derbaskirin. Her çendî demokrasiya burjuva pir hatibe tengkirin jî, pîvanên wê esasin. Ev jî kapîtalîzmê dide jiyîn.

Sedema vê jî eve: Hinekê mafê axaftinê dide kedkaran. Hinekê mafê xwe ravekirinê dide tebeqe û komên cur be cur. Ev jî rê ji hevrikiyê re vedike û pergalê dide jiyîn. Ev di sosyalîzmê de çênebû. Jixwe demokrasiya sosyalîst û hevriktiya sosyalîst qet nehat hizirîn. Lê belê pêwîst dikir ji kapîtalîzmê zêdetir demokrasiya sosyalîzmê bihata pêşxistin.

Demokrasî çiye?

Hewce dikir asta xwe ravekirina gel, di fikir û polîtîkayê de saziyên vê yên pir cuda hebûna. Di van xalan tevan de bi rastî jî pêwîst dikir ev sazî, partiyê derbas bikin û bi şêweya partî nepejirandinê de bûna. Ji ber ku di sosyalîzma zanistî de partî piştî qonaxekê amûrek neçare bê derbaskirin. Ji kur ve lê bê nêrîn bila be, di teoriya sosyalîst de evqasî pêşketina dewletê, rewşek nayê pejirandine.

Weke dewleta Sovyetê yek şaneya ku dewlet neketî navê nemayî, biyanîbûnek pir xeter û jirêderketine. Evqasî bihêzbûna partiyê, redkirina teoriya sosyalîzmê ye. Jixwe ev jî redkirina demokrasiya sosyalîzmê ye. Bihizirin, tiştek ku mirov êdî ji bilî zikê xwe bihizire nemaye. Neçare ku her tim reş û spî li cîhanê binêre. Pirrengî tine, hêvî tine û hevriktî tine bûye. Ev jî hêza xebatê şeht dike. Encam jî, hilweşîne.

Ji hevbeşiyê re erê, ji xebata li ser vîna şirîk re jî erê, lê ewqas jî însiyatîfa kes û însiyatîfa koman hewce dike. Nexwe bi şêwaza boriya “rabe-raze” ve baxivin, an jî bêdeng bin nabe. Misoger ev berçav nehatiye girtin û nehatiye serxistin. Her tim ew dane guhdarkirin. Feraseta “Teqez dewletê pêk bîne! Qet deng dernexe! Welatiyê herî baş, welatiyê herî zêde bi dewleta xwe ve girêdayî ye! Şaş an jî rast!” Polîtîkayên wisa hene, li dijî gelan û kedkarane, ew jî teqez pêk anîne. Li vir bîrdoziya xulamtî serdeste û civakek ku vê jî dijî, misoger nabe sosyalîst.

Her çendî ne li gorî tê xwestin jî be, dikare bê gotin Lenîn pir sosyalîst bû, ango kesayetek pir pêşketî bû.

Di ol'an de rêber û heta têgeha murşît pir girînge. Tê gotin ger "Pîr û murşît" nebin, nizanim wê cemaet çi bike. "Mele çi bike, dê cemaet jî wê bike." Li gorî min vir jî rewşek wisa heye. Stalîn pêkhînerek pir çors bû. Bi rastiyên giştî ve tevdigeriya, lê kesek bal nedida ser ziraviyan. Ya rastî zêde nehatiye fêmkirin ku, kesayetek çiqasî di zanebûna hîmdarên sosyalîstiyê de ye, çiqas xwe dahûrandiye, çiqas xwe ji xisletên feodalî rizgar kiriye.

Jixwe pêwîste di wan mercan de tiştek din jî ji Stalîn neyê payîn. Stalîn nekarî li ser demokrasiya sosyalîst raweste. Heta ev hemû –yên di dema Lenîn de jî hatine kirin- weke wurşedarî dîtin. Nekarî dengên wisa ji her cihî derdikeve di nava ahenga demokrasiya sosyalîst de bi yek bike. Got; "Bêdeng be!" Dibe ku di destpêkê de bi armanca taktîk bû. Jixwe hemû hewldanên Stalîn ên destpêkê weke taktîkin, lê paşê di asta rêgez de pêş ketin. Nekarîn ji bin derbikevin. Xavî wisa destpê kir. Bi rastî jî bi Lenîn re şîretên wisa hebûn. Îtîfaqên veşartî ji holê radikir. Digot pêwîste amûrên ku li ser vîna mirovan hukum dikin bên parçekirin û ev pêk jî aniye. Zexta li ser gelan şikandiye. Azadiya feqîran nas kiriye. Hînkera wî heta dawî ji vê re vekiriye û ev di radeyek bilinde di nava pêkanînan de diyar kiriye. Ser jî xistiye, lê belê ev tam bi sazûmanî nebû, ji hêla demokrasiyê ve nebû dewlet an jî dewlet li ser bingeha demokratîk nehat damezirandin. Ya rastî di gotina Lenîn de demokrasî dewlete.

**Ne Kesayetek Evdal û Çêkirî**

**Kesayetek Dihizire û Biryar Dide**

Mînak, Kurdistan pir paşketî ye. Feodalîteyek sed qatî ji Rusya Çartî paşketî, heta di wateya eşîrperestî û kapîtalîzmê de jî kapîtalbûnek paşverû, ji ber ku bi mêtîngeriyek di sînorê komkujiya herî xeternak de dijî, dikarim van baştir raçav bikim.

Mînak, me têgehek weke “bandorên Kemalîst” derxist hole. Li gel vê têgehê yên weke “bandorên eşîrparêz û axatiyan” jî gelek caran em bikar tînin. Heta min ev kar ewqasî kûr kir, em ji vê re dibêjin di Marksîzmê de heta dixwazî bikaranîna derûniyê jî. Min zêde pêdivî bikaranîna rêbazê derûniya sosyalîst dît. Ji ber xala qadroyên sosyalîst çareser nebe, çi bigihe serkeftinê, çi di radeyek kêm de çalekiyên siyasî û leşkerî pêş bixe, wê di carekê de berovajî veguhere. Ger rojane li ser milîtaniya sosyalîst ranewestim, wê ew kes di carekê de partiya mezin veguherîne amûrek hişk a feodalî.

Kes û ferdên malbata aristokrat ên bê ax û bê bace, li Kurdistanê pirin. Malbat, terbiya “bila lawê min mezin bibe, daku bibe paşa” dide. Şêwaza terbiya yên herî hejar jî wisa ye. Li gorî şêwaza eşîrê ya mînak tê girtin jî eve. Niha, ger em vê nedahûrînin û bi rêbazên guncav terbiye nekin, dê şêweya paşayê ku pêşî bavê xwe darve dike derbikeve holê. Hêz û raye girtiye destê xwe, kesê ku rexneyek ji rêzê jî dike, tesfiyekirina wî weke rêgez digire dest.

Kemalîzm jî, vê li Tirkiyê bi şêweyek cuda dike. Ev jî mînakek vê ye. Ya dimîne bi şêweya evdên xirabûyî, bê naverok, êdî em dikarin bêjin evdên serî tewandî pir lez pêş dikeve. Jixwe di nava me de jî hema her sal tasfiyek rû dide û em jî destwerdanên xwe dikin. Ev jî PKK’ê pêş dixe. Ger ez nebim, her kes dibêje; “Wê em tev biçewsandan, heta em ê hemû bêrehm ceza kiriban.” Jixwe rewşa yên din jî ji sedî heftî û pênc di rewşa evdalan de ne. Ji ber ku hêza şerê taybet a rêxistina beramber pir pêşde ye, çend mehan an dimîne yan jî namîne. Jixwe di nava xwe de jî lez xirab dibe. Asoyek wisa polîtîk a cidî, çandek demokrasiyê tine ye. Pir xwepereste. Hema weke bêje; “Yên ji min hez nake bila bemire.” Hezkirinê jî bi zorê dixe meriyetê. Afirîneriyek cidî tine ye. Hemû karê dikare bike, girêdayî keda

milyonan mirovên partiyê, hemû nirxên berhema dîrokê di rêkurtkê re, bi rêbazên metirsîdar desteserkirine! Yên li hemberî vê asteng jî li gorî xwe bi rêbazên komploger ve tine dike! Di encamê de xwe di demek kin de li ser keda milyonan dike serdestê yekane.

Niha ev çiye? Ger li rewşa kesayet bê nêrîn, bivê-nevê tenê dikare bibe despotek feodal. Nikare bibe rêberek siyasî ne yê kapîtalîst ne jî yê burjuva. Ji wî jî paşde ye. Jixwe qet nikare bibe demokratek burjuva. Nikare bibe demokratek gundî jî. Çima wisa bû? Em ji kur ve binêrin bila be, ma ev sîxurek bi zanebûne, na. Ma ev sîxurek mêtingeriyê ye, na. Ji heft saliya xwe ve wisa çêbûye û pêş ketiye. Tişta ku di nava malbatê de nedîtî û hêz û qîmeta ku nekarî di nava civakê de saz bike, di nava partiyê de pêş dixe.

Vaye tişta ku di partiya Bolşevîk te pêk hatî, ji bilî vê ne tiştek din bû. Dikarim ji van re bêjim mînakên "Stalînên biçûk" jî. Ev rastiyek zêde û di gelemperiya cîhanê de dihat jiyîn. Ya rastî nekarîn li hemberî vê merheleyek serkeftî pêk bînin. Ji kur ve binêrin bila be, van kesayetan hevdu xwedî kirin. Jixwe ji bo partiya Bolşevîk di dema Stalîn de wisa tê gotin: "Partiya mirovên durû." Li ber çavan zêde pîroz dikin, lê belê di hundurê xwe de jî pir acizin. Ev di kesayeta Çavuşesku de jî pir balkêş xwe da der. Ya rastî mirov ji van re bêje kesayetên minafik baştire. Dema li ceme şeqşeqe, dema dikeve tengaviyê jî heta dawî îxanetê dike. Niha divê pêşî li vê bê girtin. Hewl didim di mînaka xwe de jî vê pêk bînim. Di radeyek mezin de girêdan û pêwendiyên min wisa ne.

Li dijî vê girêdanê me. Hemû jî duristin, ji bo bibin minafikek wisa, durûyek wisa nayên girêdan. Kesayeta wan tenê dikare evqasî girêdanê ragire. Ma girêdanek ji gundîtiyê tê wê çiqas nirxa wî hebe? Di dilê xwe de ji sedî nod xwe dijî, ger hebe ji sedî deh jî ji bo dayîka xwe dijî, hebe ji Xwedayê wî re ye! Lê di rastiyê de jî girêdayî milkek biçûke û evîndarê xwe ye. Ev ne sosyalîzm, şêwaza girêdana burjuvaziya biçûke. Her kêlî jî dibe ku bê guhertin. Dikare pesnê xwedayê xwe jî bide û heman kêliyê îxanetê jî lê bike. Jixwe îxanetê jî dike. Vaye rêbazên ez pêk tînim, çareyên derbaskirina vê kesayetê

ne. Tevdîrên sosyalîstkirina partiyê, kûrkirina azadiyê ye. Wê tu kesayetek wisa ava bikî, bila bibe kesayetek pêkhatî. Ne kesayetek evdal û çêkirî, kesayetek dihizire û biryar dide. Wê ev kesayet ne pir xweperest û ferdperest be, ne jî evdal be. Wê ne bi temamî xwe înkar bike, ne jî xwe xwediyê her tiştî bibîne.

Çareyê di vir de dibînim û ev jî ne pêkanînek hêsane. Dibe ku hewldanên min ji sedî nod ber bi vê ve diçe. Hewldana ku beramber şerê vekirî yê Komara Tirk dimeşînim, bi qasî bê gotin tineye kême. Lê ger ev karbidestiya qadro pêş nekeve, wê PKK tine bibe.

## Dema Artêş Domdar Bû Serdest Dibe û Dibe Ku Veguhere Rewşa Çîna Mêtînger

Têkoşîna sosyalîzmê, di heman demê de têkoşîna li dijî heywanbûna mezin a serdema emperyalîzmê ye.

Kîjan cinawirî ji nifşê xwe evqas mirov kuştine?

Ev cinawirê herî mezine! Ji bilî vê ti aliyê vê bê ravekirin nîne. Ev heywanbûna herî xeternake. Ger em dixwazin têkoşîna sosyalîst û civakî pêş bixin, em ê misoger li dijî vê ferdperestî û cinawirbûnê têkoşînê bimeşînin. Jixwe di her ol'î de jî wisa ye. Gelek Ol'ên weke Xiristiyanî û Îslamê, ji bo armancek wisa di dest de pêk bînin, têdikoşin. Her tim li dijî zaliman, destxwîndaran, bê edaletî û dizan têdikoşin.

Vaye, sosyalîzm şêweya vê ya herî pêşketiye. Partiya sosyalîst, amûra ku vê herî zêde pêş dixe ye. Bi tenê û bi komekê nikarim vê bikim, bi partiyek herî pêşketî ve vê dikim. Heta ger dewlet hewce bike, ezê bi dewletê re bikim. Yek aliyê dewletê bê parastin hebe, ew jî ji ber şerê li dijî ferdperestî û xwediyên desthilatiya bê hevsengî hewce dike. Ji bilî vê bi ti şêweyî dewlet nayê parastin. Jixwe ev di teoriya sosyalîst de hatiye ronîkirin. Dibeje; "Ger hêjî yên serdest û mêtînger hene, zorê bikar bîne." Ji bilî vê ti mantiqa zorê nîne. Şaşwazim! Çima evqas artêş hene? Dibe ku artêş ji bo serkeftinekê hewce bikin. Piştî wê belav bike. Vaye te ser xistiye, çima tim artêşan xwedî dikî?

Weke amûrek taybet dema artêş domdar bû, dibe ku veguhere çîna serdest û mêtînger. Ev xeteriya artêşan heye. Gel her kêlî di rewşa

artêşbûnê de girtin, li hember şêwaza mêtînger û zextkaran jî tevdîrek herî bibandore.

Mînak yekser amûra artêşê belav bike, birokrasiyê belav bike, îstîxbarata taybet belav bike, gel û kes xurt bike. Hûnê bêjin; "Vêca ger xeterî hebin." Ferdên xwe ewqasî xurt bike, daku wexta te got; "Rabin welat biparêzin", wê hêza parastinê esas bigirin. Ji birokrat û amûrên artêşê yên herî bi bawer zêdetir ew mirov dikarin parastina welat û kedê pêk bînin. Ev di Sovyetan de pêk nehat. Weke amûrek taybet hat pêşxistin. Komîteya Ewlekariya Dewletê (KGB) pir baş pêş ket. Artêşa sor pir baş pêş ket. Birokrasiya Sovyetê pir baş pêş ket. Niha jî dibêjin; "Artêşa sor bûye bela." Kavilên wê jî bela ne. Vekirî bû dê wisa ba. Ji ber ku li gorî pergalê ye. Belê ev, ji bo burjuva û feodalan cuda ye. Ew ditirsin. Ji ber her tim mêtîngeriyê dikin, rojane zextê dimeşînin, rojane pêdiviya wan bi rêxistina zextê jî çêdibe. Lê pêdiviya sosyalîstan bi vê nîne. Ger li cihekê rêberek sosyalîst her tim van amûran xurt dike, divê mirov ji wî bitirse. Ev dijberî teoriya sosyalîste.

Vêca wê qet parastin çênebe? Wê parastin hebe, lê ne bi şêweya amûrên taybet. Wê tu nedî destê fermandarên taybet. Dema te da, vaye weke milîtanên nû yên dema di nava partiya me de raye digirin destê xwe dibe.

Modela herî guncav dibînim eve: Di rewşek ku her kes dibêje PKK ya mine de, rewşek ku kes nabêje PKK ya mine ava dikim. Lê PKK bi temamî ya te ye. Hemû PKK ya mine, lê di heman demê de tiştek ne ya mine. Ev tê wateya ku PKK weke amûrek taybet nedîtine.

Ma rayeyek jê re hat dayîn, ew raye mînak rayeya; "li vê herêmê şoreşê evqasî pêş bixe. Di nava pêvajoyek şeş mehan de serkeftinek wisa saz bike" ye. Ne rayeyek wisa ye ku bêje; "Li wir derebegiyê saz bike." Ev amûra partiyê jî di vê manê de ji bo te nehatiye dayîn. Jixwe li gorî min divê feraseta sosyalîzmê ya raye jî wisa be. Di bersiva peywirek ku pêwîste were bicîhanîn de, wê tu amûrek rêxistinê di astekê de bikar bînî, bi wê peywirê re wî peywirdarî jî bigirî. Mînak dema saziyek weke katibî heta dawiya jiyana wî da kesekî ew diqede û tine dibe. Katibên nayên guhertin û amûrên nayên guhertin, misoger

bandora şêwaza çîna serdest û mêtîngeriyê ne. Mixabin di sosyalîzma pêkhatî de ev pêk hatine û berdewam kirine. Ya divê bê kirin derbaskirina vane. Neku nayê derbaskirin.

Jixwe dema em hinekê li ezmûnên gelan dinêrin, wisa ne girêdayî amûrên taybetin. Milet ti carî weke serdestan -ger li ser serê wan despot, zalim û mêtînger nebin- pêwîstiya çekdarbûnê nabînin. Pêdiviya avakirina amûrên taybet, rêxistinên taybet û rêxistinên veşartî nabînin. Rêxistinên veşartî karê kîne? Amûrên zextê yên taybet karên kîne? Mane gotinek heye dibêjin; “Kurmê xayîn.” Ango karê kesên ji xwe ditirsê ye. Ji ber neheqî li hinekan kiriye lewma vê dike. Lê ev jî kêmin. Her wiha dijminê wan pirin. Çima? Ji ber wan dijmin ava kirine. Sosyalîstek vê nake. Hewce nake sosyalîst xwe ji gel biparêze.

Di ezmûna Sovyetê de, pêşxistina evqas amûrên artêş û birokrasiyê, kes nikare bêje tenê li ser bingeha xwe ji emperyalîzma DYE biparêze pêş xistiye. Na, ji sedî nod li hember civaka xwe pêş xistiye. Ev kiryar hemû, ji civaka Sovyetê veşartî hatin kirin. Rêxistina îstîxbaratê û artêş pir cuda bûn. Encam jî, rizîn û xirabûn bû. Ev hemû jî şaşin.

Di mercên emperyalîzmê de jî be, em PKK’ê weke modelekê pêş dixin. Em ti carî bi rêbazên ku sosyalîzma pêkhatî bikar anî ve tevnagerin. Ger bikin jî, jixwe negengaze em li ser piyan bimînin. Çareya sereke min dîtî, kes hem ji hêla bîrdozî hem jî weke milîtan xurtkirine. Ji ber piraniya pereyan li cem kapîtalîstane, zêdahiya ferdperestiyê jî ew didin. Vaye, wê tu modelek wisa pêş bixî, wê ji pereyan jî, ferdperestiyê jî hîn bilindtir be. Jixwe PKK’ê ev ji civaka Kurd û Kurdistanê re selmandiye. Her cure netewperestiya hatî sepan û her cure kiryarên feodalî tiştek nedane miletê Kurd. Lê modela PKK’ê yekîtî daye, dilşadî daye, mirovê xurt daye û mirovê leheng daye. Vaye hêza PKK’ê di vir de ye.

Behsa pirdengî tê kirin, ez ji pirdengî zêdetir dibêjim; “Avakirina asta sazîbûna ku ji civakê re pir hewce ye.” Neçare ku saziya bîrdozî û dilşadiyê hebe. Ev saziya bîrdozî û dilşadî çiye? Em çi navî li vê

bikin bila be, saziyek berpirsyar a di civakê de pêşxistina nirxên bingehîn û çavdêriyê ye. Pergalek me li ser vî bingehî ava kirî heye. Gihaye serkeftinekê yan jî serfiraziyê jî. Niha jî wê bi sazî bike. Ev yek, ya duyem jî desteya parastinê dibe. Bal bidinê, saziya parastinê ne artêşeke. Kêm-zêde ji rêjeyek pispor saz dibe. Saziyek ji çil-pêncî kesî pêk tê, her tim dikare çavdêriya parastinê bike.

Mînak, dema hewce kir bikare di nava bîst û çar demjimêran de artêşê kom bike. Lê artêşa wî tine, amûra wî ya taybet tine, tenê deste heye. Vaye dikare bibe desteya aborî yan jî meclîs. Mîna vê dikare bi çandê ve jî eleqedar be, hawirdor ve eleqedar be. Lê yên karên wan ên rasteqîn heyî deste ne. Bal bidinê, li vir di wateya kevnar de dewlet tine ye. Ango di destê de evqas raye, evqas semyan tine ye. Misoger wê tu hêza zêde, semyana zêde û zêde kes nexî destê wî. Tenê bi qasî bikare biafirîne û xwe bide jiyîn hinek pere û bi qasî hewce dike endaman bidî. Mînak, yek bixwaze dîktatoriyê bike nikare bike. Ji ber ku hêza wî tine. Komîteya parastinê bi çil-pêncî kesî ve sînordare, nikare darbe bike. Dîsa hevsengiya saziya dilşadiyê hatiye sazkirin, hêza wê sînordare. Pirdengî yan jî demokrasiya sosyalîst ya em behsê dikin wisa dibe. Ya rastî pêwîste mirov ji vê re bêje; “Hevriktiya sosyalîst.” Ji meylên cuda zêdetir, hişmendiya yek dengî neraste. Xweza rastiyek pir tevlîheve. Xwezaya mirov jî rastiyek pir tevlîheve.

Elbet yeqîn dikim ji kapîtalîzmê zêdetir, pêwîste di sosyalîzmê de hevriktî, azadiya raman û azadiya koman hebe. Jixwe ev sazî ji bo ewleya van mafan hene. Ji bo kes xwedî însiyatîf be, kes afirîner be pêdivî bi van saziya hatiye dîtin. Nexwe feraseta; “Wê tu her tiştê murşîd pêk bînî” nabe. Na! Ger zêde bihêz be, wê ev bibe sofîtî û paşverûtî. Hevsengiya vê jî hatiye çêkirin. Wê tu modelê wisa pêş bixî, daku misoger divê sazî ne yên diçewsînin, pêwîste xwedî xisletên însiyatîf an jî kes pêş bixin de bin. Vaye, demokrasiya sosyalîst ancex dikare wisa pêş bikeve.

Kapîtalîzm jî bi vê modelê tê derbaskirin. Cinawirê herî mezin ê roja me kapîtalîzm bi xwe ye. Jixwe nakokiya di civakê de mezin kiriye.

## Di Navbera Civak û Xwezayê De Valehiyek Mezin Heye

Niha nakokî ji nava civakê derketiye, veguheriye nakokiya bi xwezayê re. Ya herî xeternak jî eve. Dîsa nakokî bûna nakokiya tenê di navbera çînayetiyan de derketiye, kapîtalîzm aresteyî hemû civakê bûye. Aresteyî xwezayê bûye. Cinawir tenê çînayetî û mêtîngeriyê saz nake, xwezayê jî wêran dike. Ango erd û asîman jî kun kir. Hema bêje hevsengiya xwezayî serûbin dibe û civak aniye ber tinebûnê. Her der bûye beton, wê şûnek lê bê jiyîn nemîne. Mezinbûna şêniyan dibe ku teqînek wisa ava bike rewşek ku cîh li ser rûyê erdê nemîne bide jiyîn. Hinek nexweşiyên seyr derdikevin. Nexweşiyên her tim gefan li mirovahiyê dixwin pêş dikevin. Ev hemû nakokiyên ku kapîtalîzma cinawir derxistîn holê ne.

Nakokî; ji sedsala 19. heta ji çarîka destpêkê ya sedsala 20. zêdetir ber bi şêweyên cuda ve diçe. Nakokiya kapîtalîzma sedsala 19. hinekê jî nakokiya di navbera ked û semyan an jî proleterya û burjuva, hinekê jî gelên bindest û dewletên mêtînger de bû.

Wexta em li vê çarîka duyemîn a sedsala 20. dinêrin, êdî ti wateya van nakokiyan nemaye. Xeteriya çînayetî ewqas negirînge. Dîsa mêtîngerî jî ewqas cidî nayê girtin. Ger hebe jî sînordare. Nakokî hîn zêdetir bi gelemperî bû û bi şêweyên nû pêş ketin. Li gorî min di roja me de aliyên emperyalîzmê û kapîtalîzma di nava xwe de dihewîne yên herî xeternak û nakokiyên rê jê re vekirine, hemû civak kiriye hedefa xwe. Mêtîngerî û teknîkên rêvebirina ku pêş xistiye ewqas pêşveçûyî ne; mînak asta pêşveçûna yekdestdarî, holdîngbûn û tora çapemeniyê jî bi serve bike, rêveberiya zanyarî, teknîkên pir tirsnak ên pir pêşketî ne.

Ya rastî hema hemû civak dîl hatiye girtin. Ne çîn, civak bêguman çîn jî di navê de ye. Lê niha li ser hemû civakê tê lîstin. Li ser her çînê cuda dilîze. Li ser zayend cuda dilîze. Li ser zarok cuda dilîze. Jinê pir baş bikar tîne. Heta çîna semyana navîn pir cuda bikar tîne. Lewma nakokî hem bi giştî bûn hem jî berfirehî mezin bûn.

Dema em behsa cîhanîbûnê dikin, bûyera kapîtalîst û emperyalîzmê hemû cîhan weke axtapotê di nava pençeyên xwe de girtiye. Weke bangerê bi ser her tiştî re derbas dibe. Elbet di teknîka ku rê ji vê re jî vedike de pêşketin hene. Dîsa di pêncî salên dawî de pir baş tora çapemeniyê di astek awarte de bandor kiriye. Ev weke tê zanîn ne ji bo feydeya mirovahiyê ye, di derbarê dawiya wê anînê de xeterî jî bi xwe re aniye.

Em dikarin nakokiyê wisa berhev bikin: Ne weke raveyên çînên bindest û mêtîngehkirî li dijî çîna mêtînger a din, dijberiya gelê bindest a li hember dewleta mêtînger a serdest, bi şêweyek vê jî bigire nava xwe bi hêza civakî ve yan jî civakê bi xwe re li ser wan saziyên çapemeniyê yên mezin û derfetên teknîkê yên din re dike yek û di navbera xwe gihandina hêza rêvebirinê de ye.

Îro têgehek weke DYE hêza herî mezine derxistine holê. Di bin vê sazûmaniya nû de bi rastî jî civaka cîhanê di bin xeteriyek mezin de

ye. Nakokiya yekemîn eve. Nakokiya duyem jî, di navbera civak û xwezayê de valehiya mezin a hatî avakirine.

Di pêncî salên dawî de wêrantiya hatî kirin, yeqîn dikim ji destpêka mirovahiyê heta roja me ya herî mezine.

Qirêjbûna xwezayê di ti demên dîrokê de evqasî pêş neketiye. Ne tenê qirêjbûn, xweza ji dest diçe. Cure tine dibin. Nebat û lawir bi lezek mezin ve di rewşa tinebûnê de ne. Hewa qirêj dibe, qeşa dihele, radeya germahiya tevahiya erdê her ku diçe zêde dibe. Êdî warên ku em lê dijîn dê veguherin çolê. Ev hemû kêm xeteriyê rave nakin.

Êdî xeteriyên heyî, di rewşek xeteriyên çînayetî çil qatî zêdetir paş xwe dihêlin de ne. Beriya her tiştî xisletên mirov ên li ber xwe dayînê tên tinekirin. Asta dilşadî tê xistin.

Vaye ji we re bêhtengî!

Hinde di nava betonan de tê jiyîn, kêmek maye mirov veguhere kêzikan! Vaye, kapîtalîzmê mirov veguherandiye kêzikan. Ji vê kapîtalîzmê jî ancex ev tê payîn. Dema teorî û bernameyên sosyalîst ên nû tên pêşxistin, teqez pêwîste di van mijaran de nîqaş werin meşandin.

Ger bal bê dayîn, ji bo vê jî pêwîste modela sosyalîst zêde bê pêşxistin. Ev model, modela pêşxistina mirove. Li gorî min bi vê modelê re, mirov dikare her tiştî venêrîne. Hûn dikarin zêdebûna şêniyan venêrînin. Misoger dikarin civakê bi vê bidin yeqînkirin. Kapîtalîzm civakê nade yeqînkirin, civakê ji rê derdixe, bikar tine û xerc dike. Lê sosyalîzm ne wisa ye. Dide bawerkirin û her tiştî bi dilxwazî dide kirin. Xeterî mezine. Mînak, dema dibêjin em karbondîoksîtê kêm bikin, her kes diraze, ji ber ku dibêjin hem bila şênî kêm bin, hem jî em bi zad xwe xwedî bikin.

Civakek ecêb beredayî û xerc dike hatiye avakirin. Her kes dixwaze hîn zêdetir bixwe û hîn zêdetir xerc bike. Hema cinawirên xerckirinê ne! Dema pêşerojê her kes veguherî cinawirek xerckirinê, êdî cîhanek ku bê xerckirin jî namîne û dê vêca hevdu bixwin.

Belê, bi modela sosyalîzma zanistî re ne xweza wêran dibe, ne jî bêrehmiya civakê pêk tê. Dikare plansaziya şêniyan bê çêkirin. Dikare

aborî bi hevsengî bê pîlankirin. Vaye di roja me de sosyalîzm li hember harbûna xerckirinê û wêrankirina xwezayê, li hember dîlkirina civakê ya ji aliyê tora çapemeniyê û gelek nexweşiyan ve, navê têkoşînê ye.

Misoger feraseta sosyalîzma sedsala 19. têrê nake. Ew her tim hişke û dibêje; “Li hember çînayetî çîn, li hember mêtîngeriyê rizgariya netewî.” Ev jî hinekê hewce ne, lê di rastiyê de rûyê ku derdikeve pêş pêşxistina demokrasiya sosyalîzmê ye. Li dijî wêrankariya hawirdor û harbûna xerckirinê, ya esasî pêşxistina têkoşînê ye. Ev dikare bibe bernameya nû ya sosyalîzmê. Bernameyek wisa hem wê bibe raveya sosyalîzmê ya herî zelal, hem jî rizgariya mirovahî bi xwe ye.

Di vê watê de sosyalîzm pêşeroja mirovahî ya yekane ye.

Berê civakbûn dihat gotin. Em jî niha ji vê re dibêjin sosyalîzm. Jixwe dema civakbûn raweste heywantî destpê dike. Di mercên kapîtalîzmê de jî cinawirên herî xeternak mezin dibin. Lewra têkoşîna sosyalîst di vê qonaxa serdema kapîtalîst-emperyalîst de rêya sereke ya rizgariyê ye. Mercê ku nebê nabê ye! Ger heywanbûnek evqasî bi giştî bûyî neyê rawestandin, dê mirovahî biqede. Di vê watê de ez dibêjim di sosyalîzmê de israr, di mirovbûnê de israre.

## Di Roja Me De Hinek Xisletên Nû Yên Pêngava Sosyalîzmê

Bersiva herî watedar em bidin roja yekîtî, pişgirî û têkoşîna çîna karker 1’ê Gulana ku bi gelemperî bûye, li gorî xweseriya vê çînê di derbarê ramanê cîhanî û pêkanên pratîkî de, di mijarên ku helwestên

herî bingehîn bersivê bidin pêdiviyan de zelalbûn û biryardariye. Di hêza pêkana vê de cîh girtin, weke peywir li pêş me ye.

Ev roj herî watedar û bi girseyek mezin pîrozkirin, bi hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re, pênaseyek xurt dana sosyalîzma ku ji qîmet hatiye xistin an jî dixwazin qîmeta wê bixin, ji bo serkeftina peywirê girînge. Dema ev bê kirin bi qasî pirsgirêkên bingehîn ên girêdayî dîrok û rojaneya mirov, ewqas jî rêyên çareseriyê dîtin û hêza li ser wê pêkanê raberkirin weke ku tiştek ji girîngiya xwe winda nekiriye, dibe ku her roja derbas dibe hîn baştir bê fêmkirin û li pêş hemû peywiran radiweste ku, di destpêka karên em dibêjin lezgînin û nayên taloqkirin de ye.

Bêguman hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, pirsgirêkên kapîtalîzmê kêm nekirine yan jî weke hatiye îdîakirin nayê wateya serkeftina wê. Berovajî hîn zêdetir bi pirsgirêkên ku ew giran kiriye û nikare ji bin derbikevê re rûbirû hiştiye.

Dikare bê gotin, di roja me de bi ti demê re neyê muqayesekirin, kapîtalîzma heyî elametên rizandinê raber dike. Şîrovekerê herî niyaz baş, dikarin bêjin ku dîrok radiweste. Dibe ku hinek ji vê re bêjin; "Serkeftina bê dawî ya kapîtalîzmê." Lê belê hemû amaje destnîşan dikin ku, pêwîste weke bêdawiyek nêzî karesatekê bê pêjirandin. Ya rasteqîn jî wisa ye. Mirovahî xist nava çerxek xerckirinek wisa ku ti carî mînakên vê nehatine dîtin. Bi bazdanek wisa re dihêle, êdî nikare henase bigire û nediyare ku wê li kur bikeve. Vaye bingeha bûhran û reşbîniyê eve.

Bi gelemperî hemû çînên mêtînger û çewsîner, bi taybet jî çîna wê ya herî çavsor û bêrehm, weke pergala ku xwe dispêriyê kapîtalîzmburjuva, ya rastî xiftanê xwe jî biguhere, di roja me de hatiye rewşek ku qet hewce nake, lê ewqas jî bûye bela serê civakê.

Ji bo Şoreşa Cotmehê, dikare bê gotin ku şoreşek zû welidiye. Lewma di nava xwe de nexweşiyên giran jiyaye û rê ji şêweyek sosyalîzma ku nekariye xwe ji hilweşînê rizgar bike re vekiriye.

Em dikarin vê ji bo şoreşên ku di demên dîrokê yên herî kevin de pêk hatine jî bêjin. Di her serûbinbûna girîng de yan jî di şoreşê de

kêm-zêde çîna ku meyla desthilatiya şoreşgerî ya herî çepgir û radîkal diyar dike, di nava mercên herî jêr û zehmet de dibe çîna ku herî zêde kar dike. Kole, serf û peyre karker bi mercên hinekê tên guhertin ve, çînên kedkar ên rengê xwe guhertine.

Em dizanin ku çînên serdest jî bi guhertina rengê xwe ve hatine heta roja îro. Tişta ku kaptalîzm-emperyalîzmê jî bi serve kirî, bêteşekirin, ji vê hêlê ve anîna rewşek ku nekare têbikoşe û ji bo vê jî şerek derûnî, bîrdozî û çandî ya pir sazûmankirî dimeşîne. Pêşketina teknîk a di qada çapemenî û weşanê de jî pir baş bikar tîne û berfireh dike. Civakê di bin bombebaranek wisa de digire ku nekare henase bigire û wisa birêve dibe.

Seyre; berê bi rastî jî serdestan hewl didan bi çekên diteqin û bombebaranan çok li civakan bişkînin. Di roja me de êdî pêdivî bi vî şerî nayê dîtin, ji ber bombebaranên ruhî, bîrdozî û çandî hîn zêdetir bibandorin. Teknîka heyî jî derfetê vê zêde pêşkêş dike. Lewra derfeta çînayetî û her tiştê ku pêwîste ji hev bê cudakirin têkilhev kirin, ev jî di bin fermana çînek her tiştî binrebinre, hîleyan, mêtînê û zextek nayê dîtin ve kirina meriyetê pêş ketiye.

Ger em di roja me de nikarin behsa çînên ku sînorên wê zelal û baş hatine destnîşankirin bikin, yek ji sedema wê ya herî girîng jî eve. Ya rastî diyardeya kedê, çîna ku çavkaniya xwe ji wê digire, her çendî naverok û şêweya xwe biguhere jî, misoger wisa ye. Lê bi gelemperî pêwîste pênaseyek baş ji bo çîna mêtînger a serdest ku her tim rengê xwe diguhere û di wateyekê de jî xwe bi giştî dike bê kirin.

Pênaseya çîna kevnar a weke xwediyên koleyan, xwediyên axan, xwediyên kargehan têrê nake.

Pênaseyên weke burjuvaziya navîn, burjuvaziya biçûk û hwd jî têrê nake. Ger em dixwazin sosyalîzmê baş fêm bikin, pêwîste pênaseyên dahûrînên çînan û rastiya rojane berçav bê girtin û wisa bên kirin. Nexasim li welatek weke Tirkiyê, rejîm çawa tên damezirandin, yekser dest bi bîrdoziya; “Em girseyek bê çîn û takemafin” kiribin, ev rewşa nû hîn zêdetir xwedî girîngiyekê ye.

Rêbazên zextê yên çors şûna xwe ji bîrdozî û derûnîre hiştiye û jixwe ya tevlîheviyê jî kûr dike eve. Ya împaratoriya tora civakî tê

gotin yekdestên çapemenî û weşanê ji hukumdarên herî bi qudret zêdetir bi şêweyek xeternak civakê birêve dibin. Cihê teknîkê ya di nava hilberînê de hinek din pêş ketiye. Li şûna keda berê ya dest û mil –her çendî dîsa girêdayî vê bingehê be-, hilberîn kirine destê rêveberên teknîka nû û wisa jî keda dest û mil bêbandor kirine. Ango aliyên keda xwe dispêre dest û milê mirovê kedkar zêde hatiye lewazkirin.

Hema bêje bi şoreşa zanist û teknîkê ya yekdestên heyî pêş xistin re, ji mirov re dibêje; “Tu zêde ne hewce yî.” Betaliya zêde, hinekê jî girêdayî vê xisleta kapîtalîzmê derketiye holê. Kêmek maye burjuvazî civakê weke ne hewce ye îlan bike. Ya rastî ya nehewce kapîtalîzma heyî bi xwe ye. Lê mixabin ji ber desteserkirina wê serdestî, rêveberî û amûrên bandorkirinê yên mezin ji civakê re dibêje; “Tu ne hewce yî” û dide pejirandin.

Ya herî zêde jî lepên xwe avêtiyê gerstêrka me ye û henaseya wê qut dike. Vaye tinebûna şînahiyê, di wateyekê de qutkirina henaseya mirove. Sêwana gerstêrka me qut dikin, difirînin.

Ji ber kunbûna tebeqeya jora asîman, cîhana li ber her cure xeternakiyan vekiriye. Ji aliyek din ve jî xeteriya atomê dibe ku her kêlî rewşek mehşerê pêş bixe. Ji ber derketina hinek nexweşiyên ku pêşî lê nayê girtin –weke pençeşêr û AIDS (Nexweşiya kêmbûna Parastinê ya Jêvegirtinê)- nehevsengiya şêniyên zêde dibe, ne diyare wê mirovahiyê ber bi kur ve bibe, ji ber encamên ku nediyarin wê cîhan bikeve çi halî, bêguman kapîtalîzm berpirse. Ji ber her ku diçe van pirsgirêkan hîn girantir dike û tîne astek bûhrana mezin. Hem di wateya ruhî hem jî fîzîkî de henaseya mirovahiyê tê birîn.

Fikarên bingehîn ên jiyana mirov tên tinekirin, estetîk tê tinekirin, rista ol û felsefeyê tê tinekirin.

Rewşek ku mirovatiya kor bûyî, ecûc, koma mirovên weke moriyan, dibe xeternakiyek rasteqîn. Pergala ku vê jî saz dike, kapîtalîzma cîhanî ye.

Pêdivî bi bîrdoziyek nû û ramanek bingehîn heye.

Sosyalîzma ku li hember vê pir bi îdîa ye nebesiyek jiyan kiriye.

Niha jî sedema vê tê nîqaşkirin.

Gelo bîrdozî û karbidestiyek ku cardin bikare pergala emperyalîstkapîtalîst dikare çawa bê sazkirin?

Ya rastî qada ku nîqaş li ser lêhûr bibin eve. Kapîtalîzma heyî parastin, ji bo mirovahiyê pejirandina mehşerê ye, pêşeroja wê tinekirin, di rewşek ku bi qasî mirovahiya hovane de jî ne kamil, dixe nava mehkumiyetek xirab. Harbûna xerckirina civakî ya heyî, dibe sedema ku em hêsan pênaseyek wisa bikin. Ger dê mirovahî bijî –qet nebê bi qasî qanûnên xwezayê yên din, li gorî qanûna mirovahiyê jî wisa dibe-, ev rewşa heyî nayê pejirandin. Nîqaşkirina rewşê û xwe gihandina rêya çareseriyê, çi bi navê sosyalîzma zanistî, çi jî em bêjin sosyalîzma ku di vê astê de pêş dikeve, pêdivî bi bîrdoziyekê, ramanek bingehîn û sepana vê heye.

Em baş dizanin ku, sosyalîzma zanistî di rojekê de çênebû. Ne tenê berhema ceribandina welatekê ye. Heta ne berhemek kapîtalîzma Ewrûpa ye. Di hemû pêvajoyên civakbûnê de, nexasim di pêvajoyên serûbinbûna şoreşgerî de, ya ku xwedî veguhertina herî radîqal meyla derdorên civakî her tim di derbarê pêşketina sosyalîzmê de fikir û çalekî derxistine holê. Di vê wateyê de, fikir û pratîkek ku bi pêşketina civakbûnê re derketî holê ye. Serdema kapîtalîzmê hêza vegotinek zanistî daye vê fikir û çalekiyê. Her ku çûye xwe gihandiye hêmana sosyalîzma zanistî.

Bêguman weke di hemû pergalên civakî de heyî, şaşî û nebesiyên sosyalîzma zanistî jî hene. Di Şoreşek Fransa ya dema kapîtalîzma wehşî de jî, ji derdorên herî radîqal re komînîst dihat gotin. Dîsa derdorên çepgir ên şoreşên burjuva jî tev derdorên sosyalîst û komînîst bûn. Di ezmûna Komîna Parîsê yên di sala 1848 û 1870’î de jî komînîst bibandor bûn. Di Şoreşa Cotmehê de dibin desthilat. Paşê ev, dibin tevgerên berfireh. Bêguman di vê demê de sosyalîzm hinek din bi zanist dibe. Lê nikare bê gotin ev gotina sosyalîzmê ya dawî ye. Pênaseyên welatên sosyalîzma pêkhatî yên weke; “Em zû gihiştin komînîzmê” nerastin.

Em vê jî niha baştir fêm dikin. Di hemû şoreşên bingehîn de her tevgera ku serkêşe û alîgirê kedê ye, hinekê jî xwedî naveroka sosyalîstiyê ye yan jî xwe ji sosyalîzmê re amade kiriye.

Em ji derketina Spartakûs a ku yek ji raperînên bingehîn ên serdema koledariyê ye destpê bikin, di hemû pêvajoyên şoreşî yên girîng de tevkariyek wan ji dîroka têkoşînê, her wiha têkoşîna sosyalîstî re çêdibe.

Di Şoreşa Îslamê de, têkoşîna di navbera Îslama fermi û Îslama muxalefet de derbas dibe jî xwedî xisletên wisa ye. Dikare ji vê re pevçûna mezhebên Sûnî û Elewiyan jî bê gotin. Mînak, derdora herî radîqal ên parazvanên Hz. Elî jî –hinekê jî li gorî demê- derdorek sosyalîste yan jî çepgirin. Îslama ku pêk hatî, derdora sûnî yan jî Îslama fermiye. Dikare pir rehet wisa li gorî xwe cudabûnek bê kirin.

Ji derdorên rastgir heta derdorên herî radîqal ên çepgir, ev di Şoreşa Cotmehê û di Şoreşa Fransa de jî wisa ye. Dîsa di Şoreşa Cotmehê de rastgir û endamên xeta navîn jî hene. Derdora hizba herî radîqal a Bolşevîkan tê gotin, komînîstin.

Ev derdikeve holê: Bi qasî dîroka mirovahiyê, têkoşîna sosyalîzm û komînîzmê jî rastiyeke.

Lê belê nêzîkbûnên gelek fişal, şaşiyên nirxandinên weke mînak di demek kin de bizava xwe kir bizavek serdest, di asta cîhanî de bû bizavek serkeftî hatin kirin. Hinekê jî bi şêweyên nirxandinên nebiyê dawî, ol’a dawî û gotina dawî derketin holê. Li gorî ku pêşketina civakî jî didome, gotina her qonaxa girîng a rastî li gorî pêşketinên nû tên derbaskirin. Bihêlin weke gotina dawî be, weke gotina kevnar dimîne. Lê ev jî nayê wê watê ku, ti wate û girîngiya gotinên ku hatine kirin nînin. Jixwe Îslamiyetê, li gorî dema xwe şûna lîberalîzma burjuva û sosyalîzmê rê ji pêşketinên girîng re vekiriye. Mîrateyên girîng ji dîrokê re hiştine. Di vê watê de misoger vale neçûye. Pêşketina civakî û azadî hinekê jî xêra van têkoşînan çêbûye. Nexasim têkoşîna sosyalîzmê, di vê mijarê de navê pêşketina herî bingehîne. Hemû pêşketinên xwe dispêrin kedê, hilberînê û afirîneriyê, herî zêde jî di bin ronahiya vê bîrdoziyê de ber bi mirovahiyê ve pêşve çûne.

Em dikarin bêjin ku di roja me de velvele û bûhranek berfireh tê jiyîn. Kapîtalîzm îdîa dike ku pergalek di asta gerdûnî de ye û gelemperî ye. Berê jî ev îdîaya wî hebû. Di encama kêmasiyên sosyalîzma pêkhatî bi xwe de û hilweşîna bi destê wê, firsed dide ku di vê îdîaya xwe de hîn xurtir be. Lê belê weke hatî diyarkirin, berovajî vê îdîayê jî gengaze.

Bûhrana ku her diçe giran dibe, zêdetir pêdiviya sosyalîzmê derdixe holê.

Bê sosyalîzm bûyîn, tê wateya bê hewa mayînê.

Ji bûhrana her demê zêdetir giran bûyî û pirsgirêkên derdikevin holê re çareserî, dîsa wê di sosyalîzma ku raveya xwe di zanista civakî de dibînê bê gerîn. Ne gengaze ku kapîtalîzm ji rûxîna weke çiyan, dîsa pirsgirêkên nayên rakirin re di nava xwe de çareseriyê bibîne.

Wisa bi şoreşên zanist û teknîkê ve, ev pirsgirêk nayên çareserkirin. Şoreşa zanist û teknîkê ya di xizmeta kapîtalîzmê de, bûhrana ku pergal jiyan dike hîn zêdetir kûr dike û ji bilî vê jî ti encamê ava nake.

Çareserî dîsa di rastiya civakî de ye, aliyê wê yê sosyalîst de ye.

Lê sosyalîzmek çawa?

Çi ji hêla teorîk ve, çi jî bi şêweya pêkhatî, pêwîste sosyalîzm bê xurtkirin. Bi qasî pêdivî heye kêmasiyên di dîroka xwe de berçav bigire û derbas bike, ewqas jî divê bûhrana tevlîhev û berfireh a di roja me de tê jiyîn rasteqîn binirxîne û hêza xwe ya çareseriyê ferz bike. Em ji dahûrînên fikrî bigirin, heta nêzîkbûnên bersivên derûnî û dilşadî didin, ji destgirtina binesaziya jorîn a siyasî heta ji nû ve vesazkirina aborî, ku polîtîkayên nû neyên pêşxistin, ji pirsa; "Sosyalîzmek çawa" re bersivek xurt nayê dayîn.

Dema me destpê kirî weke me diyar kir, bi pirsgirêkên bingehîn ên çavkaniya xwe ji kapîtalîzmê digirin ve dixwazin cîhanê bê henase bihêlin, banê wê tê kunkirin. Xeteriya ku mehşerê rave dike, nexweşiyên civakî yên xerc dike, encama mirovên ku wisa dibin morî, ecûc û libên xîzê derdikeve holê.

Ji bo carek din qîmeta mirov jê re bê dayîn, hiş û exlaqê wê bi xwezayê re di nava aşitiyê de be, pêdivî bi nêzîkbûn û perspektîfek sosyalîst ku nakokiya wê ya bi xwezayê re kûr dike heye.

Ev ji her demê zêdetir dikare xurt bê gotin. Weke ku pergala kapîtalîst-emperyalîst, hevsengiya ku mirov bi xwezayê re saz kirî veguhertiye nakokiyek rûxandinê ya pir xeternak, rêxistinbûna civakî jî ber bi pêwendiya tinekirina mirovahiyê ve biriye. Ango ji van herdu nakokiyên cîhanî yên bingehîn re rê vekiriye.

Vaye sosyalîzma heyî dikare bersivê bide van herdu nakokiyên bingehîn û wisa xwe rast pênase bike. Pêwendiyên mirov ên bi xwezayê re –pêwendiya hawirdor jî tê gotin- rast dahûrandin, pirsgirêka ku tevgerîn, nebat, derdor hwd bi şêweyên cuda pir reformîst bilêv dikin, çareseriyek şoreşî ferzkirin şerte.

Dîsa li dijî modela civaka emperyalîzmê ya di rastiyê de dibe ecûc û morî, em ji zêdebûna şêniyan bigirin heta plansaziya hilberîn û ji nû ve vesazkirina binesaziya jorîn tev hewce ne. Ji bo ji nakokiyek wisa berfireh re jî bibe hêza çareserî, em dikarin sosyalîzmê rojane bikin. Lewra pênaseya çîna teng jî têrê nake.

## Çînek Karker a Weke Sedsala 19. Nemaye

Tengaviyek sosyalîzmê ya heyî jî di vir de ye. Bi nirxandinên sedsala 19. ve nêzî pirsgirêkê dibin û dibêjin; “Çîna karkeran a wisa, çîna karkeran a welê.” Ya rastî çînek wisa nemaye yan jî serdema ku kapîtalîzm di wateya teng de bi çîna mêtîngeriyê ve xwe têr dibîne derbas bûye.

Di wateya teng de jî kedxwarî heye, lê hîn zêdetir bi gelemperî bûye, me jî ji vê re got ku, şoreşa zanist û teknîk û bi cîhana çapemenî û weşanê re pêşketinên ku rê jê re vekirine, civak dîl girtiye. Rêbazên dizî û rêbazên zextên wisa pêşketine, mirov nikare bi sedsala 19. re jî muqayese bike.

Lewra bi şîroveyên wê demê ve roja me nirxandin, rastî tevlîhevkirine. Di nîqaşên sosyalîst de hinekê jî ev heye û ev jî tengbûnê rave dike. Nirxandina vê rewşê wê rêbazên şer jî, ango pirsgirêka taktîk jî ronî bike. Di roja me de taktîkên kevin têrê nakin. Çawa ku civak bi temamî bi mêtîngerî û zextê ve di lepên xwe de girtiye, hewce dike şêweyên têkoşînê yên tevahî civakê jî eleqedar dike bên pêşxistin.

Pergala kapîtalîst-emperyalîst ji bo hemû mirovahiyê, hevsengiya xwezayê xirab kiriye. Lewra pêdivî bi perspektîfên ku xîtabî derdorên civakî yên berfireh bike heye. Ango bikare bersivê bide pirsên weke bernameyek sosyalîstiya nû, ramanek saxlem ku ew xwe dispêriyê û taktîkên di çalekiyan de dikevin meriyetê divê çawa bin bide, wê sosyalîzm carek din xwe xurt bike û bide diyarkirin ku ji bo pirsgirêkên pêkhatî jî hêza çareseriyê ye.

Vaye nîqaşek wisa rasteqînî ye. Yên ku ji kûranî bi çarenûsa mirovahiyê ve girêdayî ne, dixwazin ji bingeh ve nêzî pirsgirêkên mirovî bibin, ji ber vê wê bi kûranî û baldarî zêdetir nêzî sosyalîzmê bibin. Wê bi xurtkirin û ji pirsgirêkên nû re bi dîtina bersivan ve nêz bibin. Peywir li pêş me ne. Di nîqaşên mijarê de tengbûn û gotinên kevin ve têrbûnek heye. Pêwîste nîqaş zêdetir bên nûkirin. Lewra pênaseyek nû ya sosyalîzmê –di wateya rojaneyî de-, dikare li ser bername, çalekî û raveya wê ya taktîkî bê rawestîn. Li ser vî bingehî dikare partiyên sosyalîst ên nû bên damezirandin û cureyên çalekiyên girseyî bên pêşxistin. Di şoreşa zanistî û teknîkê de, ji bo bi ramanê sosyalîzmê pirsgirêk bên çareserkirin, dikare têrkar bibe hêza pêkanê. Wê ev nêzîkbûn misoger di pêvajoyek kin de baldariya li hember sosyalîzmê zêde bike, bide diyarkirin ku çavkaniya çareseriya bingehîne û li hember kapîtalîzma ku ketiye pêvajoya xwe ya rizandinek berfireh, bikare pêvajoyek sosyalîstî ya guncav derbixe holê.

Partiya me PKK, di vê mijarê de ji destpêkê ve li dijî encamên neyênî yên sosyalîzma pêkhatî, bi qasî tevgerek xwedî helweste, ewqas jî bandorên wê yên neyênî di nava xwe de nedaye jiyîn, dîtiye ku sosyalîzmek wisa xwedî qusure, lê tevî vê jî tevgerek ku bîr û baweriya xwe ya li hember sosyalîzmê winda nekiriye.

Ev jî serbixwe û bi îdîayek mezin di civaka herî paşketî ya li welatek paşketî “Kurdistan” tê binavkirin de û di mercên wê yên civakî de pêk aniye. Di vir de jî hêzek ku ji encamên girîng re rê vekiriye. Partiyek li ser vî bingehî teşe girtiye.

Di vê manê de ezmûna PKK'ê, di merheleyek tevî ku sosyalîzma pêkhatî di asta cîhanî de xwe gihandî hevsengiya bi kapîtalîstemperyalîzmê re, ji ber xetimandina xwe ya navxweyî hilweşiya û lewra xwestin qîmeta sosyalîzmê bixin de, tevgerek pêşketinê ya herî zêde xwe gihandî çalekiya herî mezin a sosyalîzmê û xeta wê ya bîrdozî ye. Ji ber vê sekna xwe, dişibe tevgerên ku di serdemên paşverû de pir kêm li ser piyan mayî, lê ewqas jî xwedî cihek bi şeref û serfirazin.

Elbet, ji ber pergala fermî ya serdest hukmê xwe zêde dide axaftin û di van mercan de her kes ber bi baskên paşverûtiyê ve dibeze, her tevgera ku dev ji qada şer bernade, di vê mijarê de îdîaya xwe didomîne, tevgerek egîdî ye. Di heman demê de tevgerek xwedî mafê bi navê mirovahî baxivê ye.

Her tevgera azadî ya mezin, bi qasî bikare di asta gerdûnî de serkeftî bersivê bide demên muhafezekarî, ne tenê çareserî ji welatê ku lê dayîk bûye û mercên gelê xwe re ava dike, bi vê re dikare bibe berdevkê xeyalên mirovahiyê jî. Jixwe demekê Xiristiyanî, demekê Îslamiyet, dîsa demekê Şoreşên Fransa û Cotmehê ristek wisa dan xwe û hêjayî rista xwe ya berdevkiyê jî bi qasî biçûk neyê dîtin bersiv dan.

Niha her çendî em destpêkê ne amade jî bin û em xwe weke tevgerek di asta netewî de pênase bikin jî, mercên nav-netewî yên heyî û pêşketinên li herêmê, berdevkiya PKK'ê ber bi astek berdevkiya sosyalîzmê ya gerdûnî û nûnertiya wê ya rast ve dibe. Hema bêje vê neçar dike. Her çendî destpêkê em ne li benda vê bin, ji ber mercên lez guherîn û tevlîhev bûyîn peywirek wisa dabin pêş partiya me, bêguman mirov bi vê serbilind dibe. Lê em neçarin ku peywira li pêş xwe rast têbigihin û nirxandinek baş bikin ku dê tevkariya me çawa be.

Qada Rojhilata Navîn, qadek di dîrokê de gelek bîrdozî, nexasim ol bi navê mirovahiyê derketine holê û çalekiyên pir bi îdîa pêş xistine. Ji ber ku di çêbûna mirovahiyê de dergûştî kiriye, hemû şaristaniyên bingehîn li vê qadê mezin bûne, Rojhilata Navîn rastiya xwe ya civakî di nava pêşketina mirovahiyê de cihê xwe derdixe hole. Tevî ku hêjî

mirovatiya li vir di rewşek pir zehmet de ye, bûhranên emperyalîzmê herî zêde li vir tê jiyîn, di mijara çareseriyê de îdîaya wê ne ketobere.

Weke din bûhran çiqas giran dibe bila be, wê derketinek şoreşgerî dîsa li wan deran rû bide, di gelek mînakên dîrokê de jî diyar dibe. Welatê Rojhilata Navîn a herî paşketî welatê Kurdistanê û dîsa gelê ku herî zêde hatiye jibîrkirin û ji mirovahî hatiye derkirin gelê Kurdistanê –ji ber axên herî kevin ên dîrokê ne, rastiyek ku dergûştiya mirovahiyê kiriye tê ravekirin-, niha cardin hewl dide çavên xwe li jiyanê veke. Dema çavên xwe li jiyanê vedike, mîna gavên mezin ên di pêşketina mirovahî yên destpêkê de, dixwaze vê bi gavek nû pêk bîne. Ev hinekê jî bûye nesîbê PKK'ê û di mezinbûna wê de hatiye ravekirin.

Partiya me di vê manê de bi qasî zanebûna dîrokî, ewqas jî di zanebûna rista ku rastiyên rojaneyî daye sosyalîzmê de ye. Hewl dide berdevkiya wê bike. Di vê mijarê de bi qasî cewhera wê ya enternasyonalîst, ewqas jî cewhera xwe ya netewî bi şêweyek bijare daniye holê. Bi şahadetên pir hêja ve selmandiye ku xwedî sonda xwe ye. Dema miletê xwe ber bi azadiyê ve dibe, di vê mijarê de yeqîn dike ku gavek bingehîn avêtiye. Wê jî bi zanebûn dike.

## PKK Tevgerek Kedê Ye

Jixwe PKK, di hemû pêvajoyên xwe yên dîrokî de tevgerek ku bi komployên paşverû yên nav-netewî re rûbirû hatiye. Yeqîn nakim komployek evqasî di asta nav-netewî de li derdora ti tevgerê bê pêşxistin. Ji ber ew tevgerek sosyalîst a herî xurt û tevgerek rizgariya netewî ye, lewma bû sedema rê ji pêşketinên komploya nav-netewî re veke. Lê belê li ber xwe da û têk neçû. Di her pêngava xwe ya nû de

bi berdevkiya sosyalîzmê re, bi sekna xwe ya hevgirtî ya di nava şer de, netêkçûna xwe diselmîne. Dev ji têkçûna wê berdin, bi gavên hinek din ber bi serkeftinê ve diçe de, tevgera wê ya xurt, di heman demê de weke xisleta bingeha van tevan, diselmîne ku tevgerek sosyalîste.

Bêguman pêwîste zanebûna dîrokî, zanebûna serdemê hîn zêdetir xwe bigihîne raveyek zanistî. Dîsa pêwîste ji bo çareseriya pirsgirêkan bi kûranî bersivên nû bibîne. Hewce dike li ser bingehên nû pênaseyên partiya kedê, demokrasiya sosyalîst û çalekiyên dewlet-milet pêş bixe. Di şênberiya pratîka me de jî tevgerek gel a berfireh bi taktîkên cur be cur derketiye holê.

Partiya me rêya rizgarî ji bo azadbûna hemû civakê, nexasim ne tenê ji hejaran re, ji derdorên civakî yên din re jî vedike. Li hember kedxwariya mêtîngerî, kolekirina jinê û dîsa zextên ku cewaziya mezheban û nakokiyên millî rê jê re vekirine, dikare ku nêzîkbûnên azadkirinê û çareseriyên berfireh pêş bixe. Tevî zehmetî û nebesiyên wê, pêşketina xwe didomîne û li ser bingeha rêzdariya beramber kedê ya esas digire bûna partiya xwediyên kedê ye. Hêjayî eslê mirov kesayeta herî leheng û fedekar, mijara şêwaza jiyanê, di berfirehiya ku ti partiyê de nehatiye destgirtin, bersivên wê ewqasî hatine pêşxistin.

Mirovatiya ku rastiyek PKK'ê dijî, tê wateya mirovatiya rizgarbûyî.

Me hêj ev di radeya herî biçûk de pêş xistiye. Ger em bikarin vê ji bo gelê xwe tam bigihînin serkeftinê, em pir baş dizanin ku, ev bi navê mirovatiyê destkeftiyek mezine. Jixwe me zanî ku rizgariya di kes de pêk tê, veguherînin rizgariya bi gel re pêk tê.

Em ji her demê zêdetir pê ve girêdayîne ku, mebesta rizgariya bi miletekî re pêk tê, veguherînin rizgariya di mirovahiyê de pêk tê. Baweriya me bi mirovahiyê heye, em dizanin ku jiyana hêjayî mirov heye.

Ji ber em pir kûr bi vê ve girêdayî ne, bi şêweyek ti partiyê de neyê dîtin jiyana xwe fedayî mirovahiyê dikin.

Tevgerek evqasî civakbûnê dijî, ji bo vê fedekarî û wêrektiyê pêş dixe, bivê-nevê, tevgera herî sosyalîst a cewherî ye. Jixwe serbilindiya vê bûye para PKK'ê. Ji ber vê xisleta bingehîn a partiya me, bêguman em ê weke reşka çavê xwe biparêzin. Hemû şahadet li ser vî bingehîne û ji bo vê ne. Berxwedêrî û fedekariyên herî mezin, hemû ji ber xêra vê cewhera saxlem derketin holê û em mezin bûn. Li gorî mezinbûna me jî bi parastin û xurtkirina vê cewherê ve pêk tê, em yeqîn dikin ku di vê mijarê de jî peywirdarin. Em zanebûna vê kûr dijîn. Dîsa biryardarî û pêkana vê jî di asta herî jor de ye.

Nêzîkbûna ku em jê re dibêjin tempoya xebatê û şêwaza lêdanê pir pêş ketiye. Bi dahûrîna Rêbertiyê re, ji banga; "Bi xwe re gel pêk bîne, bi xwe re mirovatiya nû pêk bîne, ji bo vê jî xwe bike rastiya mirovahiyê û ji bo vê jî çi hewce dike bike" re bersivek biçûk neyê dîtin hatiye dayîn.

Ev rastiyên ku ji aliyê pir kêm hêza partiyê ve tên fêmkirin, ji vir û şûn de bi tevkariyek hîn zêdetir ve wê pêl bi pêl di nava gelê me, gelê herêmê û mirovatiyê de diyar bibe. Bi bilindbûna rastiya sosyalîzmê ve girêdan, nêzîkbûnek zanistî jê re kirin, dibe rastiya me ya herî bingehîn.

Tevgera me ya sosyalîst ku li ser vî bingehî derketiye holê û di roja me de veguheriye partiya herî pêşketî, bêguman dê ji vir û şûn de jî xurt, biryardar û bi şêweyek serkeftî ber bi armancên xwe ve bimeşe. Ji ber vê em dibêjin; bersiva roja ked, yekîtî, pişgirî û têkoşînê ji 1'ê Gulanê re erênî hatiye dayin. Me girêdana xwe ya bi kedkarên cîhanê tevê re domandiye, baweriya xwe ya li hember dîrok û rojaneya wê raber kiriye. Em dibêjin ku; me pêşeroja xwe jî li ser vî bingehî bi şêweyek herî baş bi biryar kiriye.  Bijî roja yekîtî, pişgirî û têkoşîna hemû kedkaran 1'ê Gulanê!

1 Gulan 1993

## Em Derbasî Qonaxên Şoreşên Nû Dibin

Emerîka hêjî împaratorê stratejîk ê nav-netewî ye. Di nava vê împaratoriya ku wisa di nava stratejiya nav-netewî de Tirkiye yan jî rêveberiya Tirkiye jî cihek girîng digire. Di mijara Balkanan, Kafkasya û Rojhilata Navîn de, wê bi rêveberiya Tirk re hinek pêwendiyên di asta stratejîk de çêbin. Heta dê ev eleqe hîn zêdetir be. Zêdebûna vê eleqeyê, nayê wateya ku bê wê nabe û wê pir mayînde be. Berovajî zêdebûna eleqeyê bi xisleta xwe ya guman ve têkildare. Devjêbernade, lê bi zanebûna ku dibe her kêliyê ji dest biçe li pey alternatîfane. Weke gelek caran hatiye gotin, nexasim ji aliyê serokwezîrê Komara Tirk ve tê gotin; “Pir pişgiriya me dikin. Yekem care evqas eleqeyek navnetewî li hember me pêş dikeve. Girîngiya me ya stratejîk hatiye fêmkirin.” Belê, hatiye fêmkirin, lê dizanin ku wê tu jî bî derbaskirin. Êdî dizanin ku kar bi sîxuran nayê îdarekirin, lewma tevdîran pêş dixin.

Hinekê jî feraseta DYE wisa ye. Di nava stratejiya wî de, dibêje; “Emê beriya hilweşîn û tasfiyebûna Komara Tirk bîst û çar demjimêr, yek demjimêrekî jî jidil nêz bibin.” Bes ji aliyek din ve jî bi gelek pirsan kevtûlefta “ez dikarim çi bikim” de wê tevbigere û ji xwe wisa ye jî. Dema PKK’ê terorîstê yekem îlan dike, ji aliyek din ve jî yekser an jî neyekser pêwendiyên bi wî re dihizire. Hevkarên xwe seferber dike, wan jî di asta jor de vedixwîne. Gelek sîxurên mezin û biçûk dixe meriyetê. Ji bo di nava me de baskek nerm bide avakirin, qaşo şewqa kesk pê dixe. Heyranê baskê nerme. Bi israr li pey vê ye.

Heta dema herî zêde dibêje, “PKK’ya terorîst” jî heman weke li ber bigere helwesta “PKK’yek nerim ava bike” raber dike. Ev jî dide diyarkirin ku çiqas tengav bûye û çiqasî nêz dibe me weke hêzek siyasî binase. Di bingeha vê nêzîkbûnê de hêza me ya şerker jî di navê de wê PKK’ê binase û pir rehetî dikarim bêjim ku wê dev ji gera pêwendiyên pê re bernede.

Di stratejiya DYE de, fikra ku dê li hember bilindbûnek wisa şoreşî bê eleqe bimîne, wê tenê bi şêweyên “terorîste” hewl bide

şoreşê bixeniqîne û bersivê bide kêmasiyek mezine. Wê hewl bide bikeve nava şoreşê jî. Hîn ji niha ve diyar dike ku baskê nerm esas digire. Ger vê ser nexe, vê care jî dê bikeve navê û wisa hewl bide baskê nerm ava bike. Piştî serkeftinê deh salan jî, pêncî salan jî bijî, dê vê helwesta xwe bidomîne. Ti fikarên me ji vê nîne. Lê ji ber fikara me nîne, em nikarin rewşê ji nedîtî ve bên.

Emê baş bibînin ku stratejî, pêwendî û armanca wî çiye. Emê li ser vî bingehî ji wî netirsin û ji pêwendî pêşxistinê jî netirsin. Lê belê emê fikaran ji meyil, niyaz û nirxên mêtîngeriya emperyalîst bikin. Emê wî baş binasin û vê polîtîkaya wî niha jî, piştî pêncî sal din jî be her tim bibînin û li dijî derbikevin. Heta emê wî bikişînin nav pêwendiyê. Ew hinek din fêmkirin û ji bo ji polîtîkaya ku bi salan bê şeref meşandiye hesab bipirsin emê pêwendî pêş bixin û bi ser de biçin.

Hêza împaratoriya demê ya herî mezin DYE paşçavkirin, tê wateya ew ji her alî ve nenirxandinê. Qet nabê bê înkarkirin. Emê vê di kêliya ku pêwendî pê re bê pêşxistin de jî bibînin, dema bê pêwendî jî bibînin. Di dema bê pêwendî de jî têkoşîn meşandin, dema em bêjin me pêwendiyên herî baş pêşxistin de jî têkoşîn meşandin pir girînge. Jixwe ger emperyalîzm her kêlî xwe nû dike û pêşve dibe, pêwîste şoreşa me jî xwe nû bike û di her demê de mezinbûnek ku bikare şerek mayîndebûnê esas bigire û domdariya serkeftinên xwe misoger bike.

Pir vekiriye emperyalîzm heye, emperyalîzm nehatiye rakirin. Demekê di nava çepên Tirk de ev gotin pir dihat kirin, lê niha hema bêje êdî navê emperyalîzmê qet derbas nabe yan jî nayê bihîstin. Ferasetek emperyalîzmê ya pir seqet, niha jî veguheriye ferasetek “emperyalîzm tine ye.”

Emperyalîzm heye û hem jî bi qasî hîn zêdetir li hundur hukum bike, yan jî bikeve nava dil û mejiyê mirov zirav bûye û di şêwazek hûrûkûr de heye. Dibe ku ne dema leşkertiya çors, zexta siyasî ya çors û dîsa mêtîngeriya aborî ya çors de be, lê ji wan jî zêdetir di wateya mirov bê çand bike, mirov bê hest bihêle, xerîzeyên mirov har bike û mirov ber bi heywanbûnê ve bibe de pêşketinek emperyalîzmê heye.

Divê em ji vê hêlê ve pêşketina emperyalîzmê bibînin. Li ser xwezaya mirov, derdora mirov, ruhê mirov û nexasim dîroka mirov êrîşek mezin dike. Qirêjiya hawirdor a salên dawî ku tê binavkirin wêrankirina xwezayê, xweza aniye rewşa ku neyê jiyîn, ev jî bêrehmiya êrîşên emperyalîzmê ye.

Dîsa êrîşî dîrok û nirxên dîrokî dike. Qaşo bi şêweya jiyana emperyalîzma Emerîkî ve hemû nirxên exlaqî, nirxên dîrokî yên bi rastî jî her tiştê mirovahiyê ne di bin navê "bêdîrokî yan jî dawiya dîrokê hatiye" de, hewl dide bide jibîrkirin.

Gelo ya dawiya wê tê dîroke?

Ya ku dawiya wê tê û tine dibe gelo emperyalîzma bê dîroke?

An jî mirovahî ye?

Pêwîste ev baş bê dîtin. Ruh û wijdan tarî dike. Emperyalîzm tenê li ser feydeyê nayê sazkirin. Di wateya çors de mêtîngerî heye, lê hewl dide ruhê mirov ê ku heta niha nehatiye eşkerekirin, ji nû ve eşkere bike û pêşkêşî sûkê bike. Jinê baş pêşkêşî sûkê dike û hestên mirovan pêşkêş dike. Bi şêweyên mûzîkê yên ava kirî ve, hestan pêşkêş dike, di bin navê şêweyên jiyana nû de xerîzeyan pêşkêş dike, bazirganiya xerîzeyan dike û herî zêde jî ev di dema emperyalîzmê de derketine holê.

Di bin navê cîhanê û gelemperî de rastiya gelan a netewî, rastiya gelan a çandî, ruhê gelan tinekirin, li hember van nirxan şer dana destpêkirin heye. Ji aliyek din ve jî bi çend qevdên nav-netewî re, yekdestdarên nav-netewî re ji sazûmaniya kozmopolît re derfetek bêsînor avakirin, herî zêde jî emperyalîzm da jiyîn an jî êrîş evqasî pêş ketin.

Tê dîtin ku, emperyalîzm paş neketiye yan jî tine nebûye, berovajî pêşketinekê dijî. Dîsa ne rewşek bê emperyalîzmê, kûrbûna emperyalîzmê, emperyalîzma ku dikeve hundur û qada xwe berfirehkirinê heye.

Elbet çawa ku her pêşketin di xeta xwe de amajeya hilweşandinekê dide, di vê manê de mirov dikare bihizire emperyalîzm jî ditefe û tine dibe. Lewra li şûna emperyalîstbûnê, bê emperyalîstî destpê dike. Divê ev jî weke pêşketina meylek dijber bê

dîtin. Ji hêlekê ve emperyalîzm dikeve nava pêvajoya lewazbûnê, nexasim serbixwebûna zêde ya welatan, yekitiya jiyana gelan a bi berê ve nayê muqayesekirin, raveya pêşketina emperyalîzmê ye.

Nexasim pêvajoyên şerên rizgariya netewî, dîsa demên ku ked pir çors hatin mêtîn, piranî di sedsala 19. de rû dane. Yên din jî di sedsala 20. de rû dane. Di herdu qonaxên mezin de şêweyên mêtîngerî û zexta siyasî ya emperyalîzmê hatiye paşvexistin. Yeqîn dikim, sedsala 21. dê bibe sedsala derbaskirina wêrankariya ku emperyalîzmê di serê mirov de, ruhê mirov û di çanda mirov de daye avakirin be. Nexasim xweza cardin anîna rewşa ku bê jiyîn, çareserkirina pirsgirêka şêniyên ku divê ew jî tevlî bibin, rawestandina bêdîrokî yan jî tinekirina nirxên dîrokî, rawestandina xeniqandina ruhê mirov, astengkirina metabûna jinê yan jî metabûna cînseltî û mêtîngeriya li ser rawestandin, jin têkil xizmetên mirovî kirin, mirov cardin bi çand, dîrok û xwezaya wî re lihevanîn, peywirên ku di vê sedsalê de bikevin meriyetê ne. Dîsa di azadkirina jinê de pêşketinek pêşveçûyî avakirin, jiyîn, weke armancên herî girîng ên şoreşên sedsala 21., em dikarin bi rehetî bêjin hîn ji niha ve xwe ferz dike.

Di vê manê de serdema şoreşan bi dawî nabe. Berovajî em dikevin pêvajoyên şoreşên hîn ziravtir û kûranî.

An jî em pêvajoya çîna çors û têkoşîna netewî ya şoreşan li paş xwe dihêlin, dikevin nav pêvajoya şoreşên civakî yên kûr, şoreşên çandî, şoreşên ruhî û şoreşên dilxweşiyê dijîn. Ev jî herî kêm bi qasî şoreşên leşkerî, siyasî û aborî hêja ne.

Ger şoreşa mirov a ruhî nebe, şoreşa civakî ya mirov nebe, şoreşa xwezayî ya mirov nebe, em çawa dikarin behsa şoreşek an jî jiyanek bi tenduristî bikin?

Lewra li hember êrîşên emperyalîzmê yên kûr û zirav bûyîn, pêdivî bi şoreşên kûr, biruh, dilxweş, exlaqî, bidîrok û çandî heye. Em pêvajoyên şoreşên ku dikarin bêjin, em serdema vê dijîn mijara gotinê ye.

Bêguman dê emperyalîzm jî weke berê bi hêza êrîşên çors ve bi ser şoreşên gelan û binyatên civakî yên mirov de neyê. Wê bi şêweyên

rêbazên cuda êrîş bike û dike jî. Xwe dispêre teknîk û daneyên zanistî û wisa jî rêbazek derûnî ya mezin li ser cîhanê ferz dike. Li cîhanê rêveberiya zanistî saz dike, rêveberiya teknîk saz dike, bi pêşketina teknîk re dîlgirtina mirov esas digire. Dê êdî atomê bikar neyîne. Ji ber ku bikar bîne, dê ev cîhan ji bo wî jî bikeve rewşek ku êdî neyê jiyîn.

Dîsa hewce nake zêde cîh dagir bike. Ji ber cihek ku nehatî dagirkirin nemaye. Dagirkeriyek cuda pêşxistin, teknîkek cuda ya bikaranîna çekê, bi vê sedemê ji hêla emperyalîzmê ve neçariye. Jixwe hedef di meriyetê de ne. Vaye şerê derûnî. Di vê manê de ev rêbaz pir kûranî tên bikaranîn û dê bên bikaranîn jî.

Şer hîn zêdetir derbasî aliyê mejî û ruh dikin. Girêdana mejî û girêdana ruh a nû hatiye pêşxistin, dê hewl bidin hîn zêdetir jî pêş bixin. Lewra dê şoreşa mejî, şoreşa ruh û rêbazên wê jî bikevin meriyetê.

Ev jî şoreşa jêhatiya fikirandina serbixwe, ruhê xwe nefirotin û parastina nirxên mirovî yên bingehîne. Em dikarin ji vê re bêjin şoreşa muhafezekarî jî.

Ji ber ku dema xwestin mirovahî tine bikin, wê tu biparêzî. Dema xweza hat wêrankirin, wê tu bi teknîkên guncav ve şerê pêşîlêgirtinê bimeşînî. Emê li dijî tasfiyebûna komên civakî û netewan ên bêwext, xirabûna ziman û çandê rawestin. Mirov xistina nava bêhntengî û ragêşiyek mezin, hema weke nexweşiyek nû ye. Heta bêhntengî dibe dayîka hemû nexweşiyan. Di encama xirabûna cînseltî de nexweşiyên weke AIDS pêş dikevin.

Li hember van tevan dê xisletek te ya rizgarkirina mirov hebe.

Bêhntengî diyardeyek emperyalîzmê ye.

Ev nexweşiyên nû diyardeyên emperyalîzmê ne. Bi wan re têkoşan, têkoşîna dij-emperyalîzmê ye. Wê tu şêweya vê bibînî. Jixwe ji bo AIDS dibêjin webaya serdemê ye. Ev jî çavkaniya xwe ji rêderketina cînseltî digire. Emê bi feraseta rast a cînseltî ve pêşî li vê bigirin. Jixwe zanyarên emperyalîzmê jî vê dibêjin.

Nexwe şoreş jî çareya vê ya yekane ye. Hejmarek zêde nexweşiyên ku çavkaniya xwe ji xwezaya pêşketina emperyalîzmê

digirin hene. Bûyera bêhntengî em behsê dikin, nexweşiyek girane. Ev ancex bi statû yan jî vesazbûnek civakî ya nû ve, ango bi şoreşê dikare bê derbaskirin. Emê jî teknîka vê ya nû bibînin.

Ji bo sosyalîzmê demek nû ya teorîk vedibe.

Em nikarin bi nirxandinên sedsala 19. ve tevkariyê ji teoriya sosyalîst re bikin. Bi gotinek din jiberkirina nirxandin û teoriyên sosyalîzma sedsala 19. re, dîsa bi nirxandinên serdema 20. ên emperyalîzm û şoreşên rizgariya netewî re, teoriya sosyalîzmê nikarin dewlemend bikin. Elbet jiberkirina van re jî em nikarin bêjin sosyalîstên başin. Em tenê dikarin sosyalîzmê bi derbasbûna sedsala 21. re yan jî di derbarê pêvajoya em navê re derbas dibin de pirsgirêkên heyî baş danin holê. Bi dîtina hinek din pêşketinên ku kûr bûne re xwe têr nebînin, bi vê re li dijî van pirsgirêkan rawestin û bi teoriya ku rêbazên hêza çareseriyê pêş dixe re ancex dikarin tevkariyekê bikin.

Belê, pêdivî bi teoriya vê demê heye. Lê divê em ya kevin jî bi temamî înkar nekin. Dîsa bêku ferasetên partiyên kevin, ferasetên şerên kevin bên înkarkirin, li gorî demê dewlemendkirina ferasetên partiyê û taktîkên têkoşîna wê, divê weke tevkariya ji sosyalîzmê re bê hizirîn. Weke tevkariya ji taktîkên şerê sosyalîzmê re jî, mirov dikare behsa pêşxistina taktîkên nû bike.

Ev hemû jî didin diyarkirin ku, di rêya teorî û pratîkê de li ser bingeha têkoşînê ne dawîbûna serdema sosyalîzmê û têkçûna sosyalîzmê ye, berovajî nûbûna wê, misoger pêşxistina teoriyên û ya herî girîng jî bi pratîkên nû re jîndarbûna wê, di wateya pir afirîner û pir nûjentiyê de, hêz ji vê re avakirine. Di vê manê de li dijî emperyalîzmê û nûnerên wê yên sereke bi qasî têkoşînê, ewqas jî nûnertiya sosyalîzmê derbasî qonaxek nû dibe.

Hilweşandina sosyalîzma pêkhatî ya li Sovyetê, ne di wateya tinebûna her tiştî de ye. Dê destkeftiyên sosyalîzma li wir bi şêweyên cuda ji bo xwe rê veke. Dîsa li nav gelek welat û gelên cîhanê yên biçûk û mezin, derdixin holê ku destkeftiyên netewî û civakî dê vê demê ava bikin, jixwe raveya zanistî ya cewhera afirîneriya

sosyalîzmê vê neçar dike û derdixe holê ku sosyalîzm jî eve. Jixwe em di ezmûnên xwe de jî pir balkêş dibînin ev gengaze.

Bêguman welatê ku me kiriye hedefa xwe di vê çarçovê de nirxandin nezehmete.

Dema DYE wisa rola hunerkarê sereke û împaratoriya sereke dilîze, Almanya jî vale nasekine. Ew her tim weke di sedsala 19. de bûye, di sedsala 20. de jî li hember emperyalîstbûnê baldar nêz bûye û du şerên cîhanê yên mezin û gelek şerên biçûk û mezin li serê mirovahiyê kiriye bela. Bi qasî gelek pêşketinên faşîst, heta qirkirina gelan, bûye bela. Ne tenê di qira Cihûyan de, di qira Ermeniyan de jî li pey Îttîhat û Terakkî, gelo mirov dikare pişgiriya Almanan nebîne? Em dev ji vê berdin, di roja me de di qirkirina li Kurdistanê de jî mane gengaze ku piştgiriya Almanan neyê dîtin? Bi rastî hem di qirkirinên nava xwe, hem jî yên derve de, divê para emperyalîzma Alman pir baş bê dîtin û şîroveya wê rast dana rûniştandin pir girînge.

Yek jî Japonya xwe kom kir û nû li cîhanê belav dibe. Dema belav jî dibe ji bo vê rejîma faşîst xwedî bike ji bo ji Emerîka û Almanya paşde nemîne çawa hewldanê dike? Pêwîste pir baş bê dîtin di bin navê ji aliyê aborî ve bi xwe ve bide girêdan, çawa xwe berdide nava Rojhilata Navîn. Dereng şiyar dibe, lê belê wê pir xirab bi encam bike.

Ya herî girîng jî xirabûna li Rusya rast nirxandine. Gelo Rusya emperyalîste? Bi hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re, gelo ya ku li Rusya pêş bikeve emperyalîzme, yan jî pêşketina sosyalîstek nû ye? Pêwîste xisleta polîtîkaya Rus a bi nakok baş bê nirxandin. Hilweşîna sosyalîzma pêkhatî bi temamî netinebûne, lewra ji aliyekê ve hêzên sosyalîst hebûna xwe pêş dixin, ji aliyê din ve jî pevçûnek di navbera hêzên netewperest an jî meyldarên kapîtalîst de mijara gotinê ye. Nakokiyên van, nexasim pêşxistina pêwendiyên bi welatên emperyalîst re dide pêş. Dîsa pêwîste di nava Balkanan, Kafkasya û Rojhilata Navîn de diyarbûna van baş bê lêkolînkirin.

Di nêvenga van pevçûnên emperyalîst de wê şoreşa Kurdistanê çawa derfeta derketinê bibîne, ji van pevçûnan çawa sûd werbigire divê baş bê zanîn. Di vê manê de hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, li welatên emperyalîst ên mijara gotinê nakokî lezkirine. Divê rewş

teqez ji pêşketinên dema statîkoya kevin baştir destdayî û nêzî hilweşînê baş bên nirxandin. Dîsa ya girîng pêwîste baş bê dîtin ku dema ew bêpergaliya DYE di bin navê “sazûmaniya nû” de pêş xistiye û gengeşe, hîn zêdetir sîûda rêya şoreşê vedike.

Weke din li herêma me welatên Rojhilata Navîn hinek pêşketin hene. Pevçûna Ereb-Îsraîlî ya ku weke dijminên ezel û ebed dixwiyên, ber bi rewşek lihevkirinê ve diçe. Lê divê mirov bêje ku dê ev jî serdemek tam aştiyane û lihevkirinê saz neke. Îsraîlî yan jî şêweya vê ya siyonîst wisa hêsan tenê bi Îsraîlekê ve sînordar namîne. Siyonîzm di cîhanê de hêza herî bibandor û beralîkirinê ye. Bi Fîlîstin û welatên Ereban ve têr nabe. Wê her tim qada xwe ya bandorkirinê zêde bike. Jixwe em dizanin li ser Tirkiyê çiqasî bi bandore, di nava rêveberiya Tirkiyê de çiqas giraniya xwe heye û çiqas begê wî ye. Em dizanin ku dixwaze vê li tevahî Komara Tirkiyê berfireh bike û berfireh jî kiriye. Dîsa em baş dizanin ku çiqas hêzên rêveberiya Ereban jî xwe dispêrin wî. Lewra nakokiyên heyî negengaze di carekê de lihev bikin, heta divê bê dîtin dê ev xisleta binakok hîn zêdetir kûr bibe û bidome. Lê belê derdikeve holê ku, lihevkirinek jî hewce dike, ji ber di hevsengiya hêza heyî û di rastiya Ereb û Îsraîlê de rêveberiyên heyî, rêxistinên heyî û şêweya têkoşîna wan êdî têrê nake. Derdikeve holê ku êdî ev bêwate ne. Ne Ereb weke kirine rojeva xwe dikarin ji kokê ve Îsraîl tine bikin, ne jî êdî Îsraîl dikare çok li hemû Ereban bişkîne. Lewra negengaze ji bo herdu aliyan jî behsa serkeftinekê bê kirin. Vaye ev jî ji pêvajoya em dibêjin a lihevkirinê re zemînekê ava dike. Encam jî, hevdîtinên aştiyê ne. Ne mercên ku Îsraîl tam ferz dike dibe, ne jî mercên ku Ereb tam ferz dikin dikare pêk were. Wê di xetek navîn de lihev bikin. Niha jî hevdîtinên vê yên du kesî û pir kesî dikin. Weke ku dê di wateya tinekirinê de serî li ti şerên dijwar nedin, dê aşitiyek wisa mayînde, demdirêj û stratejîk jî pêş nekeve.

Ev hîn zêdetir lihevkirinek bêbiryar a dema bêbiryariyê ye. Dibe ku ev rewş her kêlî xirab jî bibe. Wê lihevkirin pêş bikeve, lê belê wê di nava xwe de gelek tovên pevçûnan jî bihewîne. Jixwe em roj bi roj dibînin ku çawa tê pêkan û çawa tê xirabkirin.

Divê mirov ji aliyê Rojhilat ve rewşa Îranê jî bi serve bike. Îran ji berê ve bi hêzên çi ji Nîvgirava Ereban, çi Anadolî, çi Kafkas û çi jî Asya Navîn hatin re bi pevçûnê re rûbirû maye. Pevçûna Îran û Iraqê jî berdewamiya vê ya di asta dîrokî de ye. Nakokiyên wê yên bi Tirkiyê re jî, dîsa li ser bingeha dîrokî ye. Raveya vê ya mezhebî ewqasî negirînge. Şerek siyasî ye û temamî girêdayî nakokiyên di navbera wan de ye. Wisa hêsan bi Tirkiyê re lihev nake. Nexasim dostaniyek wisa bibawer qet saz nake. Dîsa di roja me de nexasim bi rejîma Iraqê re, bi gelemperî jî cîhana Ereban re nikare dostaniyek mayînde pêk bîne. Di navbera wan de nakokiyên mezin hene. Lewra berendamê herî mezin ê hêzên nakokiyên herêma me ye. Weke bi rêveberiya heyî re diyar dibe, di rêveberiya berê ya Şah de jî ev wisa bû. Dibe ku siberojê ev hîn dijwartir be. Lê belê ji ber pirsgirêkên xwe zêde nikare şer kûr pêş bixe. Bes zêde nikare lihevkirinekê jî bijî. Divê ev jî bê dîtin.

### Bi Kapîtalîzmê Re Têkoşînek Demdirêj Hewce Dike

Pêşketina mirov ji nêz ve girêdana xwe bi hêza şêweyê ve heye. Li ser pêşketina mirov bandora şêwe yan jî bi gotinek din fikir û vîn, rewşa ruhî nebe, jiyana pratîkî jî pêş nakeve. Dema mirov dibe mijara gotinê, pêşî pêdivî bi şêweyek wisa ya pêşketina fikir heye. Heywan çima heywane? Ya rastî bi wan re jî di asta meyl de hinek tişt hene ku, dimeşin, nexwe heywan weke kevir nagindirin. Lê dema mirov, dest bi civakbûnê kir misoger aliyê wê yê fikir, ku giraniya xwe dida der bûyera hebûnê bû.

Ji bo vê van dibêjim: Asta we ya pratîkî ji fikir qut bûye û pir xetere. Ji ber ku di asta bûnewerên hov de xeteriyekê bi xwe re

dihewîne. Li hember pirsgirêkên giran ên xwezayî, mirov bi fikir bersiv dide û hebûna xwe jî wisa berdewam dike. Pirsgirêkên civakî yên di nava xwe de jî, dîsa bi hêza fikir çareser dike. Kurtasî fikir, şêwe û xeyal nebe, jiyan jî nabe.

Hema bêje we fikirandin jibîr kiriye yan jî tiştên hûn weke fikir di hişê xwe de digirin ji jiyanê qutin. Ger em hîn şênbertir bêjin, jiyanek me ya şoreşgerî heye û fikra we ji wê qute. Weke nekariye bersivek hêjayî ji pirsa ji bo çalekiyek şoreşgerî fikrek çawa û çiqas bidin û hêjî nadin. Ji bo we şiyar bikim dibêjim ku ev şaşiyek çiqas xeternake.

Nexwe ji bo hebûna civakî şertê sereke pêdiviya fikrek wisa ye. Emê niha li vir berfirehî dîroka fikrê mirovahiyê venekin. Pirsgirêkek me ya lêkolînkirina pêşketina fikrê mirovahî ya di tevahiya dîrokê de jî nîne. Ev mijarek akademîke, zêde hewce nake em li vir bigirin dest. Yên dixwazin dikarin dîrokê lêkolîn û lêgerîn bikin. Jixwe dîroka fikir weke waneyek mezin li hemû zanîngehên akademîk didin xwendin.

Hinek qonaxên esasî yên dîroka fikir hene. Niha em dikarin kurtasî derbasî vê bibin. Di destpêkê de bi mirov re astek fikir a pir paşketî û heta şêweyek fikir ya paşketî, hoveber hebû. Ew jî zêdetir biderketina efsûn, sihir û ol'an re xwe dide der. Çi efsûn û sêhr, çi jî bizavên ol'î ya rastî şêweya destpêkê ya fikrin. Ol jî fikreke, lê pir paş dîsîplîna ku em weke zanistî binav dikin dimîne rewşekê rave dike. Lê belê hêjî ol hebûna xwe didomîne û dê bidomîne jî. Efsûn û sêhr jî heye. Sedema vê eve: Ev bi hebûna mirov ve girêdayî ne.

Ma mirovek dikare bi temamî zanistî be?

Gelo dikare hemû tevgera xwe li ser bingeha zanistî pêşve bibe?

Belê ev hemû di heman demê de pirsgirêkên felsefîkin. Di vê mijarê de îdîa heye û di astek zanistî de jî pêş dikeve. Lê wer diyar dibe ku negengaze xeyal, dogma û ol jî ji holê rabin. Ev jî di xwezaya mirov de veşartiye. Xwezaya mirov bi qasî hewce dike misoger neçare cîh bide xeyal, dogma, mijarên weke nirxên pîroz tên binavkirin, heta exlaq û dilxweşiyê. Nexasim rewşa em weke dilxweşî binav dikin pêk neyê, negengaze ku mirovahî bi tenduristî pêş bikeve û jiyîna wê jî dê bi pirsgirêk be.

Xetimandina di bîrdoziya sosyalîzmê de, çavkaniya xwe ji dilxweşiyê digire.

Ji ber pirsgirêka ol û dilxweşiyê rast negirt dest, bû sedema herî bingehîn a hilweşîna sosyalîzma pêkhatî. Ango her çendî zanistî û fikrê zanistî hewce dike, hêjî vê weke materyalîzma çors gotina; "Her tişt li gorî reçeteyê pêş dikeve" kirin, tê wateya nenaskirina mirov. Di sosyalîzma pêkhatî de hinekê materyalîzma çors hat pêkanîn. Encama ku derketî holê jî, hilweşînek pir xirab bû. Bêguman gelek dersên ku ji vê bên derxistin hene.

Civaka mirov çima wisa ye?

Jixwe diyalektîk vê mijarê hinek din ronî dike. Qanûnên bingehîn ên diyalektîkê hene. Ger ev bi materyalîzma çors ve ji rê neyên derxistin, ango em bikarin rewşa sosyalîzma ku heta roja îro me nas kiriye derbas bikin, wê hêza me ya xwe fêmkirinê zêdetir be. Dema em zanistiyê wisa bi tenê digirin dest, herî kêm bi qasî dogmayên ol'î xeteriyê rave dike.

Zanistiyek hişk a weke determînîzm (qederperest) an jî materyalîzma çors jî tê gotin, zêde ne li gorî çêbûna mirove.

Niha em naxwazin li vir derbasî felsefeyê bibin. Ango ruh pêşiye, yan jî heyber? Em li vir pirsên felsefîk ên weke hiş heyber diyar dike, yan jî heyber hiş diyar dike, lêkolîn nakin. Zanist çiqas pêş ketibe, hêjî ji van re çareseriyek peyda nekiriye. Pêşketinên herî dawî yên daneyên fîzîk, biyolojî û heta derûniyê, didin diyarkirin ku ev pirsgirêk qet ne hêsanin.

Tê nîqaşkirin gelo misqalên heyberî xwedî hebûnek hestiyarin an na. Heta piştî vê xalê veguhertina heyber û enerjî, dîsa têkilhevbûna ruh û heyberî ji holê tê rakirin. Kîjan beriya kîjanê tê? Ger em hinek din kûr bikin, ji fîzîk jî wêdetir –jixwe ji vê re metafîzîk tê gotin- an jî ji ruh wêdetir –ji vê re jî dibêjin xweda-, rewşên ku heta dawî jî hişê mirov ranakine. Ango bi mirov re îzafiyetek, ya rastî sînordariyek zêde heye. Her çendî xwe dixe dewsa xweda, dikare bê gotin dê mirov nekare wisa be, ger bibe jî wê dîsa jî nekare xwe ji pêkanîna qanûnên diyalektîkî rizgar bike. Bandora heyberî ya pêşketina fikir girînge û ev jiyanê diyar dike.

Ancex pir heyberparêzî jî, pir ruhparêzî jî, rewşên ku mirov nikare ji nav derbikeve ava dikin.

Îro di serdema me de pirsgirêka herî bingehîn eve. Ev li ber çavan, pirsgirêka mirovê destpêkê ya derketî hole bû. Lê di heman demê de pirsgirêka mirovê niha ye. Bi mirovên destpêkê re têgeh, hêz, fikir û perestiyek awarte heye. Ev hinekê hat dahûrandin, lê niha cureyên xeteriyên ku li yê berê neyê gerîn hene û ji wan re jî çareseriyên zanistî tê gerîn. Di navbera wan de cewaziyek pir kêm heye, dibe ku pirsgirêkên niha ji pirsgirêkên mirovahî yên çend deh hezar sal berê girantirin. Ya rastî mirov dikare li vir mirov baştir bigire dest. Heta em dikarin bi aliyê wî yê fikrî re heyber û xwezayê jî têkilhev bigrin dest. Lê ev mijara me derbas dike. Niha zêde ketina nava felsefeyê ji hêla mijara me ve neku neçariyeke yan jî hewce ye. Lê belê em nikarin girêdana wê ya bi felsefeyê re jî çênekin.

### Bîrdozî û Dilxweşî Ji Bo Mirovê Destpêkê û Mirovê Dawî Jî Hewce Dike

Bila kes nehizire ku bingehek bîrdozî ya pir xurt a PKK'ê tine ye. Berovajî hem jî di asta herî pêşketî de xwedî bingehek bîrdozî ye.

Weke tê dîtin, ne dişibe sosyalîzma pêkhatî, ne jî vê yan wê bîrdoziyê. Bi me re nêzîkbûnek bîrdozî ya pêşketina xwe ya herikbar didomîne heye. Her wiha divê hema neyên gotin bîrdoziye û derbas nebe. Ger hûn pêwendiya xwe ya bi bîrdoziyê re qut bikin, hûnê bibin heywan.

Jixwe di rewşa heyî de sedema herî bingehîn hûn nikarin xwe venêrînin, nebûna zemînek we ya pir cidî ya bîrdoziyê ye. Mirov ji we ditirse, ji ber ku hûn bê bîrdozî ne. Berê dihat gotin; “Hûn bê ol û bê exlaqin.” Mirovê bê exlaq rewşek karesat, dîsa mirovek bê ol rewşek pir xeter rave dike û civak hemûyan jî lenet dike û cezayê herî giran dide. Niha bîrdozî dewsa van têgehan tevan digire. Nexasim bi me re bîrdozî nebe, mercek nebê nabê ye. Ez behsa bîrdoziya materyalîzma çors, ev an jî ew asta pêşketina sosyalîzma pêkhatî nakim. Behsa pêdiviyek bingehîn û pêdiviyek bîrdozî dikim. Her wiha ev ne tenê ji bo niha yan jî hûn PKK’yî ne hewce ye, ezel û ebed hewce dike. Ji bo mirovê pêşî jî hewce ye, ji bo mirovê dawî jî hewce ye. Lê di serdeman de guhertinên cur be cur raber dike.

Ger îro em weke gel, di astek ku gelek caran tên lenetkirin û li hember xwe xezebê dijîn, ev çavkaniya xwe ji bîrdozî, ango di mijara rastiya xwe ya heyberî de ji nirxên fikir û dilxweşiya xwe qutbûnê digire. Ger miletek bikariya hêza xwe ya fikir û dilxweşiyê bi rastiya xwe ya heyberî re bigire dest, misoger asta heyî nemijara gotinê bû. Dikare ev rewş weke; “Mêtîngerî di tevahî dîroka xwe de miletê me di vî yan jî wê astê de ji dilxweşiya bîrdozî qut kiriye” bê pênasekirin. Lê ya girîng pêkhatina vê rewşê ye.

Weke gelek kesan gotî, li şûna vegotinên; “Miletê me cahile, bêhişe”, emê bi gelemperî wisa bêjin; “Miletê me bê bîrdozî ye, ne kêfxweşe û ji ber ku ji van têgehên bingehîn hatiye qutkirin jî anîne astek heywanbûnê. Her wiha bi qasî dixwaze tê mêtîn, bi qasî dixwaze lê siwar dibe, bi qasî dixwaze dikuje û li hember vê dengê wê jî dernakeve. Derbikeve jî, kes cidî nagire.”

Vêca rewşa min a xwe pêkanînê bihizirin. Ger ez bûme dengek mezin, sedema vê ya herî bingehîn min xwe ji aliyê bîrdozî ve pêş xistiye. Bal bidinê, ya rastî min di wateya çors de bi çekê kar nekir. Dîsa bi pereyan jî kar nekir.

Şêwaza karkirina min bi bîrdozî ye.

Ji ber ez bûm hêza ramanek mezin û li gorî rastiya me ya heyberî ya pir guncav, fikir hilberand û xwe gihand hêza pêkana wê, ev jî ez veguherandim teqînek mezin.

Çima dikarim evqasî bibandor bim? Ji ber min rewşa di civakê û rastiya Kurd de ya bê bîrdozî û bê kêfxweşî di kesayeta xwe de dahûrand û bi vê çareseriyê re asta min a xwe pêkanê jî bi mercên heyberî re di ahengê de bû, niha di asta mucîze de têm nirxandin. Jixwe ji ber vê ye her derketinek dîrokî xwedî xisletek mucîzewî ye.

Ji aliyekê ve em beriya Îslamê li nîvgirava Ereban rewşa Ereban a heyberî berçav bigirin an jî li Ewrûpa beriya Şoreşa Fransa rewşa heyberî û heta beriya Şoreşa Cotmehê rewşa heyberî ya Rusya berçav bigirin –ji bo em van şoreşan hinekê dizanin dibêjim-, emê bibînin ku, bi rastî jî ji bîrdoziyek mezin qutbûnek, bê kêfxweşiyek mezin heye yan jî hukûmetek ku komek berjewendiyên teng a civakê tine dihesibîne, ji bo wê tê wateya ewqas cehalet û bêkêfxweşiyê heye. Dikare ji vê re îdareya zilmê û dîktatorî jî bê gotin. Hinek derdikevin, tam jî di vê pêvajoyê de xwe ji pêşengtiya bîrdozî û kêfxweşiya yên ji bîrdozî û kêfxweşiyê qut bûne re amade dikin û ew bi tenê yan jî çend kes jî bin, di demek kin de vediguherin teqînek civakî ya mezin. Vaye navê vê jî şoreşe.

Gelo mezinbûna Hz. Muhammed çiye? Ji ber wî ji serdema xwedî mercên civakê yên pir çors û hovane re, bi fikir û kêfxweşiyek pêşveçûyî bersiv da. Bermahiyên olî kom kir –fikrên wê demê bi gotinên olî dihatin ravekirin- di Kuranê de berhev kir û vê jî bi kêfxweşiyek pir mezin pêşkêş dike. Bi vî rengî teqînek Îslamî ya mezin pêk tê. Lewma pir hêsan û di rêya berjewendiyên erzan de mirovahî tê xistin. Her wiha gelek rewşên mîna vê bi lenet jî hene. Vaye ev derketin û ji vê re çareserî dibîne.

Di pêvajoya Şoreşa Fransa de jî proleterbûn û gêjbûna burjuva jî di radeyek neyê tehemûlkirin de bûn. Aliyek ji jor ve heywanbûn dijiya, aliyê din jî ji jêr ve heywanbûn dijiya. Elbet wê bi derketinek bîrdozî û kêfxweşiyek mezin ve bersiva vê bihata dayîn. Jixwe

fîlozofên wê demê jî avakerên fikir û exlaqê yê herî mezinin. Encama vê jî Şoreşa Fransa ye.

Ev di Şoreşa Rusya de jî didome. Li Rusya di mercên hîn paşketîtir de hem li jor, hem li jêr heywanbûnek tê jiyîn. Ji vê re jî bi nêzîkbûn, fikir û kêfxweşiyek mezin a sosyalîstî ve bersiv tê dayîn. Ev jî dibe şoreşek mezin.

Hinekê rastiya Kurdistanê jî dişibe van. Tam rejîmek heywanan mijara gotinê bû. Ya li jor tê pêkan ji rêveberiyek heywan re ye, yên li jêr jî disemixînin dibin heywan. Me ev dît û hewl da fêm bikin dê ev bi kîjan fikir û dilxweşiyê bê derbaskirin. Di encamê de bi teqînek pir cidî re pêşketinek ku em weke Şoreşa Kurdistanê binav dikin derket holê. Nexwe me hêza xwe ji kur girt? Me xwe nesipart pereyan, fêrbûnên civakbûnê yên kevin, şêweyên rêxistinbûna çîn û tebeqeyên civakê. Berovajî me hemû parçe parçe kirin. Ji ber ku hemû ketî bûn û hatibûn xistin. Ya me pêşkêş kirî, bi rastî jî hem rastiya xwe rast nirxandine û hem jî ji bo derketina wê dibe fikir û kêfxweşiya herî guncav.

Hûn nikarin vê hêsan bigirin dest, ji ber ku rastiya me li holê ye. Ez ji ber vê her roj ji we re dibêjim bi fikir û kêfxweşiyek têrkar nêzî jiyanê bibin. Mixabin hêjî hêza we ya fikir û dilşadiya we têra rizgarkirina we nake. Hûn nikarin xwe ji belengaziyê rizgar bikin. Gelo dilxweşiya kî ji we ya bilind heye û fikra wî têrê dike ku ji mercên heyberî re bibe bersiv? Ji ber ku tine ne ji we re dibêjim hûn bêrêgez û xafilin. Sedema ku hûn çareserî, nexasim çareseriya Rêbertiyê bidest naxin, paşde dimînin û heta dibin PKK'yîbûnek sexte. Lewra hûn nikarin pêş bikevin, ji ber ku qanûnên pêşketinê hene.

Nexwe bi gelemperî fikir û taybet jî şêweya wê ya bîrdozî mijara gotinê ye. Ango dikare di navbera fikir û bîrdozî de girêdanek bê çêkirin.

Raman, şêweyên giştî û fikrên giştî ne.

Bîrdozî jî, li gorî mercên heyberî yên civakekê hatiye eyarkirin, weke berjewendiya wê civakê hatiye fikirîn û heta fikrên hatine bernamekirinin.

Rastiya civakekê çi pêşveçûn, çi paşketin an jî nêzîkbûna ji aliyê kevneperest ve dibe, ramana wê rave dike. Bîrdoziyên paşverû û bîrdoziyên pêşverû hene. Dîsa kevneperestî heye. Yên hewl didin guhertinê ava bikin hene. Bîrdozî bi asta civakbûn a şênber ve girêdayî ne.

Di tevahî dîrokê de pêşveçûnek bîrdoziyan jî heye. Bîrdoziyên Ol'î di vê yan jî wê civakê de, di vê yan jî wê astê de pêş ketine. Ev didome. Weke din bîrdoziyên ku bi giranî aliyên xwe yên felsefîk hene. Vaye divê em li vir rêjeya felsefeyê jî fêm bikin. Felsefe ji ol derdikeve yan jî piştî qonaxek pêşketina ol derdikeve pêşberî me. Ango herî kêm bi qasî ol dîrokek wê jî ya kevin heye.

Cewaziya felsefeyê hîn zêdetir nêzî zanistê ye.

Nabêje; "Xweda heye, wisa ferman daye." Vegotinek weke; "Xweza heye û wisa ye" dike. Ango felsefe ji hinek dogmayan cuda li gorî rastiyên xwezayê fikir pêş dixe. Gelek aliyên wê yên dişibin ol hene. Têkilhev dibin, lê cewaziya wan heye. Felsefe hinekê hewl dide rastiya xwezayê binirxîne, ol jî bi temamî –dema em dibêjin bi temamî, em nabêjin qet xwezayê jî nabîne- ji destpêkê ve xwe dispêre rêgezek ji xwezayê jî bilindtir. Dibêje; "Ev xweda, ev gotina xweda" û hewl dide wisa xwezayê û jiyana heyberî vesaz bike. Divê neyê jibîrkirin, ev jî fikreke. Neku ji ber yê bi temamî ji xwezayê jî bilindtir xwedayeke, na. Fikrek bi giranî aliyê wê yê dilxweşî heye û hêza fikrek mayînde dide.

Fikra "Xweda" kengê û çawa çêbû?

Bi gelek peresanê re derbas dibe û bi têgeha xweda hêjî tam nehatiye pênasekirin ku dixwazin behsa çi bikin. Yê ku herî zêde zanist pêş xistî bi Einstein re jî fikra xweda heye. Her xwezaya paşketî xurtbûna xwe di kesê ku xwe weke xweda dibînê de jî fikra xweda heye. Lê di navbera wan de cewazî heye. Zanist jî behsa pênaseyên weke "Hêza ku xwezayê birêve dibe yan jî qanûnên xwezayê" dike. Tişta em dixwazin bêjin; "Têgeha Xweda-Yêzdan" hêjî pêşketina xwe didomîne yan jî ji domandinê paşve namîne. Lê belê her tişt girêdayî fikrek wisa girtina dest û pêşketina wê wisa ravekirin negengaze. Di

vir de felsefe dikeve meriyetê. Felsefe hinek din nêzî zanistiyê ye û hewl dide hîmên pêşketina xwezayê destnîşan bike.

Weke tê zanîn gelek bizavên felsefê hene. Bizavên îdealîst, bizavên materyalîst û rêbazên ew bikar tînin hene. Ji aliyekê ve yên dixwazin bi nêzîkbûnek metafîzîk û ji fîzîkê jî wêdetir rave bikin, ji aliyê din ve jî yên dixwazin bi nêzîkbûnên materyalîzma çors ve rave bikin hene. Bi qasî diyalektîk hîn zêdetir bi felsefeya materyalîst ve girêdayî ye, metafîzîk jî zêdetir bi felsefeya îdealîst ve girêdayî ye.

Em van zêde li vir venakin. Lê belê kêm-zêde girêdana hemûyan bi pêşketinek civakbûnê re heye. Di serdema pêşî ya mirovahiyê de jî û niha jî heye. Ya girîng di pêşketina mirov de rola ol an jî felsefeyê dîtin û mirov bizane tê çi wateyê. Ango niha hûn li gorî ol an jî li gorî felsefeyê dihizirin, divê hûn vê fêm bikin. Gelo bingeha fikra we ol'î ye, yan felsefî ye, divê hûn fêm bikin. Elbet li vir beşek jî fikra zanistî ye. Fikra zanistî, li gorî ol jî, li gorî felsefeyê jî, jiyana heyberî hîn zêdetir objektîf rave dike. Ango îdîayek wî ya bêje; "du cara du dike çar" nine. Xwedî zelaliyek wisa ye. Navê wê li sere, fikra zanistî yan jî zanistên civakî, zanista fîzîk, zanista kîmya, zanista biyolojî, heta ger wisa bê gotin –jixwe hewl tê dayîn hinek meylên bingehîn bên dîtin- zanista derûniye.

Gelo cewaziya fikra zanistî bi yên din re çiye?

Fikra zanistî li gorî yên din hinek din baştir dikare qadek gerdûn, xweza û civakê pênase bike. Bi sedem û encamên wê re ku bikare rave bike digire dest. Elbet ev jî hêzek daye mirov. Li gorî zanistê hizirîn niha bingehe û mirov bi vê pêşve diçe. Lê belê di tevahî dîrokê de ol jî mirov pêşve biriye û li ser lingan hiştiye. Felsefê jî heman rol list û hêjî dilîze. Tenê di zanistbûnê de pêşketinek heye. Zanist berê jî, beriya kiryar û çalekiyên mirov destpê bikin jî hebû. Ango dema mirov nêçîrtî dikir, dema hinek amûrên xebatên çandiniyê pêş xistîn jî zanist hebû. Di van xebatan de aliyê zanistî çibû? Vaye fikra ku dibêje; "Ez wisa aresteyî nêçîra xwe bibim, wisa li nêçîra xwe bidim, ezê li erdê bidim" jî nêzîkbûnek zanistî ye. Yan jî nêzîkbûna dibêje; "Ez vê zeviyê wisa biçînim, ezê di berdêla wê de vê bigirim" jî fikrek zanistî ye û bi qasî dîroka mirovahiyê xwedî paşerojekê ye. Ango

zanistî ne tenê rewşek girêdayî roja me ye. Lê di roja me de pir sazûmankiriye û li qadên pir cuda pêş ketiye.

Di destpêka mirovahiyê de cihê ol çawa esasî bû, di roja me de jî tê dîtin ku hatiye sînordarkirin. Dîsa felsefe çawa di serdema destpêkê û serdema navîn de û heta di demên destpêkê yên kapîtalîzmê de hebûna xwe giranî didomand, niha jî ketiye rêza duyem an jî wisa diyar dibe. Zanist jî pêşî sînordar bû, niha her tişt li gorî zanist tê hizirîn û jixwe ev jî pirsgirêkek pir girînge.

Di roja me de tê nîqaşkirin nexasim zanista ku rê ji teknîkê re vekiriye, gelo mirov çiqasî ber bi îmhayê ve dibe.

Pêşketina teknîkî ya ku îro zanistê tehrîk kirî yan jî rê jê re vekirî, herî kêm bi qasî dogmayên ol'î û baweriya hişk a felsefî gef li civaka mirov dixwe. Heta dikare bê gotin, di dema nêz de herî zêde jî teknîka girêdayî zanist, dibe ku dawiya mirov bîne. Ger tevdîr neyên girtin, dibe ku teknîk cinawirên ku mirov daqurtîne biafirîne. Jixwe atom cinawireke yan jî cinawirê îro derdor bi temamî wêran dike teknîke.

Berê jî cinawir hebûn, lê mirovan dikariya xwe li hember wan cinawiran biparêzin. Di serdema destpêkê, serdemên destpêkirina mirovahiyê de mirovê ku dikariya xwe biparêze, niha nikare li hember cinawirên teknîk xwe biparêzin. Heta dibe ku piştî çend sedsalên din cinawirên teknîk hîn xetertir bin. Elbet wê mirov jî bizane ku xwe li vir biparêze.

Bi gelemperî mirov serdema ku dijîn weke serdema dawî dinirxînin. Her çendî ev her tim di nava xwe de wisa bê dîtin jî, ya rastî ne wisa ye, guhertin esase. Belê, diyalektîka guhertinê pêwîstiyek rêgezî ye, lê divê ev jî rast bê nirxandin. Guhertin, nayê wateya ya pêk tê neyê dîtin. Asta pêşketina bingehîn a demekê, nirxên wê hene, dema ew hatin dîtin, hingê wateyek guhertinê çêdibe. Nexwe ger tu bêjî; "Her tişt tê guhertin" jî, wê tu bibî zirtker. Yeqîn dikim di nava me de jî guhertin hinekê bi şêweya zirtan tê fêmkirin. Ji bo fêmkirina guhertinê, pêwîste ya mayînde bê dîtin. Nirxên bi qasî dîroka mirovahiyê mayînde û qet neyên guhertin hene. Her wiha nirxên ku

pêwîste bên guhertin jî hene. Pêwîste em xwedî guhertinek wisa yan jî feraseta felsefeyek wisa bin.

Kurtasî, xalên ku pêwîste bên dîtin evin: Di pêşketina mirovî de fikir û bîrdozî, çi di asta efsûnî, çi bi sêhr û olî, çi felsefî û zanistî de bê ravekirin bila be, misoger bi jiyanê re têkilheve. Ev dîsîplîn nebin, jiyan nameşe.

Mirov bi qasî teşe dide xwe, xwe bi felsefîk dike û xwe bi zanist dike mirove.

Bes kuder giranî dide kuderê, ji kur kuderê esas digire, li kur guhertinê dijî, li kur çiqasî pêdivî bi şêweya bîrdozî heye, li kur çiqasî pêdivî bi dîsîplîn, dilşadî û exlaqê wê yê pêkhatinê heye? Ger ev rast bên destnîşankirin, ew civak bi tenduristiye, ew civak azade, ew civak dikare xwe bide jiyîn. Lê belê ger nejêhatî be û pirsgirêka xwe ya bîrdozî, pirsgirêka xwe ya dilşadî çareser neke, dê ew civak birûxe. Dema li ser hukme dê birûxe, dema birûxe jî wê belav bibe û bihele biçe.

Niha hinekê civaka me ya Kurd jî civakek rûxiyayî rave dike. Civaka Kurd civakek rûxiyayî û herî xirab jî bi belavbûnê re rûbirû ye.

Ji ber ku rastiyek civakî ya asta wê ya bîrdozî û dilşadî têkçûyî ye.

Tam jî di vê xalê de PKK çiye?

PKK tevgerek, pêşî dîtina bîrdozî û dilşadiya rastiya miletek ku bîrdozî û dilşadiya wê hatî hilweşîne.

Divê ev baş bê fêmkirin, ji ber xwedî wateyek sereke ye. Lê belê ez girêdana we ya bi civakbûnê ve dinêrim an jî hewl didim fêm bikim hûn behsa guhertinek çawa dikin. Halê we dişibînim gundiyên kevin ku darên xwe rakirîn û guhertinê dixwazin. Şûna dar çek girtina destê xwe, cewaziyek teknîkî ava dike, yan jî di ferasetê de ti cewazî nîne. Gundi jî dar radike û dihejîne dibêje; “Kuro ezê bi ser te de bêm, zû biçe ji ber çavên min.” Lê paşê weke êrîşên Don Kîşot ên li hember aşê avê, nikare xwe ji valederketinê rizgar bike. Jibîr nekin, hejandina çekê ya gelek ji we dişibe vê, heta xetertire. Ji ber ku dema te bi çekê Don Kîşotî kir, wê tu bişewitî. Jixwe vê pir metirsîdar dibînim û

dixwazim pêşî lê bigirim. Hûn ji rewşa bûna “Don Kîşotên biçek” derxistin, niha yek ji peywirên me yên bingehîne.

Vêca emê vê çawa asteng bikin? Belê weke min gotî, emê pêşî hêza fikir, bîrdoziya ku pêşî li rûxîn û belavbûna me ya civakî bigire û dilxweşiya ku van bi vînek bilind raber bike ve bi girêdana xwe ya jiyanê diyar bikin û di jîndarkirinê de asteng bikin. Pêdiviya we jî bi vê heye. Her wiha ez çareyek din jî nabînim.

Gelek bîrdozî ne xwedî vê îdîayê ne. Mînak, girêdayî asta zanista ku di serdema me de pêş dikeve, bîrdoziyên ku em dibêjin nûjenin hene. Ev çine? Bîrdoziyên ku em dikarin girêdayî rastiyên civakî yên burjuva rave bikin netewperestî û pêvekên wê ne. Lîberalîzm, dewletperestî û gelek bizavên weke van, ev ekol, ew ekol bîrdoziyên ku diyar kirîn hene. Lê belê di navbera van de xisleta herî bingehîn dikare weke netewperestî bê pênasekirin. Bîrdoziyên beriya niha jî, ji ber girêdanên wan ên bi civakê re sînordar bûn, li paş asta netewî bûn. Zêdetir cemaet û civatên eşîran esas digirtin. Cemaetên bi şêweyên malbatan hatibûn avakirin. Bîrdoziyên xwedayî, heta dibistanên felsefê jî berjewendiyên cemaetek teng esas digirt û di rastiyê de bîrdoziya wan bû, ango ne ya tevahî civakê.

Burjuvazî çînek ku gavek din pêşketiye û qet nebê ji bo xwe netewekê esas digire. Sûkek netewî, sînorek netewî û dewletek netewî esas digire. Ev jî rastiya xwe, di rastiya bîrdoziya netewperestiyê de derdixe holê. Ev bîrdoziya netewperest çiye? Civakek burjuvazî bilind dike, netewek vê civakê bilind dike. Neçare ku netew be. Ji ber ku pêdiviya burjuvaziyê bi netew dewlet, çanda netewî û axa netewî heye. Di vê xetê de fikrek mezin a dewleta netewî, fikrek mezin a çanda netewî, fikrek aboriya netewî, partiyên netewî, ji bilî van gelek hêmanên din ên netewî tên pêşxistin. Ev jî netewperestiyek pir mezine. Jixwe ji ber sedemên cuda ber bi faşîzmê ve herikbûn heye. Hîtler nûnertiya netewperestiya şoven a herî pêşketî dike û dibêje; “Nijada Alman a herî bilinde, hemû nijadên din ketî ne.” Xala herî xeter pêşketina ku bîrdoziya burjuva digihiyê evdere.

Elbet negengaze ku girêdana bîrdoziyan bi civakbûn û çînên civakî re bê paşçavkirin. Bi gelemperî girêdayî mirovane, lê bi taybet civaka mirov, ango bi pêşketina çînayetî re girêdanên bîrdoziyan heye. Negengaze ku mirov girêdana gelek bîrdoziyan bi giştî civakê re û taybet jî bi çînên wê re nebîne. Vaye pêşketinek wisa ya bîrdoziya burjuva jî heye û ev pêşketin hêjî bi hemû leza xwe ve didome. Lîberalîzm jî, dewletperestî jî, şêweyek din a netewperestiyê ye.

Beramberî vê cêwiya burjuvaziyê yan jî bi wê re di dîrokê de zêde derketine holê çîna kedkar, xwest bi bîrdoziyek heta ku weke proleterya hat binavkirin derbikeve holê. Weke tê zanîn, ji vê re jî gotin bîrdoziya sosyalîst. Bingeha bîrdoziya sosyalîzmê jî ji kevin de ye. Çawa ku di tevahî dîrokê de netewperestiyê dispêrin arîstokrasî û çîna xwediyên koleyan, sosyalîzm jî dikare heta bindest, pleban (hemwelatiyên Roma yên çîna navîn û jêrtir) û serfan bê nirxandin.

Pleban bi Spartakûs re ceribandinek sosyalîzmê kirin, serfan jî di serdema navîn de gelek ceribandinên komînên civakî kirin. Lê belê pêşketina wê di sedsala 19. de, ji dema weke sosyalîzma zanistî dihat nirxandin jî girtiye.

Ango her serdemek li gorî xwe sosyalîzmek xwe heye.

Mînak di Îslamiyetê de Hz. Elî yan jî Elewîtî bi gelemperî hinekê jî sosyalîzma Îslamê ye. Di serdema navîn de hema her olek li gorî xwe şêweya wê ya bûna sosyalîst heye. Heta ev, di serdema destpêkê de jî mijara gotinê ye.

Girêdayî bîrdoziya zanistî ya giştî ku bi serdema kapîtalîzmê re derketî holê, li gel vê zanista sosyalîzmê jî heye. Ji bo ji sosyalîzmên din bê cihekirin, ji sosyalîzma pêş dikeve re, sosyalîzma zanistî tê gotin. Çima zanistî?

Jixwe sedsala 19. sedsalek zanistê ye û ti qadek ku zanist xwe neda hesandin nîne. Ev pêşketin bandor li zanistên civakî jî dike. Lewra weke raveya herî cewherî ya zanistên civakî sosyalîzm derdikeve holê. Vaye ji ber vê navê sosyalîzma zanistî yan jî zanista sosyalîzmê tê lêkirin. Ev zêde negirînge.

Sosyalîzm, di dîroka bîrdoziyan de di îdîaya bûna zanistiya mezin de ye.

Hinek sedemên vê jî hene û sedema vê ya herî bingehîn jî girêdana wê ya bi çîna kedkar ve ye. Serdest neçarin ku derewan bêjin û ne rasteqînî bin. Lê çîna kedê neçare ku rasteqînî be, ango zanistî be. Ji ber ku pêdiviya xwe bi derewê û mêtîngehkirina hinek din nîne. Vaye ji ber vê sedemê çîna kedkar çîna herî zêde nêzî zanistiyê ye. Ev ji hêla îzafî ve jî wisa ye.

Jixwe mirov bi giştî her tim hewceyî xeyalane. Lê xeyal ne rêvebirine. Jixwe negengaze ku xisleta sosyalîzmê jî ya xeyalî neyê hizirîn. Ya rastî her bîrdoziyek xeyaleke û sosyalîzm jî neçare ku ûtopyek wisa be. Sosyalîzma pêkhatî xwest vê derbas bike yan jî xwest sosyalîzmê bê utopya û dilxweşî bihêle, mixabin encam bû hilweşîn. Ev dikare weke şêweyek jirêderxistinê ya berovajî cewhera bîrdoziya sosyalîstî jî bê hizirîn. Weke di her jirêderxistinê de heyî, di vir de jî nekarî xwe ji binkeftinê rizgar bike.

## Di Dîroka Bîrdoziya Sosyalîst De Qonaxên Girîng

Niha em pirsên gelo pêdivî bi bîrdoziyek zanistî heye yan jî ma pêwîste bîrdoziyek zanistî be ronî bikin.

Hişê mirov her ku diçe bi zanist dibe. Lewra çawa ku di fîzîk û kîmyayê de yan jî di şaxên din de radeya zanistbûnê heye, di şaxên civakî de jî radeyek zanistbûnê heye. Lê belê çawa ku zanistê di mijarên qanûnên xwezayê yên bingehîn de xwe negihandibe xetek çar bi çar, zanista civakî jî hîn zêdetir îzafiye. Negengaze ku xwe bi temamî zanist bike. Ji ber civak bi xwe xwedî xisletek xeyalî ye. Tesewire, ruhe, ne gengaze ku ev bikeve nava şêweyek çar bi çar. Bi gelemperî mirov bi xwe ne hebûnek ku bi temamî weke zanist bê hilberandine. Ger bixwazin mirov wisa bigirin dest, dê rewşek weke faşîzmê xwestî tenê nijada Alman ava bike derbikeve holê, ev jî ya herî xeternake. Heta di sosyalîzmê de hinekê hat ceribandin û rûxandin ava kir. Faşîzm bîrdoziyek burjuva ya pir zû hatî rûxandine.

Ji ber ku sosyalîzma pêkhatî jî, sosyalîzmek jirêderketî bû hilweşiya. Xwestin di sosyalîzma pêkhatî de ferdê civakek bêruh û mekanîk kar dike ava bikin.

Sosyalîzm di asta têgeh de, dikare weke rêbaza herî azad a pêwendiyên mirov ên bi civakê re bê pênasekirin. Li dijî çi tiştê ku ji rastiya civakê qute, jorî wê cîh digire, diçewsîne û mêtîngeriyê dike hebe derdikeve. Lê dema dibêje ez wisa bim jî, gotina; “Di civakê de neçare ku her tişt weke diranê şehekê bişibin hev” jî înkara pêşketina xwezayî ye. Ji ber ti pêşketina xwezayî ne wisa ye. Lewma ya herî rast tevlîbûna azade.

Divê tevlîbûna civakî li gorî jêhatî û hewldanê be.

Jixwe sosyalîzm jî wisa tê pênasekirin. Şûna vê tevlîbûna birokratîk, tevlîbûna li gorî fermanê, ji berê ve weke “Du caran du dibe çar” tevlîbûnek kirin, ne li gorî xwezaya mirove. Jixwe di hilweşîna sosyalîzma pêkhatî de jî diyar bû ku ne li gorî xwezaya mirove. Di serdema koledarî û feodalî de yek kesî pir jorî civakê digirt, dixist şûna xweda. Niha jî dixe şûna karsazan. Xwedayên wisa çawa hatibin derbaskirin, karsaz jî tên derbaskirin. Bes di sosyalîzmê de mirov kirina mekanîk, bivê-nevê jirêderketineke, ne astek azadiyê ye.

Bi gelemperî feraseta fikir, wekhevî û azadiyê ya bindestan di sedsala 19. de ji aliyê Marks-Engels ve hat pêşxistin û gihandin raveyek zanistî. Ev raveya zanistî ya sosyalîzmê ku Marks-Engels pêş xistî tevkariyeke û tiştên dayîn bidestxistin hene. Xeyala sosyalîst, kevneşopiyên sosyalîst û nexasim bi awayek bîrdozî digihînin raveyek zanistî. Ji bo cudabûna xwe ji yên din bidin diyarkirin jî, ji sosyalîzma xwe re dibêjin; “Zanistî.” Ev qonaxek girînge û biçûk nayê dîtin.

Ji aliyekê ve bîrdoziya sosyalîzmê wisa zelal û bizanist dike, ji aliyek din ve jî xwestin vê birêxistin bikin. Lîga’ya Komînîst Enternasyonalîsta Komînîst a 1. damezirand. Ev jî ber bi sendîkayên karkeran ve birin û hinekê jî zanebûn û rêxistin bi çîna karker dan bidestxistin. Lê mixabin nekarî tam bike desthilat. Komîna Parîsê ceribandinek bû, lê mixabin negihandin serkeftinê.

Li ser van tevan Lenîn sosyalîzm hinek din polîtîk kir û gavek pêşdetir avêt. Di şoreşa sosyalîst a di pêşengtiya Lenîn de ku weke “Ezmûna Bolşevîk” tê binavkirin, qonaxa pêşketina pratîk-polîtîka hebû.

Tevkariya Lenîn a herî girîng ji sosyalîzmê re ew bi polîtîk kir.

Ji bîrdozî ber bi polîtîkayê ve pêngavek mezin pêk anî. Weke tê zanîn teoriya şoreşê ya Lenîn heye. Di teoriya şoreşa emperyalîst de, vegotina; “Ji xeleka herî lewaz şikandin” heye. Nirxandinên wî di derbarê partiya pêşeng û ya ku taktîka şerê partiya pêşenge raperîn û gêrîla de hene. Her wiha teoriya dîktatoriya proleterya jî mijara gotinê ye. Van hem bi têgeh dike, hem bibername dike û hem jî bi pêşengiya partiyê re birêxistin dike. Heta ev ber bi dewletbûnê ve jî bir. Di pêvajoyên pey wê re –nexasim di dema Stalîn de û peyre- ev weke şêweya pêşxistina dewletê saz kirin.

Hemû tişta Stalîn kirî pêşxistina dewleta sosyalîst bû. Ev rewş ewqas hat pêşxistin ku yan jî ewqas yek alî hat destgirtin ku, hema hema bîrdozî di nava polîtîkayê de, heta di nava aboriyê de hat helandin. Weke hêza bîrdozî û dilxweşiyê partî di nava dewletê de tine bû û hat tinekirin. Ango dikare di nava partiyê de dewlet jî bê tinekirin. Bi Marks û Engels re pîvanên vê tên dayîn. Dewlet pêşî hewce ye, lê derketina ji dewletê jî hewce dike. Dîsa dibe ku partî ji holê rabe, lê piştî ku digihe armancên xwe radibe. Partî jî, dewlet jî armûrên pêvajoya derbasbûnê ne.

Di ezmûna Sovyetê de partî rabû û bû dewlet. Bîrdozî ji holê rabû, xistin asta polîtîkaya hundur û polîtîkaya derve. Elbet bîrdozî wisa di nava polîtîkayê de helandin û tinekirin xeteriyên mezin dihewîne. Jixwe ev jî derket holê. Pergalek Sovyetê ya pir baş polîtîkbûyî û hêmanên partiyê, hêmanên dewletê, dîsa sekreteriya partiyê û hemû hêz di asta cîhanî de di destê xwe de girtin, rê ji paşketinek kapîtalîzmê wêdetir re vekir. Ev jî jirêderketine.

Belê ji kur lê bê nêrîn bila be, pêdivî bi dewleta proleterya heye, lê dema partiyek xwe evqasî dike dewlet û berovajî sedemên hebûna xwe bikeve, ew jî jirêderketine. Vaye ev jî li Sovyetan kûr bû û di

encamê de ber bi xetimandinê ve bir. Elbet xwezayî encama vê xetimandinê jî hilweşîne.

Hêjî cîhan vê dijî. Dîmenek cîhana ku demekê weke pergala sosyalîst û pergala emperyalîst cihe bûyîn hebû. Hema hema heftî salî wisa hat nirxandin. Her wiha ev jî bi serdema şoreşên proleterya ve hat pênasekirin. Piştî hilweşîna ezmûna Sovyetê, tê dîtin ku ev têgeh jî hatine qedandin. Gotinên weke serdema şoreşên proleterya, têgeha dîktatoriya proleterya zêde nayên bikaranîn. Heta dewletên sosyalîzma pêkhatî yên hatîn damezirandin hebûn û tê gotin ew jî hatine derbaskirin.

Di roja me de rewşek nû ya derketî holê tê nîqaşkirin. Her çendî ji vê re "Serkeftina Kapîtalîzmê" bê gotin, ev ne kapîtalîzma di destpêka sedsalê de ye. Rewşek pir cuda ye û jixwe hewl tê dayîn jî bê fêmkirin.

## Sosyalîzm Bi Dewletbûnê Nagihe Armanca Xwe

Pêwîste hinekê pirsgirêkên sosyalîzmê yên veguhertina hêzek polîtîk bên dîtin. Jixwe heta ku ev pirsgirêk neyên dahûrandin, ji nû ve damezirîn negengaze. Weke di her bîrdoziyê de dibe, bêguman dê sosyalîzm jî rast nêzî pirsgirêka desthilatî bibe.

Wê bîrdozî bixwazin di dewletbûn, desthilatdarî û civakan de cîh bigirin.

Ev xwezaya wane. Lê pirsgirêk wê ev heta kur û çawa be. Lewma kes nikare sosyalîzmê tawanbar bike ku dixwaze bibe dewlet. Elbet wê ji bo berjewendiya kedkaran bixwaze bibe dewlet. Jixwe yek ji peywirên wê yên bingehîn jî eve. Lê belê ma her tişt bi dewletbûnê ve çareser dibe? Vaye di vir de pirsgirêk derdikevin holê.

Sosyalîzm bi dewletbûnê nagihe armanca xwe.

Ya herî rast dewletbûn weke armancek sosyalîzmê ya hêsan bê hizirîne. Hinek armancên sosyalîst hene û bi destê dewletê pêk tên. Ji bo çewsandina paşverûtî û valederxistina xeteriyên emperyalîzma derve, dewlet hewce ye.  Lê belê her tişt ji dewletê payîn, wê sosyalîzmê ji rê derbixe.

Jixwe ev dibe rewşek weke her tişt ji xweda hêvîkirinê. Ol jî di destpêkê de watedarin û bersivê didin pêdiviyên balkêş. Dewletek bi ol jî destpê dike û dibe dewlet. Bes paşê yek derdikeve, ol tenê bi xweda ve rave dike û dibêje; “Ez siya Xwedê me.” Vaye dibe siltanek monarşîk û dîktayek nehatiye dîtin. Sosyalîzm jî dişibe vê. Pêwîste bibe dewlet û di destpêkê de jî demokratîke. Piştre li ser her tiştî sekreterek giştî û bi “enternasyonalîzmê” re di asta cîhanî de bû rêberek!

Her tişt bi dewletê re çêbû û di encamê de sekreterek giştî ya ketî dewsa Xwedê yan jî bîroya wê ya polîtîk derket holê!

Vaye jirêderketin wisa ye.

Deka vêca li ser vî bingehî em li nava xwe binêrin: Hinekê raye digire destê xwe kuştin jî di navê de, li ser her tiştî hukum dike. Ev di şênberiya ku di nava me de tê jiyîn re diyarkirin, ji bo dema bîrdoziyek dibe desthilat xeteriyên wê çine dibêjin. Ev li Sovyetan pir berfireh hat jiyîn û tişta ku ji vê re jî rê vekir hinekê pêkanên destpêkê yên sosyalîst bûn.

Ya rastî li Sovyetan ya destpêkê hatî pêkan, kiryarên sosyalîst ên wehşî bûn û beriya wê jî ti mînakên wisa nîne.

Dema hinek bandorên din jî bi ser kesayeta Stalîn ve tên servekirin, dewlet wisa nepixand û sosyalîzm bi polîtîkaya hundurderve û aboriyê ve sînordar kir.

Encama ku derket, encama “sosyalîzm nabê” bû.

Vaye nîqaşên sosyalîzma nû wisa dikare bi polîtîkayê re têkilhev bê destgirtin.

Pêwendiya sosyalîzm û polîtîkayê, pêwendiyên sosyalîzm û dewletê berê jî dihat destgirtin. Di dema Lenîn de jî mijara desthilatî, dewletê û pirsgirêka demokrasiya qewmî hat destgirtin û pir jî li gorî esasê çînayetî çareseriyên guncav hatin dîtin. Ev li gorî dema xwe polîtîkbûnek pir girîng bû û xeyalên rizgariya mirovahiyê bû. Bi qada rakêşweriya mezin a ava kirî re, baldariya mezin a li hember sosyalîzmê, di tevahî sedsala 20. de berdewam kir.

Ev çima wisa bû? Çi ji aliyê bîrdozî, çi jî polîtîk ve, bi rastî jî cîhanek mezin ku bida mirovahiyê hebû. Her wiha bi qasî xeyalê wê, rewşa pêkana wê jî dibû, lê ji rê hat derxistin.

Çawa ji rê hat derxistin?

Her tişt ji bo berjewendiyên Sovyetê. Di nava berjewendiyên Sovyetê de her tişt ji bo berjewendiya Rusya. Di nava berjewendiya Rusya de her tişt ji bo brokrasiyê. Di nava birokrasiyê de her tişt ji bo berjewendiya partiyekê. Di nava wê de jî her tişt ji bo berjewendiya navend, nivîsgeha polîtîk û sekreteriya wê bû. Di encamê de xwestin hemû mirovahiyê di xizmeta yek komê de bidin bazdan.

Xwestin sosyalîzmê wisa bikar bînin, lê vekirî bû dê ev wisa nemeşe. Jixwe cewhera sosyalîzmê jî berovajî vê bû û lewra hilweşîn jî lez çêbû. Ev jî bi şêweyek ku kes ne li bendê bû û ferq nekirî de pêş ket. Ji ber ku pêşketinên hatîn jiyîn pir berovajî cewhera sosyalîzmê bûn, ev tiştek tê fêmkirine. Lewra divê mirov şaş nemîne ku çima di rojekê de hilweşiya. Ji ber ya xwezayî jî wisa pêkhatina wê ye. Di vê navberê de em vê jî bêjin, dîktaya wê jî pir çewsîner bû.

Ev jirêderketin pir xeternak bû. Di nava me de jî destpêkê yek kes ne ti tişte, lê dema rayeya partiyê digire dibe cinawirek. Min di pratîka me de sedan kesên wisa dît. Ev li Sovyetan hinek din bi nûjentî û gelemperî çêbû. Di vê rewşê de ya hewce, bi bîrdoziya sosyalîst ve pêwendiya hêz û raye, pêwendiya polîtîk pir saxlem destgirtine.

Dikare çawa saxlem bê destgirtin?

Pir baş raçavkirina safîtiya bîrdoziyê ve dibe.

Divê bîrdozî bi polîtîkayê ve xirab nebe.

Pêwîste polîtîka nebe amûrê berjewendiyên çînek teng an jî berjewendiyên komekê –heta weke niha tê jiyîn ne ji bo berjewendiya çînayetî jî-, kesî û hinekan.

Ji ber vê çi hewce dike?

Hêmanek bîrdozî hewce dike.

Îro li Îrana ku em qet naecibînin, dibêjin rejîma meleyane jî, saziya Ayetullah heye. Hêza wî ya ku bikare hêza herî polîtîk a mezin Şah jî hilweşîne hebû û hemû hêza wî bîrdozî bû. Ya rastî "Ayetullah" hêmanek bîrdozî ye. Ayetullah karên xwe bi bîrdoziyê birêve dibe û jixwe niha jî dikarin heta dawî bi bandor bin.

Vaye di sosyalîzmê de ev tine bû. Hêmana bîrdozî, çi bi çapemeniyê, çi berdevkiyê, çi jî îdeologên xwe ve girîngiya xwe winda kirin. Îdeolog bûn papaxanên dewletê yên ji rêzê û li Sovyetê gotin; "Berjewendiya hundurîn eve, berjewendiya derve eve", bang kirin ku her kesî bikin amûrê derewan. Bi vî rengî bîrdozî jî bi îxanetê re rûbirû ma. Lê em dizanin ku sosyalîzm xîtabî hemû mirovahiyê dike. Jixwe Ayetullahên Îranê jî dibêjin; "Em Îslamê ne tenê ji bo Îranê, ji bo hemû mirovahiyê dihizirin" û ev jî deng vedide. Li Sovyetan jî pêşî enternasyonalîzm ji bo hemû mirovahiyê bû, lê paşê bi temamî veguherî berjewendiyên Sovyetê, berjewendiyên Rusya yan jî berjewendiyên komekê.

Ji bo pêşîlêgirtina vê misoger pêwîstî pê heye ku hem di asta netewî hem jî nav-netewî de mirov bi bîrdozî be. Hat xwestin ku vê bi enternasyonalîzmê re çareser bikin û enternasyonal hatin damezirandin. Lê mixabin dîsa jî nekarîn ezmûna Sovyetê ji vê encamê rizgar bikin. Nabêjim di vê mijarê de qet rol nelîstin, bes encam jirêderketin û hilweşîna wê bû.

Nexwe hewce dike ferqa wate û pêwîstiya bîrdoziya sosyalîzmê ya ji polîtîkayê derbixin holê. Divê ji berjewendiyên dîktator û koman re nebe amûr, bikare di kesayetên kedkaran de ji bo pêşeroja hemû mirovahiyê rol bilîze.

Pêwîste sosyalîzm her tim girêdana xwe ya bi dîrokê, pêşerojê, xeyalan, zanistî, asta pêkanê, bi hedefên pêşketinên pêşbîniyan re bihizire, nîqaş bike, raçav bike û bi vî rengî jî di xetek ku bikare rola mejiyek rasteqînî bilîze de be. Weke hêmanek ku ne girêdayî netewekê, berjewendiya çînek tenge, girêdayî çînên nûnerên kedê ye – heta ku mirovatî eleqedar dike yan jî mafê wane, pêşketinên di kesayeta van de rû bide bên saxlemkirin-, girêdana xwe ji ramanek çînî qut nake weke hêmanekê xwe pêş dixe. Divê weke hêmaneke dihizire ya rastiya netewî paşçav nake, lê xwe di nava berjewendiya netewî de jî nexeniqîne, adil nêzî her netewî dibe –ji vê re tê gotin her netewek bikare çarenûsa xwe bi xwe diyar bike-, dîsa demokratîke. Dîktatoriya weke berjewendiya komekê nabîne, dewleta ku dîktatorî û amûra desthilatiyê ye, ji bo hêmanên mêtîngerî yên bê maf ji holê bên rakirin, bi şêweya ji nû ve vesazkirinê veguhertina wê esas digire. Mîna vê gelek fikrên bi tenduristî dihizire, proje û hîmên wê yên exlaqî esas digire û kar dike.

Mirov ne tenê bûyerek pêşveçûnê ye. Di sosyalîzma pêkhatî de di bin navê pêşbaziya bi kapîtalîzmê re mirov veguhertina heywanê ku her tim dixwe û vedixwe. Jixwe di hilweşîna Sovyetê de her kes dibeziya dikanan. Heta di vir û wira xwe de heyberên zad dagirtin, bibû xisletek bingehîn a mirovê Sovyetê. Belê, pêşketina aborî hewce dike, lê ger tu di çavên mirov de bînî asta ku bêje; “Xwarin û vexwarinê bixim vir û wira xwe de, zêde bigirim” û veguherînî heywanbûnê, ew ne sosyalîzme.

Vaye astek dilşadiyê ya ji bo sosyalîzmê hewce heye. Ya rastî di ol’an de dibêjin; “Mirov bi temamî dilşad dijî, li gorî rêgezên pîroz dijî.” Lê her çendî tevahî ne wisa be, di rastiyê de dilxweşî şertê sereke ye. Jixwe dema te hewl da mirov zêde bi heyber têr bike, ti carî têr nabe. Vaye wêrankariya xwezayê, rizandina civakê, penceşêriya mirov, ji ber van qalibên civaka tine û xilas dike ye.

Îro li Ewrûpa civatên pêşketî yên xerckirinê, welatên pêşketî yên kapîtalîstê ne. Hinde ketine asta civata xerckirinê, êdî xweza li ber xwe nade. Weke êdî cîhan jî ji qalibên van civatên xerckirinê re tenge, hêjî didome. Yek din jî penceşêr serve zêde dibe. Penceşêrbûn di

wateya rasteqîn de bi qasî nexweşiya penceşêrê ye, weke din jî penceşêriya giştî heye. Weke vê gelek nexweşiyên netewî pêş dikevin. Di encama vê de nexweşiyên weke penceşêr û AIDS ên lêvegirtî derdikevin holê. Ev hemû çavkaniya xwe ji xerckirinê digirin. Vaye tinekirina cînseltî jî rê ji AIDS re vedike. Ew jî nexweşiyeke û ji ber qalibên civaka xerckirinê pêş dikeve. Ragêşî, bêhntengî û yên weke van tên avakirin, bêguman rê ji van re vedike. Heta hêjî nexweşiyên nû pêş dikevin. Ji ber ku hêza mirov a li hember van qalibên civaka tinekirinê ya li ber xwe dayînê hatiye tinekirin.

Tiştên wisa di hinek qonaxên dîrokê yên din de jî hebûn. Weke Weba (nexweşiyek ji lawiran vedigire), gelek nexweşiyên wisa dem bi dem hatine dîtin ku bi berfirehî vedigire. Ev hemû misoger bi xistina civakê ve girêdayîne. Dema hêza li ber xwe dayînê tine dibe – jixwe ev jî hêza dilxweşiyê ye-, mirov têk diçe.

Miletê me jî bi temamî weke penceşêrê ye.

Ji ber ku hêza wê ya berxwedan û dilxweşiyê hatiye rûxandin.

Lewra her cure nexweşî tê jiyîn. Jixwe ji bo em bikarin ji mirovan re bêjin mirovên bi tenduristîne, hezar govan hewce dike. Bi rastî jî ez hemûyan bi nexweşî dibînim û hemû şoreşgeriya xwe jî ji bo vê nexweşiyê venegrim dimeşînim. Hûn min bikujin jî, qet nikarim weke wan mirovan bijîm. Ji aliyê dilxweşî, ruhî ve nexweşin, fîzîkî nexweşin. Lewra aliyek wan a bê destgirtin nemaye û belengaz bûne. Ti jiyana wan a bi tenduristî nîne û dilxweşî sifire. Jixwe çand û zimanê wî hatiye wêrankirin û tine bûye. Niha di civakek evqas nexweşî dijî de ger tu bêjî; "Dikarim bijîm", te xwe ji rê derxistiye.

Vaye pirsgirêkên bingehîn evin û evê çawa bi sosyalîzmê bên derbaskirin dikeve rojevê. Pir vekiriye ku dê weke ya di nava sosyalîzma pêkhatî de neyê derbaskirin. Ger tu weke ya di nava kapîtalîzmê de hewl bidî tenê zikê xwe têr bikî, wê tu mirov ji mirovê ku kapîtalîzmê ava kirî şûndetir jî veguherînî bûnewerekî. Ev rastî di sosyalîzma pêkhatî de derketiye holê. Elbet tu dilxweşiyê bişkînî, demokrasiyê pêş nexî, wê mercên ji kapîtalîzmê paşketîtir derbikevin holê û te jî li paş xwe bihêle.

Sedema vê ya herî bingehîn, weke me gotî, ji ber sosyalîzma pêkhatî demokrasî û dilxweşî pêş nexist û qalibên tinekirinê yên kapîtalîzmê derbas nekir lewma wisa çêbû. Xwezayî berovajî bîrdoziyê ketiye.

Bîrdoziya sosyalîst misoger normên kapîtalîzmê ji bo mirovahiyê esas nagire. Nikare bêje; “Kapîtalîzm evqas dide, ezê jî evqasî bidim.” Wê tu hinek tiştan qet nedî, hinek tiştên neyî jî bidî. Kapîtalîzm derdor qirêj dike, xwezayê qirêj dike û civakê dike penceşêr. Wê tu jî çareyên rê li vê digire peyda bikî. Nexwe di bin navê “Ji kapîtalîzmê zêdetir dihilberînim” de tu xweza û derdor qirêj bikî, dilxweşî û demokrasiyê bixeniqînî, weke ku ev ne sosyalîzme, nikarî bibî karîkatorê wê jî û jixwe derket holê ku nikare wê jî bike. Misoger pêdivî bi sosyalîzmê heye.

Di destpêkê de, weke di serdema koletî û serdema navîn de bûyî, di roja me de jî ger ji çîna mêtînger a serdest û nûnerên wê re bimîne, weke me beriya niha gotî dê cinawirên ku derbikevin holê, ji yên serdemên destpêkê xirabtir ku neyên muqayesekirin pêş bikevin. Jixwe ev cinawir ji niha ve di nava kar de ne û mirovatiyê dikemirînin. Ji ber vê pêşî çawa mamoste dibêjin; “Çareseriya li hember kapîtalîzmê sosyalîzme” pir bi îdîa û dilxweşiyek mezin ve di nava jiyanê de cîh digirin û şerê wê dimeşînin, wê tu jî heman şêweyî bijî.

Di roja me de li hember vê cinawirbûnê wê bi sosyalîzmek hîn xurtir bersiv bê dayîn. Ev bersivek çawa ye? Elbet bersivek dikare pir rehet bê dayîne. Ji ber neku tinekirin û wêrankariya kapîtalîzmê nayên derbaskirin. Lê pêdiviya vê jî bi têkoşîn û heta têkoşîna dilxweşiyê heye. Ji nû ve rêxistinbûn, bername û nîqaşên vê yên berfireh hewce dikin. Nexwe gotinên weke; “Sosyalîzm hilweşiya û îflasa wê jî hat selmandin”, jixwe dibe êrîşa bîrdozî ya kapîtalîzmê û ya niha berfireh tê meşandin jî eve.

Ji bo kapîtalîzm mehkumiyeta xwe ya ji aliyê sosyalîzmê ve veguherîne bê tawaniyê, di nava hewldanek mezin de ye.

Ya rastî di tevahiya sedsala 20. de darezînên giran derbas kir û hat mehkumkirin. Di rastiyê de ne zehmete ku neyê derbaskirin. Bes ji ber şaşiyên ku tên zanîn û hinekê jî ji ber hêj tam serdema wê nehatî ev

mehkumiyet bi derbaskirinek tam a kapîtalîzmê ve encam nebû û hinek din temenê kapîtalîzmê dirêj bû.

Lê bila ti kes nehizire ku temenê kapîtalîzmê weke destpêka sedsalê zêde yan jî bi tenduristî ye.

Berê gotina weke; "Kapîtalîzm berê bigihe dawiya sedsalê wê bê derbaskirin û emê bigihin komînîzmê jî" şaşî û fişalbûnek bû. Ya rastî ev şêweyek jirêderxistina xeyalekê bû. Ji ber ku ji aliyekê ve sosyalîzma pêkhatî di rewşa paş kapîtalîzmê de bû, ji aliyê din ve jî îdîa dikir ku komînîzm damezirandiye. Mirov dikare vê jirêderketin û fişalbûnê di rastiya sosyalîzmê de bibîne.

Ya rastî bi kapîtalîzmê re têkoşînek demdirêj tê xwestin.

Mamosteyan digot ku wê ev têkoşîn sedî salan bidome, bes wê dîroka kapîtalîzmê jî nêzî hezar salî be.

Dîroka pêşketina sosyalîzmê bila çend hezar sal bikişîne. Divê em xwe ji vê nedin paş. Ji ber ku her tişt di çend deh salan de hewandin, di dîroka sosyalîzmê de negengaze.

Lê belê ji ber ku ev wisa ye em nikarin li hember kapîtalîzma roja me bê bîrdozî yan jî bê têkoşîn, bê şerê wê yê desthilatî derbas bikin. Bes têkoşîna emê bimeşînin jî di derbarê wê heta kur û çawa bin de jî pêwîste em şêweyên wê yên bingehîn û taktîkên wê peyda bikin.

Ji bo vê jî nîqaşên sosyalîzmê yên rojaneyî hewce dikin. Divê ev nîqaş pêşî pirsgirêkên ku kapîtalîzmê li ser mirovahiyê ferz kirine bigire dest. Ango pêdivî bi nîqaşek ku di serî de li ser netewên bindest, mirovahî, çînên bindest ber bi hilweşînê ve dibe, temamî xwezayê wêran dike, heta pêşveçûna civakên kapîtalîst ên di nava xwe de jî temamî wêrankarî pêk tîne pêşî lê bê girtin heye. Bi kurtasî ya divê di roja me de bê kirin, piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî nîqaşek berfirehe. Ango qonaxek qediya, dikare qonaxek çawa bikeve dewsa wê? Divê ev bi nîqaşan bên ronîkirin.

Bal bidinê, di dîroka sosyalîzmê de nîqaşên mezin hene.

Di Misilmaniyê de jî nîqaşên Elewî-Sûnî hinekê dişibin nîqaşên sosyalîzm û kapîtalîzmê. Sûnîtî di tevahî dîrokê de weke şêweyek dewleta fermi û serdest Elewîtî çawa çewsand, veguherand

mezhebekê û wê mezhebê jî xwe siparte çiyan, di roja me de jî sosyalîzm ji aliyê kapîtalîzmê ve wisa hat çewsandin. Kirin mezheb, ji qîmet xist û bi hukmek nayê jiyîn ve xwest şanî civakê bike.

Vaye di wateyekê de ku em dikarin bêjin sosyalîzma Îslamê çawa dixwazin Elewîtiyê jî, bi dewletê ve girê bidin, ji cewhera wê ya şoreşgerî vale derbixin, bi heman şêweyî êrîşa kapîtalîzmê ya li hember sosyalîzmê jî wisa heye. Kapîtalîzm bi vê êrîşê ve çend çeperan desteser dike û bi vê re jî dixwaze sosyalîzma heyî bi xwe ve girê bide. Ya rastî hinekê girê jî daye. Mînak li Tirkiyê hemû qadroyên sosyalîst ên kevin di xizmeta kapîtalîzmê de ne, heman weke hinek nûnerên Elewiyan didin bazdan. Heta dixwazin di nava PKK'ê de jî hinekan ber bi xizmeta dewletê ve bidin bazdan.

Ev rewş di tevahiya dîrokê de wisa bû û di roja me de jî wisa ye. Lê belê ji ber ku wisa ye, çawa em nikarin aliyên Şoreşa Îslamê yên li hember zilmê û mêtîngeriyê ji nedîtî ve bên, aliyên sosyalîzmê jî di asta gerdûnî de yên li hember mêtîngerî û zilmê û heta li hember xeteriya ku mirovahi yekpare bi xeternakiyê re rûbirû ye ji nedîtî ve bên. Di vê rewşê de teqez karên ku bên kirin hene.

**Enternasyonalizmek Nû**
**Bi Sosyalîzmê Pêngavê Dide Pêkanîn**

Weke di dîrokê de bûye, cardin sosyalîzm dikare bi raveyek zanistî ya rêkûpêk ve bê gihandin. Dema em roja xwe dinirxînin, dê bê dîtin ku du serî, ango rikdarên beriya niha heyî hatine derbaskirin. Niha jî dibêjin seriyên Başûr û Bakur an jî cuda bi têgeh dikin. Çiqas mirovatiya ku hinekê weke pergal xwe îdare dike, li hember kapîtalîzmê nerehetî dijî hebe –netew, çînên bindest û hawirdorparêz jî di nav de-, divê para van hemûyan a şirîk bê dîtin. Di dîroka sosyalîzmê de heman weke Enternasyonalîsta Yekemîne. Ya ku vê dixwest ser bixe ne ji netewekê, yekîtiya karkerên ji hemû netewan û ji vê jî zêdetir sazkirina yêkîtiya bîrdozî bû û ya rast jî ev serxist.

Enternasyonala Duyem hinek din xwedî damezirîniyek girseyî û bidestxistina desthilatiyê bû. Lê ev ser nexist û jixwe ji ber vê sedemê hat derbaskirin. Şûna wê Enternayonala Sêyemîn ku pêşketî jî enternasyonalîzma sosyalîzma dewletbûyî bû. Lê wê jî dewletbûn xirab bikar anî û ji ber ku pêwendiya sosyalîzmê ya bi dewletê re rast çareser nekir derbas bû.

Belê, niha pêdivî bi damezirandina enternasyonaliyek nû heye.

Jixwe asta nîqaşên heyî jî her ku diçe vê dixe rojevê.

Divê neternasyonaliyek sosyalîst a çawa çêbe?

Enternasyonaliyek sosyalîst a bê damezirandin, pêwîste bi gelemperî di asta gerdûnî de rewşa mirovahî, sosyalîzmek bi bername ya li gorî her netewê, heta her parzemînê û herêmê hatiye sazûmankirin û heta ji bo her netewê di nava netew de li gorî çînayetî hatiye sazûmankirin sosyalîzmekê esas bigire. Ango ev tê wateya pêvajoya ji nû ve damezirandinê û ev jî di rewşa qonaxan de ye. Jixwe rêgeza sosyalîzmê jî eve. Wexta li cihekê qonaxek hat sazkirin, dikare li cihek din jî qonaxek din bê sazkirin.

Mînak pêvajoya yekîtiya bîrdozî, pêvajoya dewletbûnê, ji ber pirsgirêkên ceribandinê pêvajoya derbasbûnê, pêvajoya ber bi sosyalîzmek hîn tenduristî ve çûyîn bê hesibandin. Divê ev ecêb neyên dîtin, dê ev berdewam bikin û biçin.

Ya girîng pirsgirêkên sosyalîzmê di nava rojaneya wê de rast girtine. Ev bi xetên giştî ve, dikare weke sosyalîzm û dewlet, sosyalîzm û pêşveçûn, sosyalîzm û dilxweşî, sosyalîzm û pirsgirêkên netewî, sosyalîzm û çand, sosyalîzm û aborî, sosyalîzm û sosyalîzma pêkhatî, sosyalîzm û utopya, sosyalîzm û zanist, sosyalîzm û ol, sosyalîzm û malbat, sosyalîzm û jin, sosyalîzm û mafê çarenûsa xwe bi xwe rêvebirina netewan, sosyalîzm û demokrasî, sosyalîzm û pêwendiyên partî bê rêzkirin. Neçare ku ev hemû ji nû ve bên nîqaşkirin.

Ango bîrdoziya sosyalîst bi xwe jî dikare weke têgeh ji nû ve bê sazkirin, piştî her ku çû ev têgeh zelal bûn dikare bi bername bibe, piştî bi bername bû dikare ji nû ve bê birêxistinkirin û divê derbasî çalekiyê bibe. Wê pêşketina misoger bi qonaxên wisa re çêbin. Dibe ku niha rewşek wisa pir bi îdîa tine û hinek nîqaşên teng û seresere hene. Lê her ku biçe wê heman weke enternasyonalên yekemîn, duyemîn û sêyemîn, ya çaremîn û pêncemîn jî pêş bikeve.

Wexta em bîrdoziya sosyalîst, desthilatbûn û polîtîkbûna wê bi xalên giştî ve digirin dest, niha em dikarin li rastiya xwe vegerin. Em li vir têgeha polîtîka jî ronî bikin. Yeqîn dikim mijarek hûn pir zehmetî dijîn jî polîtîka ye. Weke ku we polîtîka mîna têgeh pênase nekiriye, rewşa pêşketinek polîtîk jî zêde nas nakin. Ya rastî ji bo bîrdozî jî rewş wisa ye. Min hewl da têgeha bîrdozî ronî bikim. Her kes dikare di

pêşketina xwe de bibîne ku hûn çiqas dikarin vê têbigihin, li gorî xwe encam derbixin û hêza we têrê dike xwe bi bîrdozî bikin.

Lê min ev jî pir vekirî got: Heta hûn pêşketina bîrdozî saz nekin, nikarin ji heywanbûnê rizgar bibin. Her wiha ev civak jî xwe bi bîrdozî neke, nikare ji belavbûnê rizgar bibe. Civakek bê bîrdozî, misoger nikare xwe ji civakbûnek hoveber, nexweşî û rûxiyayî rizgar bike. Pênaseya wê ya ji bo kesekê jî hatî kirin, bi heman şêweyî ye. Hûn devjê berdin bi serê xwe yê hoveber û xerîzeyên xwe ve şoreşê bikin, nikarin xwe jî bidin jiyîn.

Hemû hêz û mezinbûna min, çavkaniya xwe ji avakirina min a bîrdozî digire.

Jixwe rewşa min a bîrdozî ku pêşde ye, min dike Rêber. Asta rêbertiya bîrdozî, ji ber ku rastiya civakî hat dahûrîn, nexasim dahûrînên me pêkana afirîneriya sosyalîzma zanistî ne, ez jî hîn bihêztir kirime. Bi temamî bîrdozîne û wexta bîrdoziyek wisa bi polîtîkbûnê re jî bê meşandin, dê ev bibe hêzek pir mezin.

Vaye ger li vir polîtîka bê pênasekirin, qonaxek ji bîrdozî ber bi civakbûnê ve derbasbûne. Polîtîkbûn jî fikra bûyî hêze, rêxistinbûne, bûna propaganda û bûna malê civakê ye. Rêbertiya bîrdozî fikra ku ji bo civakê hewce derdixe holê û wê li ser hîmên rast pênase dike. Ji vir û şûn ve pirsgirêka wê ya berfirehbûnê, birêxistinbûnê re tê çareserkirin. Navendên rêxistinî, kargeriyên rêxistinî di encamê de bi qasî karî girseyê tevlî xwe bike, vediguhere hêzê û ev jî polîtîkbûne.

Me polîtîkbûn, ya bîrdozî hewce dibîne di bingeha danasînên bernameyê de bilêv kiribû. Ger bi girseyî be –ev jî birêxistinê dibe- û dema rêxistin vê dike jî serî li çalekiyê dide. Çalekî dikare hem di asta leşkerî hem jî siyasî de bin. Ya rastî em dikarin bi çekbûn û bikaranîna çekên agir weke polîtîkbûn binirxînin.

Yekser vê jî bêjim; leşkertî jî tam polîtîka ye. Heta leşkertî raveya polîtîkbûna lêhûrbûyî ye. Bila ti kes leşkertiyê weke saziyek ji polîtîkayê qut nebîne. Asta polîtîka ya zêdetir hûrûkûr, şêweya ku bi çek û leşkertî tê kirine.

Leşkertî polîtîkaya pêşketî ye.

Ti xisleta wê ya ji polîtîkayê cuda û şûna wê bigire nîne. Ya rastî polîtîka jî fikir û bîrdoziya pêşketî û lêhûrbûyî ye. Hîn zêdetir şêweya fikrê ku bûye malê civakê ye.

Mînak dema em di çarçoveya rastiya Kurd de digirin dest, derdikeve holê ku pêdiviya Kurdan a bûna netew û rizgariya netewî heye. Ji bo rizgariya netewî pêdivî birêxistinbûnê, ji bo rêxistinê redkirina rêxistinbûna mêtîngerî û dewletê û ji bo vê jî pêdivî bi çalekiyê heye. Ango neçare bibe rêxistinek çalekger. Niha ev danasînên bîrdozî ne û em jî van danasînan pêk bînin. Pêşî em partiya wê damezirînin, paşê rêxistinbûn û çalekiya wê pêş bixin. Di encamê de ya derdikeve holê polîtîkaye û hêzek polîtîke. Berjewendiyên bingehîn, pêşbîniyên bingehîn dibin hêza heyberî. Ango tu bipirsî; “Min çiqas da gel, çiqas rêxistin ava kir û çiqas derbasî çalekiyê kir” û pêwîstiyên wê jî bicîh bînî, di vê manê de tu dibî polîtîk. Di encamê de polîtîkbûn, weke gelek ji we dizane ne zimandirêjî ye.

Te çiqas girse birêxistin kiribe, çiqas mirov perwerde kiribe, çiqas birêve biribe, tu ewqasî polîtîkî. Têgehên weke berjewendiya netewî yên giştî, dewleta netewî, şoreşa netewî weke bîrdozî tên ravekirin û bi bernameyan ve tên girêdan. Ya peyre pratîke û ji vê re jî taktîk tê gotin. Propaganda bikin, birêxistin bikin, yek-du xwepêşandanan lidar bixin, çend çalekiyên mezin lidar bixin. Vaye ev jî pratîke, xebata polîtîke û polîtîkbûne. Ger hûn vê bikin, hûnê polîtîk bin. Di vê watê de polîtîkbûn, veguhertinek hêzbûna ji bîrdozî û ji rastiyên wê ye.

### Di Sosyalîzmê De Rastiya Rêber û Milîtan

Dikarim li vir xwe mînak bidim. Min pêşî rastî diyar kirin. Yekemîn pirsgirêka netewî; dema min di pirsgirêka netewî de partî, di pirsgirêka netewî de bernameya partiyê û di pirsgirêka netewî de mîna vê hinek danasînên din ên bingehîn kirin, piştî wê derbasî propagandeyê bûm. Rastiyên civaka Kurd ên jiyanî hene. Min ji bo wan qîr û hewar kir. Vaye ev propaganda ye û ajîtasyone. Peyre ji ber ev têrê nekir aresteyî rêxistinbûnê bûm, peywira nûnertiya didim hinekan, peywira avakirina komîteyan didim hinekan, sazûmankirina xwepêşandanan didim hinekan û çek didim hinekan daku rêgezan bidin pêkan. Ev jî her ku çû bû tevgerek polîtîk, leşkerî û ez jî ji

îdeologekê bûm propagandevanek, ajîtatorek û çalekgerek. Bi gelemperî îdeolog li ser masê dimînin hinek tiştan derdixin holê û milîtan jî vê berfireh dikin. Lê hûn jî dibînin, ji ber di nava me de zêde milîtan tine ne, hema bêjin ê bîrdoziyê derdixe holê jî û berfireh jî dike heman kese. Demek dirêj di nava me de wisa bû. Lê belê ji ber ku ev tam nehatin fêmkirin, sînordar ma, pirsgirêkên bîrdozî û polîtîk an jî weke pirsgirêkên rêxistinî yên polîtîk, ev pirsgirêkên cuda ne. Lê bal bidinê, pêşketina bi me re bi şêweyek şayanî kes xwe li gorî civakê û li gorî gel bi bîrdozî dike, paşê jî wê ber bi heta îlana partiyê ve dibe û ji bo pêkanîna pêdiviyên wê jî heta dawî bi taktîkên guncav tevdigere. Xwedî şêwaza dîtina qadên ji xeteriyê dûre.

Elbet ev, heta ku perwerdeyek baş neyê girtin pêk nayê, ji ber ku mirov dikare bi bîrdoziyê perwerde bide mirov. Perwerde nebe, mirovê me belengazek di nava sînorên heywantiyê de belavbûyî ye. Lewma wê tu perwerdeyê esas bigirî û bi wê xurt bibî. Ger tu dixwazî mirov an jî xwe ji heywanbûnê rizgar bikî, dixwazî ji bûna kesek hoveber, zextê dibîne û tê mêtîngirin derbixî, wê tu xwe perwerde bikî. Perwerde dibe hêza te ya propaganda, bûna hêza rêxistinê û vebûna hinek jêhatiyên fikir û ruh ên mirovî. Ev jî xwe li derdora xwe ronîkirin, rêxistinkirin û bi şêweya derbasî çalekiyê bûyînê diyar dike. Hingê bi rastî jî tu dibî kesek perwerdekirî û rêxistinkirî. Elbet kesek wisa jî polîtîke û wexta hewce kir leşkere.

Girêdana polîtîka û leşkertiyê ya bi bîrdoziyê ve û girêdana bîrdozî bi asta heywantiya ku civak di navê de dijî pir vekiriye. Di rastiya Kurd de ev hîn şênbertire. Civaka Kurd, civakek ji bîrdozî û dilxweşî qut bûye, hatiye belavkirin û helandine. Bîrdoziyek wê kom bike, nûnertiyek vê bîrdoziyê ya xurt di kesekê de pêşxistin, peyre her çendî lewaz jî be bi partiyê re dana meşandin, ji ber ku pêdiviyek dîrokî pêşwazî dike ev lez derbasî civakê kirin û veguhertina tevgerek rizgarvan hatiye serxistin. Lewra her kes ber bi wê ve baz dide. Ev bi perwerdeyek ji rêzê û çalekiyek ji rêzê ve ber bi pir karkirinê ve dibe. Ji ber ku ev pêdiviyek dîrokî ye.

Nexwe divê hûn polîtîkayê hîn baştir fêm bikin. Ango pir vekiriye, girêdana polîtîkayê bi bîrdoziyê, bîrdozî jî bi asta rûxîna civakê ve

heye û peywirdarê derbaskirina vê ye. Vekiriye ku polîtîka jî amûra vê ya herî bingehîne. Ango bîrdozî dibêje, polîtîka dike yan jî îdeolog dibêje, milîtan derbasî çalekiyê dibe. Heta ger hûn leşker bin, divê bi şêweyek lêdana xurt derbasî çalekiyê bibin. Lê çalekgeriyek bi serê xwe çêbe, ancex hûnê weke gundiyê ku dar dihejîne bihejînin û winda bikin. Weke tê zanîn di pevçûnên gundiyan de hemû gundi û eşîret lewaz dikevin. Ji ber ku bîrdoziyên wan nîne, armancên wan nîne, erk û hedefên wan ên civakê yên bingehîn tine ne. Di vê rewşê de şerkeriya Kurd, şerkertiyek xwe bi xwe tine dike.

Gelek ji we di jiyana xwe de propagande dike, lê belê ji ber asta van propagandeyan ji xisleta bîrdozî ya bingehîn qute yan fesadî yan jî zimandirêjî ye. Mînak ez jî pir daxivim, lê pir jî serkeftî me. Ji ber ku axaftinên min, bi temamî girêdayî berjewendiyên bingehîn ên civakê ne. Kesek nikare min ber bi fesadî û gotinek ji berjewendiyên bingehîn cuda ve bibe. Jixwe ez vê firsendê nadim. Hemû axaftinên min girêdayî berjewendiyên bingehîne. Lewra propagandevanek pir başim, hem jî îdeologek baş û di encamê de bibandorim.

Hûn çima nikarin bibandor bin? Ji ber ku hûn zêde ne bi bîrdozî ne. Weke ne bi bîrdozî ne, rêbazek we ya propagandeyek bi şêweya fesadî heye. Ji ber ku di xebatên xwe de weke gundiyan, ehbap-çawîş dimînin, zêde pêş nakevin. Di encamê de asta milîtanê di jêr de, bêperwerde, bêrêxistinî, lewaz û asta qutbûna ji bîrdoziyê derdixe holê.

Rastiya vê ya di nava têkoşîna çekdarî de diyar dibe jî, çek bi keyfa xwe bikaranîn, taktîk nepêkanîn û rastiya milîtanê dervî taktîke. Her wiha weke min gotî, li vir bîrdozî rê dide nasîn. Ne propaganda û polîtîkayê dizane, ne jî rêxistinê dizane, lê çek girtiye destê xwe. Elbet wê di vê rewşê de li xwe bide. Jixwe piraniya we jî wisa kir. Lê belê rêya derbaskirina vê jî pir vekiriye. Li hember kesên ku gel dixin hene, pêwîste zimanek bîrdozî û şêwaza wê ya polîtîk bê bikaranîn. Hûn jî dizanin, her tişt bi çek nabe. Ji bo bikaranîna çek jî pêşî pêwîstî birêxistinê heye. Ger her kes bi serê xwe çek biteqîne û bêje; “Keyfa min bixwaze ezê çek bikar bînim, bikar nayînim, çalekî bikim û

nekim", ev encama herî xetere û ji bo wisa nebe jî rêxistin hewce ye. Ango pêşî wê tu bibî rêxistin, pêşî bibî rêxistinek ku bi bernameyê û partiyê ve girêdayî. Ger rêxistinek li gorî vê dîsîplîn bidest xistî çêbe û girêdana vê jî bi armancên bingehîn ve baş bê çêkirin, hingê dikare behsa serkeftinê bê kirin.

Niha ez dibêjim; "Armancên netewî û çînî, mirin û mayîn nebe, ez jî nabim." Ger hûn jî dixwazin min fêm bikin, ez beriya her tiştî îdeologekim, berjewendiyên armancên bingehîn ên netewî raçav dikim û her kesî bi armancên netewî ve girê didim, vêdibêjim û vê raçav dikim. Vaye rêberê netewî eve û hêza xwe jî ji vir digirim. Dibêjim ku partî hewce ye û rêgeza partiyê raçav dikim. Dibêjim ji bo partî rêxistin, ji bo partî milîtan hewce ye û ava dikim. Vaye asta netewî ya bingehîn û asta siyasî ya milîtaniya partiyê wisa çêdibe. Dibêjim ku, dê wisa propagandevan be, wisa bibe hêz û xeta partiyê wisa birêxistin bike û bimeşîne. Bi vê nêzîkbûnê paşê dikare leşkertî jî bê kirin. Pergalê pêk tîne, dîsîplînê pêk tîne, çek jî li gorî rastiyan û di cîh de tê bikaranîn. Ev jî tê wateya xeta leşkerî ya herî baş. Pêkhatina têkoşînek leşkerî ya baş, tê wateya artêşê. Kurtasî ger hûn van pirsgirêkan wisa di nava hev de bibînin, hûnê baştir bikarin li ser rastiyan hukum bikin.

## Cîhan Dabeşkirina Du Serî Ne Raste û Ev Hatiye Derbaskirin

Ji bo şoreşa Kurdistanê jî ger rewşa polîtîka ya rojaneyî bê ravekirin, em dikarin yekser bêjin, me berê ev pir berfireh dikir, heta me li gorî sosyalîzma pêkhatî dikir. Ev ne şerm û ne jî şaş bû. Lê em

niha nikarin bi heman şêweyî bikin. Mînak di manîfestoya me de weke; “Cîhan, cîhanek wisa ye, aliyek wê wisa, aliyê wê yê din jî rewşên wisa hene. Cîhanek emperyalîst-kapîtalîst a wisa, cîhanek sosyalîst û hêzên rizgariya netewî ya wisa heye” tê vegotin. Elbet em niha vê pênaseyê derbas dikin.

Nexasim piştî salên 1990’î, pênaseyên wisa zêde nerastin. Tê xwestin cîhan hinek din bi raveyek gelemperî bê nirxandin. Lê em dikarin rastiyê çawa diyar bikin? Hinek vê weke nakokiya Bakur û Başûr datînin holê. Ev jî binavkirinek çorse û cîhan wisa weke Bakur û Başûr cihekirin jî zêde neraste. Lê dîsa jî ger em di wateya gelemperî de bêjin nakokiya bingehîne –jixwe pêdivî bi têgehek wisa heye- dibe. Dikare rewşa yên li jor bi hêzên pergala emperyalîst, yekdestdarên kapîtalîst ên areste dikin re, yên rewşên wan bi vê xirab dikin, bi şêweya nakokiya Bakur û Başûr bê bilêvkirin. Dikare weke netewên serdest û bindest an jî çîna mêtînger û mêtînkirî jî bê pênasekirin. Li gorî min ewqasî negirînge.

Lê belê ev derket holê: Weke di sosyalîzma pêkhatî de çêbû, Başûr bike du serî, heta di nava van herdu seriyan de her tişt ji bo Sovyetan, bi polîtîkayên derve yên Sovyetê ve girê bide û peyre jî bêje; “Her tişt girêdayî vê ye!” Yan jî bêje; “Êdî têkoşîna li dijî emperyalîzmê jî girêdayî vê ye û kî berovajî vê bikeve, ew ne sosyalîste!” Bi rastî jî berê ev hat kirin. Jixwe ya şaş û xeternak jî ev xal bû.

Her tişt ji bo berjewendiyên Sovyetê, di nava berjewendiyên Sovyetê de jî ji bo berjewendiyên Rusya bû. Ger her tişt ji nirxandina nivîsgeha polîtîk re bimîne, wê misoger her tişt xeter be. Pir vekiriye ku dê têkoşînek vê ya serkeftî bi emperyalîzmê re jî çênebe. Weke hat dîtin ev di kesayeta Gorbaçov de hat fêmkirin, dê bikare xwe ber bi nokeriya kesek weke Reaganê kevneperest ve berde. Kesek weke Yeltsîn diçe û hewl dide ji mîrateyên kapîtalîzmê sûd werbigire. Me hinekê sedemên vê vekirin.

Êdî nirxandinek cîhanê ya wisa ne watedare. Ango cîhan wisa weke du seriyan cihekirin û navberên mezin vekirin zêde neraste. Jixwe vekiriye ku, kapîtalîzm ji vê sûd werdigire.

Me beriya niha diyar kiribû ku, nirxandinên sosyalîzma pêkhatî, bi gelemperî dîroka têkoşînên civakî jî xetimandiye. Di heman demê de têkoşîna sosyalîst jî xetimand û pêvajoyek şêst-heftî salî ya bêhndanê da kapîtalîzmê. Li şûna cihetiyek wisa û dijwar sînor danîn, hunandina dîwarê Berlînê, di nava hev de biman, wê ji hêla gelan û netewan ve encam hîn erênî bûya. Jixwe, pêdiviya sosyalîzmê bi dîwaran nîne. Berovajî pêdiviya wê heye ku dîwaran hilweşîne. Lê mixabin welatên sosyalîst, ji welatên kapîtalîst zêdetir û heta ji rêgezên wan ên netewperestî hîn sitûrtir dîwar hunandin. Ji ber ku sosyalîzm ne rejîmek wisa xwe bi kelhan biparêzê ye. Di serdema navîn de kelh hene. Dîsa dema kapîtalîzm hat damezirandin, dewletên kapîtalîst xwestin qadên xwe yên netewperest û mêtînger bi çîtan biparêzin û dîwarên gûmrûkan bilind kirin. Vaye ji aliyê sosyalîzmê ve ji van dijwartir avakirina kelhan, hunandina dîwaran weke ku hilbijartinek şaş bû, yaku hewce dikir bê kirin berovajî êrîşkirina bi ser dîwarên kapîtalîzmê de bû.

Kapîtalîzmê mirov bi şêweya çîn û qabîle dabeş kiriye, gelek tebeqe ava kirine. Ya herî rast bi demokrasiya sosyalîst û însiyatîfa sosyalîst bi ser van de çûyîne. Vaye dê mirovên wisa sosyalîst bihatan pêşxistin û ev mirov li her cihî bihatan belavkirin. Ewrûpa û Emerîka bi temamî şêwazek kapîtalîst li ser mirovê xwe serdest bû û ev jî bû sedem ku kapîtalîzm xwe bigihîne hêza qet para wî neketiye. Ev bi temamî ji ber siyaseta sosyalîzma Sovyetê ya hunandina dîwarên bê wate çêbû û di encama vê de jî heftî salî pir tişt dan windakirin.

Niha ev tê derbaskirin. Divê mirov vê xirab jî nebîne. Dema Sovyetan hilweşiya, em nikarin bêjin bermahiyên sosyalîzmê qet li wir nebûn. Berovajî me got pirsgirêkên kapîtalîzmê giran dibin û ev jî piştrast dibe. Her wiha derketina zemînek sosyalîzma hîn bi tendurist jî mijara gotinê ye. Ev niha baştir tê fêmkirin. Hilweşîna birokrasiyan dibe pêşketinek hîn baştir û mirov cardin beşdarî hev dibin. Ev beşdarbûn hewce ye. Ji ber di navbera herdu aliyan de kendal bên hunandin, dikare bi bombeya atomê gef li mirovahî bê xwarin û dîneharek kapîtalîzmê pir rehet dikare atomê bikar bîne. Jixwe Emerîka bikar anî. Ev jî tê wateya dawiya mirovahiyê. Tenê ji bo

xeteriya atomê jî be, wê tu mirovan çawa biparêzî? Wê tu têkoşîna çînî heta nava Emerîka dirêj bikî û mirovahiyê wisa di nava hev de bijî, daku ji bo kapîtalîzmê nebê hedefa bombaya atomê. Ango rêya yekane ya çeka atomê bêkar hiştin, bi gelemperîkirina sosyalîzmê û kirina para her netewê ye. Tenê ji bo vê xeteriyê jî diyar dibe, wisa dabeşbûna du serî zêde neraste û wê rê ji çewtiyên weke bombeya atomê ya sosyalîzmê û bombeya atomê ya kapîtalîzmê re neyê dayîn.

Hewce dike sosyalîzm bi temamî bibe malê civakê, mirovê her cihî, mirovên li welatên kapîtalîst, mirovên li welatên bindest. Wê bibe malê wan, lê ne weke ew dibêjin; “Aliyek evqasî sosyalîste, aliyê din jî evqasî nesosyalîste”, pêwîste ramanek hewsengî hebe.

Tu dikarî bibî dewletek sosyalîst jî, lê belê wê pêwendiyên te bi her kesî re hebe. Heta wê pêwendiyên te bi Emerîka re jî hebe. Ev pêwendî ne radestbûn an jî xwestina kapîtalîzmê ye. Ev pêwendîne, taktîkin û her demê jî hewce ne. Wê di vê pêwendiyê de hem ew te bandor bike, hem jî tu wî bandor bikî. Dê ew bixwaze di nava te de komek hevkar-kapîtalîst ava bike, wê tu jî bixwazî di nava wî de komek sosyalîst ava bikî. Dê ew bi te ve girêdayî be, wê tu bi wî ve girêdayî bî û ev ya herî bi tenduristî ye. Ev jî rê nade şerên girseyî û îmhayê, her wiha dê rê ji pêşketinên giştî re veke. Ne tenê ji bo pêşketina netewekî, wê derfeta ku hemû netew bi hev re pêş bikevin ava bike. Li Sovyetê bi sosyalîzmê re netewa ku zêdetir pêş ketî, netewa Rus bû, netewên din li paş man. Heta ji dervî Sovyetê, ji gelek cihên din jî paşdetir man. Lê belê di cewhera sosyalîzmê de netewek, heta di nava netewekê de çînek li dijî yê din pêşxistin nîne. Di sosyalîzmê de ya esasî pêşketinek mirov a hevseng û pêşketinek civakê ya hevseng heye.

## Sosyalîzm Wesfe,
## Pirsgirêka Mirov a Xwe Bi Civakî kirinê Ye

Di vê manê de pêwîste rewşa polîtîk a rojaneyî bê nirxandin. Hewce nake ku mirov xemgîn bibe û bêje; "Vaye evqas serûbûn çênebûn." Berê ji sêya yekê cîhanê sosyalîzm bû! Têgehek weke berî her tiştî ji sêya yekê cîhanê, ji çarê yek, an jî ji şeşê yekê cîhanê sosyalîste jî, zêde neraste. Sosyalîzm ne pirsgirêka hejmarî ye. Ji ber ku ji sêya yekê cîhanê yan jî ji şeşan yekê cîhanê sosyalîste, em ê xwe nexapînin.

Di rastiyê de sosyalîzm wesfe, pirsgirêkek mirov xwe bi civakî kirinê ye.

Bila deh mirov xwe bikin sosyalîstên baş, dibe ku ji şeşan yekê cîhanê zêdetir wê cîhanek sosyalîst derbikeve holê.

Lewra mirov nikare sosyalîzmê bi têgehek erdnîgarî şîrove bike. Heta nêrînên weke; "Evqas mirov di bin bandora sosyalîzmê de ne" kirin jî, serkeftina sosyalîzmê nade diyarkirin. Serkeftina sosyalîzmê bi mirovê pêkhatî re tê diyarkirin. Ev jî ne hejmarî ye, pirsgirêka wesfê ye. Navendek ji deh kesan pêk tê yên pir baş nûnertiya sosyalîzmê dikin, ji deh milyon sosyalîstên gêjbûyî, yan jî ji hemû mirovên di bin bandora kapîtalîzmê de zêdetir bihêzin. Ger di nava her netewê de navendek wisa bê sazûmankirin, ev ji şeşan yekê cîhanê ku sosyalîstin baştire û hêjatire. Ev hem gengaze, hem jî ya raste. Pêdivî bi têgehên wisa heye. Ango ya hewce li her derê mirovê sosyalîst bê ku cihetiya netew bê kirin, derxistina holê ye.

Pergala sosyalîst a bilind an jî li ser vî bingehî ger raveyên weke li ser gelan serwer, çarenûsa gelan areste dikin, mirovê wesifdar bi hevsengî, rastî jî bi baldariya bîrdozî ve bê pêşxistin û ev di asta navnetewî de weke bombeya atomê li hember xeteriyên mezin ên ku kapîtalîzm li ser mirovahiyê ferz dike bi sazî bike, pişgiriya partiyên ku polîtîk bûne û enternasyonalîst pêş bixin, ji rastiya weke beriya niha di sosyalîzma pêkhatî de çêbûyî, gotinên nepixandî yên weke; "Me evqas rizgar kir, em evqas din jî beşdar dikin" hêjatire. Elbet ev

nayê wê wateyê dibe ku sosyalîzm li her cihî xurt be. Lê ya herî xeter li cihekê sosyalîzm xurt be û li cihekê jî sosyalîzm qet nebê, ev jî jirêderketinê rave dike, bi temamî nabe sosyalîzm. Ango sosyalîzm bîrdoziyek wisa ye, dema te ji rewşek weke ji aliyekê ve sosyalîzma gelemperî, ji aliyê din ve jî bi gelemperî ji faşîzmê re rê vekir, dê tu bi destê xwe wê vale derbixî. Ev ji bo partiyekê jî derbasdare. Beşek pir sosyalîst, beşek jî pir gundi be, tê wê wateyê te ew partî qedandiye. Ango di cewhera sosyalîzmê de pêşxistinek hevsengî heye.

Dema mirov li sosyalîstiya min jî dinêre, wê bê dîtin ji bo di nava partiyê de partiyek sosyalîst ava bikim şerek çiqas mezin dimeşînim. Ji bo li Kurdistanê di pêşengiya PKK'ê de rê ji pêşketinek sosyalîst re vekim, çiqasî di yek mêzînê de bi xwe re pêş dixim. Rastiya sosyalîzmê wisa ye.

Mînak, ez dikarim bibim sosyalîstek birokratîk! Weke Çepên Tirk ên bi temamî bûne birokratîk, dikarim du gotinan bikim û paşê jî bihêlim an jî komekê ava bikim û yên mayî jî weke birekê îdare bikim! Lê ji ber ku feraseta min a sosyalîstî vê napejirîne, di kesayeta xwe de qet cîh nadim van.

Sosyalîzm bi gelemperî, bi temamî asta partiyekê ya sosyalîst rave dike.

Asta sosyalîstbûna partiyekê, divê asta azadiya girse diyar bike û vê wisa jî derbasî nava qada nav-netewî bike. Ji ber ku ez jî xwe girêdayî pênaseya sosyalîstek wisa digirim dest, min karî bibim sosyalîstek rast û karbidest. Di mijara dema hemû sosyalîstên birokratîk dihilweşiyan, heta hemû serkêşên dewletan dihilweşiyan de, min çawa xwe bihêz kir, gelek dersên ku bên derxistin hene. Jixwe her kes dipirse; "Sosyalîzma kevin rûxiya, Stalînîzm rûxiya, lê tu çawa weke sosyalîstê dawî li ser piyan mayî?" Ya rastî fêm nakin em sosyalîstek çawa ne. Em sosyalîstên pêkhatî, sosyalîstên birokratîk, sosyalîstên feodal, sosyalîstên burjuvaziya biçûk qet nas nakin an jî çi nêz û çi jî dûr ti eleqeya me bi wan re nîne. Berovajî em di nava PKK'ê de, bi wan re têkoşînek pir dijwar dimeşînin. Komek axa, burjuvaziyên biçûk û gundiyên PKK'ê yên xwe sosyalîst dibînin hene.

Me li hember hemûyan têkoşînek dijwar meşand. Di encamê de ya pêk hatî, sosyalîzma PKK’ê ye. Jixwe ev jî hêj dijî.

Her kes dizane ku PKK, bi asta dahûrîn û asta pêkhatinê re hema hema di asta nav-netewî de xwedî hêza rol lîstinê ye. Me ev pêk anî. Bi feraseta sosyalîstiyek rast ve nûnertiya rêbertî, nûnertiya gel, nûnertiya partî û nûnertiya demokrasiyê pir baş hat kirin. Bersiva herî rast ji pirsgirêkên mirov ên bingehîn û ferzkariyên kapîtalîzmê re hatin dayîn. Vaye ev jî pêşketineke.

Em dikarin pir rehetî bêjin ku asta me ya çareserî û asta pêkhatina wê, di wateyekê de serkeftina sosyalîzmê rave dike. Ne hûn ne jî dijmin nikare vê înkar bike. Ji ber li holê ye ku min ev çawa pêk aniye û hatiye selmandin. Min bi van ferasetan, helwest û reftaran û şêwaza têkoşînê ve pêk anî.

Ez jî mirovekim, lê mirovek çawa? Mirovek girêdana xwe bi bîrdozî, girêdana xwe bi polîtîkaya pratîkî ve, girêdana xwe ya têkoşîna bi kapîtalîzmê re, girêdana xwe bi mezinkirina mirovên bindest ve, ango bi qasî hûn dikarin bihizirin, mirovek gelek girêdanên xwe heyî me. Di encamê de sosyalîzma ku pêk tê dahûrandin di şênberiya PKK’ê de, di nava rastiya gelê Kurd de, her ku diçe pêşketinek di herêmê de bibandor dibe û di qada nav-netewî de jî deng vedide. Kurtasî rewşa polîtîk a nav-netewî û di derbarê asta dahûrîn û pêkhatina di nava PKK’ê de ev dikarin bên gotin.

Di vê vegotinê de, weke ku rê ji pesindanên vale re nayê dayîn, rê ji rewşek bi bazdan û dana bazdana gotinên weke; “Êdî sosyalîzm hilweşiya –ev di çepên Tirk de pir diyarkere-, ya mayî rêya kapîtalîzmê ye” re jî nîne. Em ne weke berê ji ber sosyalîzma hatî damezirandin ji hiş çûbûn, ne jî dema hilweşiya kêfxweşiya me têk çû. Berovajî, em hîn baştir û watedar bi ser rêya xwe de çûn. Me her tim hem bawer kir nirxek pir bilind a dahûrînên me heye û hîn baştir pêkhatina vê jî sosyalîzma ku hewce ye, hem zanî û hem jî di vir de israr kir. Di encamê de çepgiriya sexte an jî birokratîk, çepgiriya sosyalîzma pêkhatî jî hatin derbaskirin û carek din nekarîn xwe kom bikin. Lê me her roj pêşketin li ser pêşketinê saz kir. Ger em bi vê lezê biçin, bi rastî jî pênc-deh sosyalîstên xurt, şêwaza me ya rêbertiyê esas

bigirin, ne faşîzma Tirk dimîne, ne jî paşverûtiya Rojhilata Navîn dimîne. Heta ger sosyalîstên hîn bi îdîa derbikevin, heman şêwaz û tempoyê ew jî li gorî demê û cîh pêk bînin, bi şêwaza têkoşînek guncav ve bimeşînin, dê ev jî bibe enternasyonalîstiyek mezin.

Em heta dawî hewce dibînin ku dilnizm bin. Lê ger hinek jî bizanin bi vê şêweya pêk hatî ve girêdayî bimînin, negengaze ku nirxa wê ya enternasyonalî neyê hizirîn. Asta ku me di şênberiya Kurdistanê de pêk anî, pir rehet dikare derbasî pêkhatina qada Rojhilata Navîn bibe. Jixwe hema yekser dikare derbasî qada Tirkiyê bibe. Di encamê de ev jî hejandina qada nav-netewî ye. Dikare ji ezmûna Bolşevîk zêdetir, di dîrokê de cihê xwe bigire.

Lê belê em niha bi astek netewî, heta nava partiya xwe ve mijûl dibin. Dev ji nava netewên din berdin, heta asta polîtîk ên cuda yên Kurdistanê berdin, em bi pêkanîna asta xwe ya hundurîn ve mijûl dibin û ya rastî jî wisa ye. Heta ez di nava PKK'ê de yek bi yek kes ve mijûl bûm, bi xwe re mijûl bûm û bi milîtan ve mijûl bûm. Jixwe ev ya herî rast û encamgir bû.

## Em Rast Dihilberînin, Dijîn Û Têdikoşin

Dahûrîn heta dawî di asta kesayet de ne. Hema hema hemû ziraviyên kes hatine destgirtin. Derket holê ku ev şêwazek raste. Jixwe sosyalîzm bîrdoziya herî zêde bi mirovan re eleqedar dibe, dûrî dogmayane û derfet ava dike ku mirov ji her alî ve bê dîtin. Me jî wisa wate da vê û pêk anî. Di encamê de me ji mirovê ku bûye girêka kor û gihaye asta heywanbûnê, di nava PKK'ê de her ku çû xwe gihandina asta mirovek ku bilind dibe û qabîliyeta çareseriyê pêş dixe pêk anî. Di nava PKK'ê de her ku xwe gihandina vî mirovî pêk hat, xwe gihandina asta netewî, gihandina asta çalekî û derbaskirina şerê taybet ê faşîzane yê herî xedar pêk hat. Ev jî pêşketinek pir mezine. Ev hatiye selmandin. Nirxa mezin a asta nav-netewîbûna wê jî ji vir tê. Ji ber ku li pişt şerê taybet ê Tirk a tê ferzkirin paşverûtiya Ewrûpa, Emerîka û Rojhilata Navîn heye û ew jî kêlî bi kêlî li benda serkeftina vî şerê qirêş bûn. Lewra şerê ku me di nava PKK'ê de meşandî, şerek mezin a enternasyonalîste. Aliyê wê hem netewî, hem jî enternasyonalî heye. Aliyê wê yê netewî li dijî helwesta mêtîngerî ya îmhakirina netewî ye, aliyê wê yê enternasyonal jî li dijî her cure hêzên şerê taybet ê faşîzan xwedî dikine. Elbet ev jî nirxek mezin a enternasyonalîste.

Di nava me de mirov di heman demê de hilberînê pêk tîne.

Ji ber di qonaxên partiya me yên bingehîn de nêzîkbûna afirîner heye. Her qonaxek bi rasteqînî nirxandin, destnîşankirina peywiran, li gorî wê mirovên me perwerdekirin, mezinkirin û dana şerkirin di meriyetê de ye. Encam jî, rêxistinek ku PKK'ê bin naxe yan jî weke partî domandina pêşketina xwe ye. Di nava wê de feraseta milîtanê rast û feraseta rêbertiya rast heye. Ev jî her ku diçe ber bi ferasetek fermandariyek rast û ferasetek leşkertiya rast ve dibe. Ger ev nêzîkbûn ji her alî ve bi kûranî bê domandin, dê rê ji artêşek pir mezin re jî veke. Artêşek gel a mezin ku li Kurdistanê pêş bikeve, artêşek gel a ku Rojhilata Navîn bihejînê ye. Wê ev artêş demokrasî, sosyalîzm û di encamê de enternasyonalîzmê bîne.

Ev pêş dikevin. Ya girîng ev ji aliyê me ve selmandine. Mînak ez xwe, selmandinek mezin dibînim. Girêdana min a bi sosyalîzmê ve, xwe wisa selmandine. Ger mirovê sosyalîst, xwe wisa biselmîne, ev bersivek mezine. Jixwe ne tenê ji bo rastiya me ya netewî, di nava rastiya nav-netewî de her kes dikare me weke sosyalîstek rasteqîn pênase bike.

Hemû kapîtalîst tevî hemû hewldanên xwe nekarîn pêşketina me, yekser di kesayeta me de têkoşîna ku tê meşandin asteng bikin û hêza wan têrê nake. Kanî pergal belav bibû û sosyalîzm ji çav ketibû! Ger ev rast be, vêca çima nikarin min asteng bikin? Ji ber ku ez xwe rast dihilberînim, rast didim jiyîn û rast têkoşînê didim kirin. Li şûnek pir tengim, lê ya girîng ez çawa xwe rast mezin bikim, xwe bi îdeolog bikim, xwe bi polîtîk bikim, xwe bi gel bikim û xwe mirov bikime. Encama vê jî pêşketinek ku kes nikare asteng bike. Dîsa ev veguherî sala pêşketina herî mezin a ku di pênc-deh salên dawî de kapîtalîzm xwe pê serkeftî didît.

Qaşo sosyalîzma pêkhatî hilweşiya û kapîtalîzmê serkeftin bidest xist. Lê vêca me ser xist û ev jî ne ketobere.

Ya rastî ya ser ketî ne kapîtalîzme û ya winda kirî jî tenê rizînên sosyalîzmê bûn.

Dîsa di tevgerek weke me bi zorê tê jiyîn, hem ji aliyê kapîtalîzm, hem sosyalîzmê ve nayê erêkirin, lê pêvajoya van a hilweşînê weke

firsendek baş dinirxîne de, pêngavek sosyalîst a rasteqîn pêkanîn hatiye serxistin. Ev jî bi taktîkên têkoşînê yên guncav ve birêve birin, di rêbertiya PKK'ê de pêk hatiye. Ger îxanet lê neyê kirin, dê ev ast bi temamî, bibe asta ku serkeftinê bidest dixe.

Bi kesayetek sosyalîst a mirov pir baş şîrove dike ve, em gihiştin vê hêzê.

Ev serkeftinek mezin a mirovahiyê ye.

Deka pêkanek vê ya ji rêzê hûn bikin, bila bi hezaran pêkhînerên wê derbikevin. Vêca asta radeya serkeftina vê hûn bi xwe bihizirin. Lê hûnê kar bikin. Sosyalîzm karkirine, teorî ye, taktîke û mirovbûne. Nexasim di nêvengek weke me kirine heywan de, îdîa mirovê herî mezin, çareseriya mirov, tê wateya mirov ji nû ve xwe biafirîne. Bila hinekê jî hêza we ya pêkanîna modela me yan jî şêwaza me ya pêkanînê hebe, hingê hûnê bibînin asta serkeftinê çawa tê bidestxistin. Lê ev jî weke min gotî zanistiye, vîne, hêza ramane, pratîke, teorî û çalekî ye. Ger hûn bizanin van bi hev re û têkilhev li gorî qanûnan guncav, bi qasî stratejîk, ewqas jî heta dawî bi bingehên wê yên taktîkî ve girêdayî bigirin dest, nexwe hûn milîtanên saxlemin û ti hêz jî nikare vî milîtanî rawestîne. Heman weke nekarîn min rawestînin.

Elbet rola mirovekî ya dîrokî sînordare. Hûn nikarin wî ji xwezayê bilindtir bigirin dest û hemû sedsalan bi wî pênase bikin. Rola mirov a dîrokî heye, tenê wê dilîze û ya mayî jî yên din temam dikin. Heta di roja me de rêbertî saziyeke û rista wê jî heye. Milîtantî jî saziyeke û rista wê jî heye. Ger her kes rola xwe rast bilîze, wê ev kar hîn serkeftî be. Ger lingek jê bibe, dê bikule. Lewra em partiyek ku her kes rola xwe dilîze esas digirin. Ger enî, artêş, xebatên girse, xebatên leşkerî, rêxistinbûna navxweyî, zelaliya bîrdozî, xeta polîtîk a partiyê wisa bi hevsengî bê meşandin, negengaze ku ev partî yan jî saziya rêbertiyê ser nekeve.  Vaye ezmûna PKK'ya ku pêk tê eve.

Ger ji hemû aliyan ve nayê fêmkirin, ev nebesiya we ye. Ez ji we re dibêjim, rewşek ku pêk tê heye.

Vaye ez li qada nav-netewî dijîm.

Ma çima nikarin min yek santîmî ji cihê min der bikin? Berovajî her roj zêdetir bandora xwe pêş dixim. Ji ber ku nirxandina xwe ya

cîhanî, nirxandina xwe ya peywendiyan rast dikim. Sosyalîstek rasteqînim. Dizanim li kur-çawa tevbigerim, li kur-kîjan taktîkî pêş bixim, li kur-çawa dostaniyê ferz bikim, li kur-çawa îtîfaqan bikim, li kur-çawa dijber derbikevim. Min ev hemû bi rasteqînî pêk anîn. Vê jî bi ruh, zanebûn û gavên guncav ve dikim.

Ser dixim, ser dixim û dijîm. Tu nikarî bêjî; “Tu mûcîzeyekî, xeyalekî.”

Ez heta dawî bi zanistim.

Kesê pêk tême!

Li gorî we tevan, li gorî rastiya Kurdistanê, li gorî rastiya navnetewî, kesek ku dikarim baş bijîme. PKK jî partiyek ku, hewl dide bi me re wisa be. Ger vê serkeftina xwe paşve nexe, hinek di hundur û derve de wê bin nexe, wê şêwaza we zêdetir têk bibe, ev jî tam serkeftine. Ger hûn bikarin van rastiyan ji van aliyan ve bibînin, elbet dê berpirsyariyên we jî hebin. Ji bo asta bîrdozî, polîtîk û rêxistinî çi hewce bike, dê ew ji we bê xwestin. Dema we jî bersiva rast da vê, hûnê bibin beşdarvanek baş. Beşdarvanek baş jî, baş kar dike û serkeftinê saz dike. Lê ger hûn van paşçav bikin, seresere bêku pirsgirêkan bibînin, bêku rêya çareseriyê esas bigirin, wisa hêsan bêjin; “Bila serkeftin çêbe”, ev jî negengaze. Ger hûn girêdana xwe bi bîrdoziya zanistî û rêxistinbûnê ve qut bikin, serkeftinê danin aliyekê, hûn ancex dikarin bibin sedema binkeftinê. Jixwe ya bi gelek ji we re çêdibe jî ev rastiye.

Îro asta ku me di PKK’ê de girtî, hem pir karbideste, hem jî astek pêkhatina bîrdozî û polîtîk a dîrokî ye.

Nexasim dema em bi rastiya nav-netewî ve muqayese dikin, li hember sosyalîzma pêkhatî û partiyên komînîst ên fermî tine bûyîn, wê bê dîtin ku ya hêzek mezin bidest dixe û zêdetir bi îdîa, partiya me ye. Emê pesnê xwe nedin, lê yeqîn dikim em partiyek li gorî enternasyonalîzmê guncavin û herî zêde bi îdîa ne. Jixwe her ku pêş bikeve, wê ber bi serkeftinê ve biçe.

Şoreşa Kurdistanê, Şoreşa Rojhilata Navîne!

Şoreşa Rojhilata Navîn jî, di radeya nav-netewî de dê bibe şoreşek herî pêşketî û encamgir.

Dema em van hemûyan dinirxînin, min zêde pêwîstî pê nedît xalên weke bîrdoziya olî jî di roja me de dixwaze bibandor be, lêkolîn bikim. Heta ev xal xwe bi rojane dike û dibe partî, lez jî ber bi desthilatiyê ve diçe. Ev jî xalên girîng, hêjayî nîqaşê ne.

Nexasim li Rojhilata Navîn pêşketinek şiyarbûnek Îslamî ya nû yan jî bi şêweya dewletbûnê tê jiyîn. Elbet ev jî dikare berfirehî girêdana wê di îslama rast, pirsgirêkên rojaneyî, pirsgirêkên çînayetî û netewî de weke mijara nîqaşekê bê destgirtin. Her wiha netewperestiya burjuva, di vir de jî netewperestiya burjuvaziya biçûk û hevkaran heye. Weke ku cureyên van di gelemperiya cîhanê de heyî, dixwazin li Rojhilata Navîn, nexasim li Kurdistanê jî heta dawî bibandor bin. Çawa weke berê dihat zanîn aliyên van ên bîrdozî, polîtîk û rêxistinî dihat çi wateyê, îro em dikarin vê baştir bibînin. Nexasim modela dewletoka hevkar a li Başûr pêk tê û dîsa gelek komên di nava daxwazkariyên reformist de hene. Me berê ev pir rexne kirin û rexneyên rast bûn.

Niha em dikarin van rexneyan zêdetir rojaneyî bikin.

Li hember tevgera me, seknek wan a çawa heye, emê çawa nêzî wan bibin? Emê ji hêla polîtîk ve çawa nêzî tevgerên Îslamî, netewperestên burjuvaziya biçûk, dewleta hevkar, "nûjen" a federe û faşîzma Tirk bibin? Têgeha ku weke rêya çareseriya siyasî tê binavkirin, derfeta wê ya dahûrîna polîtîk çiye, ger hebe ev girêdayî çiye, çareseriya polîtîk di kîjan asta leşkerî de derbasdare? Weke qonaxekê federasyona li ser Tirkî tê ferzkirin, di kîjan wateyê de raste? Naveroka wê dikare federasyonek çawa be? Pêwendiya wê bi demokrasiya Tirkî û têkoşîna wê re çiye? Di vê manê de çepên Tirk an jî hêzên şoreşger ên Tirkiyê çi wateyê rave dikin, dikarin kîjanê bandor bikin, em dikarin wan ber bi pêşketinek çawa ve bibin?

Ev xal tev, divê weke sergotarên cuda, berfirehî bên lêkolînkirin. Dîsa pêwendiyên polîtîk ên bi emperyalîzmê, Ewrûpaya wê, Emerîka wê, heta dewletên cur be cur ên herêma Rojhilata Navîn re tên çi wateyê? Ma bêpêwendîbûn raste? Ger ne raste, pêwendiya polîtîk

weke pêwendiyek radestbûnê neyê dîtin, şêweya wê ya rast çiye? Gelo bi mînaka dewleta hevkar a federe ku pêwendiya polîtîk weke pêwendiyek radestbûnê digire dest, an jî li şûna komek sazûmaniyên burjuvaziya biçûk ên ji serxwebûn û azadiya xwe tawîzan nadin, bi Tirkiye, dewletên herêmê re û bi DYE re helwesta baş a pêwendiyan pêş dixe çiye?

Dikare di van mijaran tevan de hem têgihî, hem jî di asta pêşketina pratîkî de nirxandin bên kirin. Dikare nirxandinên ku hatine kirin jî, bên pêşxistin. Em naxwazin zêde bikevin ziraviya van xalan. Ya ji me re hewce jî neziravî, ya esasî destnîşankirine. Jixwe me di gelek nirxandinan de, ziravî jî diyar kirine. Partî di vê mijarê de xwedî qabîliyetek xurt a nirxandinê ye û ev jî zêde bûne belge. Elbet kesên ku di doza partiyê de bi îdîa ne bi qasî nan û avê pêdiviya wan bi vê heye. Dê xwe bigihînin vê û ji bo xwe jî encama hewce derbixin. Tişta ji me hatî xwestin, ji mêj ve hatiye dayîn. Bes bila bizanin bibin milîtanên partîbûyî.

Kes nikare îdîa bike PKK, weke gelek kes dihizirin tevgerek jixweber û bi hinek çalekiyan ve dimeşe. Jixwe yeqîn nakim ên di meriyetê de jî tevgerek leşkerî ne. Heta niha min ji meşandina gêrîlatiyek cidî re jî negotiye; “Erê.” Nabêjim; “Wisa jî hatiye kirin.” Hinek hewldan hene, lê misoger pêdiviya wan jî bi vesazbûnek ku PKK guncav dibîne heye. Me ev di serî de jî digot, niha jî dibêjin. Xeta leşkerî û rêxistinbûna wê ya ku PKK guncav bibîne, hêjî weke pirsgirêkekê pêşberî me disekine.

Li gel van rêxistinbûna girse jî, pirsgirêkeke. Heta bîrdozî di derbaskirina vê qadê de pirsgirêk hene. Bi hêmanên çapemenî û weşanê, propaganda û ajîteya bîrdoziyê kirin, peywirek cidî ye. Rojnameyên partiyê rast bikaranîn, li gorî naveroka bîrdozî rol girtin sînordare. Derfetên pir mezin ên çapemenî û weşana me hene. Lê nayê bikaranîn, têrkar venaguhere rêxistinbûn û propagandeyê. Weke amûrekê qîmeta tê xwestin ji nirxa wê re jî nayê dayîn. Divê ev jî weke pirsgirêka bîrdozî bê dîtin. Ango nêvenga belavkirina bîrdoziyê, pêwîste di vê çarçovê de bê destgirtin. Niha kêmek maye televîzyona

wê jî çêbe û dê bi qasî tê xwestin radyoyên wê jî çêbin. Jixwe çapemeniya wê heye, divê zagonî û der-zagonî jî –li dervî welat û hundurê welat derfetên girîng hene- baş bên bikaranîn.

Ji aliyê polîtîk ve jî rewşên pêşketinên mezin derketine holê. Bi çarçavî baldariya milyonan girse li hember polîtîkbûnê heye û di radeya birçî de eleqedare. Nûnerek partî yê baş dikare wan pir lez bigihîne rêxistinek polîtîk. Gel dixwaze li her qadê xwe bigihîne desthilatî û nûnertiya wê. Divê nûnertiya demokratîk, bi şêweya nûnertiya partiyê bê meşandin. Êdî kî çiqas dixwaze dikare rêxistin damezirîne. Weke min gotî, heta dawî derfetên çareseriyê hene.

Hûn jî dibînin, asta PKK'ê ya pêkhatina bîrdozî û polîtîk, ne tenê pêşketinek girêdayî netewî û heta dema dîrokî ye, di wateya herêmî û nav-netewî de jî pêş ketiye, di astek ku dost û dijmin jî zêde rêzdar nêz dibê de ye. Elbet hûn jî weke milîtanên vê partiyê, neçarin ji her kesî zêdetir vê astê bibînin, vê astê bi pîvanên bîrdozî û polîtîk ve têbigihin. Di şêwaza herî zirav de xwe bigihînin dahûrînên wê, di kesayeta xwe de pêk bînin. Ya herî girîng jî asta serkeftin û pêkhatina wê, bi xwe bixin meriyetê, her wiha ji xwe pêngavan bidin destpêkirin û bi vî rengî divê êdî yekbûna bi rastiya bîrdozî û polîtîkaya partiyê re bê temamkirin. Ger hûn vê pêk bînin, dê ji bo we bibe pêşketinek ku siûda wê ya serkeftinê berze. Partiyek ku ji nû ve bi milîtanên wisa pêkhatî ve xwe gihandina serkeftinê, bi qasî ewleya wê ya herî bingehîne, ewqas jî meşa li pêş serkeftinê jî misoger dike.

## Wê DYE û KT Ti Carî Gotina; "Têkoşîna Em Dimeşînin Terorîzme" Ji Min Nebihîse

**David E. Korn:** Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistanê; Birêz Abdulah Ocalan! Beriya çend salan ji erka dîplomasiya ku min ji bo Dewleta Yekbûyî ya Emerîkayê dikir, teqawîd bûm. Di vê

navberê de min her tim di derbarê pirsgirêka Kurd a li Iraqê de jî nivîsand, di demên dawî de jî heman tiştî ji bo Kurdên li Tirkiyê dikim.

Niha jî dixwazim di derheqê PKK'ê de lêkolîn bikim û binivîsim. Dixwazim vê jî bêjim; li gorî min PKK, ji aliyê çapemeniya navnetewî ve, pir erzan hatiye danasîn û pêşkêşkirin. Ji bo vê nivîsa xwe jî, min xwest bi we re hevpeyvînekê bikim. Mixabin ji ber ku ezê di van kêliyan de nekarim serdanekê li Rojhilata Navîn bikim, neçar mam pirsên xwe bi nivîskî amade bikim. Min bi vî hizrî pirs amade kirin. Ji niha ve dixwazim bêjim ku, ji bo bersivên we spasiyê dikim. Dirêjiya nivîsê ji we re dihêlim. Hêvî dikim hûnê vê daxwaza min bipejirînin û ji niha ve spas dikim.

**Abdulah Ocalan:** Birêz David E. Korn ji bo eleqeya we spas dikim. Weke kesek yekem care dîplomatek di dewleta Emerîkayê de erk girtî û kesek li ser rewşa gelê Kurd nivîs dinivîse, ev baldariya we ya li hember PKK'ê hêja ye û watedare.

Weke we di destpêkê de destnîşan kirî, bi rastî jî dixwazin di asta raya nav-netewî de di derheqê partiya me de nêrînên neheq û berovajî pêş bixin. Bêguman hûn jî pir baş dizanin ku, di pêşxistina van nêrînên neyênî de, giraniya DYE'yê heye.

Yekser bibîr bînim, îro alîgirê serokê CIA (Teşkîlata Îstîxbarata Navendî), li qada nav-netewî weke nûnerê terorîzmê yê herî mezin, pir rehet di komîsyonên cur be cur de vê nêrînê dibêje. Ev camêr ne kesek ji rêzê ye. Hûn jî dizanin CIA di asta cîhanî de rêxistinek çiqas bibandore. Bêku bi me re hevdîtinê bike yan jî rastiya me lêkolîn bike, lêkolîn kiribe jî wisa nêrînên xeter yek alî danasîn, bi rastî jî miletek ku qurbanê herî mezin ê terorîzma nav-netewî ye, PKK'ya ku ji bilî bikaranîna mafê xwe yê pîroz ti armanc û mijûlbûna xwe neyî, wisa nirxandin hem neheqiyek mezine, hem jî şêwazek dijminatiya sînornenase.

Miletek ku pêvajoya qirkirinê jiyaye, ji bilî nasnameya xwe ya netewî û daxwazên xwe yên netewî-demokratîk pêşxistinê zêdetir ti pirsgirêkek xwe ya din nîne. Di vê mijarê de li hember qirkirinê li ber xwe dayîn, çima dibe terorîzma nav-netewî? Ev nirxandina neheq,

tenê dikare bibe nêrîna emperyalîzma sînornenas. Ti eleqeya vê bi edalet, mirovî û heta hêmanên rastiya siyasî ve nîne. Di bin tohmetek giran de hiştin marîfet dîtin, nêrînek emperyalîsta mezine.

Birêz alîgirê CIA jî pir baş dizane ku, îro miletê herî zêde qurbanê terorîzmê emin. Ji dîrokê jî pir baş tê zanîn, Komara Tirkiyê û hovîtiya Tirk, hêza qirkirina çand û gelane. Pêdiviyên mirovî yên teqez, pêdiviyên hûmanîzmê, mafê xwe yê jiyana pîroz, nasname û mafê parastina silala xwe, wisa bi nêrînek berovajî û tawanbariyek pir mezin ve dinirxîne. Ji nêrîna we re dihêlim, lê ev nêrîn hema bêje nêrîna DYE ya fermî ye. Hûn jî ji nêz ve dinasin. Bi rastî jî hewl didim fêm bikim, gelo weke berjewendiyên dewleta DYE, girêdana xwe çiqas ji nêz ve bi van nêrînan re heye. Pirsên we yên li ser vî bingehî, weke we jî diyar kirî, dikare di astekê de ev danasîna PKK'ê ya hêsan bê derbaskirin. Yeqîn dikim, bersivên ku em bidin van nirxandinên şaş, kêm jî be sererast bike.

Bi vê mebestê, yeqîn dikim hûnê hinek din xwedî ferasetek nêzî rastiyan bin. Bawerim dê bi we re nêrînên DYE yên li ser me hinek din xwe bigihîne nêrînek ku rastiyan dibîne. Cardin ji bo eleqeya we spas dikim.

## Em li hember hemû bîrdoziyên ku pêşketina kes asteng dikin bi bertekin

**David E. Korn:** Birêz Ocalan, rêjeyek mezin a çapemeniya navnetewî, hêjî PKK'ê weke "rêxistinek cihekar" dide nasîn. Dibêje armanca we "avakirina dewletek Marksîst û Lenînîste." Nexasim serxwebûn, bi rastî jî armanca PKK'ê ye? Her wiha gelo Marksîzm û Lenînîzm bîrdoziya PKK'ê ye?

**Abdulah Ocalan:** Bi israr partiya me weke rêxistinek cihekar nirxandin û berdêla wê çi dibe bila be, bi her tiştê xwe ve li pey dewletê bazdana wê fişale, ne raste. Dîsa her wiha bi partiyên kevnar ên komînîst re heman rengî dîtin jî, nenirxandinek di cîh de ye. Xeta bîrdozî û siyasî ya partiya me, weke hatî gotin ne di şêwaza komînîst

a kevnar de ye. Ger wisa bûya, wê bi hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re weke partiyên rûxiyayîn, em jî ji mêj ve rûxiya bûna. Pêşketinên dawî yên nav-netewî, nexasim hilweşîna sosyalîzma Sovyetê jî, pir vekirî danî holê ku divê em wisa neyîn nirxandin.

Raste, partiya me ji destpêkê ve bi sosyalîzmê rê ketiye. Lê em baldar nêz dibin ku ev sosyalîzmek li ser bingeha zanistî ye. Em yeqîn dikin civak jî li ser bingeha zanistî dikarin bên destnîşankirin. Em jî di vê mijarê de her ku diçe ferasetek sosyalîzmê ya li gorî xweseriya xwe pêş dixin. Dikare bê lêkolînkirin, daku bê fêmkirin sosyalîzmek çawa ye. Ev hem ji bo me, hem jî ji bo derdorên bi me re eleqedar dibin wisa ye. Ramanê xwe yên bîrdozî pêşxistin, li gorî feraseta me ya mirovahî û civakî, divê xwezayî bê dîtin. Civakên bê bîrdozî û miletên bê bîrdozî jî tine ne. Li gorî rastiya di navê de dijîn guncav, weke rêya çareseriyê dikarin her bîrdoziyê jî bipejirînin.

Vekirî bêjim; sosyalîzma pêkhatî û partiyên ew areste kirîn, weke ku nekarîn rastiya Kurd rast binirxînin, di înkarkirina wê de û heta evqasî xurtkirina Komara Tirk de, amûrên herî bingehîn pêşkêş kirin.

Weke gel û partî, me ji vê sosyalîzmê û komînîzmê zerar dît.

Lê tevî vê, em her tim bawer dikin feraseta me ya wekhevî û azadiyê bihêze, bi qasî hezkirina mirov a kûr, divê ewqas jî bi wekhevî û azad mafê her miletekê bê dîtin û pêşxistin û em ji bo vê têdikoşin.

Newekhevî û bêmafiyên zêde ne tenê di navbera netewan û heta çînan de, di navbera ol'an, navbera mezheban, navbera zayendan, navbera çandan de, bi kurtasî di navbera netew û asta nav-netewî de çiqas feraset û helwestên azadbûnê asteng dikin hebin, li dijî wê, xetek me ya li gorî cewhera mirov guncav tê pêşxistin heye. Di vê navberê de li hember her ku diçe qirêjbûna xeter a hawirdor, zêdebûna şêniyan û xeteriya atomê bûna xwedî nêrînek herî radîqal, em pêwîstiyek feraseta vê sosyalîzmê dibînin. Weke partiyek pir bi rêgez dixwaze xwe pêk bîne û weke tevgerek xwedî çarçoveyek bîrdoziya wisa ye û hewl dide wisa be, nirxandina me dê nêzîkbûnek rasteqîn be.

Ezê nekarim bi kurtasî ji her hêlê ve vebêjim ku, em xwedî feraseta sosyalîzmek çawa ne. Me bi salan pêşî gelek nirxandinên cur be cur

pêş xistin, hêvîdarim hûnê lêbikolin. Lê belê dikarim bêjim ku, feraseta me ya sosyalîst, dê weke welatên serdest ên sosyalîzma pêkhatî ne bê demokrasî be, ne sosyalîzmek kes biçûk dike û dewletê mezin dike be.

Heta ji pirdengiya gelek welatên kapîtalîst zêdetir, em girêdayî pirdengî, xwedî ferasetek demokratîk û ferasetek dewlet di wateya kevnar de ji dewletbûnê derdixê ne. Dîsa kapîtalîzma dewlet û sosyalîzma xwe dispêrê wê, nêzîkbûnek aborî ya em napejirîne. Em yeqîn dikin pêdivî bi vesaziyek aborî ya nû, ya ku kes bikare serbest jêhatiyên xwe pêş bixe heye.

Li hember hemû bîrdoziyên ku bi navê dewletê pêşketina kes asteng dikin bertekên me hene.

Her wiha em dixwazin bêjin, di vê navberê de ji ber her miletek heta dawî xweseriya çanda xwe najî, binyatek civakek yekbêjî ango monolog pir xetere. Kurtasî feraseta kesek ku heta dawî dikare çanda xwe ya dewlemend û jêhatiyên xwe pêş bixe, yek ji pîvanên bîrdoziya me ya em pir baldar nêz dibine. Em zêde ji ferasetên nexasim dewlet her tişte, –kes ne ti tişte yan jî kes her tişte- berjewendiyên civakî ne ti tişte dûr disekinin û li hember bibertekin.

Bi qasî ji civakê re hewce ye mafên kes, bi qasî ji kes re hewce ye feydeyên civakî û sazûmaniya gelemperî, weke rêgez xalên ku em hewl didin pê ve girêdayî bimînine. Yeqîn dikim ji bo xwe dana naskirinê evqas bese.

## Em jî bi qasî emerîka federalîzmê dixwazin

Weke din em bên ser mijara "cihekariyê", em nêzîkbûnek şert û merc çi dibin bila bin "dewleta cuda" ferz nakin.

Xala em dixwazin pir vekirî bêjin, modela dewletek ku mafên miletekê yê herî bingehîn aborî, çand, civakî û siyasî ewlekirine. Weke ku dikare ev maf di bin sêwana heman dewletê de jî bên bikaranîn, dikare di bin sêwana dewletek cuda de jî bê bikaranîn. Şêweyên dewletan wisa pir hişk an ûnîter an jî cihekar binavkirin, li gorî rastiyên roja me neguncavin. Rastiya nav-netewî cuda ye.

Em serdemek her ku diçe gelek yekîtiyên siyasî yên cur be cur pêş dikevin dijîn.

DYE bi xwe jî pergalek dewleta federe ye. Tevî ji heman netewî pêk tê, Almanya jî pergalek dewleta federe ye. Dîsa tevî ji netewên cuda pêk tê, Belçîka federasyonek ji du miletan pêk tê. Îspanya dewletek otonomiyên wê zêde ne. Yekîtiya Dewletên Emerîka ya Bakur pêş dikeve. Yekîtiya Ewrûpa heye, heta Yekîtiyek Tirk jî pêş dikeve. Pêwîste mirov Civata Dewletên Serbixwe jî serve bike. Dîsa hewce dike federasyonbûna di nava Rusya de jî weke mînakek baş berçav bê girtin. Ev mînak tev destnîşan dikin ku di bin heman sêwana dewletê de, bi pergala federal ve jiyana serbixwe û azad gengaze, her çendî di halek dewletên cuda de jî bin, bi yekîtiyên cur be cur û şêweyên federasyonan hatina gel hev a van dewletan jî gengaze. Jixwe pêşveçûn jî, peresanek bi vî rengî destnîşan dike.

Wexta em vê rastiya giştî berçav digirin, di her mercî de çiqas PKK ne li pey cihekariyê ye û pey baz nade, di nava binyatek otorîter û ûnîter a civandinê ya li ser dewletek faşîzan serdeste weke Komara Tirkiyê de, pejirandina vê jî negengaze. Bal bidinê binyata dewleta ûnîter a heyî, yê ku piştî nîvê duyem ê sedsala 20. ji sosyalîzmê –jixwe nûnertiya wê demê Stalîn bû-, herî zêde jî ji Hîtler û Mussolînî bandor bûyî, Mustefa Kemal pêş xist. Misoger tev jî dizanin ne dewletek demokratîke. Ji ti çandî re azadî tine ye. Îro her kes jî dizane ku, demokrasiya heyî jî sexte ye û girêdayî artêşê ye.

Binyata ûnîter a Komara Tirk, yek ji binyatên herî zêde dijdemokratîke.

Ne tenê mafê kêm-netewan, netewa Kurd înkar dike û nas nake. Di heman demê de di nava xwe de jî li hember gelê xwe dewletek dijberî mafên mirovan û bi rastî jî ji bilî bixin çav ti nirxa demokrasiyê lê nîne. Vaye em li hember –ji kur bê nêrîn bila be, ev binyatek dewleta faşîste-, dewletek wisa, bi gelemperî jî di nava yekbûnê de ji bo demokrasiya wê têdikoşin. Ev têkoşîn weke "têkoşîna cihekar" binavkirin, kena xwe bi rastiyan kirin û cidî negirtine. Ya herî rast

mirov vê weke demokrasiya netewî û têkoşîna daxwazên demokratîk ên netewî binav bike.

Bal bidinê, hemû pêşketinên siyasî yên Tirkiyê, bi têkoşîna me ve girêdayî peresanê dijîn. Rejîma kemalîst gihaye qonaxek wisa, nexasim bi vê operasyona di derbarê Başûrê Kurdistanê re, yan wê di çarçoveya reforman de peresanê bijî û temenê xwe dirêj bike, yan wê di nava qalibên teng ên ûnîter de hîn zêdetir tengav bibe. Ji xetimandin ber bi xetimandina ve bigindire, yan jî wê hilweşe biçe.

Ji ber vê me dehê caran got, ger Komara Tirkiyê dixwaze pêşketina demokratîk bi rêya reforman saz bike, em amade ne. Heta me got emê bibin hêza herî saxlem û ewleya pêşketinek wisa demokratîk.

Em pir vekirî ji we re jî dibêjin ku, derdek me wisa “Îlla em cihe bibin” nîne.

Bes bila aliyê beramber bi xwe bawer be û ji hevdîtina siyasî re vekirî be. Dikare di nava sînorên heyî de encamên nêzî wekhevî û azadiya gelan bê girtin. Dikare daxwazên demokratîk ên netewî di astek pêşveçûyî de bên sazûmankirin. Ji bo Tirkiyê demokrasî, dikare di astek pêşveçûyî de pêşketinekê raber bike. Em jî dibêjin; “Em ji vê re amade ne.” Ti wateya wê nîne her kêlî vê weke cihekariyê binirxînin.

Jixwe herî kêm em jî federalîzmek weke Emerîka ku ji yek netewî pêk tê dixwazin. Em jî bi qasî Almanya, bi qasî Îspanya demokrasiyekê û weke pêdiviyek wê ya pêşketî pergalek federal dixwazin. Ev xwestin çima dibe cihekarî?

Hêj gavên destpêkê nehatîn avêtin, feraseta ku naxwaze nasname û navê gelekê jî nas bike, ma mirov nikare rehetî bêje cihekar û şovenîste. Netewek xwedî hejmarek milyonan, dîsa nasnameya miletekî ku di dîrokê de ya herî kevne evqas înkarkirin, ma ne cihekariya herî xirabe? Çima rastî wisa nayên dîtin, lê xweparastina me ya rast û mafê mirovî, mafê parastinê yekser cihekarî bê nirxandin?

Hûn baş dibînin ku, em bi şaşiyek giran û darezên nirxên jirêderketî re rûbirû ne. Heta dixwazî ji vê re bêje; “Xwe dispêre

bîrdoziya Marksîst-Lenînîst a hişk", bi qasî dixwazin bêjin; "tevgerek cihekar a herî terorîste", ev hemû tawanbarî ne. Her wiha ti aliyên wan ên rasteqîn nîne. Rastî, zêdetir girêdayî nêrînên ku min hewl da bilêv bikime.

**Em tenê ji gelê xwe fedekariyê dixwazin**

**David E. Korn:** Birêz Ocalan, PKK di salên dawî de, baldariya Kurdên li Tirkiyê qezenc kiriye û heta dikare bê gotin alîkariyek xurt jî tê girtin. Sedema vê çiye?

**Abdulah Ocalan:** Pir vekiriye, her çendî sînordar be girêdayî bersivdana bêrîkirinên dîrokî yên gelê me ye. Dîsa divê neyê jibîrkirin, yekem care di nava PKK'ê de ji bo gelê Kurd bi fedekariyek mezin, dema hewce jî kir di mercên herî zehmet de, bi tena xwe bi hezaran mirovên leheng jiyana xwe feda kirine. Ji bo nasnameya netewî, demokrasî û gel jiyana xwe fedakirin, ji hêla gel ve jî ev dîtin û nirxandin sedema herî bingehîn a vê baldarî û pişgiriyê ye. Gelê Kurd di dîrokê de gelek caran hatiye xapandin. Lewra naxwaze yekser bawerî bi her rêberî bîne. Çi demê bi çavên xwe dît, ji bo wî fedekariya herî mezin tê kirin, canê herî hêja bi lehengî didin û xwe ji vê nadin paş, belê wê demê hebûn û tinebûna xwe seferberî vê tevgerê dike, pişgirî dide û dibe alîkar. Ya dibe jî eve.

PKK bi taktîkên rast bîst sal zêdetire pêşketinekê raber dike, tevgerek ku kevneşopiya îsyangeriya paşverû di dîroka Kurd de gelek caran hatiye dîtin û di pêvajoyek çend mehan de rê ji encamên pir xirab re vekirî derbas kiriye.

Tevgerek wisa ye, hema bi îsyanê re nexwedî xisletek binkeftinê ye, berovajî îsyana ku bi yek kesî, min bi xwe re dayî destpêkirin mezin dibe, me îsyana yek kesî ber bi jêhatiya şerê gelêrî ve bir, ev jî bû sedem ku gelê me heyran bimîne û weke mûcîzewî binirxîne.

Ev bûyer yekem car di dîroka Kurdistanê de pêk tê. Ger bi rastî jî hûn dixwazin radeya vê pişgiriyê fêm bikin, divê mirov vê rastiyê destnîşan bike. Ji ber ku gel ji hemû îsyanan bi fikare –ji ber pir zû hatine çewsandin û rê ji statûyek xirabtir re vekirine-, wisa hêsan pişgiriya xwe nedida. Her ku encama pir serkeftî û nebinkeftina tevgera me bi salane dimeşîne dîtin, baldarî û pişgiriyek bêhempa derket holê.

Tenê ji pêngava 15'ê Tebaxê ve, tevî terorek bêrehim ku deh sal paş xwe hişt –bi hezaran mirovên me bi şêweya kuştinên kiryarên wan nediyar hatine qetilkirin, milyonan ji gundên wan hatin koçkirin, birçî hatin hiştin, bi sedan îşkenceyan re derbas kirin, deh hezaran jî hêjî

girtîne-, ger ev gel hêjî bi pişgiriyek mezin bi her tiştê xwe ve piştewaniya partiyê dike, ji ber ev partî jî hêjayî gel xwedî dîrokek lehengiyê ye. Ji bilî vê bi ti hêcetî û sedemî vî gelî pişgiriya vê partiyê nedikir. Em tenê ji gelê xwe fedekariyê dixwazin.

Me ji bilî armancên hîmdar bi qasî misqalekê jî ti berjewendî neda vî gelî û bi berjewendiyên heyberî ve girê neda. Berovajî di asta herî bilind de hebûn û tinebûna xwe feda kir, me jî partiyek di asta efsûnî de û bi pêşkêşkirina hezaran şehîdên leheng ve, cewhera vê pişgiriyê girt.

Sedemên herî bingehîn ên pişgiriya me dikin eve. Elbet xebatên me yên propagandeyek berfireh û rêxistinkirinê di hemû şêweyên têkoşînê de çêbûne. Ji gêrîla bigirin heta kampanyayên têkoşîna aştiyane, hemû bi şêweyek guncav kirina meriyetê, ji aliyê taktîk ve jî li gorî her demê gavên rast û xweser avêtin, rê ji xurtbûna baweriya gel re vekir. Weke sedema duyem, ji vê hêlê ve karbidestiyek bûna rêxistinek wisa berdewam dikin, ev jî her ku diçe eleqe û pişgiriya gelê me zêde dike.

## Komara Tirk dijminê her tiştê ku kurde

**David E. Korn:** Birêz Ocalan, çareseriya siyasî ya we ji bo hukumeta Tirk gotî; “De em baxivin” we bersivên çawa girtin?

**Abdulah Ocalan:** Rejîma beramberî me, ji ber ku xwedî xisletek dîwarê ji kevire, mixabin bangawaziyên me nabihîse yan jî nebihîstî nêz dibe. Hema weke em ji dîwar re baxivin rewşek derdikeve holê. Yeqîn nakim di cîhanê de rejîmek evqasî hişk hebe.

Hûn jî pir baş dizanin ku, dewletek mezin a weke DYE, li hember gelek pirsgirêkan baldare û siyasî nêz dibe. Lê belê rejîma Tirk, di dîrokê de her tim bêrehm nêzî gelan bûye. Herî dawî jî ewqas bi biryare ku gelê Kurd jî daqurtîne, çiqas mirovî û demokratîk be bila be, naxwaze yek dengê bi navê wê guhdar bike. Dihizire dema guhdar bike, wê tawanbar bê dîtin. Neçarim vê rastiyê jî diyar bikim. Dihizire ku pêwîste hebûna vî gelî nas neke û dîroka wî înkar bike. Elbet ev jî

dibe dîroka wî ya serdest, dîroka hoveber û dîroka tawanbariya mezin. Di dîrokê tevê de ti carî hebûna ti miletî nas nekir û heta dawî şer kir. Bi qasî karî tine kir, yê nekarî tine jî bike, bi darbeyên giran ve rûxand û hilweşand û vekişiya. Helwesta heman polîtîkayê li hember gelê Kurd jî disepîne. Heta dawî bibiryare ku hebûna wê înkar bike û bi erdê re bike yek. Ger ser nexe jî, wê vekişe biçe. Ji ber sedema vê kevnareya dîrokî naxwaze qîmet bide nêzîkbûna herî biçûk a mirovî û demokratîk. Misoger pirsgirêk ne daxuyaniyên me, ango nayên fêmkirin an jî pir radîqalin. Na. Di felsefeya wî, nêrîna wî ya jiyanê de cîh ji ti gel û çandê re nîne. Lewra evqas har û hovane ye.

Kesên Komara Tirk û Osmaniyan ji nêz ve nas dikin, dikarin baş bibînin ku weke şêweya serdestiya wan li hember gelê xwe jî çiqas otorîter û dij-demokratîkin. Nexasim li dijî gelê Kurd xwedî ferasetek kembaxtire. Ji ber ku ewqas îsyan hatin lidarxistin, hemû jî bêrehm çewsandine.

Nirxandinek Demîrel a weke; “Ev îsyana bîst û nehemîne, emê vê jî biçewsînin” heye. Îro li Şîlî’yê got; “Li Tirkiyê pirsgirêka Kurd nîne.” Belê gelê Kurd û pirsgirêka wê nas nake. Dema wisa be asayiye ku daxuyaniyên me jî weke “li dîwara beton bikevin” û vegerin. Divê mirov şaşwaz nebe.

Bi rastî jî qada nav-netewî di serî de jî DYE, ji ber berjewendiyên stratejîk, dema hêzên bingehîn jî dikin palpişta xwe hûnê jî bibînin em çiqas bi helwestek xirabkar re rûbirû ne û wê ti carî daxuyaniyên me yên banga çareseriya mirovî û demokratîk jî guhdar nekin. Her çendî em hinek reformên erênî pêşniyar bikin, qet naxwaze bibîhîse. Rêxistinên ne bi PKK’ê re, misoger ti eleqeya xwe bi têkoşîna çekdarî re nînin jî hene, naxwaze bi wan re jî hevdîtinê bike. Ji ber dijminê her tiştê di nava wê de Kurd heye.

Misoger rastiya ku pêwîste DYE, nexasim bi navbeynkariya we bibîne eve. Ji bo ev dîwarên ji kevir bên nermkirin, pêdivî bi hewldanên we heye. Ev peywira we ye jî. Ji ber ku hûn palpişta wî ne. Yeqîn dikim hûn ne alîgirê ewqas tundbûna wî ne. Ji ber ku ev, tawana herî mezin a mirovahî û qirkirinê ye.

Xîtabî wijdana we dikim!

Gelo helwesta mirovî û demokratîk li cem kiye, mejiyek kirêç girtî, dilek ji betonê li cem kiye? Divê hûn destnîşan bikin.

## Pergala Federe Ji Bo Gelê Me Hewce Ye

**David E. Korn:** Birêz Ocalan, em bêjin hukumeta Tirk, ji bo kêmnetewa Kurd çareseriya federe berçav girt. Gelo wê ev çareserî bibandor be? Ji ber rêjeyek mezin Kurd, li dervî Bakurê Kurdistanê ne, li Stenbolê, Îzmîr, Enqere û cihên din dijîn. Ger hûn çareseriya federe, weke rêya kêmkirina êşên Kurd nabînin, alternatîfek çawa dibînin?

**Abdulah Ocalan:** Modela dewleta xwe bînin berçav, hûnê baştir binirxînin, pêşxistina pergalek federe çiqas rasteqîne yan ne. Her wiha em dikarin fêm bikin çareseriyên cuda jî çawa dikare bên pêşxistin.

Raste, beriya her tiştî hema hema nîvê Kurdan li bajarên metrepolên Tirkiyê dijîn. Lê belê rastiyek jî heye, hêjî welatek Kurdistan ku xwedî sînor û piraniya Kurdan lê dijîn heye. Em jibîr nekin, hêj B.Z. di Ricata Deh-hezaran a Ksenefon de, rastiya ku behsa navê vî welatî dike heye. Tirk ancex P.Z. di sedsala 10. de gava xwe ya yekem diberdin vir. Dîroka vir jî weke Tirkiye pênasekirin, sed salî derbas nake. Heta dema ku hebûna Kurdan a di dîrokê de çar hezar salî derbas dibe, hebûna Tirkiyê jî di nava sed salê dawî de, em dizanin ku nû hewl dide weke netew behsa xwe bike.

Van jî danin aliyekê, mînak hûn heman netewin, hûn çima pergalek federe saz dikin? Hem jî 52 dewletên we yên federe hene. Nexwe, çima pergalek federe ya miletek ku welatê wê û navê wê di nava mirovahiyê de herî kevne nebe? Her wiha sedema mirovên me gelek li metrepolane, ji ber zext û îşkencê ye. Ev girseya Kurdistanî, pirsgirêkên gelê Tirk ên aliyê Rojava jî giran dike. Elbet ew bi xwe jî di nava mercên jiyana pir giran de dijîn.

Pergalek federe ya pêş bikeve, wê di carekê de milyonan mirov vegerîne welatên dayîka wan. Li Ewrûpa jî nêzî du milyonî Kurd

hene. Em dizanin ku ew jî ji ber zext û sedemên aborî koçber bûne. Bi pêşketina pergalek federe ve, ew jî bêku li serê Ewrûpa bibin bela, em yeqîn dikin dê ew jî vegerin welatê xwe. Pirsgirêka Kurdên din jî, dikare di çarçoveya demokratîk de bê hizirîn.

Piştî ku demokrasiyek berfireh, ji bo Tirkiye jî derbasdar bû, Kurdên li Metrepolan jî dikarin ji bo xwe dibistan vekin. Dikarin saziyên çapemenî û weşanê pêş bixin. Em çima ji vê re seyr dimînin? Ji ber ku wisa bû, çima fikarên me hebin? Li gorî pêwîstiya demokrasiyek berfireh, yê dixwaze wê li rojava (Tirkiye) bimîne, yê dixwaze wê derbasî rojhilat (Kurdistan) bibe.

Pergala federe; ji ber sedemên dîrokî, civakî, siyasî, û çandî hewce ye. Tenê li berfirehiya erdnîgarî û belavkirina şêniyan nêrîn û gotina ji pergala federe re nedestdayî ye, hûn jî pir baş dizanin ku ne li gorî rastiya dewleta we bi xwe ye jî.

Ma dikare şêweyek din jî bê hizirîn? Dema min destpê kirî jî diyar kir, şêweyên yekîneyên cuda hene. Konfederasyon û şêweyên yekîneyên nerim hene, dîsa şêweya otonomî heye. Ev hemû, ancex piştî ku hevpeyvînek siyasî bi şêweyek berfireh jîndar bû, dikare bê nîqaşkirin û em encam bikin.

Feraseta beramberî me, ji ber ku bi dîwarê ji kevir hatiye hunandin, naxwaze fêm bike em dikarin di bin navê kîjan şêweyên guncav de dewletê ji nû ve vesaz bikin. Ango şêweya dewletek li gorî netewa gelê Kurd û daxwazên wê yên demokratîk pêkanîn û ev di zagona bingehîn de destnîşankirin, ne ku bê derfete. Heta ji bo derbaskirina vê aloziya giran, rêya herî raste. Em jibîr nekin, îro Tirkiye li cîhanê qeyrana herî giran a aborî, civakî û siyasî dijî. Her wiha sînorên nav-netewî tengav dike û terorîzmê disepîne. Rêya derbaskirina vê jî, binesaziya dewletek ku bi hevpeyvînên siyasî pêş bikevin re derbikeve holê. Ji bilî vê, ji bo Tirkiye rêyek din a derketinê nîne.

## Em mafê xwe ya berxwedaniya pîroz bikar tînin

**David E. Korn:** Birêz Ocalan, hem hukûmeta Tirk, hem jî hukûmeta Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê PKK'ê weke "rêxistinek terorîst" binav dikin. Ger li gorî nêrînên we ev ne wisa be, hûn çi dihizirin?

**Abdulah Ocalan:** Me di bersiva pirsa we ya destpêkê de feraset û pêkana herî mezin a terorîst vegot. Me ti carî neheq dilopek xwîna ti gelî, heta yek biyaniyî nerijandiye erdê. Me ji we re diyar kir li welatê xwe, weke pêwîstiya bûna mirov, ji bo nasîna nasnameya me, pejirandina hinek mafên weke gel û netew daxwazkirinê wêdetir, ji bo vê jî hewce bike li ber xwe jî dayînê zêdetir ti çareyek me nîne.

Ku dera vê terorîzme?

Hûn kefîl bin, bêjin; "Ha ji we re nasnameya we, mafên we yên netewî û demokratîk", ezê yek kêliyê jî serî li tundiyê nedim. Lê hûn nagirin ser xwe ku mafên min bidin min. DYE nagire ser xwe, Tirkiye nagire ser xwe. Bêguman Komara Tirk weke gel dibêje; "Tu tineyî û nikarî ti mafî bixwazî." Ji ber vê jî ji dîrokê heta roja me, dixwaze bi hêzek herî hoveber û zordar ve me qir û tine bike. Terorîzma herî mezin ne eve, çiye? Hûn hewl didin hinek rastiyan berovajî bikin.

Hûn têkoşînek ku ji bilî nûnertiya mafê xweparastina gel a herî pîroz bike ti pirsgirêka xwe neyî, li nav-netewî weke hêza terorîst a herî mezin dinirxînin. Kanî heq, kanî edalet, kanî rastî?

Hebûna miletekî înkarkirin, jiyanek bêhîm û hejar pejirandin, ma li gorî we pêdiviya şaristaniyê ye?

We di şerê serxwebûna Emerîkayê de heta dawî gelek şêweyên çalekiyên di wateya terorîstî de lidar xistin û wisa rizgariya netewî ya Emerîka saz kir. Vêca ma raste ez we terorîst îlan bikim?

Jixwe em naxwazin weke we bibin dewletek mezin a serbixwe. Ya em dixwazin di bin heman sêwana dewletê de hinek daxwazên bingehîn ên mirovî ne. Di nava van de mafê jîndarkirina mafê çand û zimanê xwe heye. Dîsa mafê derfeta siyaset kirinê, bi qasî dikare aboriya xwe saz bike û pêşxistinê heye. Ev xwestin çima terorîstî ye? Ger aliyê beramber jî bêje; "Ez amade me van mafan bidim", em dikarin di yek rojê de tundiyê beramberî hev rawestînin.

Bes bila, bi armanca qirkirinê bi ser me de neyên, xwe jî weke navbeynkar bipejirînin. Belê, em her kêlî amadene ku rawestînin.

Tevî ku rastî eve, ger hêjî bêjin; “DYE û Komara Tirk we terorîst îlan dike û hûnê beramberî vê çi bêjin?” Kena xwe bi rastiyan kirine.

Ez van gotinan, bi şêweyek herî rasteqîn ji bo DYE û Komara Tirk rast dibînim.

Dema dibêjin em neterorîstin, ji bo hinek gavavêtina hewce nabînim ku sextekariyê bikim. Em ti carî jî, di wateya we gotî de xwe terorîst nanirxînin. Em şerek pir lehengî û pîroz ê mirovahî didin. Ne tenê ji bo gelê Kurd, em ji bo gelek çandên ku li Rojhilata Navîn hatin tinekirin jî şer dikin. Çanda Helen, çanda Ermenî, çanda Suryanî, çanda Ereb û çanda Çerkez heye. Weke van gelek çandên biçûk û mezin hene. Ango ji bo xweseriya çanda gelek miletan jî em şer dikin. Çima wê ji vê re “terorîst” bê gotin? Yê ku vê nas nake, aliyê berambere. Komara Tirk bi zorê û bêrehm diçewsîne. Gelo ev neterorîzme, çiye?

Ez qet nikarim şerek ku em bi navê mirovahî dimeşînin, weke têkoşînek bi deqa reş binirxînim. Her tiştî dipejirînim, lê wê ti carî DYE û Komara Tirk gotinek weke; “têkoşîna em dimeşînin terorîzme” ji min nebihîsin.

### Piştewanê herî mezin ê şerê taybet ê Tirk, Îsraîle

**David E. Korn:** Birêz Ocalan, di navbera rêxistina Filîstînê ya ku li hember Îsraîlê çalekiyên terorîst dike û PKK’ê de pêwendiyek çawa heye yan jî alîkariyek çawa dide?

**Abdulah Ocalan:** Di destpêka salên 1980’î de, hinek pêwendiyên me yên sînordar hebûn. Lê nexasim piştî Rêxistina Rizgariya Filîstînê li Enqereyê navenda xwe vekir, ji me dûr ket û hêj di salên 1982’an de em bi serê xwe, li Rojhilata Navîn di nava civatên gelê Kurd de pêş ketin. Her çendî ji bo pêşxistina pêwendiyê hewldanek me çêbû, ji ber ferzkariyên Tirkiyê Rêxistina Rizgariya Filîstînê bi me re pêwendî pêş nexist. Niha jî em hebûna xwe, bi hêza xwe ya cewherî ve didomînin.

Ger em pirsgirêka Îsraîl şîrove bikin, divê ev hinek din cuda bê fêmkirin. Di qada nav-netewî de pêşkêşkirina Tirkiyê û dîsa di qada nav-netewî de PKK di bin tawanbariyek giran de hiştin, berpirsyariya yekemîn a van derdorên –nexasim ên pêwendiyên xwe bi Tirkiyê re xurtin- Îsraîliyane. Wan, di asta nav-netewî de pêşkêşkirina Tirkiyê de rolek çalek girtine. Dijberiya herî mezin a beramber mafên mirovan û qirkirina herî mezin li Tirkiyê ye. Mixabin Îsraîla dibêje; “Welatê dostê Îsraîlê tenê Tirkiye”, bi şêweyên cur be cur bi hemû hêza xwe ve bi ser me de hatiye û ser hemû tawanên Tirkiye jî girtiye.

Weke miletek qirkirina herî giran dijî, em pêwendiya gelê Cihû, nexasim derdorên girîng ên dewleta Îsraîlê ku dijberî gelê Kurd, bi Tirkiyê re tevdigere, heta dawî xeter dibînin. Ger Îsraîl nebûya, Tirkiye bi tena xwe nedikariya evqasî di asta nav-netewî de bi ser me de bê. Di nava welatên Îslamî de bi nêrîna weke; “Tenê Tirkiye pişgiriyê dide min” ve, divê Îsraîl evqasî ne li dijî gelê ku mazlûm û pîroz mafê xwe yê berxwedanê bikar tîne be.

Ti êrîşek me ya li dijî Îsraîlê nîne.

Em wate nadin pişgiriya Îsraîlê ya yek alî li hember rejîma Tirk û evqasî êrîşî me dike. Em yeqîn dikin a herî rast tavilê dev ji vê helwesta xwe berdê. Sedema DYE jî evqasî bê pîvan bi ser me de tê, yeqîn dikim misoger bandora hinek lobiyên Îsraîlê hene. Tirkiye hinek sonda dide wan, ew jî bi sondê Tirkiyê yeqîn dikin an jî li gorî berjewendiyên xwe guncav dibînin, lewra sînornenas bi ser me de tên. Vê pir xeter, neheq û pişgiriya qirkirina ku pir jiyane dibînim. Bi vê mebestê dixwazim bibîr bixim.

**Bazirganiya eroînê derewek mezine**

**David E. Korn:** Birêz Ocalan, Tirkiye û hinek welatên din dibêjin, PKK bi firotina eroînê ve xwe xwedî dike. Hûn dikarin di derheqê vê tawanbariyê de çi bêjin?

**Abdulah Ocalan:** Ev jî yek ji derewên herî mezine û ji bo ser tawanên xwe bigirin, avêtina ser beramberî xwe ji nirxandinek bêrûtiyê wêdetir ne tiştek dine. Yê ku li hember bazirganiya madeyên hişbir yên nav-netewî herî zêde girtî, li dijî wê radiweste, heta pir vekirî bêjim, yên di nava xwe de herî zêde li dijî hişbir û alkolê xwedî helwesta herî radîqal tevgera me ye. Hûn jî pir baş dizanin ku, derketina mirovên ku hişbirê jî bikar tînin û mirovên ku ji hişbirê re dibin amûr jî, ji nêz ve girêdayî pergala nav-netewî û dewletên bi şêwazên mafya kar dikine.

Xirabiya herî mezin li me bê kirin, PKK di bazirganiya hişbirê de weke amûrekê nirxandine. Îdîaya terorîzmê çiqas derewek mezin be, derewa duyem a temamkariya wê gotina pêwendiya PKK'ê bi hişbirê re heye jî derewe. Ez pir baş dizanim, di nava me de negengaze ku yek kes jî bi hişbirê ve mijûl bibe. Kerba me li hember hişbirê heye. Ger her kes jî weke me bûya, li vê cîhanê yek kesê ku hişbir bikar tanî nedima. Xwezayî bazirganiya wê jî çênedibû.

Dixwazim di vê mijarê de bala we bikişînim; hêj ji salên 1980'î ve "tezek" polîsên Tirk û xebatek girêdayî vê "tezê" hebû.

Dema hewl dan bi rejîma 12'ê Îlonê re rêjeyek mezin gelê me koç bikin, yeqîn dikim ji bo reşkirina têkoşîna ku emê li Ewrûpa bimeşînin xefkek hatî sazkirine. Dîsa ji bo beşdarbûna ciwanên li wir asteng bikin, rêbaza bazirganiya hişbirê hilbijartin.

Yekem care dibêjim ku divê hûn vê xalê pir baldar binirxînin. Bi rastî jî ev lîstoke û teqez divê hûn lêbikolin û encamên wê fêr bibin. Divê bê zanîn polîsên Tirk ciwanên Kurd di nava komê hişbirên ku sazûman kirine de pir zêde bikar tîne. Niha bi hezaran ji wan li Almanya girtîne. Yê vê dike û dide kirin jî polîsê Tirke. Çima? Weke bi yek kevirî çend çûkan bide. Yek; van ciwanan fêrî hişbirê dikin. Du; para qezenca herî mezin a bi hişbirê tê destxistin polîs ji xwe re dibe. Jixwe qezenca vê ya herî mezin jî diçe ji kontr-gêrîla re. Jixwe li Tirkiyê, di nava JÎTEM'ê de ango di rêxistina îstîxbarata jendirme de ev bû mijara nîqaşê. Di bûyera Cem Ersever de derbasî belgeyan jî bûye. Ew bi xwe dibêjin, bi gelemperî xwe bi qezenca bazirganiya hişbirê xwedî dikin. Sê; dixwazin bi vê têkoşîna me di bin navê; "Vaye

Kurd di nava komên hişbirê de cîh digirin" de qinyatekê ava bikin. Ji bo van ciwanan jî dibêjin; "Ev girêdayî PKK'ê ne." Lewra propagandeya; "PKK jî girêdayî hişbirê ye" belav dikin.

Ji bo şaşiyek wisa lenetî û xeter di asta nav-netewî de derbixin holê ezê ji bo we vebêjim. Kuştina Palme jî, bi heman şêweyî ji bo me di asta nav-netewî de terorîst bidin selmandin, ji aliyê derdorên tarî ve hat pêkanîn. Komara Tirk welatê me ji ciwanan vale kir, ew têkil hişbirê kirin û ew derbasî qada nav-netewî kirin. Yek ciwanê Kurd, heta ku pişgiriya polîsên Tirk nebe nikare evqas li cîhanê belav bibe û di rêya hişbirê de cîh bigire. Yeqîn dikim ez van pasaportan nadim wan. Ger bê xwestin dikarin di rojekê de rêyên çûna wan bê girtin. Jixwe weke polîtîkaya qirkirina netewî, hemû ciwan ji welat derxistin, polîtîka herî bingehîn a vê rejîmê bû. Şêweyek vê ya din jî, ciwanên mayî jî di terîqetan de birêxistin kirin.

Îro li Tirkiyê hinek terîqet, rêxistinên weke Hizbulahê, li ser bingeha ol'î li dijî PKK'ê tên derxistin. Di vir de jî para polîsê Tirk zêde ye. Yek têkil karê hişbirê dike, du, têkil ol û terîqetên sexte dike û wisa jî hewl didin enerjiya ciwan a ber bi têkoşîna me ya rizgariya netewî ve biherike asteng bikin. Cewhera polîtîkayê eve. Mixabin li Ewrûpa jî, gelek zanyariyên şaş gihandin polîsên Alman û propagande dikin dibêjin PKK di bazirganiya hişbirê de bi çalek cîh digire. Weke min gotî, ev tawanbariyek girane. Ez nabêjim misoger ne ji nêz û ne jî dûr ve ti eleqeya me nîne. Em bi tundî li dijî vê ne.

Bila li dadgehên nav-netewî bê selmandin, ger yek endamek PKK'ê yê rastî têkil hişbirê bûye, ezê jî hemû tawanbariyên we bipejirînim. Lê yek tawanbarî nîne. Tenê propagandeyek şirîk heye, çewtkirin heye û li ser ciwanên me lîstokên mezin hene. Hûn jî ger bal bidinê, berê mîna vê li ser reşkan jî lîstokên wisa hatine lîstin. Vaye em jî qurbanê vê ne. Rastî jî weke min gotiye.

Em her tim yê hişbirê bikar jî tîne û dide bikaranîn jî şermezar dikin. Ji pirsa; "Tevger û miletê ku herî zêde li hember hişbirê girtî û li dijî bazirganî û bikaranîna wê kiye" re bersiva em bidin; "Tevgera PKK'ê û gelê me ye."

**Em yeqîn dikin li DYE jî dostên hêja hene**

**David E. Korn:** Birêz Serok, PKK'ê qet berjewendiyên saziyên Emerîka yan jî kesên wê yê li Tirkî yan cihek din kiriye hedefa xwe?

**Abdulah Ocalan:** Misoger heta niha yekser li hember sazî û kesên DYE çalekiyên me pêk nehatine û hedef nehatine girtin. Heta çend Emerîkiyên ku li Kurdistanê hatin girtin bi şêweyek herî baş bûne mêvanê me û paşê jî hatine berdan.

Tevî ku ti şerê me bi DYE re nîne, ecêb dimînim ku DYE û derdorên îstîxbarata wê PKK'ê di cîhanê de weke xeteriyek mezin dibîne. Me çi ji DYE'ê kiriye ku, DYE evqasî di asta cîhanî de bi ser me de tê? Helwestek pir seyr û çavsorî ye. Tevî ne vekirî, ne jî sergirtî ti şerê me pê re nîne, li hember yek kesê wî jî êrîşek me ya herî biçûk pêk nehatiye, DYE bi çi mafî ewqasî bi ser me de tê? Bi rastî jî ez jî dixwazim sedemên vê ji we bipirsim û fêm bikim. Ma me li ku derê êrîşî berjewendiyên DYE kirine, heta ku DYE bi ser me de tê? Her roj daxuyanî bi ser daxuyanî dide, dibêje; "Em pişgiriyê didin têkoşîna Tirkiyê ya li dijî PKK'ê." Çima? Gelo mafdare? Madem tu naxwazî Tirkiye hebûna gelê Kurd înkar bike û qir bike, nexwe tu çima pişgiriyê didî? Deka em bêjin tu li dijî PKK'ê pişgiriya Komara Tirk dikî, rêxistinên Kurd ên nerm hene, hinek daxwazên wan hene, tu çima pişgiriya daxwazên wan nakî, her tim pişgiriya faşîzma Tirk dikî? Ev bi qasî pişgiriyek pir neheqe, ewqas jî li dijî gelê Kurd û partiya me helwestek êrîşkare. Divê bê guhertin. Ji ber ku gelê Kurd nikare xwe baş biparêze, nikare li hember DYE jî baş parastina xwe bike, ma hewceye evqasî dîn û har bê êrîşkirin?

Yeqîn dikim li DYE jî dostên hêja hene.

Dizanim mirovên weke we hewl didin rastiyan hîn zêdetir di nava pîvanên objektîf de binirxînin jî nekêmin. Lê belê tevî vê, weke polîtîkaya we ya dewleta serdest, dixwazim bibîr bixim hûn neheqin, bi salane di bin navê "pişgiriya Tirkiyê" de ji polîtîkaya qirkirinê re dibin amûr.

Ya ku pêwîstiya xwe bi pişgiriyê heyî ne Tirkiye. Bi rastî jî ger baweriya we bi demokrasiyê hebe, beramber mafên mirovan rêzdar bin, yek tişta hûn bikin heye; ew jî pêwîste hûn bibînin ku em tevgerek mafê mirovan diparêzin û têkoşîna demokrasiyê didine. Li dijî qirkirina herî mezin a ku dîrok govaniyê jê re dike, yê ku hewl dide hebûna xwe ya pîroz biparêze, gelê Kurde. Ma wê çima tevgerek di mercên herî zehmet de têdikoşe, di dîrokê de weke wê kêm, li hember rejîma hovane ya dibe ku ji zilma Roma ya li dijî Îsa bikar anî xirabtir disepîne, rêxistinek bi navê gel têdikoşe, çima pişgiriya wê neyê kirin? Ger hûn vê bikin, hûnê li hember mafên mirovan jî, li hember demokrasiyê û di qada nav-netewî de tevkariyê ji pêşketina pêwendiyek hîn zêdetir medenî re bikin.

Yeqîn dikim min, we di vê mijarê de zelal kir. Derdorek we jî ya berfireh heye, dê ew jî li ser vî bingehî zelal bibin. Ji ber ku we daxwaz kir, min hewl da hinek rastiyan pir zelal bibersivînim. Yeqîn dikim wê pêşketinên ji vir û şûnde hîn baştir bin. Her wiha dê ji we re jî derfeta hevpeyvînek hîn bi feraset derbixe holê. Ji bo we silav û rêzên xwe pêşkêş dikim.

## Em Dixwazin Mirov Rizgar Bikin û Emê Qet Radestî Kapîtalîzmê Nebin

Îro şoreşa Kurdistanê di navenda enternasyonalîzma cîhanî de rûniştiye. Ev rewş jixweber pêş neket. Ji bo wisa be sedemên vê yên bingehîn hene.

Berî her tiştî sedema hilweşîna sosyalîzma pêkhatî û şoreşên rizgariya netewî tam negihan encamê û piştî salên 1980’î hemû çav zivirîn ser şoreşa Kurdistanê. Dîsa bi rastiya nav-netewî ve girêdayî, pêwîste di bin vê de bandora mezin a mêtîngeriya Tirk jî bê dîtin. Ji ber Tirkiye welatek NATO ye, dîsa di Rojhilata Navîn de rolên girîng jê re hatine dayîn, girîngiya rola têkoşîna me jî derxistiye holê.

Pêşketina Şoreşa Kurdistanê, tê wateya pêşketina şoreşa welatên Rojhilata Navîn jî. Hem jî di asta şoreşa Fransa û Cotmehê de, şoreşek xwedî bandorek asta nav-netewî ye.

Ne tenê ji hêla erdnîgarî û siyasî ve, ji hêla naverok ve jî sedemên sosyalîzma pêkhatî ber bi hilweşandinê ve birîn ji aliyê me ve hatine dahûrandin û derbaskirin. Di sosyalîzma pêkhatî de, kesayetek sosyalîst û demokrasiyek sosyalîst nehatibû avakirin. Lewma şoreşa Kurdistanê, di asta şoreşa xisletek gerdûnî de bilind bû. Jixwe ger me bi feraseta şoreşa kevnar û feraseta partiya ku sosyalîzma pêkhatî ava kirî ve tevbigeriya, me nedikariya ser bixin. Piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, ji aliyê me ve bidestxistina serkeftinê ji xebatên me yên leşkerî, siyasî û dîplomasî zêdetir, çavkaniya xwe ji xebatên rêxistinî, pêşxistina modela partiyek û rêbertiyek nû digire.

Em amadene mirovatiya xwe bi cîhan, mirovatî û tevgerên şoreşgerî re parve bikin.

Axên Mezopotamya yên em li ser dijîn, di çêbûna mirovahiyê de xwedî cihek diyarkere. Şaristaniyên bingehîn ji vir li cîhanê belav bûn. Mirovatî pir deyndarê van axa ne. Tarîbûna ku mirovatî îro dijî, bi wêrantiya ku civakbûnê re tên jiyîn, cîhan anîna asta ku lê neyê jiyîn, pêdiviyek mezin bi asoya rizgariyek nû, felsefeyek nû û vînek wê ya şoreşgerî derdixe holê. Dîsa van axan gelek nebî û fîlozof derxistine holê. Ji bo şoreşa Kurdistanê wisa pêş bikeve, hema hema dîrok cardin dubare dike.

Emperyalîzmê amûrek mirov a dijberî mirovatiyê derxistiye holê. Ev berovajî xweza û xisleta mirove. Em vê red dikin. Hem jî pir ji kok ve red dikin. Dersa herî bingehîn em bikarin bidin, dersa mirovatiyê ye.

Em weke tevgera PKK'ê ji xwe bawerin. Em bi teknîk û dewlemendiyê ve sonda tiştekê nadin. Nabêjim; "Emê pêşveçûna aborî wisa bikin, wisa tevkariyê ji dewlemendiyên binerd û sererd re bikin."

Tişta em bikarin bêjin, ji bo bûna mirov emê bijîn û ti carî dev ji vê bernedin.

Ya niha tê jiyîn hovîtiyek berovajî ye. Em jî li dijî vê hovîtiyê li ber xwe didin. Heta dawî yeqîn dikim ku, emê serkeftî bin. Dibe hinek hêjî naxwazin asta me bibînin. Dikarin şûna hovîtî û terorîzma xwe ya bêrehm, me terorîst îlan bikin. Hêj duh DYE Hîroşîma û Nagazakî, ezê nebêjim bi sehm jî, bi çekek herî hov ve tine kirin.

Di rewşa heyî de li pişt hemû kuştin û komkujiyan kîjan pergal heye? Terorîzma herî mezin di pergala kî de heye? Di dewleta kî de heye? Emê dev ji nirxandina van bernedin. Emê bi israr bêjin ku terorîstên herî mezin evin.

Ya rastî “pergala cîhanê ya nû” bêpergaliya herî mezin a mirovatiyê nas kiriye. Li naverastê nepergal, nehevsengiyek ji rê derketiye, bi her cure neheqî û xirabûnên hevsengiya xwezayê re, rizîna civakî jî giran dike heye. Niha her kes encamên vê nehevsengiyê baştir dibîne. Rizîn pêş ketiye û pirsgirêk giran bûne. Niha bi têkoşînek şêwaza kevnar an jî bi rêbazên şerê gel ên kevin ve, pêvajoyek dubarekirin, gotin di cîh de be, “modeya wan derbas bûye.” Misoger ji bo pergala mirovatî ya nû pêwîste çareseriyek hîn pêşketî, rojane bûyî, pirsgirêkên bingehîn ên mirovahî li ser bingehek hem felsefî, hem dilxweşî û hem jî zanistî çareser dike ramanek sosyalîst bê pêşxistin. Di vê manê de li dijî bêpergalî û bêsazûmaniya emperyalîzmê, enternasyonalîzmek nû şerte.

Çavkaniya pirsgirêkên weke dêwan, pergala kapîtalîst-emperyalîste. Pirsgirêka metrepolên emperyalîst, ji yên berê zêdetir giran bûne. Hema bêje hoveberiyek cuda jî em di navenda Ewrûpa û Emerîka de dibînin. Welatên paşve hatine hiştin, bi teqîna şêniyan ve, bi her cure nexweşiyan ve hatine astek ku neyê jiyîn. Ji pirsgirêkên sedsalên 19. û 20. girantir, di sedsala 21. de li benda mirovatiyê ne. Lewra ne li ser bingeha bi şêwazên kevin ve şerên gel an jî li ser bingeha ferasetên şoreşên kevnar, neçare nûbûnek sosyalîzmê ya mirov esas digire, xwezaya mirov û di nava civakê de sekna xwe ya azadî esas digire, pêngavek sosyalîst pêş bikeve.

Emê ji rizgariya netewî zêdetir, ji bo bibin partiyek civakî, humanîst, mirovî û enternasyonal, hêza xwe seferber bikin. Ji ber ku

asoyên mirovatî hatine tarîkirin. Divê ev aso bên ronîkirin. Em ji her demê zêdetir, neçarin ku niha nûnertiya îdîayên mirovatiyê bikin. Merc çiqas giran dibin bila be, divê em di vir de bi israr bin. Dê ev me ber bi enternasyonalîzma dema nû ve bibe. Her çendî şoreşa Kurdistanê weke şoreşên ji rêzê jî bên dîtin, bi asta ku gihayê ve, bandorên enternasyonalîst ên girîng derxistiye holê.

Pir zêde êrîş li ser sosyalîzmê hene. Piştî hilweşîna sosyalîzmê jî, êrîşên li hember sosyalîzmê didomin. Ewrûpa roja me, ji bo sosyalîzmê binax bike, hewldanek mezin dide. Heman weke piştî Şoreşa Fransa, weke di dema nûkirinê de hatî dîtin, ji bo astengkirina şoreşekê ketiye nav tirsek zêde. Dijminatiyek dijwar a sosyalîzmê pêş dixe. Ev rewşa emperyalîzma Ewrûpa, bi Ewrûpiyan re reşbînî ava kiriye û hêviya wan a bi şoreşê lewaz kiriye. Lê belê hêjî nakokiyên bi pergalê re neqediyane, hîn zêdetir kûr bûne.

Ya pêwîste bê kirin sosyalîzma zanistî, weke zanist rojane kirine. Yeqîn dikim, em vê di pratîka xwe de pêk tînin. Di vê manê de ne esasên sosyalîzmê, taktîkên dema kevin û hinek stratejî şaşin.

Îdîayên sosyalîzmê, ji her demê zêdetir ji bo mirovahiyê hewce dike. Dê mirovatî yan bi sosyalîzmê hebûna xwe pêk bîne, yan jî dê di hovîtiya kapîtalîzmê de tine bibe û biçe. Ger em naxwazin mirovahî tine bibe, divê em heta dawî di sosyalîzmê de israr bikin.

Îro şoreşgerên cîhanê, weke her yek tawanbarin guman ji xwe dikin. Ev qet jî ne helwestek raste. Yên hewce dike ji xwe guman û şerm bike neşoreşgerin, emperyalîzme. Em weke tevgera PKK'ê, dikarin heta dawî bibin qêrîna şoreşê ya herî mezin. Dema vê jî bikin, ne bi pesindanek vale ve, dîsa ne ku bingehên wê yên teorîk nebin, weke derketinek tenê girêdayî vîn jî nanirxînim. Xwezaya mirov ji hêla me ve pir baş hatiye nirxandin. Em li hember xisletên bingehîn ên mirov rêzdarin.

Em dixwazin mirovê ku pergala kapîtalîst-emperyalîzmê wêran kirî rizgar bikin. Emê qet radestî vê kapîtalîzmê nebin. Hemû cîhan bibe yek jî, hemû şoreş têk jî biçin, emê bi îdîayên xwe yên mirovatî ve li hember jiyana ku kapîtalîzm ferz dike, heta dawî li ber xwe bidin. Şoreşa Kurdistanê, ne şoreşek teng a netewî ye. Li ber çavan netewî

ye, lê di cewhera xwe de şoreşa mirovahiyê ye. Heta ger ev şoreş ser bikeve, ne komarek netewî, şoreşa komarek mirovatiyê ye.

Ji bo hebûna sînoran zêde negirînge. Pirsgirêkek me ya hunandina sînoran nîne. Lê ji bo serxwebûna mirov û gelan heta dawî amûrek dijware û ji bo vê jî şerek me mezin heye. Em mirovê ku fetih dike û miletek ku pêwîste fetih bike derdixin holê. Ev jî ji zanista sosyalîst re tevkarî û destkeftiyek mezine.

Dîsa dema em îro li pêwendiyên di navbera gelên Kurd û Tirk de dinêrin, tevlîheviyek tê dîtin. Emperyalîzm xwe bi sipartina hevkarên xwe ve li ser herdu gelan jî bi şêweyên cuda pergalek mêtîngerî û zextê ya tevlîhev ava kiriye. Mêtîngeriya Tirk dixwaze, çand û gelê ku dîrok pir ji kevin de nas dike tine bike. Ji ber stratejî û berjewendiyên pir ferdperest ên hinek dewletên weke DYE û Almanya, dixwazin vê xezîneya mirovahî û çandî ji bo carek din zindî nebe, di tarîtiya dîrokê de binax bike. Rewşa em dijîn, ne mêtîngeriyek ji rêzê ye. Ne tenê zextek siyasî ye jî. Ne rewşek ku dikare bi zexta netewî ve jî bê ravekirine. Polîtîkayek qirkirinê ya mînaka wê nehatiye dîtin, li ser gelê me tê meşandin. Emperyalîzm jî naxwaze vê bibîne. Ji bo nabîne jî hawar dike dibêje; “Bosna.” Îsyan dike dibêje; “Çeçenya.” Her roj hewl dide di raya giştî de bi pirsgirêkên derew ve rewşa xwe rizgar bike. Bi heman şêweyî di pirsgirêka Kurd de jî durûye û heta dawî pişgiriyê dide rejîma faşîst a Tirk, naxwaze tawana xwe ya di vê qirkirinê de bibîne. Divê demokrat û sosyalîstên Rojava, teqez vê durûtiya welatên xwe bibînin. Dê ev jî bi Kurdên bindest û gelê cîhanê re bibe pişgiriya herî manîdar a enternasyonalîst.

Ti suc, bi qasî sucê qirkirinê nîne ku neyê efûkirin.

Li Kurdistanê rewşek tawanê heye û hemû welatên kapîtalîst têkil vê tawanê bûne. Vale vale me weke hêza sereke ya terorîstê cîhanê îlan nakin. Ev weke dizê malê, hem sucê mirovahî yê herî giran dikin, hem jî me tawanbar îlan dikin. Ji bo vê jî li Ewrûpa lîstokên mezin hatin sazkirin. Mînak kuştina Palme, hêzên paşverû yên nava NATO, dema Reagen û Kohl li ser kar bûn, ev kuştin pêk hat. Ji serî heta dawî ji bo PKK’ê terorîst îlan bikin û dijminatiya sosyalîzmê sor bikin, ev

kuştin pêk anîn. Me weke tevgera sereke ya Marksîst-Lenînîst ku kariye li ser lingan bimîne, di cîhanê de herî xeter dinirxînin.

Em tenê bi vê serbilindin. Sedema ku Almanya evqasî êrîşî me dike, ne ji ber me çend çalekiyên tund lidar xistine. Ji me ditirsin, ji sosyalîzmê ditirsin. Dixwazin di kesayeta me de sosyalîzmê bikujin û ji bo ev ser nexistin hêrs dibin. Em pir serbilindin ku, li Ewrûpa partiyek pak û bi lehengî îdîayên sosyalîzmê ve girêdayî ne.

Şoreşa Kurdistanê, ne şoreşek netewpereste. Şoreşa Kurdistanê di heman demê de şoreşek Tirkiyê ye. Şoreşa Kurdistanê ya ser ketî, Şoreşa Tirkiyê ya ser ketî ye. Heta şoreşa Rojhilata Navîn, Balkan û Kafkasya ye.

Em her tim amadene ku pêwendiyên xwe bi gelê Tirkiyê re ji nû ve vesaz bikin. Heta bê ku pirsgirêka sînoran bikeve rojevê, di nava yekbûna erdnîgariyek diyarker de, em amade ne ku asta azadiya dîrokî, çandî û siyasî ya gelan li ser bingeha wekhevî pêwendiyan ji nû ve vesaz bikin. Ya esasî em dixwazin, dawî li qirkirina Kurdan anîne û pêwendî hîn zêdetir bi mirovî li ser heman axan vesazkirine. Lê mixabin rejîma faşîzan a Tirk hîn zêdetir bi xwîn û şovenîzmê bersivê dide van daxwazên me. Gelê Tirk di bin pêlek pir giran a şovenîzmê de ye. Tevî em nêzîkbûnek enternasyonal raber dikin, ji ber şovenîzma pir bandor a Tirk, asteng kiriye ku di nava gelê Tirk de pêşketinek bi vî rengî rû bide. Lê hewldanên me yên bi israr, wê gelê Tirk jî bîne vê qonaxê.

Emê li ser axa xwe, bi gelê Tirk re enternasyonalîzmek mînak pêş bixin. Emê nekevin nava netewperestiyek teng. Emê destûrê nedin ku pirsgirêkên sînor bibin asteng. Emê ti carî weke gotinên wan ên dibêjin; "Evqas ax ji bo te ye, evqas jî ya mine. Emê kevirekî jî nedin an jî bigirin", nîqaşên erzan nekin. Piştî ku azadiya gelan hat fetihkirin, tê wateya ku ji bo me enternasyonalîzma herî manîdar pêk hatiye. Ev nûbûneke û yeqîn dikim ku emê ser bixin.

Şoreşa Kurdistanê her ku diçe zêdetir derfetên serkfetin û pêşveçûnê bidest xistiye. Ti amajeyên binkeftinê tine ne. Gelê Kurdistanê, xwe gihandiye rastiya gelê ku şer dike. Pergala emperyalîst a nav-netewî, weke hedefa sereke ku pêwîste bê tinekirin

bi ser me de tê. Lewra em berxwedaniyek pir zehmet didin. Ger em emperyalîzmê ji eniya Kurdistanê qut bikin, dê Şoreşa me di asta Şoreşa Cotmehê de, heta dê bibe şoreşek ji wê jî bandortir.

Şoreşa Kurdistanê, bi qasî hêviyên rizgarî yên gelê Kurd û rizgariya wê gav bi gav pêk tîne, ewqas jî ji bo gelên herêmê û gelek miletên din ên weke wê dibe şoreşek mînak. Dîsa di asta herî berz de nûbûna sosyalîzmê, şoreşa jinê û di vê manê de derfeta pêşketina felsefeyek nû ya şoreşa dilxweşî derdixe holê. Dibe ku em pêşketinek tam dixwazin najîn, lê pir vekiriye ku em ji bo mirovahî, ji bo gelê xwe û ji bo dostên xwe pêşketinek baş dijîn.

## Sosyalîzm û Çareseriya Gerdûnî Ya Di Nava PKK'ê De Pêş dikeve

Bêguman ji destpêka dîrokê heta niha cîhanek, ramanek cîhanî, berjewendî, girêdayî wê piştewanî, rêxistinbûn, têkoşîn û dîrokek kedkaran, bindestan û hatine mêtîn heye û didome.

Her ku dîroka têkoşîna sosyalîzmê û mirovatî hebe, dê berdewam bike.

Jiyana civakeke mirov ku xwe gihandiye bingehek zanistî, di roja me de di nava nakokiyên mezin de diheje. Ji ber ku ji aliyekê ve nêzîkbûnên cinawirî yên ku di nava mirovahiyê de heywanên wehşî jî derbas dikin hene, li aliyê din jî daxwazên xwe gihandina xeyalên buhiştê hene. Bi qasî îdealên civakî, dijberî û harbûnek ferdperestî ya tam dijberî civakê dijwar dibe. Ji ber ev têkilhev pêş dikevin û pevçûna wan nakokiyan kûr dike.

Civakbûn, girêdayî xweseriya mirove, şêweyek hebûnê ya bê wê nabê ye. Jixwe şer jî ji vir destpê dike.

Gelo civakbûn, çiqas ji bo mirov hewce ye?

Azadbûna kes a di nava civakê de, ji bo civakê çiqas hewce ye?

Cewhera nakokiyê eve. Lewra bîrdoziyên cur be cur, çareseriyên wê yên cur be cur her tim pêşxistin, heta roja me, nêzî zanistî û nêzîkbûnên sosyalîstî hatiye. Dahûrîna civakî tenê bi sosyalîzmê re çênebûye –lê yaku herî zêde nêzî raveya zanistî sosyalîzme-, beriya wê jî hema hema di hemû ol, efsûn, heta fikrên cuda de, bandorên erênî yan jî neyênî li ser rastiya civakbûna mirov kiriye. Şerê paşverû û pêşverû, fikra tarî û ronahî, nêzîkbûnên dijminatî û dostanî, her tim berhemên vê nakokiyê ne. Wisa tê fêmkirin ku, ev wê her tim di dîroka mirovahiyê de bidome.

Em van têgehên giştî ji bo vê dibêjin: Nexasim di roja me de, kesên bêmaf û xwedî seknek mêtîngerin, çînên civakî yan jî tebeqe, ji bo berjewendiyên xwe biparêzin, propagandeya li ser bingeha israr û zexta xwe pêş dixin. Teqez didin diyarkirin ku dawiya sosyalîzmê hatiye. Êdî ya serdest nêzîkbûnên berjewendiyên wane. Dixwazin vê jî her tim dubare diyar bikin ku çarenûseke yan jî jênevegere. Hêzên

emperyalîst ên sereke, dewlet, îdeologên wan ên di astên cur be cur de ji ber firsend girtine, hewl didin bi hemû hêza xwe ve vê ji bo serkeftinê misoger bikin. Îdîayên fikra sosyalîzma pêkhatî ya 70'î salî, ya rastî sosyalîzma ku pêşketinek pir mezin jiyayî tenê cureyek hilweşîna xwe ye yan jî ji bo rewşa derbasbûna wê xurt bi îdîa bikin dixwazin bikar bînin.

Di her demên dîrokê de pêvajoyên wisa tên jiyîn. Hêzên berjewendîparêz, statîkoparêz, pir diçewsînin û alîgirê mêtîngeriyê ne, dibêjin; "Ji firsendê sûd werbigirin", weke ku hewce dike berjewendiyên wan heta dawî serwer bin, hemû hunerên xwe didin axaftin. Ger nêzîkbûnek şiyar neyê kirin, dibe ku baş jî serkeftî bin. Di vê manê de ji hêla têkoşînên civakî ve, rastiyên rojaneyî ji her hêlê ve kûranî têgihiştin girînge.

Bêguman feraseta jiyanê, têgihiştinek cîhanî û di rêya wê de têkoşînên mirovatiya cîhanê û derdorên bindest û hatine mêtîn dê tim hebin. Sosyalîzma ku hatî damezirandin, qonaxek vê bû. Beriya vê di Şoreşa Fransa de jî hebû, beriya Şoreşa Fransa di hemû şoreşan de, heta di Şoreşa Îslamê de jî hebû. Weke ku di van şoreşan tevan de yên di jêr de, bindest û mêtînkirî hene, ramanên wan ên cîhanê yên radîqal an jî şerên wan jî çêbûne. Hema di hemû dîrokê de, di nava her gelî de, di hinek demên dîrokê de ev pir berfireh hatine jiyîn. Lê divê ev me asteng neke ku em rastiya roja me ya diyarker bibînin. Ne bi nêzîkbûnên dinepixîne, ne jî înkarkirinê, divê em ji her hêlê ve ji nirxandina rastiyan dûr nemînin.

Ev jî dikare bê gotin: Her tim girîngî hatiye dayîn ku bindest û kedkar ne xwedî fikrek teng bin, nexasim polîtîk û felsefîk bifikirin, di vê mijarê de heta dawî weke şêweya yên serdest û mêtînger bişopînin hatine hiştin. Ji bo rastiya xwe ya bîrdozî û polîtîk nebînin û bi şoreşê re neguherin, yan bi zorê, yan jî bi xapandin desteser kirine. Fikarên wan ên jiyana rojane, her ku çûye hîn zêdetir tengav kirine, mercên jiyana wan a heyberî her tim dijberî kedkaran hatine girtin.

Îro jî, pir tê jiyîn. Ji bo bê aso bin, gava ku pêwîste di rojê de bê ferzkirin, ferz nekin, berfireh dikin. Çi di cîhanê de, çi jî di rastiya

Tirkiye û Kurdistanê de ev hîn şênbertire. Her wiha di dîrokê de rastiya bi lenet a bindestan wisa derketiye holê. Di vê wateyê de rastiya em her tim bikar tînin weke; "Gelê bi lenet, çîna bi lenet" jî eve. Ji dûvika serdestên xwe nequtbûn, ji tora pêwendiyên wan ên berjewendiyê rizgar nebûn, heta ber bi wê ve herikîn, tê wateya gel, an jî çîn û kesê bi lenet. Ev jî sedema herî bingehîn a ketîbûn, hov û bêqîmet dîtinê ye.

Rastiya xwe azad nedîtin, di şopa serdest, mêtînger û dijminê xwe de meşîn, pey ketin, heta dûviktiya wî kirin, rewşek herî ketî ku bê jiyîne. Jixwe bingeha bê exlaqiyê jî eve. Her cure fikra teng, heta di asta herî kêm de jî nepêşwazîkirina berjewendiyên xwe jî, sedema wê ya misoger eve. Me jî di vê xalê de bi israr peyvên weke; "Kirêt û ketî" berfireh bikar anîn û di cîh de ye. Em jî di vê xalê de heta dawî bi israrin. Di vê wateyê de asoyên sosyalîzmê bi biryardariyek mezin parastin, ev azad û bi şer kirin pir girînge. Dema bikin jî, divê mirov ne dogmatîk be, ya girîng mirov ji rê dernekeve.

Ji ber ku ancex kedkar dikarin di wateya zanistî de civakê baş fêm bikin. Her çîna dervî kedê, dikare serî li her derew û her cure dogmatîzmê bide. Dikarin pir cure sextekariyê weke bîrdoziyên mayînde, heta teqezin ferz bikin. Lê belê weke di her kêliya dîrokê de çêbûye, yên xwediyê kedê, ji nêz ve bi encamên wê ve eleqedar dibin jî, di pêşxistina bîrdoziya nû û şoreşgerî de zehmetiyê najîn. Di vir de bi biryarin û derdixin holê.

## Lenînîzm Bi Giştî Sedsala Me Bandor Kiriye

Di nîqaşên sosyalîzma roja me de herî zêde sosyalîzma ku heftî salî zêdetir hemû cîhan bandor kirî, ya hatî sazkirin û îro hilweşiyayî yan jî derbas bûyî tê nîqaşkirin.

Carek din destgirtina vê dibe ku sûdmend be. Em dikarin vê sosyalîzmê bi gelemperî jî binirxînin. Sosyalîzma pêkhatî weke sosyalîzma her tiştiye nirxandin, wê pir teng bimîne. Jixwe dema nêzîkbûnên Lenînîzmê jî yên bi giranî polîtîk û taktîkî berçav bê girtin, ev di dîroka sosyalîzmê de weke qonaxek taktîkî nirxandin a herî guncave.

Xisletên herî bingehîn ên vê qonaxê çine? Nakokiyên kapîtalîzm û emperyalîzmê yên herî vekirî û ji bo vê ferzkirina du şerê cîhanê heye. Beriya wê jî gelek şerên bê wate hene. Di serdema dijberî gelan de dabeşkirina cîhanê, berdewamkirina şêweyên mêtîngeriya çors a li ser kedkaran, di vê navberê de pir lez pêşketina zanist û teknîkê, li ser vî bingehî pir lez şiyarbûna kedkaran, dîsa şiyarbûna netew û gelan û arestebûna ber bi netewbûnê ve, Lenînîzm dibe navê tevgera azadiyê ya mezin. Bi rastî jî ji çalekgeriyek pir mezin re rê vedike.

Sedsala 20. sedsala Lenînîzmê ye.

Her çendî di roja me de tê gotin "ji çav ketiye", ya rastî bi giştî Lenînîzmê sedsal bandor kiriye.

Di destpêkê de em baş dizanin ku, sosyalîzma zanistî bi Marks û Engels re pêngavek mezin saz kiriye. Nexasim ramanên cîhanê hîn zêdetir bi zanistî bûye û ber bi rêxistinbûnê ve herikî bû. Lê di wateya polîtîk û taktîkî de zêde ne pêşketî bû. Nexasim çi di ceribandina Komîna Parîsê de, çi jî di raperînên weke vê de dibe, bandora vê pir

bi sînordar bû. Lenînîzm ji bo wê taktîka polîtîk bi şêweyek pir hostane bicîh kir û bi şoreşê guhertina cîhanê û pêşketina şoreşa sosyalîstî pêşveçûnek mezin bidest xist. Bêguman ji ber ku zêde girîngî neda aliyên wê yên bîrdozî û dilxweşî, ne di wê astê de bû ku bandora mêtîngeriya kevin û di serî de jî yên kapitalist û emperyalîzmê ber çavan re derbas bike û dahûrîne. Ya ku dixwest rizgar bike; derbaskirina pergala mêtîngeriya pir çors û çewsîner bû, ji bo kedkaran û gelan cîhana jiyanek guncav avakirin bû. Di vir de jî serkeftî bûn.

Di vê manê de em nikarin bêjin sosyalîzma pêkhatî bi temamî hilweşiya û binkeftiye. Wê ev bibe derewek mezin.

Bêguman tevî ku nebesî û şaşiyên ne li gorî sosyalîzmê zêde ne, di azadbûna kedkaran de, di pêşketina wan a heyberî û giyanwerî de pêşveçûnek mezin rave dike. Di heman demê de di netewbûna gelan de û di pêşketina wan a azadî û serxwebûnê de Lenînîzm bi rastî jî qonaxa herî girîng rave dike. Ev qonaxa sosyalîzmê, di vê wateyê de bi serkeftinên mezin ve dagirtiye. Vêca dema tê gotin; “Başe ya hilweşayî û weke derbasbûyî tê dîtin çiye?” Mirov dikare bi şêweya ji ber xwe nû nekir, bi rojev nekir, pirsgirêkên nû û rêyên çareseriyê nedît şîrove bike. Ya rastî bernameya di destpêka sedsalê de kêm-zêde di ceribandina sosyalîzmê de hat pekan û serxistin.

Mînak di çarîka sedsalê ya dawî de behsa xwe gihandina komînîzmê dihat kirin. Hêj wê demê me didît ku ev, xeyal û fişalbûneke. Di pêvajoyek ku cîhana kapitalist û emperyalîst ewqasî lê xurte, heta şêweyên civaka koledar ên beriya xwe û nexasim di kes de zêde tê jiyîn, behsa îdîayên komînîzmê kirin xwe xapandin û nepixandine. Lê tişta ku pêwîste ji vê jî bê fêmkirin; taktîkê Lenînîst gihaye dawî yan jî peywira xwe bicîh aniye û ber bi qonaxek nû ve hatiye.

Vaye hêj beriya niha Gorbaçov bi şêweyek pir seyr li Tirkiyê geriya. Di vî karê rûxînê de kesê herî zêde navê wî tê bilêvkirine. Ya rastî çi bi fêhma, çi jî nefêhma be, vê nakokiyê dijî. Dibe ku hewl dide bêje jî. Zêde hewce nake ku bê selmandin. Jixwe asta azadiya gelan û kedkaran, bi qasî sedsala 19. re neyê muqayesekirin pêşve çû.

Ev hemû encama sosyalîzma zanistî, serkeftina wê ya herî girîng a pratîk û taktîkê Lenînîst ê herî girînge. Bêguman partiyên ku di van pêvajoyan de hatîn damezirandin hene. Nexasim taktîkên têkoşînên van partiyan di meriyetê de ne. Hemû jî di Lenînîzmê de berfirehî hatine destgirtin. Lê belê ber bi roja me ve asta ku pêwîste bê girtin hatiye girtin, hedefên ku pêwîste xwe bigihînine jî kêm-zêde hatine gihiştin. Lewma hewce dikir hedef bihatan destnîşankirin. Ev jî nirxandina rewşa mirovahî ya rojaneyî û ji vê jî hedef û bername derxistin bû. Yan wê partiyên komînîst ên kevin bihatan nûkirin, an jî wê yên nû bihatan damezirandin. Pêwîst dikir sosyalîzm xwe bigihîne qonaxek-merheleyek wisa. Ya hewce wisa bû. Lê mixabin a herî zêde têrkar nehatî kirin jî ev bû.

Hinekê jî pêkana vê zehmet bû. Ji ber ku asta dewletbûna di nava Sovyetan de li pêş vê astenge. Nakokiya hîmdar jî di vir de ye. Bêguman ji bo vê qonaxa sosyalîzmê dewletbûn hewce dikir. Ev nayê înkarkirin. Lê evqasî fişalkirin û mezinkirina dewletê, bi cewhera sosyalîzmê re nakok bû.

Wisa tê fêmkirin ku, damezirandina dewletek sosyalîst, heta dîktatoriya proleterya, ne avakirina civakek sosyalîste.

Jixwe qet ne avakirina mirovek sosyalîste.

Şaşî yan jî xwe xapandin bi giranî di vir de ye. Wer zanîn ku damezirandina dewletek baş têra her tiştî dike. Hema bêje di roja me de feraseta dewletparêziyê gihandine asta herî bilind. Weke ku pir pîroze hema her kes dibêje; “Dewlet û berjewendiya dewletê.” Lê belê pir ecêbe, îro jî her kes herî zêde loman ji dewletperestiya zêde dike. Yên herî zêde dewletperestiyê dikin, herî zêde berjewendiyên wan di dewletperestiyê de heyî, îro pêwîst dibîne li dijî dewletperestiyê derbikevin. Ev jî pir vekirî û jixweber destnîşan dike ku, çiqas pêdivî bi sosyalîzmê heye.

Ya rastî ya herî zêde li dijî dewletbûnê sosyalîzm bû.

Heta ji hêla teorîk ve jî tefîn û hilweşîna dewletê rave kiriye. Hemû bîrdoziyên mêtîngerî yên din, cihek pir pîroz dan dewletperestiyê. Lê sosyalîzm cîh nadiyê. Lê ecêbe, îro jî herî zêde alîgirên liberal-

kapîtalîzmê, li dijberî dewletê nîqaşan dimeşînin. Vaye li Tirkiyê yên herî zêde kapîtalîst, behsa taybetkirin û biçûkirina dewletê dikin. Ya rastî karê hewce dikir sosyalîzm bike, niha bi derew û durûtî ve carek din ji bo domandina xwe dikin.

Nexwe beriya her tiştî sosyalîzma nû û rojaneyî, li dijî vê dewletperestiyê ye û neçare ji her bîrdoziyê zêdetir li dijî derbikeve.

Pêwîst dikir biçûkirin û tefandina dewletê ser xistiba, rewşa nakok ya pir xeter, bê wate heta ya sereke li ser civak û heta kes bihata dîtin û raber kiriba ku, dê çawa bê derbaskirin. Hinekê jî ya nehat kirin ev bû. Heta di vê manê de hêmana dewleta Sovyetê weke hêza herî astengdar a bingehîn derdikeve pêşberî me. Bêguman di vir de şopên civakên mêtînger ên kevin hene. Ferzkirinên kapîtalîzm-emperyalîzmê bibandor bûne. Lê belê ji hêla vîna sosyalîst ve derbaskirina vê sedema diyarkere. Ev xala ku pêwîste berpirs bê girtine. Sedema ku îro li Sovyetan behsa taybetkirin, takekeskirin û lîberalîzmê tê kirin jî eve.

Dewletek wisa hatiye avakirin, civak di rewşek nikare henase bigirê de ye. Di vê watê de dibe ku ya hatî kirin bi temamî ne vegera li kapîtalîzmê be. Jixwe şêweyek kapîtalîzmê ye. Ewqas nepixandina şêweyên dewletperestiyê, ji vê re rê vedike. Feraseta ku kapîtalîzma dewletê weke sosyalîst dibîne, bûye sedema vê rewşê. Ji vê rizgarbûn, hîn zêdetir giranî dana kes, zêdetir lîberalîzm û zêdetir demokrasî ye, ev jî dibe derbaskirina kapîtalîzmê û dewletê. Ango nepêşxistina kapîtalîzmê ye. Bêguman wê di kapîtalîzma takekesî û kapîtalîzma taybet de jî pêşveçûnek çêbe, lê bi temamî pêşveçûna çêbe ji vê hêlê ve diyarkirin wê berovajîkirina rastiyan be. Lê hêjî ev nîqaş neqediyane. Ezmûna Sovyetê ji vê hêlê ve, hêjî hûrûkûr tê nîqaşkirin. Modelên ku wê dişopînin, heta ku gava nû bibînin dê nîqaş bikin û ber çavan re derbas bikin. Elbet pirsgirêk ne ewe ku, sosyalîzma bê avakirin tenê xwe ber çavan re derbas bike û nûbûna wê ye.

Pirsgirêkên ku nakokiya kapîtalîst-emperyalîst li ser mirovahiyê kiriye bela, qet ji yên dawiya sedsala 19. û ji yên destpêka sedsala 20. ne kêmtirin.

Mirovatî niha ji her demê zêdetir bi karesatên mezin re rûbirû ye. Pêvajoyên civakî yên nayên venêrîn hene. Ji ber aboriya kapîtalîst derdor û xweza wêran dike, hema bêje dê dawiya cîhanê bîne. Dîsa avaniya civakê ya bê kontrol, ketiye rewşek ku êdî cîhan têrê neke. Ji aliyê bîrdozî û dilxweşî ve jî mirovan di nava bêhêviyek mezin de dihêle û bi rewşek şêweya pir bêwate re tîne beramberî hev. Îro di vê mijarê de îdeologên kapîtalîzmê jî nirxandinan pêş dixin. Ev jî tê vê wateyê:

Kapîtalîzmê, bi mirovan re îdealîzm nehiştiye.

Îdîa û hêvî xilas kiriye. Gotina dawiya dîrokê, tê wateya bi mirov re tinekirina îdîa û hêviyê. Ev jî yeksan kapîtalîzme.

Êdî kapîtalîzm aso û hêvî nade.

Vêca tam jî di vê xalê de çi hewce ye? Bîrdoziya ku hêvî bide mirovahî hewce ye. Ev jî bivê-nevê sosyalîzme.

Dawiya xwe, weke dawiya mirovahiyê, dawiya dîroka xwe weke dawiya dîroka mirovahiyê diyarkirin, xisleta her bîrdoziya serdeste. Gotina piştî wî tiştek nebe, ji ber jiyîna wan hewce ye. Ev di her serdema girîng de hatiye dîtin. Serdemekê dibe ku Roma xwe weke pergala ku qet narûxe diyar kiribe. Împaratoriyên feodal jî wisa bûn. Dîsa gelek împaratoriyên kapîtalîst jî –yek DYE ye- hewl didin bidin pejirandin di nav mirovahiyê de yên dawî ne. Lê belê pêşketin, qanûnek xwezayê ye. Lewra negengaze dawiya mirovahiyê be. Ne gerdûn serûbin dibe, ne jî mirov bi hilweşînek pir cidî û nexweşiyekê re rûbirû ye. Pirsgirêkên wê yên bîrdozî, polîtîk, civakî û aborî ne. Bêguman çareseriyên wê jî bîrdozî, polîtîk, civakî, aborî, çandî û dilxweşî ye. Yên ku li vir herî zêde xwe bi çarenûsa mirovahiyê ve girêdayî dibînin, bi çarenûsa wê re mijûl dibin, ji bo çareseriyê jî helwest û reftarên xwe peywirdar dibînin jî wisa xurt bibin. Wê di vir de jî civakbûn, xwezayî sosyalîzm herî zêde bi îdîa be û piranî jî ya hewce nêzîkbûna bîrdoziya zanistî ye.

Li ser vî bingehî sosyalîzm dikare xwe ji nû ve sazûman bike.

Bi rastî jî di roja me de tiştek ku kapîtalîzm bikare bide nîne. Mînak, dema em li makanîzmayên sûka serbest dinêrin, bi temamî

derdorek mêtînger a girêdayî rant û faîzê hatiye avakirin. Kapîtalîstan di sedsalên beriya niha de bi hilberîn û bazirganiyê ve mijûl dibûn. Niha hilberîn, bazirganî û teknîk danîne aliyekê, sûka rojane, bi radeyên girêdayî faîzan ve radibin û rûdinin. Ti eleqeya vê jî bi hilberînê ve nîne. Ango kapîtalîzm evqasî bêwate û bêkar maye. Her wiha li hemû welatên mezin, welatên kapîtalîst ev sûk û lîstokên borsayê serdeste. Ev jî nade diyarkirin ku kapîtalîzmê tam ser xistiye, raber dike ku ketiye rewşek ne ti tiştî de û bê wate bûye. Gelo dikare bi lîstokên borsayê ve heta kur biçe? Ev jî şêweyek qumarê ye. Ji wî digire dide yeke din. Her tim dest diguhere. Ev jî qumar bi xwe ye.

Nexwe, kapîtalîzm di roja me de di rewşek lîstoka qumarê de ye.

Qet hewce nake ji bo kapîtalîzmê pênaseyên nû bên kirin. Pergalek qumarkariya baş, di roja me de herî baş kapîtalîzmê rave dike. Nexwe tam jî di vê xalê de, ev qumara mezin li ser mirovahiyê tê lîstin. Li ser mirovahiyê trilyon dizivirin. Ev trîlyon jî ji bo cîhan û mirovahiyê karesate. Sedema esasî ya hemû xirabûna ye. Ev nedîtin, an jî dîtin lê dij nederketin, yeksan temaşekirina –ji Neron xetertir- şewitandina mirovahiyê ye. Vêca ger hêvî ji mirovahiyê nayê qutkirin, li hember mirovatiya hîn zêdetir bi îdîa û bihêvî bawerî heye, bêguman divê hêz têra çalekiya wê ya avakirinê bike û hêza derbaskirina vê pergala qumarê jî hebe. Dîsa devjê berde ji vê bireve, ev di astek azwerî de bi îdealîzmek bilind û têkoşînê ve mezinkirin hewce dike.

**DYE Hem Dizê Malê Ye**
**Hem Jî Terorîstê Navxweyî ye**

Îro di serî de tevgera me, navê yekane ya hêjayî tevgerên şoreşger tê dîtin –weke xeteriya herî mezine- bi şêweyek pir sosret bi îdîayek terorîzmê didin diyarkirin.

Nexasim îdeolog û polîtîkvanên DYE radibin-rûdinin dibêjin "terorîzm." Hewl didin her tiştî bi vê peyvê rave bikin. Ya rastî pêwîste herî zêde jî ew bi vê peyvê –terorîzmê- bên nirxandin.

Ya herî rast mirov bêje terorîstên herî mezin hêzên polîtîk û aboriya DYE'yê ne.

Ji ber ku ya herî zêde bela serê mirovahiyê, lîstoka herî xeternak dilîze, lewra zext û îşkenceyê bêrehm disepîne, qevdek terorîstiya borsa û terorîstiya polîtîke.

Ji ber ku di destê wan de çekên rûxandinê yên mezin hene û her roj weke gef di destê xwe de digirin. Dem bi dem jî li dijî gel û hêzên dikevin ber çavên wan jî bikar tînin û terorîzmê pir baş disepînin. Hinekê jî weke yavûzê dizker, ango hem diçewsîne, hem jî xwe bihêz dide diyarkirin. Hem mala mirovahiyê dişelîne, hem jî xwediyên mirovahiyê tawanbar dikin.

Nexasim em niha bi israr tawanbarkirina PKK'ê ya bi navê "Rêxistina terorîst a di cîhanê de herî xeter" ve vê baştir fêm dikin. Di nava malbata mirovahiyê de, ya ku di girêdana bi mirovatiyê ve dildariya herî mezin raber dike ji partiya me re, ger DYE dibêje; "Terorîstê sereke", ev jî rastiyekê rave dike. Weke mînaka yavûzê dizker, dixwaze tawana xwe bavêje ser me û xwe jî veşêre. Ev taktîk di her demê dîrokê de hatiye meşandin.

Ger em Roma bibîr bînin, xirîstiyanên yekem ên wê demê bi rastî jî nûnertiya bindest û mazlûman dikir. Neron jî dîn û harek bû. Roma hilweşand. Wî rebenî bi serê xirîstiyanan de hilweşand û hemû bi şêran dan parçekirin. Ger em vê mînakê di roja me de ji bo împaratoriya DYE û nokerên wî bidin, ne tenê Roma'yek, hemû cîhan û di vê navberê de ne tenê welatê me û Tirkiye, gelek welatan dişewitînin. Kî şewitand? "Terorîstên PKK'ê." Vêca wisa xwe dispêrin hêza çapemenî û weşanek mezin dikarin bêjin; "Nizanim terorîstan evder û ewder şewitandin." Pir fişal bi berovajîkirinê ve çalekiyan jî bikar tînin.

Belê, Neron ji bo Roma xirîstiyan tawanbar kir, lê ev her roj, li her derê hemû mirovan û mirovahiyê tawanbar dikin, ser tevgerên xwe yên rûxandinê yên mezin digirin û li ser vî bingehî hewl didin temenê xwe dirêj bikin. Evder pir girînge. Li ser vî bingehî hewce dike bi êrîşek bîrdozî ya mezin ve hewldan bên kirin. Kêm-zêde derket holê ku, dê partiya me bikare vê bike. Îdeolog, komên îstîxbarat û hêzên polîtîk ên DYE'yê di vê manê de bi aqilin –elbet ger bikarin tespît bikin-.

Ji ber sosyalîzma pêkhatî nekarî di nava şaşî û qusurên mezin de qonaxên pêngavan saz bike û di vê mijarê de li serê rêxistinên biryardar PKK cîh digire, nikarin wê venêrînin, çalekiya xwe bi şêweyek îdîa didomîne û li hember pergala ku DYE dixwaze ji bo Rojhilata Navîn saz bike astenge, bese ku wî dîn û har bike.

Pir ecêbe!

Îsa jî li ser van xakan derket.

Wê demê Roma bi temamî serdestê cîhanê bû. Îsa, bi komek hewariyên biçûk ên bi qasî hejmara tiliyan derbas nakê re li Kudûsê û derdora wê bi çalekiya gotinê re, ev zilma mezin derdixist holê. Elbet em beramberî vê jî, tevgera Roma ya mezin a cezakirinê jî dizanin. Piştî ku Îsa bi çarmixê ve kirin, şopdarên wî jî li arêneyan bi şeran dan xwarin. Ango gelo pêdiviya wê Romaya pir xurt bi vê hebû? Belê. Vebûna qelîştekek herî biçûk, dihişt ku Roma wisa wehşî tevbigere. Di roja me de jî aliyên wisa hene.

Ma emê çima ji bo DYE evqasî xeteriyek mezin bin?

Jixwe emperyalîzma DYE “mijara vebûna qelîştekan” baş dizane.

Jixwe dihat zanîn Lenînîzm jî, di dema xwe de ji xeleka emperyalîzmê ya herî lewaz vekirina qelîştekê bû.

Di roja me de jî tê gotin ku; “PKK pir bi aqilmendî ji xeleka emperyalîzmê ya herî lewaz qelîşteyekê vedike û ji vê qelîştekê ramanek cîhanî ya pir xeternak û şêwaza jiyanekê dibişkive.” Ji ber vê bi ezmûna ku ji dîrokê girtiye ve, her ku dikare bi ser de tê.

Mînak di dîrokê de weke hovane tê nasîn û di roja me de jî weke rejîmek faşîzane ye, êrîş û seferên îmhayê yên Tirkiyê bes nabîne. Heta aciz dibe û dibêje; “Te çima zûtir xilas nekir?” Welatên biçûkmezin ên emperyalîzmê yên din jî, bi qasî dikarin pişgiriya Tirkiyê dikin û dibêjin; “Tu çima nikarî pêşî li vê terorîzmê bigirî?” Dijberiya wan jî ji ber binkeftina wane. Ev deh sal zêdetire bi hemû hêza xwe ve veşartî pişgirî dan wan. Em dizanin ku ji her hêlê ve pişgirî dan êrîşên wan jî. Lê belê êdî rim di têran de nayê veşartin. Hemû gelên cîhanê jî dît ku, ev dagirkerî û fetihkirine. Ev êrîşî kur dikin û pişgiriya kî heye? Ji bo li hember gelê xwe hîn zêdetir tengav

nebin, li ber çavan jî dibêjin; “Em dijberin.” Lê mixabin ew Emerîkaya ku xwe pir bihêz dibîne, pir vekirî dikare bêje; “Em pişgiriyê dikin.” Niha ji fihêta xwe jî be dibêje; “Êdî bese, operasyonan paşve vekişîne.” Sedema vê jî dibêje, binkeftina wane. Her wiha ew bi xwe derdikevin holê û xeterî mezin dibe.

Weke heman di dema Roma de bûyî, xirîstiyanî her ku diçe bikok dibe.

Lê ew bi xwe tevî hemû bêhempabûna wan, teng dibin, dîn û har dibin. Serdestiya Neron a li ser hemû Romayê, bûna împarator, qet jî nade diyarkirin ku Neron pir bihêze û jixwe em dizanin ku ber bi encamek çawa ve çû.

Niha jî rewşa hêzê sereke yê emperyalîzmê jî wisa ye. Nokerê wî yê herî girîng weke waliyê Kudûsa li Rojhilata Navîn, waliyê Anatolî jî di rewşek tengav de ye. Çiqas har dibe bila be, pêşve naçe. Lewra ji PKK’ê re dibêjin; “Rêxistina terorîst a herî mezine. Divê yek dewletên cîhanê yan jî mirov alîkariyê neke.” Ev jî çavkaniya xwe ji vê xisleta wî ya dîrokî digire.

Dema ji vê hêla dîrokek berfireh ve lê tê nêrîn, ev îdîaya DYE tê fêmkirin. Elbet waliyê wî yê li Anatoliyê jî teng-kêm dihizire, dibe ku bixwaze pir wêran bike, lê wê encamên neyênî yên ava kirine jî nebîne. Rexneyên Ewrûpa jî li ser vî bingehîne. Tê fêmkirin ku, ger em îro evqasî li serê quncika cîhanê hatine rûniştandin, netenê ji ber xisleta me ya rizgariya netewî ye, dîsa ji ber rêxistinek tundî ya mehelî ye, heta ne ji ber bûna rêxistinek sosyalîstî ye jî. Ji ber ku pergala emperyalîst a heyî ji aliyê wê yê herî xeternak ve qelîşteyek vekiriye û li gorî xwe mînakek rewşa pir xirab dihesin, ji bo wê ye.

## Li Tirkiyê Çepgirî Kemalîzme

Elbet pêşketina tevgera me, hinekê jî li gorî vê guncave. PKK tevgerek mirovahiyê ye, nîqaş li ser vê nayê kirin. Hîn ji destpêkê ve girêdayî rastiyên civakî ye, di vê xalê de bi îdîa ye. Ji her hêlê ve baldar nêzî wateya wê ya zanistî dibe. Di vê manê de, hewl dide tam

bibe xwedî xisletên tevgerek kedê. Ji bîst salî zêdetire, li hember sosyalîzma pêkhatî nexasim di çarîka dawî ya sedsalê de hilweşiya û nekarî pêngavekê pêk bîne, wê pêngavek nû pêk anî û bû tevgerek partiya herî li pêş. Ev girînge. Cewazî û cudabûna wê di vir de ye.

Bi rastî jî sosyalîzma pêkhatî ku nekarî pêngavekê pêk bîne, sosyalîzma ku PKK ji destpêkê ve rexne dikê ye.

Zêde dewletbûna wê, bûna pêveka polîtîkayên derve yên hemû partiyên sosyalîst û komînîst ên cîhanê, nêzîkbûnek nayê pejirandin dibîne. Neyêniyên di vê mijarê de dît.

Nexasim di rastiya Partiya Komînîst a Tirkiyê (TKP'ê) û rastiya çepên Tirk de –hemû ji sosyalîzma pêkhatî bandor bibûn-, zêde serde çûn. PKK'ê jî têkoşîn pir kûr meşand. Ev di wateyekê de li hember bandorên neyênî yên sosyalîzma pêkhatî ku di navbera salên 197080'î de û çepgiriya dewletparêz têkoşînek bû. Jixwe ev li Tirkiyê jî, bi şêweya yeksane çepgiriya Kemalîzmê xwe da der.

Çepgirî, li Tirkiyê Kemalîzme.

Hêjî ev xisleta xwe derbas nekiriye. Ev pir şênber li Tirkiyê şovenîzmek civakî, dewletperestî û netewparêziya zêde, dîsa heta îmhaya rastiya Kurd înkarkirin û tinebûna wê erêkirine. Vekiriye ev jî sedî sed înkarek sosyalîzmê ye. Dîsa ji destpêkê ve girêdana vê ya bi kemalîzma qonaxa rizgarî ve, di pêvajoya hilweşînê de jî ji ber ku bû piştewanê herî mezin ê kemalîzmê, rastiyek xwedî bandorek gerdûnî ye.

Belê, em jî bi ser vê rastiyê de çûn. Ev şaşiyên herî bingehîn ên sosyalîzma saz bûyî, bi pêvajoyê re pêş ket. Jixwe di salên 1925'an de hat dîtin. Di nava Enternasyonalîsta Komînîst de nêzîkbûnên weke TKP ji kemalîzmê re kirin, şovenîzma civakî bû. Ne li gorî cewhera sosyalîzmê bû. Wê demê alîgirên Lenînîst weke taktîkekê li vê xalê dinêriyan, lê belê dema paşê hat dîtin ev ne taktîk, bûye helwestek polîtîk a bi temamî pê ve girêdayî ne, bû rojaneyî, domdar bû û di encamê de bû sedema yekane ya hilweşîna sosyalîzmê.

Kemalîzm bi xwe jî, di vê manê de rejîma herî zêde sûd ji sosyalîzma pêkhatî wergirtiye.

Çepgiriya wê jî, çepgiriya herî zêde şovena civakî ye. Lewra çepgiran, tiştek nedaye gelê kedkar ên li Tirkiyê. Kemalîzm di rastiya xwe de çiqas li dijî gel be, ji ber rastiya şoventiya civakî ya çepgir jî, dê ewqas dijber be. Êdî ev rastî di roja me de wisa ronî bûye, bîrdoziyên olî jî dikarin kedkaran bandor bikin û ji wan re bibin hêvî. Qaşo çepên xwe; "Ez, ê herî radîqalim" diyar dikir jî, bi qasî misqalekê nikarin di cîhana kedkaran de bibandor bin. Bi fikare ku çima çepgir vê nanirxînin û sedemên vê dernaxin holê.

Elbet em di fêmkirinê de zehmetî najîn. Bi qasî fêmkirinê, em bi têkoşînek bandor ve jî bi ser de çûn û me PKK kir PKK. Aliyê PKK'ê yê herî erênî û bihêz a di wateya bîrdozî de bê gotin, şaşiya sosyalîzma pêkhatî û kemalîzmê ne jiyîn, ew hem di rêgez hem jî pratîkê de rexnekirin û derbaskirina wê ye. Ji ber ku me di navbera salên 197080'î de ev xurt pêk anî, me karî peyre jî cewhera xwe biparêzin. Ger em jî weke komên din ên çepgir bûna, bêguman dê piştî sale 1980'î pêngavek nehatiba kirin. Neku ji ber komên din lewaz bûn, ji ber, ji hêla bîrdozî ve nekarîn sekna çepgirên kemalîst derbas bikin, pêşketin jî saz nekirin û yekbûnek bi kedkaran re pêk ne anîn.

Kedkar, îro dibe ku ji heywanên kedîkirî zêdetir di rewşek xirab de ne.

Ti gelê kedkar ê cîhanê bi qasî gelê kedkar ê li Tirkiyê nehatiye xistin. Ne gelê Efrîka, ne Asya û ne jî Emerîkaya Latîn û kedkarên wan yek jî, bi qasî gelê Tirkiyê di rewşek bê şanazî de najî, yan jî nadin jiyîn. Nexasim kesên ku bi navê gelê Tirkiyê dihizirin neçarin vê rastiya bê şanazî ji her hêlê ve bibînin, fêm bikin, ger gengaz be çareseriyê raber bikin. Li ti cîhî nehatiye dîtin ku gelê kedkar xistine vê rewşê.

Çima hat xistin?

Nexwe divê mirov vê di rastiya Komara Tirk û heta rastiya serdestî û mêtîngeriya Tirk de rast danê holê. Heta ku ev rast neyê şîrovekirin, zext û mêtîngeriya îro heyî jî ji holê nayê rakirin.

Di cîhanê de, -ew bi xwe dibêjin- kadkarên herî zêde hêsan tên birêvebirin li Tirkiyê ne. Yên herî hêsan tên mêtîn, li Tirkiyê ne. Miletek kedkar serî tê tewandin, tê lenetkirin, lê ne evqas jî.

Me ji bo gelê Kurdistanê jî nirxandinên wisa kirin. Ya me hîn zêdetir dîrokî û kûre. Rast bû ku me got; “Miletê lenetkirî ye.” Ji ber evqasî destûra mêtîn û çewsandinê dayîn, rewşa herî bi lenet rave dike. Ji ber ku me li ber xwe da, me ev lenetî şikand, derbas kir û rewşeke serbilindî saz dikin. Lê mixabin ev li Tirkiyê nîne. Lewra rewşa li wir hîn xirabtire.

Asoyên kedkaran heta dawî hatine tarîkirin, çalekiyên wan ne zenûnin. Kedkarê li vir bê çalekiye, bê kesayete, bê armance, bê îdîa ye û ji her alî ve bê çare ye. Raziyê bermahiyane jî, lê ew jî nayê dayîn. Her roj ew bi xwe di statîstîkên xwe de diyar dikin ku, jiyana wan bi xwe çawa mûcîzewî ye.

Dibe ku di vê manê de li ser rastiya gelê Tirk fikirîn, di roja me de weke rewşek gerdûnî girîngiya xwe heye. Çînek kedkar, miletek kedkar, çima dikeve vê rewşê û xistin vê rewşê? Çima vê rewşê dadiqurtînin, ger nikare daqurtîne jî, çima li dijî dernakeve? Pir bi tenê ye. Ev rastiyek û rewşek ku pêwîste rewşenbîr, ger hebin sosyalîst û heta gelek zanyarên civaknasî yên Tirkiyê lê bihizirin.

Em dibêjin ku me kêm-zêde ev fêm kiriye. Nexasim bi dahûrandina rastiya miletê xwe re, ya rastî em di ferqê de ne ku me di radeyek girîng de rastiya gelê Tirk jî dahûrandiye. Jixwe ji ber vê ketina ferqê ye ku, aliyê şoreşa me ya enternasyonal ji her hêlê ve derdikeve holê.

Vaye ji bo vê dibêjin; “PKK rêxistina terorist a di asta nav-netewî de ya herî xeternake.”

Hemû hêzên emperyal-kapîtalîst ên biçûk û mezin, ji ber ku PKK gef li Tirkiya ku ji bo wan pir hewce ye dike, pêwîst dibînin pişgiriya Tirkiyê bikin. Ji ber ku rastiyek miletê herî bê wate heye û weke mînaka vê di nava PKK’ê de heyî, di rastiya gelê Kurd de derbaskirin, tê wateya qat bi qat mezinbûna xeteriyê.

Nexwe li cihek ku zext û mêtîngerî evqasî lê kûr û bê wate dibe de, arestebûna miletekî ya ber bi azadiyê ve, ewqas jî xeternak dibe.

Li vir nêrîna me ya ji şoreşa Tirkiyê re kêm-zêde derdikeve holê. Dema şoreşa Kurdistanê evqasî zayîna şoreşa Tirkiyê pêk tîne, di

heman demê de li qada nav-netewî jî rolekê dilîze. Di vê manê de ne tenê di mijarên qonaxek nû yên sosyalîzmê de bûna hêvî, aso û hinek rêyên derketinê diyarkirine. Dema em wê lez derbasî nava Tirkiyê bikin, dê ewqas jî vê di nava Rojhilata Navîn de diyar bike, ev ji bo hêzên heyî yên şer, mêtînger û zextkar jî xeteriyek mezine. Ev serêşiyek hem pir rojaneyî, hem jî teqez divê bê çareserkirine!

Rastiyek herî girîng jî ku di vê operasyona dawî ya Başûr de rû dayî jî eve. Ev di rastiya operasyona sala 1992’an de jî derketibû holê, lê vê operasyona dawî ev şanî hemû cîhanê kir. PKK jî bi hemû cîhanê da nasîn. Lewra dema DYE her kêlî raporekê diweşîne û dibêje; “PKK rêxistinek terorîste”, vê vale nabêje. Ji bo bandora PKK’ê bişkîne, pêdivî heye ku pir çewt û cuda bidin diyarkirin. Guman ji vê nîne.

Em jibîr nekin, li Başûrê Kurdistanê belavbûna PKK’ê û bi gelek welatên Rojhilata Navîn re –çi pêwendiyên watedar dibin, çi jî bi şêweyek pevçûnê dibe- pêşveçûna wê, pêşketinek cidî ye. Her wiha pir nêze ku di pratîkê de jî encamên polîtîk bigire. Ne tenê ji hêla aso, bîrdozî û rêxistinê ve, weke polîtîkayek bi pratîkî pêk tê, dikare her kêlî qadekê desteser bike û li qadekê pergala xwe ya polîtîk damezirîne. Ev jî ji bo emperyalîzmê herî kêm bi qasî Şoreşa Cotmehê û weke di dîrokê de di destpêka gelek şoreşan de bûyî, pêşketinek cidî ye. Ji ber vê qiyamet tê rakirin. Lewra evqas pişgirî ji Tirkiyê re tê dayîn. Elbet şoreşgerên bi îdîa jî, bi rastî jî hewldanek li gorî îdîaya xwe raber bikin, dikarin pir rehet serkeftina xwe saz bikin. Em jî vê dijîn.

Bêguman ev rewşa PKK’ê, destpêkekê rave dike. PKK bi awayek polîtîk, hêj ji gihiştina serkeftinê dûre. Dîsa dahûrînên di cewhera wê de heyî, bi temamî mirov nedaye fêmkirin û pêkanîn. Dev ji mirovahiyê berdin, hêj bi gelê xwe nedaye fêmkirin. Heta em dev ji bi gel dana fêmkirinê berdin, her roj tê nîqaşkirin ku gelo em di nava xwe de bi kesên îdîa dikin milîtanên PKK’ê ne van dahûrînan didin fêmkirin.

Me hêza dahûrandinek mezin derxist holê.

Nexasim di mijara ku pêwîste mirovê nû çawa bê destgirtin de, tê fêmkirin ku ev teşegirtina mirovek cuda ye. Lê hêj ev di nava rêxistinê

de serwerkirin, li nav gel serwerkirin û weke pergalekê derbasî mirovahiyê kirin pir sînordare. Nexwe li vir ya girîng aso, hêz û jêhatiya dahûrîna xwe gihandina wê ye. Ev jî hat raberkirin. Her çendî partî hêj di vê mijarê de nû be, biryardariya xwe û her ku diçe îdîa xwe ya pêşveçûnê didomîne. Ev di heman demê de aliyên wê yên bê derfet û lewaz jî derdixe holê. Ji ber ku her tevgera di qonaxa destpêkê de, bi xeteriyan re rûbirû ye.

Jixwe berdevkên Komara Tirk jî ji ber vê qiyametê radikin. Dibêjin; "Ger em îro vê asteng nekin, dê li serê we tevan bibe bela, heta terora PKK'ê pirsgirêkek gerdûnî ye. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêka gerdûnî hemû hêzên şer ên gerdûnî neçarin alîkariya min bikin û min di asta nav-netewî de ristek dîrokî girtiye." Serkêşên vî şerê taybet dibêjin; "Em dixwazin bibin xwediyê serkeftinek wisa yê yekemîn."

Ecêbe!

Ne tenê pirsgirêkek Tirkiye ya millî, dixwazin pirsgirêka terorek cîhanî di kesayeta PKK'ê de çareser bikin.

Qaşo wê ji bo cîhanê bibin mînak û pêşengiyê bikin! Bang li ser bangê dikin. Dibêjin; "Em şerek evqasî li gorî berjewendiyên hemû pergalê guncav dimeşînin, divê pergal bê şert û merc pişgiriya me bike!" Ew bi xwe vê dibêjin. Bi vî rengî bê ku di ferqê de bin rastiyê dibêjin. Belê weke ku vê "terorê" terorîzma wan derxistiye holê, ji bo gelan jî aso, armanc û derfeta berxwedanê ya pir hewce derxistiye holê. Di vê manê de ger israr bê kirin, nexasim derbasî nava gelan û gelên Rojhilata Navîn bê kirin –jixwe ya niha hinekê tê kirin jî eve- bi rastî jî dibe ku encama qonaxên şoreşî yên girîng be.

**Utopya Sosyalîst,**
**Ji Bo Hêvî û Serkeftinek Bi Îdîa Esase**

Dibe ku PKK, nexasim di bûna partiyek sosyalîst, zelalkirina nîqaşên demê û di wateya bersiva nîqaşên sosyalîst dayînê de bibe mînakek baş. Her ku diçe PKK vê xisletê pêş dixe. Her wiha dikare weke taktîkek polîtîk jî serkeftinê bidest bixe. Di vê wateyê de ger em li ber çavan bigirin li Rojhilata Navîn nakokî çiqasî hûrûkûrin, dibe ku di çareseriyê de heta dawî pêşketinek bi îdîa rû bide.

Nexwe hem ji bo sosyalîzmê, hem jî ji bo demokrasiyên gelên polîtîk ên Rojhilata Navîn PKK ji pêşketinên wisa re pêşengtî bike, dikare nirxa xwe ya gerdûnî qat bi qat derbixe holê.

Ma ev hewce ye?

Belê heta dawî hewce ye. Nexasim ji bo nîqaşên sosyalîzmê yên roja me hewce ne. Li hember xeteriyên mezin ên kapîtalîzm li dijî miletên bindest û mêtîngehkirî weke asoyekê û weke hêviyekê îdîayek wisa sosyalîst pir hewce ye. Ji bo gelên Rojhilata Navîn jî weke pêşketinek polîtîk pir hewce ye. Ji bo demokrasiyê, nexasim li dijî emperyalîst û hevkaran, pir dijwar pêdiviya van gelan bi rizgariyê heye. PKK di radeyek girîng de tevkariyê ji vê re jî dike. Nexwe weke pratîk-polîtîka jî PKK pir hewce ye. Hem weke aso û hêviyê, ji bo mirovahî ber bi watedarbûnê ve diçe. Hem jî ji bo rizgariya demokratîk a gelê herêmê -dibe ku ji gelên cîhanê hîn zêdetir- ku pêdivî pê dibînin, ji bo ji hevkaran rizgar bibin û carek din bi şêweyek hêjayî şaristaniyên sedî salan hetanî hezarî salan derbikevin ser dika dîrokê, PKK zêde hewce ye. Bi mebesta van herdu armancan li ser PKK'ê rawestîn, peywira welatparêzî ya pîroze, hem jî dibe peywirek enternasyonalîst. Tevî hemû ferzkirinên hundur û derve nekarîne PKK

ji gavên bi îdîa û pratîkî yên di vê mijarê de şûnve bihêlin û paşve bixin.

Em jî hewl didin serkeftina vê ya misoger saz bikin. Ji bo serkeftinek misoger di roja me de nexasim em li ser polîtîka û taktîkên leşkerî hûrûkûr radiwestin. Pêdivî bi vê heye.

Lê divê neyê jibîrkirin, PKK di rastiyê de tevgera vekirina asoyên mirovahiyê û bihêzkirina hêviyên wê ye.

Nexasim hêzek wisa ye hewl dide partiyên ku rewşên weke asoyên wan di nava sosyalîzmê de tarî bûne, bê aso mane, dîsa ji îdîayên sosyalîzmê bêpar mane berovajî bike. Jixwe ev sedema herî bingehîn a hilweşîn, binkeftin an jî xwe nenûkirinê ye. Di vê wateyê de ger aso nebin, îdîa biqedin, coş jî tine bibe, ew pergal pergala cîhanê jî be mehkumî hilweşînê ye. Ya bûyî jî ev bû.

Lewra her çendî îro PKK ji bo gelekan bê wate jî be, ji bo her tim aso û hêviyan zindî digire û berfireh dike girînge û ev berdewam dike.

Ev heta dawî wisa domandin, yeqîn dikim xisletek PKK'ê ya herî bingehîne. Ger em hinek mînakan bidin; Ger îro Îran jî tevî hemû rexneyan hêjî dikare hinekê saxlem bimeşe, li wir hêzek giyanwerî heye. Vaye hinek dibêjin; "Molla", hinek dibêjin; "Ayettullah." Ev çiye? Ev asoyek, coşek û hêzek îdealê ye. Ev pir hewce ye. Ger tê xwestin rejîmek bê jiyîn, neçare ku her tim ev hêza dilxweşî û giyanwerî weke pêşeng bê avakirin.

Rola rêbername û pêşengiyê ji bîrdoziya sosyalîzmê re hat dayîn.

Ji ber ev hat qutkirin pergal rûxiya.

Lewra îro utopya, ideal û dilxweşiya sosyalîzmê xurtkirin ji bo serkeftinê esase. Wê di vê mijarê de komek mirovên di radeyek têrkar de bikarin pêşengiya vî karê wesifdarî û hejmarî bike, dîsa ji bo dilxweşî, îdîa û hêviyê bijî û wê vê jî her tim di fikir û ruh de pêş bixe. Ango hem dê bijîn hem jî bidin jiyîn. Dikare hinekê jî ji vê re rêbertiya bîrdozî bê gotin. Bêguman girêdana vê bi zanistî, xeyal û giyanweriyê ve heye. Girêdana xwe bi heyberê re jî heye. Hevsengiya hemûyan pêk tîne. Ev pêdivî jî ji bo civakê saxlem û zindî bigire çi hewce bike nûnertiya wê dikin. Ev di dîrokê de jî wisa ye.

Ger sosyalîzm dixwaze xwe nû bike, neçare saziyek wisa pêş bixe û bide rûniştandin.

Şêx û derwêşên serdemekê çibin, ji bo sosyalîzmê jî li gorî xwe pêwîstî bi şêx, derwêş û pîran heye.

Ji bo mînak be em vê dibêjin. Lê dîsa jî ev têrê nake. Weke din pêwîstî bi pratîk polîtîkayê heye. Neçare polîtîkayê, ango taktîk jî pêş bixe.

Ya rastî PKK ji vê hêlê ve jî di nava pêşketinekê de ye. Rewşa bîrdozî û dilxweşiya endamên xwe di asta bilind de saxlem hiştin û esasgirtinê ve sînordar nemîne –me ev bi têkoşînek pir bilind ve meşand-, di heman demê de em dizanin ku çiqasî aresteyî taktîkên rojaneyî jî dibin. Dibe ku bi qasî nebê nesîbê ti partiyê di şêwazekî de li ser taktîk radiwestin.

Çi taktîkên rêxistinê, çi taktîkên xwepêşandanê, çi jî yekser taktîkên şer dibin, îro ev tev xebatên me yên din ku em herî zêde li ser hûrûkûr lêhûrbûn dikine. Em dikarin ji vê xebatê re bêjin xebata polîtîka rojane jî. Di encamê de taktîkên leşkerî jî, taktîkên polîtîkî ne. Şêweya bi tundî rêvebirina polîtîkayê ye. Ji ber şerê taybet ji bilî vê destûrê nade polîtîka bê kirin. Tundiyek bêrehim disepîne. Ji ber vê neçare ku aliyê tundî yên taktîkên me yên polîtîk, aliyê leşkerî yê gerîla zêdetir bê pêşxistin. Em jî hewl didin vê bikin. Pêwîste di van mijaran de jî pîvan zêde neyên derbaskirin, her ku şerê taybet neçar dihêle tundiya taktîkên polîtîk bên pêşxistin û ev jî ji bo serkeftinê ya sereke ye.

Di vê mijarê de jî nebesiyên girîng ku tên jiyîn hene. Jixwe ji ber ku gelek partî û rêxistinan nekarîne vê bikin, li Tirkiyê têk çûn û bêkar man. Ji ber me hinekê di demê de taktîk pêş xistin û di vê mijarê de li hember şerê taybet bê taktîk neman em pêş ketin. Ango ne tenê ji aliyê moral û bîrdozî ve -ev bi tena xwe ji bo serkeftinê têrê nake-, her wiha ji bo rojane xebatên rêxistinê yên pratîkî, çalekiya rast û xebatên çalekiyên leşkerî hatin pêşxistin, îro PKK bi îdîa ye û bin neketîye. Ger di van taktîkên rast de israrbûn hebe, wê rastiya ber bi serkeftinê ve derbikeve holê.

Weke tevgerek kedkariyê PKK, hem di asta netewî, hem navnetewî de sedema ku evqasî deng veda, di asta gerdûnî de ji pirsgirêkên hilweşandina sosyalîzma pêkhatî û pêvajoya derbasbûna wê re bersivek baş da û di vê mijarê de heman nexweşiyan di nava xwe de nahewîne. Ji ber pêşketina xwe ya afirîner berdewam dike, dîsa di polîtîkaya pratîkî de jî xwe bê taktîk nahêle, hema li her qadê berxwedaniya vê -li girtîgehan, çiyan, hundur û dervî welat- raber dike, kariye ku bibe tevgerek emperyalîzm evqasî jê mêtirsiyê bijî û pê nekarê.

Bêguman di vê mane de weke tevgerek û partiyek kedê neçare girîngiya xwe biparêze.

Ev jî ancex bi serkeftinê gengaze.

Ji ber ku li hemberî wê ne tenê hêza şerê taybet û êrîşên faşîstên Tirk ên herî har hene. Pêwîste li pey van êrîşan hemû paşverûtiya navnetewî bê dîtin. Lewra pêwîste PKK her tim xwe di aso, armanc û kêfxweşiyê de pir bihêz bike û di pratîkan de jî lêhûrbûn bike. Neçare yên heyî û pêşketinên wê serkeftî dike ne weke encamekê, her tim weke destpêkekê bibîne û xwe xurt bike.

Di vê manê de dahûrîna militanî xwedî wateyek mezine. Di demên dawî de dahûrînên ku me di nava rêxistinê de pêş xistine, ya rastî ji bo serkeftina PKK'ê sereke ne.

Me ev pir vekirî danî holê ku; kesayeta me xwest dahûrînin, kesê ji pergalê zêde bandor bûye û pir bihêz bermahiyên beriya serdeman di xwe de dihewîne, bi serê xwe hêmana şerê taybete. Dîsa me ev jî destnîşan kir, dahûrîna vê, darbeskirina xeteriyên ku yekser ne yekser çavkaniyên xwe ji şerê taybet digirin, xisletek bingehîn a PKK'ê dike PKK ye. Têkoşînek wisa meşandin û kesê bi nexweşî destnîşankirin û hewldana derbaskirina vê, ya rastî cewhera serkeftina wê rave dike.

Ev pir vekirî derket holê çiqas bê gotin; "Ez ji bo têkoşînê amade me" bila be, çiqas xwe feda kiribe bila be, her kes, her milîtan, heta her kesê rêber ê ku xwe berfirehî nedahûrandî, wê di demek kin de nekare xwe ji bûna astengî, bela serî û hêmanek nehevgirtî rizgar bike. Jixwe rûxîna partiyên ku pêşengiya sosyalîzma pêkhatî digirin jî ji vir

destpê dike. Di bîroya nivîsgeha polîtîk a van partiyan û navendên wan de kevneperestî û birokratbûn pêş ket, peyre pêl bi pêl di nava dewlet û civakê de belav bû. Bi vî rengî hilweşîn û nepêkanîna pêngavê pêş ket. Ev xeterî di nava PKK'ê de hezar carî zêdetire.

Tîpê di nava PKK'ê de ji welatên sosyalîzma pêkhatî qat bi qat zêdetir, tîpek nexweşe.

Tîpek herî kevnar, talanker, ango tîpek ji destê sêyem ê kapîtalîzmê, ango kapîtalîsta kemalîst bandor kiriye. Di heman demê de tîpek ji dervî serdemê şêweya koletî, malbatperestî, qabîleperestî, ferdperestiyê bi şêweyek herî paşketî dijî. Em ji pratîka jî baş dizanin, ev tîp bese ku bi serê xwe deh şoreşan bi erdê re bike yek.

Dahûrînan jî ev di asta herî bilind de diyar kir. Di nava partiya me de her kes vê baş dizane ku, ger ev kesayet nehatiba derbaskirin, devjê berdin em PKK'ê bînin heta salên 1995'an, me nedikariya bînin heta salên 1985'an. Heta me nedikariya di salên 1975'an de jî derbixin holê. Têkoşîna me ya bi vî kesayetî re, di heman demê de pêşketinek di asta karbidestiya partiyek sosyalîst rave dike. Têkoşîna çînî ne tenê di nêvenga objektîf û fîzîkî ya çîn an jî gel de, di nava rêxistina wê û mejiyê wê de jî meşandin şerte. Pêwîste di rayên wê yên herî zirav, kezeba reş û dilê wê de bê meşandin. Ger di têkoşîna çînî de tê xwestin serkeftinek tam bê bidestxistin, pêwîste li dijî birokratbûn û kevneperestiyê têkoşîna navxweyî û têkoşîna nefsê bi şêweyek hûrûkûr bê meşandin.

Her çendî hinek mamoste di qonaxa sosyalîzmê de dibêjin têkoşîna çînî ranaweste û pêwîste hîn zêdetir bê pêşxistin, ev pir gelemperî û gotinên kin ve hatine nirxandin.

Lenîn jî behsa vê dike û dibêje; "Di sosyalîzmê de burjuvaziya biçûk, ji nav hilberîna metaya biçûk dipijike. Ev jî her tim gefan li pergala sosyalîst dixwe." Lê gotin evqase. Dê ev di nava partiyê de çawa bê meşandin ne wî bi xwe dîtiye –temenê wî têra vê nekiriye-, ne jî paşê hatiye pêşxistin. Ferasetek Stalîn a têkoşînek çors heye. Gotiye; "Hinek serkêş hene." Ev jî bi şêweyek fişal gotiye. Wan jî xwe veşartiye, yên nekarîne xwe veşêrin jî bi şêweyek çors tasfiye bûne. Di encamê de, ev jî binkeftina herî mezin a vê nêzîkbûnê ye.

Mao jî mîna vê hinek nirxandin kirine. Lê belê her çendî hêjî Çîn dikare xwe bidomîne, dûre ku vê ji pir alî ve pêk bîne. Li Çînê jî pêşketinên weke, ezmûnên li Sovyetê pêk hatîn zêde ne. Lê ger bikarin têkoşîna çînî kûr bikin, dibe ku ew jî, bêku nexweşiyên li nav partiyên Sovyetê bijî, nexasim di xalên demokrasiya sosyalîst û enternasyonalîzmê de çiqas peywirên xwe pêk tîne bê nîqaşkirin. Ger hêjî dijî, ev hinekê jî ji ber girêdana wan a bi rêgeza têkoşînê ve ye.

Elbet me ne tenê di dema sazkirina dewletê de, di demek pir kin de ev ferq kir. Ev ferqkirin jî ne bi şêweya ku li dijî jirêderketinên çep û rast ên di nava partiyêde bû. Her çendî me ev paşçav nekiribe jî, di derbarê nêzîkbûnên çep û rast ên pir çors û nûnerên wan de têkoşîn hatibe meşandin, paşê fêm bû û pir vekirî derket holê ku –nexasim ber bi roja me ve- ev têrê nake. Têkoşîna jirêderketinên çep û rast têrê nake.

Sedemên hîn kûrtir ên jirêderketinên çep û rast xwedî dikin hene. Me di carekê de dît ku rojane kesê di rewşa rêbertiyê de ye, ger têkoşînê di nava xwe de pêş nexe, milîtanê herî ji xwe bawer rojane di nava avaniyê de bi qasî dilxweşî û perwerdeyê, pratîkek têrkar nemeşîne, ya rastî ew partî nabe partiyek pêşeng. Jixwe dema em li hemû gavên taktîkî yên pêvajoyên PKK'ê dinêrin, xetimandina çend kesan, binkeftin û windahiyên pir mezin bi xwe re ava dike. Tevî vê têkoşîna mezin, ger hêjî wisa be, tê wateya xeterî mezine.

Wê demê çare çiye?

Çare; nava partiyê hem di asta dilxweşî, hem jî di asta pratîk û polîtîkayê de bi qasî têrkar bike hêza dahûrînê û têkoşîna vê ya bê navber bi şêweyek hûrûkûr dana meşandine.

Ji ber ku PKK'ê ev di salên dawî de hinekê meşand, nekarîn ji pêşketinê dûr bixin. Jixwe ji ber vê DYE dibêje; "PKK rêxistinek terorîste." Tevî ku modela hemû rêxistinên din hatine derbaskirin, ji ber PKK bi vî rêbazî nehat derbaskirin, ev jî xweseriya wê datîne holê. Dîsa tevî hemû hewldanên Komara Tirk ên rûxandinê, yek komên Kurd ên çepgir ku nerûxandî nema. PKK berovajî tevî şerê taybet ê mezin hebûna xwe hîn zêdetir bibandor kir, ev jî çavkaniya xwe ji

têrkariya hêza dahûrandina xwe digire. Ji ber ku PKK di vê manê de, di ezmûna partiya sosyalîst de, heta di sosyalîzmê de, di partiyên sosyalîst de, di mejiyê vê de, têkoşîna çînî di asta herî pêşveçûyî de meşand, dikare bê gotin ji bo dîroka partiyên sosyalîst dibe tevkariyek pêşveçûn û pêşketinekê.

Ger di roja me de partiyek dixwaze wesfa xwe ya sosyalîstiyê biparêze, tenê serkeftinên pratîk û polîtîk têrê nake, ger dixwaze bi berzbûna dilxweşiyekê ve xwe bimeşîne, neçare ku hinekê weke PKK'ê be.

**Modela Cîhanê Ya Kevin**
**Ji Bo Mirovahî Xiftanek Tenge**

Belê, gerdûnbûna PKK'ê bivê-nevê dikare wisa bê pênasekirin. Dibe ku li gorî dixwazin me tam bi formûl nekiribe, lê belê hemû dane diyar dikin ku ev karbidestiya PKK'ê ji vir û şûn de, ji bo hemû rêxistinên ku dixwazin ser bikevin an jî bi taybet ji bo rêxistinên sosyalîst jênevegere. Ji bilî vê ti bersiv ji pirsgirêkên mirovatî, erkên polîtîk ên ziravî dixwazin, erkên dilxweşî re nayên dayîn. Belê ji bo wê hemû partiyên siyasî yên Tirkiyê xetimîn, hatin derbaskirin û têk çûn. Bi çep û rastê xwe ve li hemû cîhanê, îro li Fransa, Almanya, heta Îngîltere hemû partî kevin bûn, hatin derbaskirin û heta li hember wan eleqe nîne.

Raste, hemû partiyên çep û rast ên kevnar tên derbaskirin.

Jixwe ew bi xwe dibêjin; “Bê eleqebûna gel pir pêş dikeve.” Lê belê ji lêgerîna partiyek nû re jî bersiv nayê dayîn. Bersivek ji rêzê jî, pişgiriya gel weke şapeyekê mezin dike. Li Tirkiyê jî, ji bo burjuvaziya Tirk a liberal û neçare bijî, Tevgerek Demokrasî ya nû

heye. Hewl dide popûler be û hinekê dibe jî. Çima? Ji ber hemû partiyên çep û rast êdî bûne kevneperest, ev wisa dibe.

Ev li cîhanê jî wisa ye. Ev xalên ku weke bayê guhertinên nû dixwazin bidin –her çendî pir çewt jî bin- ya rastî ev xale. Heta dikare bê gotin, feraseta dewleta modela kevin, êdî neçare bê derbaskirin. Îro dewletperestî pir tê pêşxistin. Êdî ev di wateyekê de hemû partiyên çep û rast ên kevin, bi sosyalîzma pêkhatî ve û kapîtalîzma liberal ve, hemû rejîmên ku xwe di dewletê de rave dikin û binesaziyên dewleta paşde mane de xwe rave dikin, êdî ji bo mirovatî weke xiftanek tengin. Êdî hemû dewlet ji bo civakan xiftanek tenge û neçare bê qetandin. Mixabin çareserî nayê dîtin, ji bo nayê dîtin jî tengezarî jî zêde dibin.

Nexwe, nakokiyek herî bingehîn yek jê ya roja me jî, êdî divê dewletên ku weke xiftanek ji hesin serê mirovatiyê hatiye şidandin bên derbaskirin, sipartekên wê yên partiyên çep û rast derbaskirine. Pêdiviya mirovahî bi vê heye. Misoger gelek dane didin diyarkirin ku wexta vê qonaxê hatiye. Di vê manê de sedsala 21., ji hêlekê ve derbaskirina dewletên bi vî rengî ye. Em tenê behsa derbaskirina dîktatoriya çînan nakin. Çi sosyalîzma pêkhatî dibe, bila bi kapîtalîzma liberal ve yan jî kapîtalîzma dewletê dibe, nav çi dibe bila be, êdî modelên heyî ji bo mirovatî astengiyên cidî ne. Tam jî di vê xalê de mirov dikare teoriya tinekirin û rûxandina sosyalîzmê û dewleta wê ji nû ve ronî bike. Di vê manê de rûxandina dewletên wisa û derbaskirin hewce dike. Sosyalîzm di vê mijarê de xwedî gotina herî bi îdîa ye.

Êdî gel nikarin dewletên heyî rakin.

Komek mezin a birokratîk hatiye avakirin. Destûrê nade ti pêşketinên afirîner. Tenê rastger kom dikin û li ser derdorên ku zêde kar nakin belavkirinê ve mijûl dibin. Ev jî rewşek nayê qebûlkirin derdixe holê. Karesatekê pêş dixe.

Nexwe dikare teoriya sosyalîzmê ya dewletê ji nû ve bi şêweyek ronak hem bide pêş û hem jî piştrast bike. Damezirandina sosyalîzmê, ne damezirandina dewletekê ye, heta êdî divê baş bê fêmkirin ku erka wê bi şêweyek herî bingehîn ve derbaskirina dewletê ye. Ev qonaxa

sosyalîzmê ya destpêkê ev nedît an jî dîtibe jî hewcedariyên wê pêk ne anî. Ev qonaxa nû misoger hem dîtina vê rewşa derbaskirina dewletane, hem dana nîşandane, hem jî neçare bi xwe jî biguhere. Dema ev pêk anî wê sosyalîzm bibe hêza bîrdozî, dilxweşî û polîtîk a herî bi îdîa. Elbet encamên vê yên şênber wê di nava civakê de li qadên weke şêniyek ku têra xwe bike, têrkar xwe xwedî bike, tenduristî, perwerde û hwd de bê destgirtin. Dîsa taybet dê xwe li derdor jî bidin diyarkirin.

Sosyalîzm neçare li ser van pirsgirêkan lêhûr bibe. Lê weke şoreşa polîtîk jî, ev dewlet jî kêm-zêde neçarin bên derbaskirin, lê belê tê dîtin heta ev erk pêk neyên ti reform bi tena serê xwe têrê nakin.

Vaye gelek partiyên nû derdikevin; partiyên reformist, partiyên yeşîl. Heta ku ev partî vê pergala dewletê derbas nekin, ti carî wê nekarin xwe bigihînin derdora bi tendurist a armancê wan bûye û nekarin rê li wêrankariyê bigirin. Dîsa dê nekarin rê li tinekirina dilxweşiya di nava civakê de û qedandina hêviya jiyanê bigirin. Di vê manê de ceribandinên reformîst ên di roja me de nikarin serkeftî bin.

Evqasî berfirehbûna teoriya sosyalîzmê, ji bo çareserkirina pirsgirêkên mezin ên heyî hewce ye. Her çendî tê gotin; “Neçare reform bên kirin, ji bilî negengaze pergal bê derbaskirin”, -heman weke di dawiya sedsala 19. de partiyên reformîst ên li ser bîrdoziyên reformist û sosyalîzmê hatîn ferzkirin- ev tenê rê vedike kapîtalîzm bi şêweyek xeternak mezintir bibe û jiyana xwe bidomîne. Heman weke di ceribandina sosyalîzma pêkhatî de hat dîtin, dê xwe nêzî kapîtalîzmê bike, bi wî re lihev bike û her ku biçe kapîtalîzmê bi şêweya pirsgirêkên xeter rê ji mezinbûna wê re veke. Lewra divê reformîzm bê dîtin, ew bi pêşketina şoreşê ve bê girêdan, bi şêwazek ne çep ne jî rast bi wî re lihevkirin çênebe yan jî nakokbûn pêş nekeve, bi nêzîkbûnek rast ve pêşwazîkirin, ew di xizmeta şoreşê de bikaranîn a herî girînge.

Tê dîtin, roja pişgirî û têkoşîna kedkaran ji her demê zêdetir pêşxistina mijarên weke aso, hêvî, bername, bi awayê pratîk û polîtîka pêşxistina taktîkên sosyalîstî, me pir dide hizirîn.

Di vê mijarê de partiya me PKK rewşek bi siûd dijî yan jî gelekî bi hewldanên zane û rêxistinkirî ve vê rojê watedar pêşwazî dike. Heta dikare bê gotin, dibe partiyek ku di şêweyek herî serkeftî pêşwazî dike. Girêdayî vê di dema pêşiya me de dikare hîn zêdetir bi îdîa û hêvîdar nêzî pêvajoyê bibe. Dîsa li dijî şerê taybet ê dervî mirovatî jî, dikare şerê şoreşgerî yê herî hîmdar û pîroz ê mirovatiyê di pratîkê de dimeşîne pêş bixe. Pêvajoya tê jiyîn, hem di hêviyê de, hem di îdîayê de û hem jî di ruh de pêşketinek mezine, hem jî şoreşek ku divê di pratîk û polîtîkayê de bê serxistine. Kelecana vê bi serê xwe têrê dike ku xiroşa milîtan zêde bike û mezin kar bike. Ger hinek din nêzîkbûnek baldar ji rêgez û esasên taktîkî re bê kirin, dê di nava PKK'ê de her milîtanek pêşketinên girîng ava bike. Heta miletek pir paşketî yê weke gelê Kurd piştî ku PKK şopand rê ji çi pêşketinê re vekir, wê ya herî mezintirîn ji vir û şûn de di serî de li gelê Tirkiyê, li nav gelê herêmê jî bide diyarkirin.

Em ketine nava pêvajoyek wisa. Nexasim derbaskirina mercên jiyana kedkarên Tirkiyê yên nayê jiyîn û rewşa bi lenet heta dawî tê ferzkirin derbaskirin pirsgirêka herî bingehîne. Hema bêje hemû merc, ferz dike ku gelê kedkar ê Tirkiyê rabe serhildanê. Elbet dê PKK jî herî zêde alîkariya vê bike, bibe hêza ew derxistina holê û pişgiriya wê. Ev jî tê wateya firsenda dîrokî.

Weke her demê me gotî, li ser vî bingehî serxistina peywiran, ji bo pêşketina mezin a Rojhilata Navîn, dibe destpêka pêşketinek şoreşî ya nû.

Di dîroka gelên Rojhilata Navîn de, di demên şaristanî yên pir serfiraz de, yekîtiyên wan hene.

Yekem car derbasbûna şaristaniyê li ser van axan çêbûye. Damezirandina împaratoriya koledarî ya mezin û şaristaniyan, aliyên wan ên zêde afirîner li van deran pêş ketiye. Dîsa şaristaniya feodalî bi şêweya xwe ya herî bêhempa ve li ser van axan derketiye holê. Pêşketina kapîtalîzmê -bila bi şêweyek cuda ku wî sosyalîzma pêkhatî şibandî xwe dibe- ya giştî, îro bi şêweya şaristaniya Rojava derdikeve pêşberî me. Ev jî pir nehevsengî rewşek dijberî gelên Rojhilata Navîn

ketine, ev rewşa ku heta dawî bi kevneşopiyên dîrokî re bi nakoke, rê ji derketina mirovê ecûc û civakek mirovatî ya mînakek pir xirab re vedike.

Nabe ku gelên Rojhilata Navîn mehkumê vê bin. Ger her roj hîn zêdetir bikevin ferqa dîroka xwe û rastiyên şaristaniya mezin a xwe, her wiha rast xwedîderketinek bê serxistin, hingê dikarin bijîn. Ev jî her roja derbas dibe baştir tê dîtin. Ev kapîtalîzma çend sedsalên dawî de tê ferzkirin, bûhran bi xwe re aniye. Dikare bê gotin herî zêde di vir de ji civat û civakên nayên jiyîn re rê vekiriye. Ji derguşa mirovahî ya tê de zayiye, rola bûna gora mirovahî daye. Bêguman dema gelên Rojhilata Navîn vê bibînin, dê bikarin bi berteka herî mezin ve rabin serhildanê.

Belê, gotina partiya me eve, tiştê dike jî evin.

Dê li dijî kapîtalîzma ku dixwaze derguşa mirovahî veguherîne gora mirovahiyê raweste.

Dê bersivê bide kapîtalîzm û emperyalîzma talanker a li serê mirovatiyê bûye belayek mezin û ji bilî bûna rejîmek qumarê ne tiştek dine. Heman weke di destpêka dîrokê de bûye, derbaskirina civakên çînayetî û bi şêweya derbaskirina vê kapîtalîzma talanker, dê rola derguştiyê bilîze. Di derketina destpêkê ya partiya me de jî, me ev nirxandin kiribûn.

Wê di wexta berbangê van axan û van gelan rolek çawa lîstibin, dê ji şaristanî, civakek bê çînî û şêweyên wê yên şaristaniyê re ji bo cardin derguştiyê bike, ti sedemek dijber nîne ku vê erka xwe nebîne. Ger hebe jî, ji bo vê erka dîrokî, nabe weke astengî bê dîtin û serî jê re bê tewandin.

Em evqasî aso mezin dihizirin.

Ya herî girîng jî rojane astengiyên jiyanê yên nayên pejirandin hene. Rojane li dijî van astengiyan derketin, ji bo jiyîna mirovekê dibe ku ji nan, av û hewayê hêjatir be. Jixwe tişta ku rojane PKK'ê dide jiyîn, evqasî pêwîstî bi xisletên mirovî dibîne. Nexwe asoyek evqasî mezin pêşve birin, rojane li dijî astengiyên jiyana ku bi ti şêweyî nayê pejirandin rawestîn, mirov ji bombeya atomê hîn zêdetir hêjatir û xurt dike.

PKK'ê ev hinekê pêk anî.

Kesên rêber ên di nava PKK'ê de kêm-zêde navê pêkanîna vê ne.

Ger bê israrkirin, her milîtan kesayetek bi vî şêwazî bijî û vê domdar bike, bi rastî jî ti sedem nîne ku hêviyên herî mezin, ûtopyayên herî demdirêj neveguherin rastiyek girîng. Jixwe sedema serkeftina pratîka PKK'ê ya ji bo gelek kesan mûcîzewî wê dide diyarkirin ev rastiye.

Em li ser vî bingehî bi qasî îdealên sosyalîst û dîroka gelan ve girêdayî ne, ewqas jî girêdana xwe ya berjewendiyên rojane û di vê manê de roja pişgiriya kedkaran raber dikin.

Em bi têkoşîna partiya xwe ya pir bi îdîa û serkeftî ve vê silav dikin, ji bo hemû mirovahî û gelê me pîroz dikin.

**Li Dijî Mirinê Jiyan**
**Li Dijî Koletiyê Azadî**

Sosyalîzm çiqas dikare rewşên we ronî bike?

Ev girînge. Ji ber ku sosyalîzm rêberê bîrdoziya me ye. Ango reng, hiş û ruhê we bimeşînê ye. Ew nebin dê ling çi bikin? Ked û hewldana çors xizmetê ji dijmin re dikin.

Soslalîzm wek bîrdozî hilbijartin ji bo me nirxek berze. Hewce ye û raste. Gelo dikare we ronî bike?

Gelo hûn dikarin bi sosyalîzmê re vejîn û ronak bibin?

Bîrdoziyên cuda jî hene. Hinek netewperestiyê dikin, hinek jî olperestiyê dikin. Ew jî dikarin heta radeyekê rastiyan bilêv bikin, dikarin mirovan rakin serhildanê. Lê belê ew, ji ber hinek sedeman di nêvenga me de ser neketine. Sedê salane wer dixwiyê dê Îslamiyet, netewperestî ti encamê nede.

Me jî got, dibe ku sosyalîzm bibe.

Ya rastî êdî hewce nake zêde behsa dîrok, rêgez û PKK'yîbûna sosyalîzmê bê kirin. Yan jî xalên ku ezê bixwazim bi sosyalîzmê bilêv bikim, wê di rastiyê de çiqas dikare we dahûrîne? Sosyalîzm pêşî eve. Elbet bi temamî ne eve.

Ya girîng dahûrandina we ye.

Me di serî de xwest, PKK'yîbûnê weke pêşketinek ferasetê binirxînin. Me xwest bi qasî mirovê bi hiş, baldar û fêhma avakirin û derxistina holê pênase bikin. Rêgeza sosyalîzmê ya herî bingehîn ev bû. Lê belê niha lê dinêrim, pêkan û asta pêşketina vê ya bi we re pir sînordare û hûn red dikin. Çima? Ji ber ku hûn pir ji xwe ditirsin, lewra pênase nakin. Yek ji sedema herî bingehîn a kesayeta revok jî eve.

Di xisletên netewî û civakî de evqasî pêşketina kesayeta revok di nava me de çi rave dike?

Rave dike ku di seknek pir xeternak de ye. Ger li xwe binêre, bibîne û binase dê bitirse. Lewra dibêje; "Min nedît, ezê birevim, ji nedîtî ve bêm." Ma bi tirsa ji rastiya xwe û reva ji rastiyan ve mirov dikare bigihe cihekê? Na, dê rewşek kembaxtir bê jiyîn. Yeqîn dikim yek ji sedema herî bingehîn hûn pêş nakevin an jî raveya wê eve.

Hûn ji xwe ditirsin û direvin.

Hûn bi giştî ji xisletên mirov ên bingehîn û taybet jî ji xisletên netewî û civakî yên me ditirsin. Xala ku min weke rêber wêrek nêz

bûm, dawî li revê anîn û bê tirs hewldana fêmkirina rastiyane. Di vir de biryardar bûm, min ev esas girt û wêrek bi ser de çûm. Kesê ku vê hinekê ji kûranî nezane, hîs neke, nebihîse, nefêhma be û bi vê re jî hewl nede xwe binase, ji heywanekî kembaxtire. Vê ji bo we û her kesî vekirî dibêjim.

Nikarim pênaseya kesê ku ji her hêlê ve rastiya xwe fêm nake bikim û nikarim ji wan re bêjim mirov.

Kiye dijî?

Çawa dijî? Dijîn an jî najîn?

Pêwîste em rêgez û nirxên bingehîn ên mirov dike mirov fêm bikin. Bêyî ku bê fêmkirin, bi qasî misqalekê jî gav nayê avêtin. Ma em çima hevdu dixapînin? Ma ezê çima bi şervantiyek erzan ve xwe jî we jî helak bikim! Ma ezê çima her roj bi dilêşî û her roj bi ax û nalînê, xwe jî û we jî tengav bikim!

Me xwest bawer bikin, îdîayek we heye û bêjin; “Ev di nava lêgerînekê de ne.”Lê bi pêkanîna vê re, dibe ku me jî xirabiya herî mezin li xwe kiribe. Di çi manê de? Di maneya em çiqas pak de ne. Derket holê, di derheqê mirovan de ji xêrê ve hizirîn çiqasî dixapîne. Di rêgez, biryar û ya herî girîng jî di raveya pêkanîna wê ya pratîkî de evqasî bê îdîabûn û devjêberdan heye ku, jixwe ne di xema we de ye.

Nêzîkbûna; “Wisa çêbûye” tê çi manê? Lewra negengaze ku mirov metirsîdar nebe.

Windakirina herî hêsan, rastiya mirovek tinebûyî rave dike.

Di bin her windakirina hêsan û binkeftinê de, rastiya mirovê ji xwe ditirse û ji xwe direve heye.

Em xwe nexapînin. Ji hinek din rêzdarî û dilrehmî payîn vale ye. Kesek ku evqasî xirabî li xwe bike, mafê wî ji ti rêzdarî, eleqe û rehmê re nîne.

Eleqeya me ya sosyalîst, ya rastî ji bo dawî li vê anîne.

Hinek ji we hewce bike dikare komek olî jî biecibîne. Dikare komek bîrdozî ya cuda jî bê esasgirtin.

Ne tenê di sosyalîzmê de, di nava me de ji van tevan rev heye. Yên li gorî rastiya ol, rastiya netewperestî, nizanim vê felsefeyê –dibe ku

ev şêweya fikrek pir paşverû jî be- dijîn jî nîne. Lewra gengeşe evqasî mezine.

Di demên dawî de Emerîkî dibêjin; “Em nikarin di derheqê Kurdan de polîtîka pêş bixin.” Dema hinekê hewl didim vê fêm bikim, vê dibînim: Belê, nikare polîtîka pêş bixe. Bawerim her ku diçe Emerîka başdir ferq dike ku, pir belav bûye û dibe ku rastiyek civakî û rastiyek netewî di radeyek mezin de ji xwebûnê derketî, hêzek cîhanê ya herî zêde bi qasî Emerîka xwedî polîtîkaya herî pêşketî jî nizane dê çi bike. Nexwe em dizanin ku Emerîkî mirov di mêtîngeriya nû rêvebirinê de çiqasî şareza ne.

Çima nikarin di derheqê Kurdan de polîtîkayê pêş bixin? Bê biryar û bê çare ne. Dibe ku xwe dispêrin PKK, wisa di derheqê PKK’ê, qet nebê di derheqê min de dibêjin; “Pir zalim û pir bêrehme.” Her wiha ev jî dibe polîtîkaya Emerîka. Ya rastî yê zalim û bêrehmê mezin ew bi xwe ye. Wexta hinek dixwazin li dijî hinekan derbikevin, ger nikare wî rast pênase bike, dê van peyvan pir bikar bîne.

Niha ji Komara Tirk re dibêje; “Qaşo şerê em dimeşînin. Şerê mirovatiyê ye.” Ev van peyvan bikar tînin û dibêjin; “Em mirovatiyê ji belayek mezin rizgar dikin.” Ev raveyên xwedî bingehên bîrdozî û siyasî yên PKK’ê ne. Lê belê dijmin jî rastiya xwe hêjayî te diyar dike û pêdivî bi şer dibîne.

Nexwe dijmin ewqas me tine dihesibîne, hewl dide îdîa û rêgezên me yên herî hîmdar jî ji dest me derbixe. Elbet li ser bingeha lewaziyek bê sînor nêz dibe. Qet fêm nake yan jî tişta fêm dike eve: Dibêje; “Ez dikarim her tiştî ferz bikim û bidim pejirandin.” An jî bi şêweyek din dibêje; “Çiqas xisletên min ên neyênî hene, dikarim tevan hêjayî wan bibînim.”

Bi nezantiya fikirandinê û jiyan bê hiş pêşxistinê ve hûn xirabiya herî mezin li xwe dikin. Ez yeqîn dikim PKK, çavkaniya îlhamê û wêrekiyê ye. Belê, dê PKK her tim bûna çavkaniya vê bidomîne. Lê belê xala ku pêwîste ji bingeh ve yan jî bê fêmkirin, fêhmabûn, hiş esasgirtin û pêngava afirandina çalekiya vê kirine. Encamên din talîne û ne esasin.

Rêvebirina we karê cîhanê yê herî zehmete.

Niha rêveberiya Kurd a siyasî, rêveberiya partiya Kurd, rêveberiya bîrdozî, nexasim rêveberiya leşkerî, dikarim bêjim ku bi qasî karê cîhanê yê herî zehmete, ewqas jî karek jêhatiyek mezin dixwaze.

Rastiya Kurd a din jî, karê herî baş tê de kêrhatî ger mirin be yan jî tenê bikare vê bike, êdî hûn bihizirin.

Em çiqas dikarin jiyanê pêk bînin?

Ango karê herî baş mirinê dihizire, nexwe divê ji xiraban re çi bê gotin? Xirab ji bilî ruhê kesên mirina baş zêdetir tiştekê nahizirin distînin. Emê çi navê li van bikin? Ma emê bêjin zebanî? Navê wê wisa ye. Vaye ev jî dijmine. Lê belê feraseta yê herî baş jî, jixwe xwe ber bi mirinek herî baş ve berdan û xwe ji mirinek bê pejirandin re amadekirine.

Ev jî dibe rastiyek mirovên me. Jiyan beriya mirinê yan jî piştî mirinê tê hizirîn.

Çi kesên di jiyanê de gerîne û xwe vedikişînin jiyanê dibe, çi jî yên çavên xwe nû bi nû ji jiyanê re vedikin, tişta pêşî divê bê kirin redkirina mirinê ye.

Niha di nava we de yê mirinê red dike kiye?

Kîjan mirinê red dike?

Ya herî girîng jî, piştî ku red dike, kî li jiyanê dihizire? Ango jiyanek çawa?

Li her kesî guhdar dikim. Lê belê kesê ku zêde pîvanên min û li gorî sosyalîzmê beşdarî jiyanê dibe nîne. Yeqîn dikim em ji ber vê, nirxên mezin ji nava xwe derbixin. Ger hîsa jiyanê nebe, dê kîjan nirx pêş bikevin? Kîjan kesayet dikare meşa serkeftinê pêk bîne? Deka em li derdorên civakê yên dibêjin; “Dijîm” binêrin, li gundî binêrin, li karker binêrin, li karmend binêrin, ji “kerê” govê kembaxtire. Dijmin wî di govekê de digire, qût jî nadiyê. Bi qasî “kerê” hêza zirînê jî nîne. Her wiha diqîre û dibêje; “Ez dijîm.” Kesayetek evqasî xafil û jirêderketî, ji rewşa qewmê Musa yê lenetî kembaxtir, rewşek lenet rave dike.

Ev mirov li ku dera jiyanê ne? Neku pesnê xwe didim, lê hêj di temenê pir biçûk de, kerba min li hember mirovê wisa hebû. Min digot

mirov bi zilam û jinê wisa re, qet nikare bijîm. Min digot, di nava malbata û xizmên wan de jî nayê jiyîn. Hêjî di bîra min de ye, ew roj ev roje li pey jiyanê me. Dê tu li kur bijî? Çawa bijî? Me ji bo wê partî damezirand û şer meşand.

Hêjî em li pey jiyan û ûtopyayên xwe yên sosyalîstî ne.

Ji aliyê din ve jî li şêwaza jiyana we ya heyî dinêrim, ev tenê jiyanek li gorî we ye. Di nav de her cure kirêtî û mirinî heye. Nabêjim şaşî jî. Jixwe ti eleqeya wê bi rastiyê re nîne. Lê hûn dipejirînin û diçin.

Ma bi vî şêwazî mirovê mezin û sosyalîst tê avakirin?

Ma meşa mezin tê afirandin?

Na!

Belê, ji ber vê hûnê li hember bîrdoziya jiyanê eleqe raber bikin. Hem jî ji nan û avê zêdetir. Ji ber ku nan û av jî bidestxistin, bi eleqeya jiyanê re girêdayî ye. Bal bidinê ez nabêjim; “Hûn şerê jiyanê dimeşînin.” Em behsa “Şerê gel” an jî “Şerê sosyalîzmê” dikin. Ez hêj nehatime vir. Ji bo hatina vir, hewce dike bawerî bi pêdiviya jiyanê bê anîn.

Pêdivî bi pênaseyek jiyanê heye.

Pêwîste tu kêm-zêde pirs “jiyanek çawa” ji xwe bikî, daku şerê wê bimeşînî. Ma pirs nebê, bersiv dibe? Ma rastî nebe, şerê wê dibe? Ger bibe, dê bibe şerê xeyal û tewşomewşoyan. Hûn çima vê bi min didin gotin. Ji ber ku we mezinbûn ava nekir. Ji ber ku tevlî jiyanê nebûn. We pir şaşî kirin. Bal bibinê, nirxandinên min bi vê rastiya we ve girêdayî ye. Em neçarin şênber bin.

Îxanet li rastiyê kirin, ji bo min windakirina her tiştî ye.

Ya rastî fikarên we girêdayî rastiyên jiyanê tine ne. Nexwe, ma we dikariya meşên wisa şaş bikin? Ma evqas kurt û kêmasî tên pejirandin?

Naxwazim bi van gotinan gef li we bixwim. Jixwe yê ku gef li we bixwe, her roj bi qasî dikare gef dixwe. Dîsa jî ya herî rast, ne wisa bi gefan, quralên rêxistinê yên çors an jî wisa ferzkirina peywiran ve, pêngavek fikrî pêkanîn girînge. Bawerî bi hêza fikir û hêza bîrdozî anîn, karê destpêkê ye. Nexwe ji bilî vê em nikarin we bi ti rêyê sererast bikin û we bînin ser hişê we.

Peyvên weke “Şerê jiyanê, şerê sosyalîzmê” di astên pêş de ne, ji bo seknên pêşveçûyî tên ravekirin.

Em vê jiyana tê ferzkirin tasfiye dikin. Tê gotin; “Tiştên we winda kirine, cardin bigirin.” Belê, hûn bêçare ne. Ma hûnê jiyana di bin bandora giran a dijmin de bijîn û xwe bigihînin wê? An hûnê xwe nêzî jiyana em pir bi rêgez, afirîner û çalekgerî pêk tînin bikin? An jî hûn tam li naverastê mane? Jixwe derketiye holê ku, êdî dijmin bi xwe nikare di nava mercên xwe de bijî. Kar nade, derfetek heyberî ya pir çors jî êdî nahilberîne. Di vê manê de, bi rastî jî hûn dana jiyîn, ji hêla dijmin ve pir zehmete. Dema alternatîf û vebijêrka min a jiyanê dibe mijara gotinê jî, vêca hûn nayên. Vaye ji vê re tê gotin di navberê de mayî û rêya xwe nedîtin. Ma emê çi ji mirovê ku dijmin bi xwe hewce nabîne, pêdiviyek heybetî ya çors jî bide bikin!

Belê di vê xalê de hûnê bêjin; “Ya pêwîste bê kirin şoreşe.” Şoreşê jî ferz dikim. Lê hêza we têra şoreşê jî nake.

Dijmin heta kur qedantiye, ma hûn di ferqê de ne? Ango dibêje; “Me ew di komkujiyê re derbas kirin.” Lê ev ne komkujiyek asayî ye.

Ev dişibe vê: Hinek mar hene, weke şêwazê nîv mirî hiştinê ye. Ango beşekê dixwe, beşekê jî dihêle. Ger dijmin me tam bixwe û tine bike, em razî ne. Ger weke li Ermeniyan kirî, li me jî bike, ev jî çareseriyeke. Weke Îngîlîzan li bindestên xwe kirîn, li ser me jî mêtîngeriyek bê sepandin, em bi wê jî razî ne. Mêtîngeriya nû ya Emerîka jî li ser me bisepînin, em bi wê jî razî ne. Lê belê qirkirina li ser me pir cuda ye. Neçare wehşîtiya Tirk û hoveberiya Tirk, rast bê fêmkirin. Ji ber ku em ji mirovbûnê derxistine.

Komara Tirk hûn ava kirin.

Çil salin hewl didim xwe ava bikim, -bi hewldanên xwe yên azad ve-. Gelo Komara Tirk çiqas dikare kes ava bike û mirov ava bike? Ya rastî ne di ferqê de ye jî. Ti derdek Komara Tirk, kemalîzmê ya wisa mirov çêbe û ava bike nîne. Hîtler, taktîkek komkujiyê pêş xist. Yeqîn dikim kemalîzm ji wî xetertire. Hîtler li gorî xwe ber bi encamê ve çû, lê kemalîzm naçe encamê jî. Yeqîn dikim a herî xeter jî eve. Ji ber ku mirovên nîv bi nîv hiştî, ji mirovên ku li wan wargehan hestiyên wan

derketî derve xetertirin. Bihizirin civaka me wargehek giştî ye. Ji wargehên Hîtler xetertir dibînim. Vaye kemalîzm eve. Hîtler misoger cudabûnek çêdikir û pêk tanî. Lê belê di kemalîzmê de ewqas nekêrhatinek heye, naçe encamê. Nikare bixwe, vaye ji bo xwarinê jî weke nîv mirî li erdê dihêle, weke miraran bêhn didin.

Rewşa mirovê derûniya ku her kêlî bin bikeve û derûniya mehkumek cezayê darvekirinê girtî ku her kêlî li benda darvekirinê ye bihizirin, vaye kemalîzm ev bi xwe ye. Mirov di nava vê derûniyê de tê çi halê! Ma ev ji bo wêrankariya li ser derûniya mirov têrê nake? Mirovek nîv dîn ava dike. Hemû jî hejar û bêçare ne. Li gorî min hemûyan derziya jehrê xwariye.

Nîv mirîne!

Ango ne derziya tam kuştinê ye. Ew selefxurên berê bûn ne? Li gorî usulê berê xwarin nîv bêhndayî diveşartin. Komara Tirk jî, Kurd daniye cihek wisa. Ya rastî Tirkan jî bikar tîne. Lê Kurdan di şêwaza herî kevinbûyî de, wisa bêhnûyî dike. Dema hewce kir, dibêje; “Ezê ji te hinekê bixwim.” Heman weke mar û pisîkan. Heta hirç jî wisa dike. Ango ya Komara Tirk di maneyekê de mêtîngeriya hirçê ye. Ev rastiyeke. Emê çi bikin? Ger hinekê fêhmbûn hebe, hûnê çawa xwe ji wê mirarbûna bêhndayî û bûna xwarina hirçê rizgar bikin? Ev pirsgirêkek mezine. Emê çi bikin û birevin ku derê?

Em çawa bijîn û çawa bimirin?

“Em çawa bimirin?”

Mirovê me anîne asta ku “Ji mirinan, mirinê biecibîne.”

Em dixwazin ji jiyîn û jiyanê li ser lingan bimînin.

Vêca hûnê bêjin çi eleqeya xalên ku hûn vedibêjin bi sosyalîzmê re heye?

Afirandina mirovê azad -girêdayî civaka azad-, bi civaka azad û şerê azadiyê ve bidestxistine. Ev jî dibe bîrdoziya sosyalîzmê. Li gorî ya ku ji bo me jî pir hewce jiyana azade, yeqîn dikim bîrdoziya herî zêde ji bo me hewce jî sosyalîzme.

Lê ger em bal bidinê, ma hêj li vir neketine nav têkoşîna çînayetî. Em hêj neketine nav sosyalîzma ku di nava PKK’ê de jî pêk tê.

Lê belê ya mirov dikare yekser bêje eve: Weke ku emê jiyanê bikarin sosyalîzmê re binasin, emê şerê jiyanê jî bi sosyalîzmê saz bikin. Di rastiya miletek wisa ji civakbûnê hatiye derxistin de, li gorî ku herî zêde civakbûn rave dike bîrdoziya sosyalîzmê ye, wê çareserî jî di sosyalîzmê de bê gerîn.

Dîsa li gorî ku koletiya kes jî evqas hatiye kûrkirin, çare jî di zanista azadiya sosyalîzmê de bê gerîn. Lewra misoger evqasî pêdivî bi sosyalîzmê heye. Ango hilbijartina me ya sosyalîzmê, ne hilbijartinek ji rêzê ye. Li gorî rastiya me ya civakî û koletiya me, divê weke bîrdoziya mirovahî ya rizgarvan bê fêmkirin. Em evqasî berfireh dibînin.

Balder bin, feraseta me ya sosyalîzmê pir berfirehe. Li dijî mirinê bîrdoziya jiyanê, li dijî koletiya herî xeternak bîrdoziya azadiyê, heta li dijî tevlî jiyanê nebûnê, bîrdoziya tevlî jiyanê bûyîn, li dijî her cure hişbirê, bîrdoziya zindîkirinê ye. Pênaseya wê evqasî berfirehe.

Wexta em wisa pênase dikin û di rastiya xwe de disepînin, nexasim di şênberiya PKK'ê de neçare ku têkoşîna wê jî dijwar be. Ji ber sosyalîzma di PKK'ê de pêk tê, di rastiyê de dijmin, kapîtalîzma Tirk an jî kemalîzmê, faşîzmê weke şêweya herî xeternak û paşverû dinirxîne. Ew şêweya herî xeternak, paşverû, şovenîst û xwe dispêre tundiyê, mêtîngeriya hirçê ya li ser rastiya me ya civakî tê ferzkirin. Mêtîngeriya ku li ser mişkê disepînê ye. Kapîtalîzmek wisa heye.
Weke din divê em pênaseya xwe ya sosyalîzmê bi vî rengî jî kûr bikin.

Ji aliyê din ve jî wexta hemû bîrdozî, bizavên oldar û cuda, li ser rastiya me ya mirov tê sepandin ewqas ji rewşek şelûşeht û bê encam re vekirine, anîne astek nayên pênasekirin, pênaseya mirovê nû, pênaseya mirovê azad, tenê dikare di sosyalîzma ku di nava PKK'ê de pêk tê bê kirin.

Ji bilî sosyalîzmê ti bîrdoziyên din nikarin rastiya pênaseya rastiya me bikin, ji ber ku rewşê rizgar nakin.

Lewra ji bo civakbûnê sosyalîzm dibe vebijêrkek yekane.

Gotinek ku Castro bikar tîne heye, dibêje; "Yan sosyalîzm, an mirin an jî Yan sosyalîzm an jî Kûba'ya noqî okyanûsê bûyî!"

Ev jî ji bo me hîn zêdetir derbasdare. Yan sosyalîzm an qet!

Dibe ku Kûba noqî okyanûsê bibe, lê okyanûsek me ku wisa em noqî bibin jî nîne. Em bêjin geliyê velveleyê, geliyê dojehê dibe!

Nexwe emê pejirandina sosyalîzmê û girêdana wê ya bi jiyana me ve wisa binirxînin. Elbet sosyalîzma ku di PKK'ê de pêk tê, di nava partiyê de dema behsa têkoşîna sosyalîzmê tê kirin, kar hîn zêdetir wateyek mezin rave dikin.

Ez ji bo vê tenê behsa têkoşîna çînayetî nakim. Têkoşîna çînayetî ya di nava PKK'ê de yan jî bi gelemperî pêwîste di nava partiyê de çawa pêş bikeve, jixwe pêwîste em weke pirsgirêkek di radeya gerdûnî de binirxînin.

Sedema herî bingehîn a binkeftina ceribandinên sosyalîzma pêkhatî, ev partiyên rê ji sosyalîzmê re vekirîn, nekarîn di nava xwe de têkoşîna çînayetî domdar û afirîner bimeşînin. Sedema herî bingehîn eve. Ango partiyên binkeftîne, nekarîn di nava xwe de sosyalîzmê bimeşînin. Têkoşîn rawestandin, heta dawî derî ji xisletên çîna kevin re vekirin, lewra di encamê de dewletê jî damezirînin, bêjin gihane ber komînîzmê jî, nikarîn xwe ji nêzîkbûna ku civakê pir çewt radestî kapîtalîzmê kirinê rizgar bikin.

Ceribandina sosyalîzmê ev pir vekirî danî holê. Di vê manê de tevkariya PKK'ê ya herî girîng jî, di nava xwe de têkoşîna çînayetî, heta ji wê jî wêdetir weke ku nexweşiyên sosyalîzma pêkhatî nejiya, sosyalîma zanistî di nava mercên civaka xwe ya hîn zêdetir giran û xeternak de da sepandin. Têkoşîna di nava xwe de jî serkeftî meşand, wisa jî heta roja îro pêşketina xwe ser xist.

Ev ji sosyalîzmê re dibe tevkariya me ya herî girîng. Ango di nava partiyê de rastiya xwe ya civakî dahûrandin, rastiya xwe ya netewî dahûrandin, şax ji têkoşîna çînayetî, civakî û netewî berdan, heta ji bo kes jî şerek berfirehî dana meşandin, yekem car di nava PKK'ê de tê ceribandin.

Di cîhanê de ti partî, evqasî di nava xwe de têkoşîn nemeşandiye. Lewra partiyek din dewletê jî damezirîne winda dike. Lê ji ber ku PKK'ê di nava civaka herî zêde winda kirî de, sepana herî afirîner a sosyalîzmê esas girt û di nava xwe de her tim bi sazûmanî kir îro -dibe

ku siberojê jî- di asta gerdûnî de xwe digihîne partiyek mînak û vediguhere. Li vir her tişt neqediya ye.

Azadiyek PKK'ê heye. Rojane şer li ser bingehek afirîner dimeşîne. Ger sibe bê pirsîn; "Xeteriya herî mezin a li ser PKK'ê çiye", ev ne dijmine, ne jî ferzkariyên derve, ev û ewin. Dema vê têkoşîna di nava xwe de rawestîne, nekare rêveberiya têkoşînê ya rast, nexasim rêveberiya sosyalîst a rast bimeşîne, dê ev partî bin bikeve. Lê belê dema rast jî bimeşîne, ti carî bin nakeve. Rêya serkeftinê ya yekane ye. Wexta ev bi kesekî yan jî komîteyekê re hat sazkirin, dê partiyê ber bi serkeftinê ve bibe, peyre jî bîne. Lê belê dema rawestiya, bi kesayet re xetimî, komîteya navendî, nivîsgeha polîtîk an jî hemû qadroyên partiyê re xetimî, dewletê jî damezirîne, dê ev dewlet veguhere amûrekê û li pêşber raweste.

Dema em mirovan dikişînin nava PKK, em dareza; "Tu mirov, wê tu jiyana azad pêk bînî" serwer dikin.

Ya duyem, em dibêjin; "Pêdiviyên mirovbûnê, pêdiviyên jiyana azad, ango wê tu şerê wê bimeşînî." "Dema te bawerî bi pêdiviya vê ne anî û şerê wê nemeşand, tu nikarî bibî mirov jî, nikarî azad jî bibî."

Yekane pênaseya sosyalîzma ku di nava PKK'ê pêk tê eve û esase. Yên vê esas nagirin nikarin bi PKK'ê re bimeşin, nikarin têkoşînê pêş bixin û nagihin ti serkeftinê.

Ma tenê ji bo PKK'ê wisa ye? Na! Jixwe ger PKK nebe, ev civak hilweşiya ye û di aloziyê de ye. Rewşa rêxistinên din diyare, dewletên herî bihêz ên kapîtalîst-emperyalîst jî nikarin Kurd pênase bikin. Lewra DYE û dewletên eleqedar nikarin polîtîka pêş bixin. Çima? Ji ber ku negengaze Kurd û Kurdistan li gorî bîrdoziyên kapîtalîst û bîrdoziyên olî bê pênasekirin û polîtîka bê avakirin. Lê belê yê ku civak bi awayek zanistî di ravekirinê de herî zêde bi îdîa, berzkirina mirov de herî zêde bibiryar an jî sosyalîzma ku xwedî armancek wisa dikare vê bike. Vê ancex ger em bikarin li ser bingeh û şêweya PKK'ê sosyalîzmê bi xwe re bisepînin û di şênberiya xwe de pêk bînin saz dibe. Rastiya ku dixwaze bike, hinekê jî hatî selmandin û misoger bûyî eve.

Hûnê bizanin bihizirin; "Çima sosyalîzm, sosyalîzmek çawa û di PKK'ê de sosyalîzm çawa pêş ket?"

Dersa me ya herî bingehîn eve.

Heta ku ev ders neyên derxistin, hûn nikarin wisa gêrîlabûne, nizanim şerê bi liv û tevgere, rêveberiya jore, rêbertiye û fermandariye fêm bikin. Ji vê jî wêdetir hûnê şaşiyên mezin bikin.

Cardin dibêjim: Em bi xwesteka we ya jiyanê rastiyê didin bidestxistin. Ne tenê li hember rêz digirin, hema bêje ji tinebûnê ava dikin. Lê belê êdî divê hûn jî wate bidin hinek têgehên bingehîn. Divê hûn hêza vê di kesayeta xwe de pêkanînê raber bikin. Ne tenê bi vegotinê. Îdîayek sosyalîzmê ya bi şêweyek din, misoger derewe. Ger hûn beşdarî jiyanê nebin, hêza bîrdozî raber nekin, vîna xwe jî danenin holê, her yek ji we derewkere û sextekare. Ango hûnê bimirin û jiyan jî bi we re nayê pêşxistin. Hûn bê mejî ne, xayînin û sîxurekin. Bi van ve jî tevlîbûna jiyanê nabe. Qet negirînge objektîf an jî sûbjektîf be.

Dersa sosyalîzmê ne ji rêzê ye, dersa bingehîn a jiyana me ye.

PKK'yîbûna vê û di nava PKK'ê de pêkhatina vê, ji bo me çêbûn û vejîn bi xwe ye. Ger hûn misoger vê bi cidiyet bigirin dest, ezê jî bêjim, ev jî bi baweriya we ya bi sosyalîzmê, tevlîbûna we ji sosyalîzma ku di nava PKK'ê de pêş dikeve re, bi wê re ketina ser rêya jiyanê û hinekê jî şerkirin gengaz dibe. Weke din ne bi nêzîkbûnên cuda yên xwe ji mirinên erzan re amadekirin, ne jî şaxa jiyana ku her cure sexte ye girtin ve, ne min, ne jî xwe nexapînin. Ev kar zehmetin. Em şerê jiyan û sosyalîzmê dimeşînin.

Jixwe diyare li dijî dijminek çawa ye. Ma yê ku dixwaze bijî ne tu yî? Şerê wê jî bigire ber çav, şêweya wê ya bîrdozî, şêweya wê ya rêxistinî, pênaseya wê ya dijmin û dost esas bigire. Cidiyeta wê, kamilbûna wê, amadekariya wê ya di her astê de esas bigire. Çima tu nakî? Çima tu ber bi sextekariyê ve diçî? Çima wisa ji rê derdixî? Çima gelek tiştan ji nedîtî ve tî? Çima hewcedariyên wê di kesayeta xwe de pêk nayînî? Ger tu wisa bikî, ezê ne tenê bêjim oportonîste, ger tu ne sextekarek mezinî, gelo çiyî? Belê, ji ber ku rastiya rêbertiyê şerkerek mezin ê ferasetek wisa ye û şerê sosyalîzmê kûr dimeşîne, vê baş dinase. Partiya xwe jî dinase, şerê xwe jî dinase. Ji ber ku ev çil

salin, şerek ku her roj hezar carî ceribandî û dimeşîne heye. Wê çawa nas neke û hûnê xwe çawa veşêrin? Hûnê xwe çawa erzan bidin jiyîn an jî bikişînin nav mirinê? Evê çawa bê pejirandin? Rêbertiyek sosyalîst a wisa, misoger ne destûrê dide bikeve nav rewşên wisa, ne jî dipejirîne. Pir dijwar li dijî vê radiweste. Vaye, sosyalîzma ku di nava PKK'ê pêk tê eve.

Ger îro emperyalîzm –jixwe DYE nûnerê kapîtalîzmê yê herî bi îdîa ye- ji bo rêberiya PKK'ê dibêje; "Bêrehim û zalim", ev jî rastiyekê rave dike. Ji ber ku kapîtalîzmê bêrehmî û zalimtiya xwe weke dizê malê berovajî kir, ji bo gelên cîhanê şiyar nebin, sosyalîzma roja me cardin nebe male mirovatî, bi hunerek mezin û sextekariyek dijwar ve bi ser me de tê û dixwaze ser bigire. Di bin vê êrîşa bi ser me de, misoger karbidestiya PKK'ê wisa bi sosyalîstî pêş dikevê. Ango ne ji ber hoveberiya Tirk pir hez dike. Ew jî li hember faşîzma Tirk zêde ne eleqedarin. Lê belê ji ber ku zêde ji sosyalîzma li nav PKK'ê ditirsin, li dijî me ne. Sedema di şerê li dijî sosyalîzmê de, yê herî hosta Almanya evqasî bi ser me de tê ya bingehîn, ne ji ber ji hoveberî û rêveberiya Tirk hez dike, ji ber sosyalîzma PKK'ê ji bo xwe pir xeter dibîne.

Nexwe, sosyalîzma ku di nav PKK'ê de pêş dikeve di pîvanên gerdûnî û enternasyonalî de, cihek xwe ya pir girîng heye.

Ji bo rastiya me ya netewî û civakî sosyalîzm, jixwe bîrdoziya yekane ya vejînê ye.

Di wateya bandorkirina qada nav-netewî de, li hember kapîtalîzmê ji bo xwe xeteriya herî mezin dibîne. Lewma rêxistin û partiyek wisa ye ku welatparêziyê û enternasyonalîzmê jî pir bi îdîa li ser bingeha serkeftinê dimeşîne.

Kesê ku bîrdoziya sosyalîzmê baş bi xwe dayî fêmkirin, di nava partiyê de jî vê pêk tîne, polîtîkvanek baş, leşkerek bêhempa û her pirsgirêkê çareser dike, dikare her amadekariyê jî bike. Bingeha xwe ya bîrdozî jî wisa xurt bikin. Vê jî bi qasî hejmara tiliyan ji nava xwe derbixin. Wê demê ezê jî bêjim, pêdiviya serkeftinê ya herî bingehîn

hatiye pêşwazîkirin. Ya dimîne vesaziyek teknîkî, mezinkirina hejmar û dema wê diyarkirine.

Ger hêza we heye, hûnê bibin sosyalîstek wisa, her tim şerê wê bimeşînin û bigihin serkeftinê.

Kesên vê paşve dibînin, bi feraseta; “Yên bîrdoziya wan neyî, ji leşkertiyê baş fêm dikin” tevdigerin, pir derketin. Devjê berdin kesê bîrdoziya wî neyî ji leşkertiyê baş fêm bike, yekî ji tiştekê fêm nakê ye. Ger em bêjin helwest û reftarên herî xeternak jî ji vî kesî derdikevin, hîn rastire. Qaşo ji polîtîkayê fêm nake, lê ji pratîkê baş fêm dike, ji teoriyê fêm nake lê ji şer baş fêm dike! Yekser di vê xalê de “hêstir” tê bîra min. Ji ber hêstir li çiyan baş dimeşe, lê hêstir tenê hêstire. Reşoyek hebû -hêstir- leheng hat îlankirin. Ancex evqas ji serfermandarê Tirk derdikeve.

Gêrîlatiya bê bîrdozî û bê polîtîka nabe.

Em ê bawer bikin ku pêdivî pir bi zemîna bîrdozî û fikrî heye. Emê baş bizanin ku sosyalîzma di PKK’ê de tê, wateya xwe çiye. Piştî ev hat fêmkirin, em ê têkoşîna nav partiyê jî baş fêm bikin. Misoger neçare di nava partiyê de têkoşîna sosyalîzmê bêhempa bêmeşandin. Wexta ev jî hat meşandin, karên weke peywirên pratîkî, peywirên leşkerî ku tenê dibin karên hejmarî û wextê, ew jî ji bo çûna serkeftina esasî ye. Milîtanek ku rastiya rêbertiyê wisa bidest xistiye, di ti pirsgirêka siyasî û leşkerî de bê çare namîne û astengiyan nas nake. Ew dibe polîtîkvanek mezin, hostayek leşkerî û taktîsyenek mezin. Jêhatiye, dê misoger polîtîka û dîplomasiyê li ser bingeha serkeftinê bimeşîne. Bes bila bibe milîtanek sosyalîst. Dest bavêje kîjan pirsgirêkê bila be, dê çareser bike.

Ger hûn serkeftinê dixwazin, pêşî hûnê bibin xwedî ferasetek sosyalîst a wisa. Hêza vê ya pêhesî, hêza vê ya fikir û hêza vê ya vînê, her cure hêza vê ya teknîk, perwerde, tevdîr, tenduristî, fîzîkî û hwd tev bi hevdu re girêdayî ye. Dema te ev hemû bi xwe re kir yek, ger ti bextreşî çênebe, weke her carê min gotî, ger ji asîmanan kevirek bi ser de nekeve, tiştek ji dervî vîna te neyê pêşiya te negire, tenê pêdiviya ku tu pê hewce, girtin û dayîna henase ye. Her ku tu vê bidomînî, wê tu serkeftin ser serkeftinê bidest bixî. Tişta ku bîrdoziya sosyalîzmê

kirina malê xwe yan jî li ser vî bingehî PKK'yîkirinê, vê fêm dikim. Jixwe tişta heta niha hatî serxistin jî, li ser vî bingehî ye.

Divê kes îdîa neke û nebêje; "Ya rastî me pratîkek wisa kir, me xebatek wisa kir, PKK jî wisa pêş ket." Misoger yek ji van jî ne rastin û weke tê hizirîn zêdetir rê ji windahiyan re vekir. Sedema herî bingehîn a destkeftiyên heta roja îro, di nava PKK'ê de bîrdoziya sosyalîst bi destpêkirinek wisa ve destpê kir, heta roja me bi israrek mezin û têkoşînek mezin ve domandina wê ye.

Dema rastiya me ya civakî dibe mijara gotinê, ev çareya yekane ye, ya dimîne jî sedema windakirinek xeternake. Ketina ser xeta bîrdoziyên cuda jî, jixwe jixweber tinebûne. Rastiya herî bingehîn a hatî selmandin eve. Ger îdîaya we heye, di şerkirinê de biryardarin û dixwazin xwe bigihînin hinek serkeftinên girîng, pêwîste hûn sosyalîzma ku di nava PKK'ê de pêk tê, carek din ji her alî ve baş têbigihin. Divê hûn vê bi kesayeta xwe bidin têgihiştin. Ger gengaze di nava partiyê de pêwîste em şerê vê her tim domdar û afirîner bimeşînin. Dema ev jî hat sazkirin, a dimîne misoger pêşketinek serkeftiye.

**Faşîzma Tirk**
**Bi Pişgiriya Sovyetê Pêşket**

**(Ji Rojnameya Novoe Vermya Hevpeyvîna Makarinco Vadim a Bi Serokê Giştî yê PKK'ê Bi Abdulah Ocalan Re)**

Dema behsa Rusya û gelê Rus tê kirin, negengaze ku mirov wê Şoreşa Cotmehê ya mezin û bêhempa bibîr neyîne. Niha jî li axên Rusya ketinek mezin li ber çavane. Gelê Rus, her demê ji bo gelê cîhanê yê bindest bûye roniyek û çavkaniya îlhamê. Lewra miletê Rus, miletek mezine. Di dîrok û roja me de rolên pir girîng û mezin lîstiye.

Em di pêvajoyek ku gelê Kurdistan û gelê Rus hîn baştir hev dinasin re derbas dibin. Divê em di destpêka sedsalê û roja me de polîtîkayên tinekirinê yên faşîzma Tirk bizanin û polîtîkayên rast

destnîşan bikin. Tirkiya niha di roja me de hem ji bo Kurdistan hem ji bo gelê Rusya pirsgirêkek girînge. Nûnertiya Şoreşa Cotmehê ya mezin, gelê Rus dike. Gelo Şoreşa Cotmehê di encama kîjan şaşî û nebesiyan ket vê rewşê?

Beriya her tiştî xwe sosyalîst hîs dikim. Jixwe dewletên emperyalîst ji bo min dibêjin; “Sosyalîstê bi tena xwe mayî.” Heta Emerîka min weke; “Marksîst-Lenînîstê di cîhanê de herî xeter” bilêv dike. Emerîka li dijî Sovyetan şerek dijwar meşand û hêjî dimeşîne. Lê niha emperyalîzm bi şêweyek xirabtir êrîşî me dike. Lê belê em jî li hember vê emperyalîzmê qet nakevin. Ne di armancên me de lewaziyek hat jiyîn, ne jî di mijara sosyalîzmê de paşveketinek rû da.

Em hem dixwazin ezmûnên xwe pêşkêşî we bikin, hem jî ji ezmûnên we sûd werbigirin.

Demekê Rusya kelha sosyalîzmê bû û gel kûranî bi sosyalîzmê ve girêdayî bû. Çima niha nefretê ji sosyalîzmê dike? Nûnertiya sosyalîzmê û ronakbîriya mezin, li Rusya derket holê. Sedema hilweşînek wisa û gel evqasî tengav bûyî çiye?

Ti carî eleqeya min li hember Partiya Komînîst a Tirkiyê çênebû. Heta bi fikar bûm ku, nêzî vê partiyê bibim. Ji ber ku şêwaza jiyana wan nedihat pejirandin.

Di salên 1970’î de di kesayeta wan de, min şaşî û nebesiyên Yekîtiya Sovyetan didît. Yekîtiya Sovyetan bi salan di bin navê “enternasyonalîzmê” de, alîkariya Partiya Komînîst a Tirkiyê kir. Di salên damezirandina Komara Tirkiyê de, em dikarin wate bidin alîkariya ku emperyalîzmê ji tevgera Mustefa Kemal re kirî. Lê em wate nadin ku pişgiriya taktîkî ya ku wê demê Sovyetan dayî, çawa paşê veguherî stratejiya dewletê.

Li gorî min yek ji sedemek din a belavbûna Sovyetan, pişgiriya ku pêşkêşî Tirkiyê kir veguherî polîtîkaya dewletê bû. Ger nêzîkbûnên taktîkî veguherin stratejiyê û di bîrdoziyê de jî jirêderketin destpê bike, polîtîkaya ku ji bo hemû cîhanê bê sepan jî, dê di vê çarçovê de bimeşe.

Nêzîkbûnên Lenîn, ji Mustefa Kemal re taktîkî bûn. Lê belê Stalîn ev taktîk pir derxist pêş û kir polîtîkayek dewletê. Li ser vî bingehî nexweşî kûr bûn û sosyalîzmê her tişt winda kir. Elbet piştî ev pişgiriya taktîkî veguherî pişgiriya stratejîk, ji bo gelê Kurd pir girîng bû. Ji ber ku li vir dawiya gelê Kurd û tevgera qirkirina ji aliyê faşîzma Tirk ve pêk hatî heye.

Bal bidinê, Mustafa Kemal roj bi roj dibû faşîst. Li Tirkiyê rejîmek faşîst ava dibû û ev ber bi salên 1940'î ve bi alîkariya Sovyetan pêk dihat.

Di nava salên 1925-40'î de, serî heta binî pêvajoya îsyanên Kurdistanê bû. Ev îsyan hema hemû bi pişgiriya emperyalîzmê ve ji aliyê Mustafa Kemal ve bi komkujiyê hatin çewsandin. Ji aliyekê ve miletek bi komkujiyan dihat tinekirin, ji aliyê din ve jî, Mustafa Kemal hewl de xwe dostê hem emperyalîzmê, hem jî Sovyetê bide diyarkirin. Ji herdu aliyan jî alîkarî digirt. Ji bo sazkirina belavbûna sosyalîzmê, di salên 1920-21'ê de Mustafa Kemal xwest bi Îngîlîzan re îtîfak pêş bixe. Peyre di serî de Mustafa Suphî 15 endamên Partiya Komînîst a Tirkî di sala 1921'ê de bi komloyê qetil kir. Bi alîkariya Sovyetê ve, di cîhanê de ji serkêşên herî zêde darbe li sosyalîzmê dayî yek jê Mustafa Kemale. Dijminatiya Mustafa Kemal a li dijî sosyalîzmê, paşê pir vekirî derket hole. Jixwe ji destpêkê ve dijminek sosyalîzmê yê mezin bû. Zilamê sereke yê emperyalîzm û Îngîlîzan bû. Heta niha jî Îngîlîz nirxek mezin didin Mustafa Kemal. Sedema wê jî Mustafa Kemal li Anadoliyê darbeya mezin li sosyalîzmê da.

Tevgera Mustafa Kemal, ji bo dewletên emperyalîst bingeh amade kir û sosyalîzm cemidand.

Kes bi qasî Mustafa Kemal bi sosyalîzmê nelîst.

Îro hêjî pergala emperyalîst-kapîtalîst bi gelan dilîze. Daxwazek demokratîk a herî biçûk a gelan bi xwînrijandinê diçewsîne. Gelo çima emperyalîzm evqasî mezin li ser gelan dilîze? Ji ber ku ji sosyalîzmê ditirse û ji bo li dijî sosyalîzmê îtîfak ava bike, li ser gelan dilîze.

Komara Tirk, di salên damezirînê de ya rastî ji hemû welatên emperyalîst-kapîtalîst alîkarî digirt. Her wiha ev alîkarî heta roja me

jî didome. Ji ku li dijî sosyalîzmê şerê herî mezin Komara Tirk dimeşand. Dema ev hemû dihat kirin, ji aliyekê ve jî fermana mirina Kurdan dihat amadekirin, ji aliyê din ve jî heman polîtîka li ser gelên din ên bindest dihat pêkan. Grek û Ermenî ji holê rakirin. Gelek çand bişaftinê re derbas kir. Ev hemû jî hinekê bi pişgiriya Sovyetê pêk hatin.

Komara Tirkiyê baş dinasim. Faşîzma Tirk, Rus'an weke dijminê xwe yê herî mezin dibînin. Heta dikarin bêjin; "Em li dijî Rus'an şer bikin." Ya rastî ev îtîfakek rasterast li dijî Rusya pêk hatiye.

Di salên damezirandinê de li dijî Rusya îtîfakên Komara Tirkiyê bi emperyalîzmê re pêş xistîn sînordar bûn. Niha ev îtîfak zêde hatiye pêşxistin. Îtîfaqên bi vî rengî ziyanên mezin didin gelan. Berê dewletek bû, niha bûne pênc-şeş dewlet. Ango Sovyetê heft dewlet diyarî emperyalîzmê kir. Ev nakokiyek mezine. Jixwe darbeya herî mezin jî ji wan dixwe.

Ya rastî gelê Rus, miletek zerar dide xwe ye. Hinek kesayet hene, weke ku ji bo Komara Tirk hatine avakirin. Li Tirkiyê balyozxaneyek Rus hebû. Paşê bû alîgirê wezîrê karê derve. Her tim bi nêzîkbûnek; "Çawa dikarim alîkariya Tirkan bikim" nirxandin dikir. Digot; "Ezê biçim Moskova, çiqas malên PKK'ê hebin tevê rakim." Ne malên me, ne jî pêwendiyên me yên xurt li Moskovayê hebûn. Hinek hevalên me hebûn, em dikarin wan jî di navbera 24 demjimêran de ji wir vekişînin. Bes bi kîjan mantiqî van nixandinan dike? Ev pirsgirêkek dîplomasiyê ye. Em dikarin li ser van mijarên hatine destnîşankirin bi hev re baxivin. Ya rastî ev hevpeyvîna bi navbeynkariya rojnameya we ve tê kirin, hevpeyvînek bi gelê Rus re ye. Ger em bikarin pirsgirêkan bi kûranî û beramberî hev vekin, dê ev jî bo gelan erênî be.

**Makarinco Vadim:** Miletê Rus, miletek herî zêde bilindbûn û ketin jiyaye. Ya rastî rewşa gelê Rus a heyî, trajediyek mezin rave dike. Gelê Rus piştî demek dirêj, hukûmeta xwe damezirandiye. Piştî Şoreşa Cotmehê hewce dikir rojek nû û milet bilind bibûya, gel ji nişkê ve bi pirsgirêkek mezin re rûbirû hat. We pir vekirî destnîşan kir ku polîtîkaya me çiqasî tevlîheve. Ji bo hukûmet saxlem bê avakirin,

hewce dikir xebat xurt bûna. Ji bo çareseriya van pirsgirêkan jî, pêdivî bi qadroyan hebû.

Piştî mirina Lenîn, di nava partiya komînîst de guhertinên mezin çêbûn. Nakokiyên bîrdozî zêde xwe dan der. Taktîkên ku hatin pêşxistin, xizmet ji stratejiyê re nekir. Di hinek mijaran de vebûn çêbû, aboriyek xurt hat sazkirin. Bi rastî jî gelê me di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de li dijî faşîzmê helwestek xurt raber kir. Gelê me xwest gelek nirxan biparêze. Li dijî faşîzmê milyonan windahî çêbûn. Her miletek wisa hêsan van windahiyan berçav nagire. Ji bo hesin bê hasilkirin, kedek mezin tê xwestin.

Piştî di bîrdozî de tawîz hat dayîn, di sosyalîzmê de, ji hêla asta pêşeng ve ber bi reformîzmê ve herikbûn çêbû. Pir caran behsa komînîzmê hat kirin. Lê belê nekarîn dûrbûna ji bîrdozî jî asteng bikin. Dema gel ji bîrdozî dûr ket, jirêderketinên cudda ketin rojevê. Her wiha belavbûna Sovyetê pêk hat.

Berjewendiyên ferdî danîn pêş berjewendiyên civakî. Her kesî dixwest dewlemend, bi nav û deng be. Dema hinek jî gihan vê hedefa xwe, darbeyên mezin li gel dan. Jiyana me jî hinekê wisa derbas bû.

Îro Rusya di nava aloziyek mezin de ye. Ez yeqîn dikim, bi gelê Rus re hêzek mezin heye û dê ev hêz jî rabe serhildanê. Her çendî gengeşeyên mezin bên jiyîn, dîsa jî dewleta herî bihêze. Hêjî bi hêza xwe ve li ser linga ye.

Dema em cardin li ser pêwendiyên Rusya yên bi Tirkiyê re radiwestin, divê aliyên wê yên din jî bên dîtin. Ya rastî di salên 1920'î de heman weke pêwendiya di navbera Tirkiye û Rusya de yên tevlîhev, beriya Şerê Cîhanê yê Duyem di pêwendiyên xwe yên bi Almanan re jî hebû. Pêwendiyên hem aborî hem jî leşkerî mijara gotinê bûn. Mînak xwendevanên Dibistana Herbê ya Alman, perwerdeya xwe ya hînbûnê li Rusya dimeşandin. Piştî ku şer destpê kir, derket holê ku ev polîtîka şaşe.

Ti mafê Tirkiye nebû ku di Şerê Cîhanê yê Duyem de bi Almanan re ji pişt ve li me bixe. Ya rastî em dizanin ku Tirkiye demek dirêje dixwaze Rusya tengav bike. Lewra di vê mijarê de em jî û hûn jî xwedî heman nêzîkbûnê ne.

Bandorên netewperestiya Stalîn heta roja me jî didomin. Gel tê koçberkirin, komkujî pêk tên. Ev polîtîkaya şaş a di nava girseyê de hatî rûniştandin, di nêzîkbûna ji Kurdan re jî xwe dide der. Gelek polîtîkvanên Rus, hêjî pirsgirêka Kurd fêm nekirine. Ev ne seknek raste.

Dixwazim derbasî pirsa xwe bibim. Bi qasî min dîtî, niha şerê gêrîla li Kurdistanê berhema xwe dide. Di roja me de pêşveçûna têkoşîna we çawa ye?

**Abdulah Ocalan:** Elbet sedemên ku gelê Rus heta niha gelê Kurd nas nekirî yên girîng hene. Gelê Kurd di dîrokê de winda bûye, rewşek her kesî hêviya xwe ya dê bikare bijî winda kirî rave dikir. Miletek pir bê bandor bû. Bi vî halî ve jixwe negengaz bû ku, jiyanekê bidest bixe. Di nava gelên din de xwedî rastiyek gelê ku bi helandinê ve rûbirû bû. Lewra her kesî hêviya xwe qut kiribû. Dema tevgera me destpêkê derketî holê, kesî nedixwest bi me bawer bike. Wê demê ez bi tenê bûm. Mîrateyek millî, binyatek çînî nebû. Bi salan tena xwe bûm. Her kesî digot; “Negengaze tu nikarî van mirovan zindî bikî.” Demek dirêj wisa berdewam kir. Komek hevalên min hebûn, wan jî bawer nedikir. Heta salên 1980 û 1990’î jî nêrîna hevalan û gel jî di vê çarçovê de bû. Dijmin jî yeqîn nedikir emê ser bixin. Min hewl da bi tena xwe vî şerî bimeşînim. Paşê hat fêmkirin ku, dê ev şer pêş bikeve. Êdî li welat bingehê gêrîla hat avakirin. Serhildanên gel destpê kir. Roj bi roj mezin bû. Bi kurtasî damezirandina partiya me, zêde naşibe damezirandina partiyên sosyalîst ên kevnar.

Destpêka min dişibe, Partiya Karkerên Demokrat ên Civakî yê Rusya ku di 1898’ê de bi neh kesî ve destpê kirî. Min jî bi neh hevalî re destpê kir. Ji bilî rêhevaltiya me, amadekariya yek ji me jî nebû. Ji aliyê bîrdozî ve jî ti amadekariya me nebû.

Me bi du gotinan dest bi xebata xwe kir. Me got; Kurdistan welatek mêtîngirî ye. Gelê Kurd jî, miletek bindeste. Pêwîste welatek vî miletî hebe.” Min li ser mafê mirovan hinek pirtûk xwendibûn. Min giranî dida bîrdoziya sosyalîst. Lê zêde nekûr bûm. Di wê demê de ji bo min a girîng, bi wêrekiyek mezin avakirina komê bû. Heman weke

Partiya Karkerên Demokrat-Civakî yên Rusya, ji sala 1898 heta sala 1903'ê nav heye, lê ew bi xwe nîne. Bingeha me hîn lewaztir bû. Gelê me xwendin û nivîsandin nedizaniya. Rewşênbîrên wê nebûn. Lewra min hemû xebat bi tena xwe dimeşand. Ji bo tinekirina me jî, hemû cîhanê pişgirî da Komara Tirkiyê. Lê belê îro welatên weke Emerîka û Almanya, kêm-zêde fêm kirin ku dê nekarin me bi siyaseta tinekirinê ve îmha bikin. Êdî negengaze ku gelê Kurd bi komkujiyan ve tine bibe. Niha her kes bilindbûn û vejîna gelê Kurd dipejirîne. Ya girîng şerê me gelek tişt selmand.

Dibe ku hêj rizgarî tam pêk nehatiye. Lê vegera li jiyanê çêbû. Pêwîste em pirsgirêka Kurd li gorî demê fêm bikin. Beriya rizgar bibe û serxwebûnê bijî, hewce dikir vejînê bijî. Miletek ku koka wê hatî ziwakirin û rayên jiyanê hatî birîn bû. Tenê yek-du rayên nehatîn ziwakirin mabûn. Bi nêrîna dibe ku şîn bibe, hewce dikir zêde bihata avdan. Belê tişta me kirî jî, hinekê şînkirin û şaxdayîn bû.

Dem ber bi rizgariyê ve diçe. Em niha di dema rizgariya welat û gel de ne. Ger em bikarin xebatan bi vî şêweyî bimeşînin, emê ber bi rizgariyê ve gavên mezin bavêjin.

## Ji Bo Gelê Rus Jî
## Pirsa "Çawa Bijîn" Hewce Dike

**Makarinco Vadim:** Başe, we ev hemû çawa ser xistin? Ji nû ve jîndarbûna miletekî çawa çêbû?

**Abdulah Ocalan:** Ev hemû, ne tiştên ji rêzê û hêsan hatîn bidestxistinin. Miletê Kurd, miletek hêviya xwe ji xwe qut kiribû. Dev ji gel berdin, hevalên me jî digotin; "Em rast nabin." Peywira min a sereke ev civat weke miletekê selmandine û paşê jî bi wê dana fêmkirine. Me ev ser xist û bidest xist. Hewce dikir di nava partiyê de jî her hevalek ev serkeftin hêjayî xwe dîtiban. Milet dişibiya miriyên li ser lingan. Partiya me jî selmand ku, ev milet dikare li ser lingên xwe bijî.

Di nava gel û partiya me de, pirsgirêkek din a herî mezin, pirs û pirsgirêka “Emê çawa bijîne?” Ev pirsgirêk wextekê ji bo gelê Rus jî girîng bû. Pirtûkek Çernişevskî hebû; “Çawa Bikin?” Ew pirtûk hinekê jî rewşa me vedibêje.

Niha jî pirsgirêka herî mezin dadihûrînim, pirsgirêka; “Pêwîste em çawa bijîne.”

Ji ber ku hevalên me jî, miletê me jî nizane pêwîste çawa bijî. Yên jiyanê nas nekin, nikarin şer jî binasin. Dibe ku niha gelê Rus hewce nabîne vê pirsê ji xwe bike. Lê belê ji bo wan di salên 1870-80’î de ev pirsa jiyana azad girîng bû. Ya rastî niha jî ji bo gelê Rus pirsa “Pêwîste em çawa bijîn” girînge û rasteqîne.

Me di mijara jiyanê de heta dawî derî vekirin. Me mifteya jiyanê bidest xist. Divê ev di nava partiya Sovyetê de jî baş bê fêmkirin.

Partiya Komînîst a Sovyetê, di cîhanê de xwedî dewleta herî mezin a duyemîn bû. Lê dema tasfiye jî bû, kes xwedî lê derneket, xwe bi xwe tine kir. Dema Emerîka li dijî Sovyetan şer kir, li dijî me jî Alman û Îngîlîz kir palpişta xwe û sê care şer dike. Heta mêtîngeriya Tirk jî bi alîkariya Sovyetê li dijî me şer dike. Lê belê tevî van hemûyan, partiya me ser ket. Rêya jiyanê vebû, em ber bi jiyana azad ve diherikin.

Partiya me her roja derbas dibe hîn zêdetir mezin dibe. Gelek caran xwestin di hundur û derve de tasfiye bikin. Tevî van, îro partiya me partiyek berze. Bi vê şêwaza xwe ve berdewam bike, dê li cîhanê dengvedanên mezin çêbin.

**Makarinco Vadim:** Xebatên we fêm dikim. Ev hemû jî didin diyarkirin ku hûn çiqas pêş ketine. Ne tenê ji hêla bîrdozî ve, diyare hûn li qadên din jî pêş ketine. Pirsên ku ez bikim, di mijara hûnê kengê ser bixin de ye. Hûnê desthilatiya gelê Kurdistanê çawa saz bikin? Gelo hûn dixwazin hukûmetek serbixwe damezirînin, an jî federasyon?

**Abdulah Ocalan:** Pirsgirêka damezirandina dewletê, pirsgirêkek siyasî ye, pirsgirêka desthilatiyê ye. Rewşa gelê me, ne weke rastiya gelê dine. Ji bo me ji nû ve vejîna gel girînge. Ev pêk tê. Niha jî

pirsgirêka me ya dewletbûnê heye. Pirsgirêka kurd, ne pirsgirêkek serbixwe ye. Li Rojhilata Navîn di navbera Tirk, Ereb û Farsan de hatiye parvekirin. Li ser Kurdan bi hev re polîtikayek meşandine. Wisa bi hêsanî fersendê nadin em dewletê ava bikin, -bi taybet jî Tirk-. Lê niha pêşketinên diyar hene. Di navbera xwe de pir nakokî jiyane. Ew bi xwe jî nabin hêza çareseriyê. Îran-Iraq, Tirkiye-Îran, Tirkiye – Surî di navbera xwe de nabin yek. Ji ber vê sedemê rewşên derve hinek derfetên objektif pêşkêş dike. Di hundur de jî şerê gêrîla berfireh û xurt bûye. Gel bi awayek pir mezin alîkarî dide. Arêna siyasî tam nebe dewlet jî, lê ji bo avakirina nîv dewletê gelekî destdayî ye. Ev dikare bi awayek federasyonê jî pêk bê.

Kurd di destpêkê de bi awayê federasyan dikarin di Rojhilata Navîn de rol bilîzin, li Başûrê Kurdisanê jî bi şêweyek federasyona diyar pêk tê. Lê bi girêdayî Bakûrê Kurdistanê pêş dikeve. Di Kurdistana Başûr de ya ji Kurdistana di bin serdestiya Tirkiyê de serbixwe ye federasyonek avakirin nepêkane. Divê federasyon li hemû parçeyê bi hev ve girêdayî pêşbikeve. Pirsgirêkek din jî, berê Tirkiye Başûrê Kurdisanê di nav sînorên misakî milî de dida nîşan. Ji ber vê li Başûr di nav hemû pirsgirêkan de Tirkiye heye. Ne pêkane her parçe di nava xwe de xwe birêxistin bike. Ji ber vê yan wê her çar parçeyan înkar bikin, an jî dê qebûl bikin. Dîsa jî nakokî derdikevin holê.

Ji vir şûn ve jî bi taybet li Başûrê Kurdistanê em dikarin ber bi dewletbûnê ve gavên diyar bavêjin. Her çendî em nekarin li her çar parçeyên Kurdistanê ji aliyê dewletbûnê ve bi hêz bikin jî, em dikarin li parçeyê Başûr şoreşê pêk bînin. Em dikarin ji quntarên Zagrosê heta peravên Dicle, li derdora ava Botanê pêngava xebatek federasyonê bihêz bikin. Dibe li Başûrê Kurdistanê şer hîn dijwartir be. Ev biryara me roj bi roj xurtir dibe. Di vî alî de emadekariyên me didomin. Armanca me ya herî nêz ferderasyona demokratîke. Ev ne xebatek bi salan bajoye, xebatek emê bikarin di nav çend mehan de pêk bînine.

**Makarinco Vadim:** Bi qasî tê fêmkirin hûn dixwazin, bi Iraq, Tirkiye û yên din re federasyonê pêş bixin.

**Abdulah Ocalan:** Raste. Mînak Rusya jî dewletek federale. Belê em jî dixwazin li Rojhilata Navîn federasyonekê pêş bixin. Bi gelên derdora Kurdistanê re dikare bi rêya federasyonê yekbûnek bê çêkirin. Federasyon, ji bo dewletbûnê ne gavek biçûk û ger demokratîk be, dikare weke dewletê rola xwe bilîze.

**Makarinco Vadim:** De başe, hûnê di roja me de li qada navnetewî rolek çawa bilîzin. Bendewariya partiya we ji cîhanê çiye?

**Abdulah Ocalan:** Beriya her tiştî gelên cihanê çawa dijîn, em dixwazin gelê Kurd jî wisa bijîn. Qanûnên ku ji bo mafên mirovan û mirovahî hatî danîn, pêwîste ji bo me jî derbasdar be. Pir tişt tê gotin, lê belê di pratîkê de jî ti gav nayê avêtin.

Şerê me, bandorê li ser siyaseta dewletên cîhanê dike. Bi serkeftî pêkhatina şerê me, dê rewşa Tirkiye, Iraq û yên din jî biguhere. Bandorkirina van, bandorkirina polîtîkaya cîhanê ye. Îro Kurdistan, girêka kor a Rojhilata Navîne. Ger ev pirsgirêk çareser bibe, dê gelek pirsgirêk jî ronî bibin û rolek stratejîk bilîze. Berê gelek dewletan li ser Kurdistanê kedxwarî dikir, li gorî xwe li ser Kurdan dilîst. Lê belê niha Kurd dibin xwediyê stratejiyekê û ev stratejî mezin dibe. Ger em di vê gava pêşiya me de jî ser bikevin, em dikarin li Rojhilata Navîn rolek mezin bilîzin. Lewra fikarên Emerîkayê ji vê rewşê hene. Êdî weke berê pirsgirêka Filîstînê zêde girîng nabîne û niha jî dibêje; “Pirsgirêka Kurd, pirsgirêkek mezine.” Cîhanê bi giranî bala xwe daye li ser vê pirsgirêkê. Ji ber ku sê xalên sereke yên gelan petrol, av û hêz di nava pirsgirêka Kurd de ava dibe. Dê şoreşa me di vê mijarê de gavên xurt bavêje. Pirsgirêka petrol û avê, ne tenê yên Rojhilata Navîne, pirsgirêka sereke ya cîhanê ye jî.

## Rus û Kurd Dikarin Bi Hev Re Şovenîzma Tirk Rawestînin

**Makarinco Vadim:** Birêz Serok, hûn nêrîna Rusan a li hember Kurdan çawa dinirxînin? Bi siyaseta stratejiyek çawa ve, gelê Kurd û Rus çawa dikarin yekbûnê saz bikin?

**Abdulah Ocalan:** Rusya di sedsala 19. de, zêde li ser pirsgirêka Kurd rawestiya. Minorsky û gelek rewşenbîrên weke wî lêkolînên girîng kirin, hewl dan pirsgirêka Kurd bi şêweyek objektîf ronî bikin. Beriya Şoreşa Cotmehê, pêwendiyên Rus'an bi Kurdan re xurt bû. Artêşa Rusya heta Kurdistanê hatin. Heta Dêrsim, Erzirom, Bêtlîs, Wan û Ermenîstanê pêşve çûbûn. Ger Rusya neçûba, dê Ermenî û Kurd bibûna dewlet. Zêde pêwendî çêbûn, piştre her tişt berovajî bû.

Şoreşa Cotmehê, şoreşa gelan a azadiyê bû. Rusya alîkariya Mustafa Kemal kir, wisa Kurd û Ermenî veder kirin û rê li ber komkujiya wan vekir. Ev nakokiyek xirabe. Xwe bi sipartina alîkariya derve ve şoreş nayê çêkirin, lê divê di navbera gelan de jî pişgirî hebe. Em tevgerek sosyalîstin û em neçarin hinek rastiyan bibînin. Dîroka heftî salî ya Sovyetê, ji bo Tirkan, Farisan û Ereban dîrokek erênî bû. Lê belê ev dîroka heftî salî, ji bo Kurdan dîrokek neyênî bû.

Ne tenê Sovyet pirsgirêk bû. Hinek pirsgirêkên navxweyî jî hebûn. Bi kurtasî hebûna Sovyetê ya heftî salî, ji bo gelê Kurdistanê ne erênî bû. Nexweşiyên li Sovyetê roj bi roj mezin dibûn. Hem di hundur, hem jî li derve, pirsgirêkên wê giran dibûn. Dema pêvajoya ku hilweşiya, zêde xemgîn nebûm. Beriya pêvajoya Gorbaçov destpê bike, hinek nirxandinên min di sala 1985'an de kirî hebûn. Min diyar kiribû, pêwîste herdu pergal nêzî hev bibin. Ji ber ku hemû pirsgirêk, bi xwe re kiribûn girêkek kor. Gelek şoreş, dibûn qurbanê vê girêka kor. Ne xwedî polîtîkayek rastbûn. Di encamê de, bi gelê Rus re gelek netewên din zerar dîtin.

Ya ku tê hilweşandin ne sosyalîzme, nexweşiyên di nava sosyalîzmê de ne. Niha jî gelê Rus êşa vê dikişîne. Piştî hilweşîna Sovyetê, rewşa ji bo me Kurdan derketî holê zêde nebaş bû. Ger gelê Rus dîsa bikare rabe, dê ev ji bo wê bibe zayînek nû. Di roja me de polîtîkaya Rusya bi temamî zelal nebûye. Mirov dikare bêje, dê roj bi roj polîtîkaya wê zelal bibe. Dê li ser siyaseta nav-netewî jî bandoran ava bike.

Ji niha ve li Rusya hinek pirsgirêk destpê dikin û ev pirsgirêk ji nêz ve gelan eleqedar dike. Mînak pirsgirêka Çeçenan heye. Tirkiye bi xisletek tam şovenîst ve Çeçenan diparêze. Dîsa Tirkiye li

Azerbaycan, Kazakîstan, Tûrkmenîstan û Ozbekîstanê polîtîkayek şovenîzmî dişopîne û dixwaze li van deran faşîzmê rewa bike. Qewmên Turanî hene. Em ne li dijî azadiya Çeçen û Tirkane. Lê şovenîzma ku Tirkiye gur dike, rewşek xetere. Nexasim faşîstên weke Tûrkeş vê gur dikin. Ev ji bo Rusya û gelên din, polîtîkayek pir xetere.

Hinek îtîfaqên ku burjuvaya Tirk ên Anadolî bi hinek dewletan re saz kirîn, di rastiyê de li dijî gelê Ruse. Divê ev polîtîka baş bê fêmkirin. Dibe ku Tirkiye niha lewaze, zêde tiştek ji dest nayê. Lê belê hewl dide mezin bibe. Bi rastî jî kapîtalîzma Tirk, li gelek dewletan belav dibe. Heta ketiye nava Rusya jî. Di mijara petrol de, hîn ji niha ve gelek pirsgirêk derdikevin. Wê di pêvajoya pêşiya me de hinek nakokiyên polîtîk bilez bikevin rojevê.

Rejîma şerê taybet a Tirk her roja ku derbas dibe, xisletek faşîzan bidest dixe. Her ku faşîzma Tirkiye jî pêş bikeve, dê ji gelê Rus re jî hinek astengî derbikevin. Di dîrokê de jî gelek caran rewşên mîna vê hatine jiyîn. Împaratoriya Osmaniyan sed salan li dijî Rus'an şer kir. Li dijî Sovyetê jî weke alîgirê NATO şer kir. Niha di pêvajoya amadekariyên şer de ye. Dewleta Tirk hêsan dev ji polîtîkayên xwe yên şovenîst bernade. Niha jî Kurd li dijî polîtîkayên Komara Tirk şer dikin. Li hember van xeteriyên ku başûrê Sovyetê, yê ku rola xwe bilîze, miletê yekane bikara şovenîzma Tirk rawestîne, miletê Ruse.

Bingeha pêwendiyên di nava gelên Rusya û Kurd de yên dîrokî û rojaneyî hene. Pêwîste pêwendiyên di navbera herdu gelan de di qadên hem stratejîk, hem aborî, hem jî polîtîk de xurt bin. Rusya li gorî gelek miletên din, hîn zêdetir xwedî zemînek objektîfe ku bikare pişgiriya Kurdan bigire. Gelek pêwendiyên Rusya bi Tirkiye û gelek welatên li Rojhilata Navîn re heye. Li gorî min ev pêwendî li ser miletê Rus giranî ne. Berzbûna miletê Kurd, dê pirsgirêkên dîrokî yên miletê Rus sivik bike. Dibe ku gelê Kurd niha rolek pir erênî nalîze, lê têkoşîna miletê Kurd dê ji bo herdu gelan jî, mercên guncav amade bike.

Rus'an heta niha li hember pişgiriya ku dayîn Komara Tirk tenê zerar û ziyan dîtin. Ya rastî Komara Tirkiyê bi pişgiriya Rusya bû

dewlet. Niha jî rejîma faşîst gefan li miletê Rus dixwe. Pêwendiya wan a stratejîk li dijî Rusane.

Ne ku ji ber polîtîkvanek lewazim dibêjim; "Werin alîkariya me bikin." Lê belê pirsgirêk, pirsgirêka me tevan û gelane.

Bingeha van îtîfak û alîkariyan çiye? Miletê Rus ê serwextiya wan a leşkerî û dîrokî xurte, çima hêjî di pêwendiyên xwe yên bi Tirkiyê re israr dikin? Pirsgirêka Kurdistanê, pirsgirêkek bingehîn ku rojevê dagir dike. Ger ji hêla aborî, leşkerî û siyasî ve bi kûranî bê lêkolînkirin, di mijara çareseriya pirsgirêka Kurd de, pêwîste herî zêde jî Rusya rol bilîze. Di pêvajoya pêşiya me de li ser vî bingehî, dê miletên me hîn zêdetir hev binase. Her cure pêwendiya ku bi miletê me re pêş bikeve, dê sûdên mezin bide hem miletê Rus hem jî miletê Kurd.

**Îtîfaqa Kurd û Rus**
**Dikare Gelek Pirsgirêkan Çareser Bike**

**Makarinco Vadim:** Serhildana gelê Kurd, bandor li ser polîtîkayên gelek dewletan dike. Lê belê li Rusya gelek pirsgirêk hene. Rusya ku nû ava bûyî, ji ber van pirsgirêkan, zêde girîngiyê neda pirsgirêka Kurd. Lêgerîna pêwediyê pêş nexist. Niha li Rusya hinek guhertin tên jiyîn. Heta dibe ku di astek diyar de nûbûn jî çêbin. Dibe ku di nava pêvajoyê de hinek guhertin çêbin. Li Sovyeta kevin, di asta rêbertiyê de ji hêla bîrdozî ve jirêderketinek hebû. Her tim pêşeroj dihizirîn. Lewra astengiyên rojane yên li pêş xwe nedîtin. Hêjî bandora polîtîkayên Sovyeta kevin dihatin dîtin. Lewra li Stenbolê hevdîtin kiribûn. Polîtîkayên ku wan di wê demê de destnîşan kirî, xwe nedispart bingehên rast. Tevî ku rêyên deryayê ji bo gelê Rus ewqasî ne girîng bûn, girîngiyek mezin danê. Di vê xalê de winda kirin. Rusan ne tenê di polîtîkayên li Rojhilata Navîn meşandin de şaşî kirin, li gel vê kêmasiyên cidî hatin jiyîn. Ger van baş lêkolîn nekin, gavên rast nayên avêtin.

**Abdulah Ocalan:** Pêwîste di vê mijarê de kûr bê hizirîn. Ev şaşî bi pirsgirêka Tirk re destpê kir. Her wiha bi gelemperiya Rojhilata

Navîn belav bû. Di polîtîkaya cîhanê de jî heman nexweşî hebûn. Rexnekirin an jî nekirin pir negirînge. Lê zerarên mezin çêbûn. Ez gelekî şaşwaz dibim û dibêjim; "Ev çi polîtîka ye." Niha ew bi xwe jî ketine ferqa vê.

**Makarinco Vadim:** Hukumeta Rusya di wan deman de polîtîkayek wisa dimeşand, kesî nedikariya rastiyan bilêv bike. Her ku bi wextê re hukumet paşverû bû, jiyan nedihat jiyîn. Yeqîn dikim hûn jî li ser vê babetê radiwestin. Nerehetiya li herêmekê derdiket, bandor li qadên din jî dikir. Di encamê de belavbûna Sovyetê bi xwe re anî.

**Abdulah Ocalan:** Xalên we bilêv kirîn girîngin. Gelek xal tên jibîrkirin. Lê belê niha her tişt pir vekirî tê dîtin. Şaşiyên siyaseta Rusya yên di derbarê Tirkiyê de, hêjî berdewam dikin. Gelek pişgiriyên mezin pêşkêşî dewleta Tirk kirin. Lê belê ger hinekê jî alîkariya gelê Kurd kiriban, dê gelê Rus deh qatî zêdetir sûd werbigirta. Hilweşîna Komara Tirk, girêdayî têkoşîna Rizgariya Netewî ya Kurdistanê ye. Ger di salên 1920'ê de ne bi kemalîzman re, bi Kurdan re pêwendî bihatan pêşxistin, dê ew pirsgirêka neqeban jî ji mêj ve bihata çareserkirin. Ne Tirk dibûn mûtefîkên Emerîka, ne jî Şahê Îranê xwe dispart Emerîka. Ne jî Iraq diket rewşa heyî de. Tenê tiştek hewce bû, ew jî pêşxistina pêwendiyên bi Kurdan re. Nabêjim kêmasiyên Kurdan nînin. Xwedî kêmasiyên pir mezinin. Lê belê ger hinekê jî hewldan bihata kirin, dê encamên erênî derketiban holê. Ji salên 1920 heta 1945'an ev derfet hebûn. Di encama kêmasiyekê de, ev firsend winda kirin. Ev jî zerar û ziyanên mezin da gelê Rus.

Niha Kurd li Rojhilata Navîn pêşveçûnek mezin pêk tînin. Hewl dide xwe bi cîhanê bide selmandin. Dema em polîtîkayên nav-netewî dinirxînin, pêşketina têkoşîna Rizgariya Netewî ya Kurdistanê, dê sûdên mezin bide gelê Rusya. Di gelek mijaran de xisletên hevbeş ên her du gelan hene. Di rewşa heyî de polîtîkayek xirab a li hember Rusya bê meşandin, dê yekser bandorek xirab li Kurdan jî bike.

Mînak, ji bo çareserkirina pirsgirêka Kafkasya, dikare bi gelê Kurd ê li wir re di nava şêwrê de gelek tişt bên kirin. Em ji pirsgirêka Ermeniyan bigirin, heta pirsgirêka Tirk, çareserkirina gelek

pirsgirêkan, girêdayî pirsgirêka Kurde. Çeçen jî û gelek pirsgirêkên din jî hevdu ve girêdayî ne. Ev pirsgirêk zêde Rusya jî mijûl dikin. Dema em rewşa herî berçav digirin, îtîfaqa gelê Kurd û gelê Rus, dê çareserkirina gelek pirsgirêkan de rola vebûnê bilîze. Faşîzma Tirk di bin navê Îslamiyetê de xeteriyek mezine. Li Çeçenîstanê hinek xirabî hatin jiyîn. Ger siberojê li Kazakîstan û Özbekîstanê heman xirabî bên jiyîn, çawa dikare bê rawestandin? Belê, dê Kurd ji çareseriya van pirsgirêkan tevan de rola mezin bilîze.

**Makarinco Vadim:** Em di salên 1920'ê de nebûn. Ger ji nebesiyên ku di dîrokê de hatin jiyîn encam bên derxistin re, dikare di navbera gelê Kurd û Rus de pêwendiyên rast bên sazkirin.

**Abdulah Ocalan:** Misoger wisa ye. Kesên miletê xwe hez dike û dixwaze xebatek bîrdozî bimeşîne, divê yekîtî û yekbûnê saz bike. Gelê Rus, miletek fedekare. Di demek ku gelê Kurd ketinek dijî de, bi Komara Tirk re îtîfak pêş xist. Tam jî di pêvajoyek ku me xwe birêxistin dikir de, Rusya paşpaşkî paşveçûnek dijiya. Yeqîn dikim dê êdî ev bê sîûdî ji holê rabe.

## Avakirina Mirovê Sosyalîst
## Ji Damezirandina Dewletê Girîngtire

**Makarinco Vadim:** Bi qasî min fêm kirî, armanca PKK'ê, ne tenê rizgarkirina axê ye. Di heman demê de avakirina tîpê mirovê nû ye jî. Hûn mirovê nû çawa ava dikin?

**Abdulah Ocalan:** Hêceta şerê me ya bingehîn, avakirina kesayeta mirovê nû ye. Em tenê ji bo parçeyek ax an jî miletekê tênakoşin. Di bingeha bîrdoziya me de, avakirina kesayeta mirovê nû esasî ye. Em li Sovyetê, di sosyalîzma pêkhatî de, di vê xalê de kêmasiyên cidî dibînin. Girîngî pir dan sînoran. Li ber çavan enternasyonalîzm hebû, lê di cewher de netewperestî giraniya xwe dida der.

Di qonaxa sosyalîzma Sovyetê de, kesên ku pêşengiya pergala heyî dikirin, ji kapîtalîzmê ne kêmtir bûn.

Dewletek sosyalîst hat damezirandin, miletek sosyalîst hat birêxistinkirin, lê mixabin kesê sosyalîst nehat avakirin. Mînak, Stalîn

çiqas di bin bandora feodalî de bû? Xwe çiqasî gihand kesayetek sosyalîst? Ger ev pirsgirêk baş neyên fêmkirin, pirsgirêkên sosyalîzmê jî nayên fêmkirin.

Dîsa Kureşçev çawa derket? Pir bi Stalîn ve girêdayî bû. Piştî ku Stalîn mir, rola dijmin lîst. Her du helwest jî nerastin. Di nava Partiya Komînîst a Sovyetê de, rêgeza vekirîbûnê hat windakirin. Hema ruhê mirovan dixeniqandin. Paşê jî xirab teqiyan. Şêwazên ez dimeşînim, berovajî van tevane. Ez her tiştî pir baş û vekirî dikim.

Ji destpêkê ve heta roja me, rêgeza min a bingehîn Glastnoste (Dîroka Partiya Komînîst a Yekîtiya Sovyetan).

Polîtîkaya ku li hember dewleta Tirk disepînim jî, vekirî dikim. Heta dawî rêgeza vekirîbûnê derbasdare. Weke din mirov nikare li hember feodalîzm û paşverûtiyê têbikoşe. Ev rêbaz nebin, sosyalîzma zanistî jî pêk naye.

Di Yekîtiya Sovyetan de, bi navê komîteya navendî û sekreterya karên cuda hatin kirin, lê gel hat çewsandin. Li jorê jî nivîsgeha polîtîk xwe pir mezin îlan kir. Di encamê de vê jî rê ji teqînên mezin re vekir. Hewce dikir wisa nebûya. Kêmek mabû xwe weke xweda li cîhanê bida nasîn. Mane ev ne sosyalîzme, elbet dê hilweşe. Hewce dikir hilweşe jî. Di nava sînorên ku tên sazkirin de ne kapîtalîzm, sosyalîzm tê damezirandin. Ji ber ku sosyalîzm, nûnertiya mirovatiya nû dike. Pêwîste sosyalîzm ji bo mirovatî bibe şêwazek jiyanê û ev bê berfirehkirin.

Mirovê nû, mirovê rast û mirovê bedew, mirovê sosyalîste. Ma dê çima di nava sînoran de bê girtin? Çima xwe veşêre? Ez li dijî van teva me.

Em li Kurdistanê mirovê nû ava dikin. Kesayetek bi temamî ji gumanên takekesî dûr. Kes bi zorê bi nava partiyê de nayê girtin. Her rêhevalek me fedaîyeke. Ne li ser bingeha dîsîplînek zorakî, li ser bingeha dilxwazî dimeşin. Şoreş û şer bi dîsîplîn û navendperestiya zorakî nameşe.

Ger li Rusya rêhevalên ku dixwazin xebatên sosyalîst bimeşînin hebin, dikarin ji xebat û ezmûnên me sûd werbigirin. Divê hinekê

dilnizm bin. Ez jî rastiya xwe zêde nanepixînim. Heta niha neketime nava gelê Kurd, lê min weke rêber û serkêş dibînin. Ma em çawa tam nûnertiya bîrdoziya sosyalîst dikin û beşek cîhanê ya mezin dijberî xwe digirin? Çawa çêdibe evqas gel û evqas rêheval di xetek ji agir de, bi min re dimeşin? Divê li ser van bê rawestîn. Ez di nava partiyê de pir hûrûkûr li ser avakirina mirovê nû disekinim. Ji ber ku avakirina mirovek nû, ji avakirina partiyekê û dewletekê hîn girîngtire.

Niha ger Lenîn, baş li ser Stalîn rawestiya û tam weke sosyalîstekî pêş xistiba, wê xeterî evqasî mezin nebûna. Beriya Lenîn bemire demek kin, xwest li ser babetên weke şovenîzm û birokratîzma Rus raweste û hinek pirs jî kirin. Ya rastî Lenîn ev xeterî didît. Lê belê wextê wî têrê nekir. Wesiyetên Lenîn girîngin. Pêwîste mirov li ser raweste.

## Rexnedana Sosyalîzma Pêkhatî
## Ez Didim

**Makarinco Vadim:** Hûn kesayeta mirovê nû ava dikin. Şêwaza pêwendiya di navbera van kesayetên mirovê nû de, mînak wê pêwendiya di navbera jin û zilam de çawa be? Dîsa gelo dê piştî serkeftinê saziya malbatê hebe? Ji ber di sosyalîzma pêkhatî de, hezkirin di çarçoveya pergala kapîtalîst de bû.

**Abdulah Ocalan:** Di xebatên min de pirsgirêka jinê yan jî pêwendiyên jin û zilam cihek girîng digirin. Di vê mijarê de di sosyalîzma pêkhatî de hinek xalên ku rexne dikim hene. Pêwendiyên hezkirinê, di çarçoveya pergala kapîtalîst de bûn. Zêde nekarî xwe ji vê şêwaza pêwendiyê rizgar bike. Zilam, zilamê berê bû, jin jî jina berê bû.

Mînak, dikare li ser zewaca Stalîn bê rawestîn.

Li ser têkîliya heyî ne sosyalîzm, Stalîn serdest bû. Ya rastî di belavbûna sosyalîzma pêkhatî de, yeqîn dikim rola vê xalê jî ya girîng heye. Ez di vê mijarê de her tim xwe nû dikim. Dema min ev xebat meşandin, min bi jinekê re şer kir û ser ketim. Jinek çiqas bi gelê xwe

re ye, çiqas bi dijmin re ye? Di encamê de jina ku mijara gotinê ye, dijmin hilbiijart. Şêwaza jiyana ku min areste dikir, bi xwe re partiyek sosyalîst ava kir. Hêjî pir xurt li ser bûyera hezkirinê radiwestim.

Li ser bingeha têkîliyên koletî ne hezkirin, ne jî şer dibe.

Dijmin hezkirin kuştiye.

Jixwe di nava pêvajoya dîrokî de, jin xirab hatiye xistin. Nexasim li Kurdistanê zêdetir hatiye xistin. Jin, nûnertiya lewaziyê dike. Malbatên Kurd jî, temamî nûnertiya ketîbûnê dikin. Jin û zilam, bi têkîliyên xwe ve hevdu dixeniqînin. Ev jî ji bo me xalek pir girînge. Ji pirsgirêkên leşkerî û siyasî zêdetir, girîngiyê didim pirsgirêka jinê. Jin hem ji hêla hêjmar ve zêde ne, hem jî bi xisletên xwe yên heyî ve di nava şer de cîh digirin. Hîn zêdetir dixwazin beşdar bibin. Em ji bo wan artêşê ava dikin.

Di nava mijarên dersên ku ez didim de, pirsgirêka "evînê" jî vedikim.

Hezkirin çiye?

Hestiyarî çiye?

Çawa dikare bi hev re bê jiyîn?

Weke di pirtûka Çernişevskî de. Mînak, li wir jinek heye, yeqîn dikim navê wê Vera ye. Ji bo me mînake. Vera dixwaze bi xwe re kesayeta jina azad ava bike. Elbet ev bandor li ser şêwaza jiyana Rus'an dike. Şoreşgerên Rus jî vê bandore dijîn. Niha em van xebatan zêdetir pêş dixin.

Jina azad kiye? Her tim di nava lêgerîna jina azad de me.

Di nava Kurdan de têkîliya jin û zilam, nûnertiya mirinê dikin. Elbet jiyanek bê têkîlî û bê jin jî nameşe. Lê bi wê re jî meş zehmete. Niha divê çawa bê kirin? Ev pirsek, ji bo me pêwîste bersiva wê bê dayîn. Ez ji bo zilaman dibêjim, xwe ji şêwaza jiyanek azad û wekhev re amade bikin. Ger hûn heta dawî jiyana nû bidest nexin, ji we re jin tine ye. Ji hevalên jin re jî dibêjim, sedî sed ev zilam hewl didin li ser we serdest bin, hûn çawa wan dipejirînin? Rojekê jî ji wan re jiniktî kirin, sed qatî ji mirinê zehmetire. Ma hûn dikarin wan bipejirînin?

Jinek, şûna bikeve bin serdestiya zilam, pêwîste mirinê hilbijêre. Bi şêweya heyî ve, jiyan nayê pejirandin.

Zilamek çawa? Kesayeta jin û zilamên tên xwestin avakirin, divê li ser bingeha wekhevî, azadî û hezkirinê be. Ger ev hemû neyên avakirin, dê pêwendî zerarê bidin. Jiyan jî bi van kirêtiyan ve nayê jiyîn.

Hevalên me van tevan guhdar dikin. Ez bi xwe jî ji bo wan mînakim. Mînak ez, divê çawa hez bikim, an jî pêwîste hinek çawa min hez bikin? Ez nikarim xwe bi sipartina otoriya siyasî ve, li ser jin an jî hevalan bikim otorîte. Hewce dike di vê mijarê de jî demokrasî xurt be. Bi hezkirinek rast nêzî me dibin. Em jî wê hezkirinê bi welatparêziyê ve yek dikin. Em bi partiyê û polîtîkaya partiyê ve girê didin.

Ya ku dixwaze min hez bike, pêwîste welatparêz be, bizane şer bike, di xeta partiyê de bimeşe, hewce dike beriya her tiştî xwe azad bike. Ger wisa nebe, kes nikare nêzî min bibe. Şêwaza me eve.

**Makarinco Vadim:** Mirovên nêzî we dibin, zû ji we bandor dibin.

**Abdulah Ocalan:** Rexnedana derbaskirina nexweşiyên sosyalîzma pêkhatî niha ez didim. Miletê Rus, di oxira sosyalîzm, mirovahî û armancên mezin de pir xwîn rijand.

Emê her tim li hember gelê Rus rêzdar bin.

Niha xwedî hinek aliyên ketî ye. Lê yeqîn dikim, wê di demek nêz de serkeftina raperînê bidest bixe. Bandora sosyalîzmê xurte. Negengaze ku gelê Rusya di çend salan de ji bin vê bandorê rizgar bibe. Dê sosyalîzm xwe nû bike.

Sosyalîzm ji her demê zêdetir, niha ji bo mirovahî hewce ye.

Sosyalîzma pêkhatî, sosyalîzmek zaroktî bû. Lê niha şêwaza sosyalîzmek hîn bijare hewce dike. Divê em li ser vê lêhûr bibin. Kapîtalîzm roj bi roj ji bo mirovahî karesatên nû pêş dixe. Ev ne çarenûsa mirovahiyê ye.

Dê sosyalîzm rola xwe cuda bilîze. Heta ku cîhan û mirovahî hebe, dê sosyalîzm jî hebe.

Sosyalîzm ne xwedî dîrokek heftî salî ye.

Ji çêbûna mirovahî heta roja me heye. Berdêla damezirîna sosyalîzma li Sovyetan biha bû. Milyonan mirov xwe feda kirin. Kapîtalîzm ji bo bigihe armancên xwe, dikare milyonan mirov ji çav derbixe. Ev nabê rastiya mirovahiyê. Pêwîste ne kes evqasî li ser civakê serdest be, ne jî ji bo civakê mafên mirovahî ji holê bên rakirin. Em li ser van radiwestin. Emê bi xebatên xwe ve pişgiriya wan bikin.

**Sovyetan**
**Kesayetek Ji Xwe Hezkirî Ava Kir**

**Makarinco Vadim:** Em çend rojan bi hevalên milîtan re man. Ev ji bo me siûdek mezin bû. Me gelek tişt bi çavên xwe dît. Me bi gelek hevalên ku di şer de birîndar bûne re sohbet û nîqaş kir. Ev jî em pir bandor kirin. Bi dayîkek pir îxtiyar re axivîm, ev got; “Ji bo welatê xwe, amade me ku her cure zehmetiyê bijîm.” Me raperîna miletekê bi çavên xwe dît. Ji axaftinên hevalan jî min fêm kir, ji bo xwe gihandina armancên xwe, ji rijandina xwînê natirsin. Em çawa dijîn, hûn çawa dijîn, min ew cewazî baştir dît. Hezkirina hevalan a li hember jiyanê, pir bandor li min kir.

**Abdulah Ocalan:** Gelê Rusya niha li hember jiyanê hinekê bêzare. Lê dîsa jî ji jiyanê hez dikin. Miletê Kurd, miletek pir paşketî ye. Lê bi şerkirinê fêrî jiyana xwe dibin.

Me pêvajoyên mirin û mayînê derbas kirin. Ji vir û şûn de meşandina şoreşê hêsantire. Me bi kûranî sûd ji ezmûnên Sovyetê jî girtin. Ji bo nexweşiyên di şoreşa Sovyetê de derketin, di şoreşa Kurdistanê de dernekevin, em tevdîrên mezin digirin. Nivîsgehên polîtîk û sekreterên Partiya Komînîst a Sovyetê, xwe ji gel mezintir didîtin. Ne sosyalîzm, birokrasî hat pêkanîn. Sînorên dewletê hatin fetîşkirin. Divê kes xwe ji gel mezintir nebîne. Pêwîste xizmetkarê gel û sosyalîzmê bin.

Ez her roj, wan hisên mezinbûnê bi xwe re dikujim. Ger kompleksa xwe mezin dîtinê bi xwe re nekujim, tişta hatî serê Rusya, hêj dewlet nehatî avakirin, dê were serê me. Xebatên ku Lenîn, Mao

û yên din kirîn, xebatên dîrokî ne, biçûk nabînim. Lê belê xebatên ku ji bo partiyê meşandîn lewaz dibînim. Di gelek tiştan de xemsarî kirin, xebat di şêwazek kevnar de hatin meşandin. Demokrasî û sosyalîzma zanistî bi temamî pêk ne anîn.

**Makarinco Vadim:** Birêz Serok, dê pêşveçûna aborî ya gelê Kurd çawa çêbe? Dîsa hûn diyardeyên partî û dewletê çawa dinirxînin?

**Abdulah Ocalan:** Pêşveçûna aborî girêdayî polîtîkaye. Dema me dest bi şoreşa Kurdistanê kir, me bi deyndarî destpê kir. Ez bi xwe jî gundiyek feqîr bûm. Lê niha hem di aborî, hem jî di polîtîkayê de yê bihêz emin. Qinyata min bi jêhatiyên mirov heye. Miletê Kurd, miletek kedkare. Xwedî axên dewlemende. Berê li Rojhilata Navîn ji bo Kurdistanê digotin; “Bihuşte.” Dê niha jî bibe bihuşt. Lê belê dijmin ji sedî heştî-not miletê me bê kar û bar hiştiye. Dewlemendiyên sererd û binerd talan dike. Hemû dewlemendiyên gelê Kurd, an di bin erdê de hiştine, yan jî hemû talan kirine.

Cardin bêjim; bûhranên ku li Rusya derketîn holê, rasterast girêdayî kapîtalîzmê ne. Şêwaza nû ya sosyalîst, dikare hemû bûhranan ji holê rake. Pirsgirêkên aborî zêde negirîngin. Ger pirsgirêk ji hêla polîtîk ve bên çareserkirin, ya peyre hêsane. Elbet hinek pir pê bilîzin, dê belav bibe. Pir bi Sovyetan lîstin. Ji ber vê dibêjim, divê partî heta dawî jidil be. Pêwîste partî û dewlet di nava gel de bihele. Lê mixabin li Sovyetê berovajî vê hat jiyîn.

Gel di nava dewletê de heliya, di nava partiyê de heliya. Ji ber vê em partiyê tine dikin. Zêde girîngiyê nadim dewletê. Lê dixwazim miletek azad û serbixwe jî ava bikim. Ger miletek dixwaze bê azadkirin, pêşî pêwîste qadroyên partiyê bên bihêzkirin. Her tişt ne ji bo partî û dewletê ye. Berovajî her tişt ji bo berzbûna mirovahiyê ye.

**Makarinco Vadim:** Piştî pirsên pir girîng, dixwazim pirsek hêsan bipirsim. Gelo nasnameyên qadroyên partiyê hene?

**Abdulah Ocalan:** Na tine ne. Em zêde girîngiyê nadin van mijaran. Dizanim piraniya wan kîne û ji kur hatine. Ev tişt, aliyê şêwe ne. Ev ji bo me zêde negirîngin. Kes bi rêbazên teşeyî ve nayên îdarekirin. Mînak, di vê mijarê de Rusya ji hêla teşe ve pir xurt bû.

**Makarinco Vadim:** Gelo hejmara gêrîlayên li çiyan şer dikin ên heyî û xebatkarên partiyê çendin?

**Abdulah Ocalan:** Tam ne diyare. Çiqas qadroyên partiyê hene? Kî navende? Kî di asta jêr de peywirdare? Zêde cewaziya xwe nîne. Min hêj navê nivîsgeha polîtîk destnîşan nekiriye. Navên navendan jî ne min diyar kirine. Wisa nivîsgehên min ên sekreterya cuda tine ne. Vesaziyên teşeyî, ji bo min xeterin. Ne ku em nizanin rêxistinbûnên wisa saz bikin, ji ber ku bi zerarin em nakin. Niha yên li Rusya heyî, li hember navenda kevin û polîtîkaya kevin pir bi bertekin. Wan fêm dikim. Ezmûnên ku min derxistin holê, ne tenê ji bo pirsgirêka Kurde, ji enternasyonalîzmê û sosyalîzma cîhanî re jî, tevkariyeke. Ya girîng kar bê meşandine. Bi rastî jî em têkoşînek mezin didin. Ger dewletek din, li dijî vî dijminî şer kiriba, ji mêj ve winda kiribû. Lê em neketin û ser ketin.

**Makarinco Vadim:** Bi rastî jî xala we behsa wê kirî raste. Li ber çavane ku we ser xistiye.

**Abdulah Ocalan:** Kêmasiyên me jî yên cidî hene. Rojane li hemberî van têdikoşim. Ne mirovek evîndarê xwe me. Kesayeta ku Sovyetê ava kirî, kesayetek evîndarê xwe ye. Xwe dixin dewsa xwedê de. Ayetullahên li Îranê bi qasî wan ne evîndarên xwe ne. Pêwîste kesayetên sosyalîst dilnizm bin. Divê em bi israr li ser van mijaran rawestin. Li vir a tawanbar ne sosyalîzm, an jî komînîzme. Yên tawanbar kes bi xwe ne. Ez pêşeroja gelê Rus, di nava pergala kapîtalîst de nabînim. Miletê Rus, miletek zêde ferdperestiyê hez nake.
Zêdetir hez ji jiyana komîn dike. Ango ji aliyê xisletên xwe yên dîrokî ve jî wisa ye. Nizane bi kapîtalîzmê re bimeşe. Kapîtalîzm ne karê wane.

**Makarinco Vadim:** Gelek milet hene, di wateya rasteqîn de, naxwazin pergala kapîtalîst bijîn. Di nava lêgerîna bîrdoziya sosyalîst de ne. Di wexta Marks bîrdoziya zanistî derxistî holê de, kapîtalîzm nû pêş diket. Lê belê ramanên Marks pir û pir pênaseya pêşerojê dikir. Marks di pêvajoya derketina kapîtalîzmê ya destpêkê de, diyar kir

zêde siûda jiyana kapîtalîzmê nîne. Lê belê di pêvajoyên peyre em dinêrin ku, kapîtalîzm ji aliyê aborî ve pêş dikeve. Her wiha sosyalîzma pêkhatî jî di hişê xwe de kapîtalîzmê dipejirîne. Heta dihizirin ku wî jî derbas bikin. Ango tam nefêmkirina sosyalîzmê mijara gotinê ye.

**Abdulah Ocalan:** Bêku kapîtalîzmê fêm bikin, hewl dan derbasî sosyalîzmê bibin.

**Makarinco Vadim:** Bi rastî jî nedizaniyan sosyalîzm çiye.

**Abdulah Ocalan:** Girînge ku çima ji kapîtalîzmê hez kirin. Ji ber ku bi xwe kesayetek sosyalîst ava nekirin. Sosyalîzm ne tenê aborî ye, divê mirov bal bide vê. Mînak, hêmana dilxweşî pir girînge. Lê belê li Sovyetan zêdetir girîngî ji aborî û çekbûnê re hat dayîn. Xemsar nêzî dilxweşî bûn. Dema em niha li aboriya sûka Rusya dinêrin, bi temamî heyberê ve hatiye dagirtin. Ruhê mirovparêz ji holê hatiye rakirin. Weke tiştek nedîtine, her tiştî dixin berîka xwe. Ya rastî derfetên jiyana heyberî ewqasî ne xirabin, lê dîsa jî tiştên heyberî girîng dibînin. Ne gengaze ku mirov wisa têr bibe. Ev jî girêdayî dilxweşiyê ye.

Mînak, Îran çawa îdare dike? Temamî bi dilxweşî dimeşe. Heta kapîtalîzmê jî dilxweşî îdare dike. Dibe ku dixapîne û derewan dike, di encamê de îdare dike.

Pêwîste sosyalîzm diyardeyek ji xwezaya mirov ne dûr be. Li ser xwezaya mirov hatiye damezirandin. Rastî jî eve. Sosyalîzmek ji xwezaya mirov dûr dê hilweşe. Di dîrokê de sedema rûxîna gelek dewletan, dûrbûna ji xwezaya mirove. Sosyalîzma ku hilweşiya jî, ji ber ku ji xwezaya mirov dûr ket rûxiya. Di vir de pirsgirêka bîrdozî û dilxweşî derdikeve holê.

**Makarinco Vadim:** Birêz Serok, di jiyana we de pir dewlemendiyan dibînim. Hûn vê deyndarê çine?

**Abdulah Ocalan:** Jiyana me pir dewlemende. Pêwîste teoriyên tên pêşxistin xizmetê ji jiyanê re bikin, ne ji mehkumiyeta wê re. Di hinek mijaran de teorî, dişibe yek rengî li jiyanê nêrînê. Divê bi qasî di jiyanê de gavên pêşveçûyî bên avêtin, teorî hebin. Weke din teorî nederbasdarin. Dibe ku terîfên hêsan dikim, lê ev şêwaza mine. Lê belê pir baş li ser pêşketina mirov radiwestim. Hewl didim pirsgirêkên

wan fêm bikim û çareser bikim. Ev bi pirtûkan nayê çareserkirin. Pirtûka herî mezin jiyan bi xwe ye.

**Makarinco Vadim:** Dixwazim pirsek cuda bikim. Bi qasî min bihîstî, hûn şêwaza Sokrates pêk tînin?

**Abdulah Ocalan:** Sokrates bi xwe jî akademiya leşkerî xwendiye. Em jî weke Eflatun şêwaz û rêbaza hevpeyvîn pêk tînin.

**Makarinco Vadim:** Pir dilxweş bûm ku, we di van mijaran tevan de em ronî kirin.

**Abdulah Ocalan:** Ez her tim amade me. Bi me re jiyana cuda, taybet û fermi tine ye. Hemû di nava hev de ye. Miletê Rus dikare hinek pirsan ji me bike. Lewma me hinek xal vekirin. Rewşên ku li Sovyetê tên jiyîn seyr nabînim. Xwezayî dibînim. Bi gumanim ku dê îdeologên nû derbikevin an na.

**Makarinco Vadim:** Ev xal, rewşek ku em hemû li ser dihizirine. Ango pirsgirêka dê rêberên nû derbikevin an na. Li Rusya pir partî û pir kes hene. Hemû jî xwe rewşenbîr dibînin. Lê belê hemû jî fikarên takekesî dijîn û li pey kariyerîzmê ne. Ev jî ji bo Rusya ne rewşek base.

**Abdulah Ocalan:** Ya rastî gelê Rus, ne miletek hêjayî evqas xirabiyane. Ev ketinek mezine.

**Makarinco Vadim:** Ferdperestî û xweperestiyek mezin bidest xistine. Her tiştê xwe bi hukumetê ve girê dane.

**Abdulah Ocalan:** Berê her tiştên xwe bi hukumetê ve girê didan. Îro jî bi hinek tiştên din ve girê didin. Lê kesayetên wan dîsa heman kesayete.

**Makarinco Vadim:** Ev rewş, pirsgirêkên cidî, ava dike. Weke malê firotinê xwe berdan sûkê. Lê xeteriyên vê jî nedîtin. We beriya niha behsa Çernişevskî kiribû. Ya rastî xalên ku li wir hatine bilêvkirin, ne tenê gelê Rus eleqedar dikin. Di demên dawî de di civaka me de kariyerîzm pir pêş ketiye. Lê belê gelê Rus, di heman demê de miletek xurte. Pêdiviya xwe bi rêbertiyek rast heye. Divê bîrdoziyek rast bê meşandin.

**Abdulah Ocalan:** Miletek evqas xwedî ezmûn û fedekar, divê bikare rêberê xwe zû derbixe. Heta dibe ku rêberek xurt ê kapîtalîst jî derbikeve. Şaşiyên wisa dikin, zarok jî nakin. Ez zêde Rusya nas nakim, lê şeş mehan di nava wan de bimînim, dikarim ji wan kesên xwe rêber dibînin, baştir rêbertiyê bikim. Bi xwe bawerim. Di vê xalê de şaşwazim û tişta ku divê bikin, pêwîste tam bikin. Ger dê sosyalîzmê bidomînin, divê tam bidomînin. Demogojiyê dikin. Pir ji xwe hez dikin. Di vê xalê de kêmasiyên wan ên cidî hene. Dîsa jî miletê Rus, miletek xurte. Dê xwe bigihîne rêberek bihêz. Tişta ez fêm nakim, çima zû dernakevin. Mînak, di şerên cîhanê de rolek girîng lîstin. Atom çêkirin, derketin fezayê. Gelek karên din ên girîng kirin. Miletek ku di werzîş, huner û çandê de pêşketinên girîng çêkirine. Lê mixabin berovajî pêş dikeve.

**Makarinco Vadim:** Beriya ku li Rusya fikrên nû derbikevin, qonaxên mezin û bûhranê dijîn. Milet pir dihizire.

**Abdulah Ocalan:** Derketina fikrek nû, ji bo pêkhatina pêngavek mezin, pêvajoyek wisa hewce bû. Yeqîn dikim, dê ev pêvajo zêde dirêj neke.

## PKK Di Sosyalîzmê De Qonaxa Herî Mezine

PKK ji her demê zêdetir israra di sosyalîzmê de û partiya serkeftinê ye.

Dema em îro cardin cejna kedkaran bibîr tînin, xala herî bingehîn pêwîste li ser bê sekinandin, rewşa sosyalîzma ku nêrîna cîhanî ya çîna karkere û li ser vî bingehî pêşketina di derbarê mirovahiyê de carek din nirxandine. Ya hîn girîngtir jî, di nava vê rastiyê de cihê partiya me rast destnîşankirine.

Pêşketina di serdestî û mêtîngeriya yek alî ya emperyalîzmê ku li ser mirovahî daye meşandin, ber bi salên du hezarî ve, hîn xetertir dibe. Nexasim ji ber hêjî rast û bingehîn bersiva pirsgirêkên ku hilweşîna sosyalîzma pêkhatî derxistîn holê, nehatine dayîn, di refên kedkaran de jî gengeşe, bêbawerî û înkarkirinek mezin serwere.

Miletên cîhanê hema bêje neçar dihêlin ku kapîtalîzma herî xirab û riziyayî weke rêya jiyanê bipejirînin. Ne tenê qirêjkirina civakê, dikare bê gotin rûyê xwezayê yê ser erdê jî bi qirêjiyek herî xeternak re rûbirû ye. Di vir de jî berpirsê herî mezin pergala kapîtalîst-emperyalîste, hewl dide pêvajoyek serdestiya xwe ya hovane û çavsorî ku pêşî lê neyê girtin, sînornenas li ser hemû mirovatiyê ferz bike.

**Yan Sosyalîzm An Jî Qet!**

Weke di gelek pêvajoyên dîroka mirovatiyê de çêbûne, nexasim di pêvajoya derbaskirina pergala koledarî û feodalî ya qonaxa herî har û riziyayî dijiya de, ji paşverûtiya ku raber kirine hîn berfirehtir serdestî û mêtîngeriya ku wêrankariya xwezayê jî girtî nava xwe ku pêşve diçe, di asta herî pêş de zerarê dide mirovahiyê. Lewra bi şêweyek ku bi demê re neyê muqayesekirin ger sosyalîzm li dijî pergala kapîtalîstemperyalîst çîtekê saz neke, ne tenê karker û kedkar, dê ji bo mirovahiyê jî dawiya cîhanê be. Em dikarin ji her demê zêdetir bêjin ku ev, li dijî wêrankariya kapîtalîst-emperyalîst an sosyalîzm an jî ne tişteke.

Gelek bîrdoziyên ku bi rizgariya mirovahiyê re mijûl dibin, her tim derdikevin holê. Nexasim li gorî xweseriya gelek pergalan têkoşînên xwe yên civakî hene. Dîrok govanên hezarî ji vane.

Ya ku îro me eleqedar dike weke ramanê cîhanê ya kedkaran teşe digire rewşa ku sosyalîzm di navê de dijî ye. Bîrdoziya sosyalîst di nava sedsalên derbasbûyî de pêşketinek pir mezin nîşan da û hema bêje ji sê yekê cîhanê derfeta xwe sepandinê dît. Lê belê ji ber jiyana kevin ku di nava xwe de dijî, bandora giraniya xisletên civakî yên kedxwar û çewsîner, her wiha ji ber nêzîkbûnên dogmatîk ên zêde, em dibînin ku ev ezmûn dem bi dem ber bi rûxandinê ve diçe û pêşketinek zêde çep-rast dijî.

Gelek ezmûnên sedsala berê, heta ger em li ser bingeha dijberiyê bêjin ezmûnên şerê kadkaran a dused salî dide diyarkirin ku dev ji sosyalîzmê nayê berdan, lê ji bo pêşxistina wê jî her ku diçe ji bo bibe raveyek zanistî ya civakê jî, pêwîstî bi nêzîkbûnên afirîner heye. Ev jî di pratîkên ezmûnan de, nexasim encamên vê yên binkeftî van pir baş datînin holê.

Sosyalîzmê pêvajoyên pir girîng jiya. Di hemû demên dîrokê de kêm-zêde sosyalîzm heye. Serdema komînal a destpêkê, di heman demê de sosyalîzma destpêkê rave dike. Em ji tevgerên Spartakûs ên serdema koledarî bigirin, heta tevgera Haracî ya şoreşa Îslamî û tevgera Elewî, xwedî xisletên sosyalîstî ne. Di Şoreşa Burjuva ya Fransa de jî Babeuf weke tevgerek komînîst derdikeve hole. Jixwe bi vê şoreşê re, pêşketinên nêzî sosyalîzma zanistî li pey hev çêdibin. Manîfestoya komînîst di pêvajoya şoreşên burjuva de hat îlankirin. Manîfestoya serxwebûna çîna kedkar, weke xewnek metirsîdar li ser hemû burjuvazî xwe da hesandin. Heta ezmînên komînên xwe yên paşketî jî, di serî de Komîna Parîsê, li gelek welatan bi şêweya tevgerên koperatîf xwe dan diyarkirin. Ya herî girîng jî her ku çû rastiya ku kedkar pêwîste polîtîkayek çawa bikin bi enternasyonalîsta komînîst û li ser bingeha sînorên millî zayîna partiyên çînên karkeran ve xwe da der.

Beriya niha tam sedsalekî dikare bê gotin, di nava hemû netewên kapîtalîst ên pêşketî de, çîna karker partiyên xwe ava kirine. Em dizanin ku Enternasyonalîsta Yekemîn komaleyek kedkaran a sînornenas bû. Bîrdoziya çîna karker veguherand rêxistinek şêweya komaleyî û bi Komîna Parîsê re jî hewl da vê jîndar bike.

Enternasyonalîsta Duyem jî, zêdetir têkoşîna polîtîk pêş xist, ji komaleyan ber bi partîbûnan ve gav avêt, bi têkoşîna mafên sendîka û demokratîk ên kedkaran ve, pêşketinên girîng pêk anîn. Dema pirsgirêka desthilatiya çîna karker û kedkaran di vê qonaxa kapîtalîstemperyalîzmê de cara yekê ket rojevê, nexasim Şoreşa Cotmehê, di pêşengiya çîna karker de weke şoreşekê, di nava dîroka têkoşînên civakî de cîh girt. Em pir baş dizanin ku wê demê ku ev pêngavek pir mezin bû, di dîrokê de jî diyar bû bi navê kedkaran dewleta kevnar parçe kir û dewleta nû derxist holê. Hemû çînên vê yên mêtînger û çewsîner, serdestên wê di nava metirsiyek mezin de jiyan û di gelemperiya cîhanê de jî bi pişgiriyek paşverû ve bi ser vê şoreşê de çûn.

Şoreşa Cotmehê ku bi rêbertiya Bolşevîkan destpêkirî, pêngavek pir girîng a dîrokî rave dike. Di dîroka têkoşînê civakî de gavek mezine. Lê belê weke di her şoreşê de çêbûyî, di vê şoreşê de jî nexweşiyên zaroktî derketin holê. Di wateyekê de jî di vê şoreşa mezin de ya hatî jiyîn pêşketinek wisa bû.

Şoreşa Cotmehê bi navê hemû çînên karker û gelên kedkar zayînek saxlem rave dike. Di nava xwe de şopên civaka kevin dijî, ji ber ku weke mînaka destpêkê bê ezmûnî hebûn, a herî girîng jî di nava dorpêşiya paşverûtiya cîhanê û Rusya de, mîrateyên civaka kevin ên herî bihêz bi tengezariyek mezin re rûbirû anî.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkan pir zû bi paşverûtiya nav-netewî re rûbirû ma û bi dayîna gelek berdêlan ve xwest gav bavêje. Nekarî di hundur de afirîner be. Nexasim li hember demokrasiya di nava pergala kapîtalîst de demokrasiyek sosyalîst weke alternatîf pêş bixe.

Partiya ku şoreş pêk anî, di pêvajoya dewletbûnê de xwe di nava dewletê de heland û her ku çû partiya sosyalîst bû amûrek erzan ên polîtîkaya hundur û derve ya dewletê. Ev dewlet jî her ku çû bi fikarên netewî tevgeriya. Di bin bandorên xurt ên şovenîzma Rusya de, di nava xwe de bi qasî bi pirsgirêkek netewî, ewqas jî di qada nav-netewî de ji pirsgirêkên gelan ên şoreş û rizgariya netewî re, heta ji şoreşa sosyalîst a çîna karker re nêzîkbûna rast a hewce dikir raber nekir.

Dîsa her roja ku derbas dibû jirêderketinek rastgir jiya û ev ezmûn heta roja me bi hilweşînek giran ve rûbirû hat. Di sala 1990'î de hemû encamên wê derketin holê. Wisa çêbû, weke ku ev qonax tinebûna sosyalîzmê ye ji aliyê hemû îdeolog û nûnerên siyaseta kapîtalîzmê ve hat nirxandin û ew hatin pîrozkirin. Weke ku ji bo wan rojek nû vebûye, ketin nava rehetiyekê. Wer hizirîn ku ji bo wan cardin serdema jiyanek bê çîn û rehet destpê kiriye.

Behsa sazûmaniya cîhanê ya nû kirin. Her çendî aliyên wê yên kêm hebin jî li dijî kelhên sosyalîzmê yên dijî, ambargo giran kirin. Bi êrîşek bîrdozî û derûnî ya dijwar ve, dorpêçên aborî zêde kirin. Di nava deh salên ku bi van serûbinbûnan ve dagirtî de, pir dijwar hat dîtin ku, bi qasî ev xiroş û xwe ji bawerbûna kapîtalîzm û

emperyalîzmê xirab bû, ewqas jî pirsgirêkên giran ku nekarin ji bin derkevin bi xwe re anî.

Êdî di roja me de her kes baştir dibîne ku mirovatiyek, cîhanek bê sosyalîzm ne hêvî ye, ji ti pirsgirêkê re çareseriyê ava nake û di nava lêgerîna vê ya kûr de hewl dide rêyên çareseriyê bibîne.

Di çarîka sedsalê ya dawî de ku sosyalîzm xirab tê destnîşankirin de, êdî ji bo lêgerîn û çareseriyên nû berpirsyariyekê ferz dike.

Kapîtalîzmek her ku diçe dirize, bi temamî girêdayî rant û lîstokên borsayê ve girêdayî ye, ti xisletên wê yên afirîner nemaye, tenê hemû dînamîkên hundurîn ên civakê û nasnameya mirovî wêrankirinê ve xwe têr dike. Ji hemû demên dawî yên rejîmên riziyayî deh qatî paşketîtir, xetertir û riziyayî bandora xwe datîne holê. Tenê bi vê ve jî sînordar namîne, xwezayê, pêwendiya mirovahî ya bi hawirdor re ku nebê nabe zêde wêran dike. Vê gerstêrka bêhempa dike qadek lê nayê jiyîn. Xeteriya herî mezin a pergala kapîtalîzm-emperyalîzmê û tawana wî ya herî mezin jî eve. Ger tevdîr neyên girtin, pêvajoyek pir kin a di bin vê kapîtalîzmê de derbas bibe, dê ev gerstêrk bikeve halek ku neyê jiyîn. Kêmek maye ev gerstêrka bêhempa veguhere sergoyekê. Her çendî hinek dengên hêdî derbikevin, dîsa jî raperîna herî mezin sosyalîzme. Hem jî bi şêweya şoreşek radîkal li hember vê xeternakiyê, dê rûyên ku di nava civakê de di radeyek bilind de qirêj bûne carek din ronî bike û rêyên rizgariyê diyar bike.

Pirsgirêka herî bingehîn mirovahiyê eleqedar dike, pêşîgirtina wêrankariya xwezayê û rawestandina qirêjiya nava civakê ye. Hîn ji niha ve her çendî nîqaşên ku destpê kirine û lêgerîn di astek reformîst de bin, xalên serkêşiyê dikin ên heman pirsgirêkê datînin holê.

Nirxandinên hîn kûrtir û rêyên çareseriyê di pêvajoya pêş me de dê weke hedefên şoreşî derbikevin pêşberî me. Şêweyên civakî û siyasî yên van hedefên şoreşî, taktîkên wê yên cur be cur, teqez wê derbikevin holê. Êdî wê bê nasîn bi çarçoveyên giştî ve ev xeteriyên mezin nayên rawestandin, ji bo çareseriyên mayînde pêwîste teorî, plansazî, bername û taktîkên pir girîng li pey hev pêş bikevin. Hîn ji niha ve pêwîste lêgerîn weke hewceyek girîng bên destgirtin. Ger

nirxên mirovî tên esasgirtin, neçare ku bîrdoziya sosyalîst perspektîfa xwe hîn zêdetir pêş bixe û kûr bike, hêmanên pêkana wê bidest bixe.

## Sosyalîzm Hem Xeyal Hem Jî Zaniste

Çawa, nabe mirov hêviya xwe ya mirovahiyê qut bike, hêviya pêşketina sosyalîzmê jî qut nabe. Çawa têkoşînên civakî bi mirovatiyê re destpê kirin, heta ku mirovahî hebin dê bidome. Çawa negengaze mirovatî bê têkoşîna civakî û bê civakbûnê pêş bikeve, negengaze ku mirovahî bê têkoşîna sosyalîstî jî bijî.

Di vê manê de têkoşîna sosyalîstî dê cardi dubare weke vebijêrka sereke ya rizgariya mirovahiyê derbikeve holê. Seriyek vê jî, dê di çarçoveya şoreşek ku di serdemek dîrokê de pêk hatî, pêwîste bi şêweyek dogmatîk neyê destgirtin. Ya herî rast ew weke fikir, xeyal û zanista rizgariya giştî ya mirovahiyê nirxandine.

Hem xeyal, hem jî zaniste.

Bêguman ji ber ku zaniste, dê rastiya şênberî jî bidest bixe. Lê divê neyê jibîrkirin jî xeyalek ku sedsalan jî dirêj bike.

Nêzîkbûna zanistî ya teng, pêkana materyalîzma çorse, me di sosyalîzmê de jî ev baş dît ku, ev çawa ber bêçaretiyê ve çûye. Sosyalîzmek ku xeyal, dilxweşî, vîn û felsefeyê paşguh dike, weke

materyalîzmek çors rewşek xeternak dijî. Ev xeterî di sosyalîzmê de derketiye holê û niha jî bi derbasbûnê re rûbirû ye. Dê mîna vê gelek pêşketinên nû yên weke polîtîk, aborî û demokratîk derbikevin holê.

Li pêş bîrdoziya sosyalîst pirsgirêka herî mezin, rizgariya siyasî û aborî ye.

Dîsa demokrasî weke pirsgirêka herî girîng li benda çareseriyê ye. Ya herî girîng jî misoger pêwîste nêzîkbûnek bernameyî ji pirsgirêka çarçoveyê re bê kirin, bernameyek hem pir berfireh hem jî teqez bê pêkan heye.

Ev li ser sosyalîzma dema nû di maneya bernameyê de pirsgirêkên bingehîn ên li ser xebat bên kirine. Bêguman wê di derbarê aliyên felsefî, xeyalî, dilşadî û exlaqê de jî pêwîste hinek pêşketinên rêgezî ku esas digirin bên avakirin. Sosyalîzmek bê felsefe, bê dilxweşî divê misoger nayê hizirîn. Materyalîzma çors herî kêm bi qasî kapîtalîzmê xetere. Li gel vê mijara partîbûn, rêxistinbûn û taktîkên têkoşînê yên nû jî girîngiya xwe derdixin holê.

Êdî teoriyên şoreşa sosyalîst ên kevnar têrê nake.

Çi îsyan dibin, çi jî şerên rizgariya gel ên demdirêj dibin, ger neyên paşçavxistin, ev bi tena xwe têrê nake. Rewşa dewletên netewî yên pêş dikevin, dîsa bi îtîfaqên heyî re rewşa pêşveçûna asta civakî, şêweyên têkoşînê yên cur be cur neçar dike.

Nexasim teknîk pir pêş ketiye. Di navbera teknîk û têkoşînan de girêdanek girîng û tund heye. Lewra partîbûn û taktîkên têkoşînê yên nû dê vê pêşketina şênber jî berçav bigire û neçare hîn zêdetir rêbazên têkoşînê yên cur be cur pêş bixe. Em ji tevgerên sosyalîst bigirin heta tevgerên tundiyê, dê rêbazên taktîkî yên têkoşîna nû xwe neçar ferz bikin.

Bêguman dê li ser vî bingehî di enternasyonalîzmê de jî pêşketin derbikevin holê. Êdî di nava sînorên netewan ên teng de neyê girtin, li gorî gotina emperyalîzmê di demek globalbûn evqasî zêde dibe de, pêwîste sosyalîzm jî global bibe.

Dê nêzîkbûnek enternasyonalîstiyek nû hîn zêdetir xwe bide hîskirin. Bi qasî sînorên netewî yên hîn rastir û şênber, dê di sînorên

gerdûnî de jî xwe bidin der. Enternasyonalîstiyek sosyalîst a pêwendiyên di navbera civak û xwezayê de baştir sazûman dike, pêdiviyek girînge û sedsala pêşiya me di bin ala enternasyonalîzmek wisa de pêşwazîkirin, dibe ku ya herî rast û hewce be.

Ji nêvengek ku sosyalîzmê bandor kiriye jêderek peydakirin, tevgera PKK'ê ya aliyên xwe yên xweser heyî, di roja me de bi eleqeyek mezin tê nirxandin. Bi qasî bersiva pirsa sosyalîzmek çawa, ewqas jî girêdana wê bi paşerojê ve û ya nû jî çawa bê sazkirin tê nîqaşkirin.

Hemû karê em dikin, PKK bi vî rengî xweser weke partiyek qonaxa sosyalîzmê di rojevê de girtine.

Ev jî zêde hatiye serxistin. Herî zêde aliyê PKK'ê ya bûna hêza pêşeng a Rizgarvanê netewa Kurd tê dîtin. Lê belê aliyê herî girîng jî, di nava têkoşîna sosyalîst a nav-netewî de, wateya rave dike. Aliyê wê yê ku pêwîste zêdetir derbikeve pêş jî eve. Di nava çarîka dawî ya vê sedsalê de, derbasbûna sosyalîzma pêkhatî, serkêşê emperyalîzmê DYE, PKK'ê vala weke "Rêxistina terorist ê herî xeter a Cîhanê" nanirxîne. Xala ku pêwîste ji vê bê fêmkirin, li hember pergala sosyalîst DYE jî, hêj ji niha ve PKK'ya ku di sosyalîzmê de xwedî seknek girînge weke xeteriyek mezin dibîne û dinirxîne. Ya rast jî eve. Paşverûtiya nav-netewî jî demekê Marks, Engels û peyre jî Bolşevîk xeter û sosret nirxandin. Niha jî paşverûtiya nav-netewî li ser PKK'ê îtîfaqan saz dike, heta weke di asta jorîn de xeteriyan saz dike dinirxîne û di derheqê wê de li qada nav-netewî şîroveyên cuda tê kirin. Faşîzmek Komara Tirk a wehşî, pişgiriya hemû aliyên paşverûtiya nav-netewî digire. Dîsa weke ku ev şerê qirkirina ku ev faşîzm dimeşîne têrê nake, li qada nav-netewî jî her roj şîroveyên nû û dadgehên nû tên vekirin, ev jî ji vê hêlê ve rastiya PKK'ê baş datîne holê.

Emperyalîzma nav-netewî DYE û alîgirên wî yên nêz weke dewletên Almanya û Îngîltere, di vê mijarê de xwedî ezmûnên kevnin. Ya wan eleqedar dike ne Rizgarvaniyek netewa Kurd a tenge û jixwe pişgiriya vê dikin. Ji bo serkeftina wê jî her cure hewldanê raber dikin. Ya ku ev dijberin, weke pirsgirêkek girîng di pirsgirêka Kurd de

pêşengiya PKK'ê û nêzîkbûna wê ya bîrdozî û civakî di nava pergala xwe de heta dawî xeternak dibînin. Dibe ku, naveroka sosyalîzma PKK'ê jî xwedî bolşevîkbûnek nûbe. Li Rojhilata Navîn di nava xeleka kapîtalîst û emperyalîzmê ya herî lewaz de her ku diçe pêşengiya PKK'ê derdikeve pêş, ev jî ji bo wî xeteriyek mezine. Di encama hinek pêşketinên çapraz ji salên 1990'î ve di encama tevgavkirina Rojhilata Navîn de, blokbûna ku saz bûyî, hişt ku PKK jî hebûna xwe bidomîne, ev ji bo pergalê jî hîn dijwartire û bi baldarî hewceyî nirxandinê ye.

Di nava hevsengiya Rojhilata Navîn de her kêlî nêzîkbûna DYE ya dibêje; "Emê PKK'ê ti carî nekin xwedî maf û nehêlin bibandor be" ne vale ye. Dixwaze vê pêşketina ku di nava hevsengiyan de nedihat payîn derketî ji holê rake. Ger gengaz be, dixwaze kedî bike, ger negengaze jî weke polîtîkaya herî bingehîn a salên dawî dixwaze ji holê rake. Lewra vê polîtîkayê pir dijwar derdixe pêşberî me.

Bêguman di têkoşîna me de, zêdetir di derbarê taktîkên bêbandorkirin û xeniqandinê yên emperyalîzmê de, me jî giranî da polîtîkayên xwe. Me jî vale girîngî neda herî zêde rêbertiya PKK'ê di van xalên taktîkî de lêhûr bibe. Ji ber ku PKK'ya ku hinekê jî xwestin bi şêweyek veşartî bixeniqînin, ji aliyê pêşketina taktîkî û stratejîk ve ger pêşketinek raber nekiribûya, dê îro jî cewhera wê ya sosyalîstî xwe negihandiba zemînek xurt.

PKK'yîbûn û sosyalîstbûn li ser bingeha van pêşketinên stratejîk û taktîkî zêdetir watedar bûye. Heta bi qasî her ku çû bandor li ser gelên Rojhilata Navîn kir, ewqas jî di qada nav-netewî de weke pêşengê sosyalîzma herî bi îdîa bandorek saz kiriye, heta tê fêmkirin ku dê pêşengiyê jî bike.

Di vê manê de şoreşa Kurdistanê, ger hîn zêdetir bikare naveroka dewlemend bike, nexasim partîbûnê, di nava xwe de ji bo çareseriya mirov, avakirina kesayeta mirovê nû di salên dawî de di radeyek mezin de pêş xistî mayînde bike û ji hêla taktîk-stratejîk ve jî rêbazên şerê şoreşgerî bidest bixe û vê jî bi serkeftinek girîng encam bike, negengaze ku pêvajoyek sosyalîzma pir bi îdîa nede pêşxistin.

Divê neyê jibîrkirin, parçebûna Kurdistanê bi ezmûnek federasyona sosyalîzma ku pêş bikevê ve, li ser esasê çar netewên bingehîn û gelek kêmnetewên heyî bigire nava xwe û modelek wisa jî lez sazûman bike.

Ev jî çar netewên mezin, kêmnetewên cur be cur û çandan bi bandora PKK'ê re ber bi sosyalîzm û demokrasiyê ve peresînekê raber bike, dê ji bandora Şoreşa Cotmehê jî bilindtir, rê ji bandorekê re veke. Her wiha jêder û dîroka Rojhilata Navîn ji nû ve bi navê gelan bidest xistin girîngiya xwe zêdetir dike. Ev pêşketina bi naverok, Rojhilata Navîn kiriye xeleka herî nazik a şoreşa nav-netewî. PKK jî rastiya vê ya herî girîng a roj bi roj pêkhatina stratejî û taktîka wê ye. Sedema ku paşverûyên nav-netewî evqasî li ser girîngiya PKK'ê radiweste jî, ji ber vê xisleta wê ye. Valederxistina gelek stratejî û taktîkan, ew di nava metirsiyê de hiştine.

Mînak, li Misrê komcivîna bilind a li Şarm El Şeyhê hatî lidarxistin, negengaze ku mirov vê fikarê nebîne. Her çendî ev komcivîna bilind weke "Komcivîna bilind a terorê" û zêdetirîn jî di derbarê Filîstînê de li hember hinek bûyerên terorê weke bersivdanê hatibe lidarxistin jî, di rastiyê de hedefa wê pêşketina PKK'ê ya li Rojhilata Navîn rawestandin bû.

Ji ber dibînin PKK ji qelîştekên pergala nû ya emperyalîzma ku hêj baş nerûniştî sûd wergirtiye, heta pêwendiyên bi dewletên ku pirsgirêkên wan bi emperyalîzmê re heyî pêş dixe ber bi blokbûnekê ve dibe, dixwazin bi vê civîna bilind ve bêjin vê; "raweste." Lê mixabin encamek berovajî da. Weke ku civîna bilind ev blokbûn hîn zêdetir lez kir, wate û girîngiya PKK'ê jî hîn balkêştir mayînde kir. Bi rêya hevkarên xwe çareseriyên ku li ser tevgerên Kurd ferz dikin, bi erdê re bûn yek. Bi qasî bandorên vê civîna bilind lewaz bûn, PKK'ê hêzek mezin bidest xist û wisa derket, bi qasî stratejîke, ewqas jî rê ji pêşketinên weke bikare pêşketinên taktîkî yên li herêmê bandor bike û pêşengtiya van bimeşîne re vekir. Bêguman ev pêşketinên stratejîk, taktîkî, leşkerî û siyasî ne. Ger hewcedariyên wê bi baldarî bên nirxandin û bi naverokek sosyalîst pêkve bê pêşxistin, dê encamên girîng derbikevin holê.

Dîsa di serî de pêşengiya partiyê, ger her ku biçe nav gel jî li ser vî bingehî bê veguhertin û dîsa pêwendiyên stratejîk û taktîkî bi şoreşa Kurdistanê ve girêdayî bê pêşxistin, federasyona Kurdistanê jî ji bo vê tam weke qeraseyekê bikar bîne, weke ku dê ev ber bi federasyona gelên Rojhilata Navîn ve bibe, dê naveroka wê jî bi şêweya demokrasiya sosyalîzm û gelan pêşketinên mezin raber bike.

Di roja têkoşîna çîna karker û kedkarên nav-netewî de PKK partiyek herî zêde nêzî vê rastiyê ye, herî zêde jî hêjayî wê pêwîstiyên wê pêk tîne, ango di sosyalîzmê de israr dike û bi vê re jî nûnertiya serkeftinê dike, di rewşa partiyek sosyalîst de ye. Ji ber xwe ji hemû nexweşiyên sosyalîzma pêkhatî ber bi hişweşînê ve birî rizgar kiriye, ji bo lêgerîna sosyalîzmek nû ya bi îdîa jî di nava xwe de zemînek pêş xistiye û weke partiyek sosyalîst teşe digire.

Bêguman di vê mijarê de zêde pirsgirêk hene. PKK bi hemû hêza xwe ve, bi rizgarvaniya netewa Kurd û pêşxistina şoreşa Kurdistanê ve mijûl dibe. Karê vê şoreşê li welatên cîran di berfirehkirinê de sînordar jî be pêk nayîne. Dîsa bandorên xwe yên nav-netewî li gorî dixwaze nikare di platformên ramanî de ragihîne. Dîsa jî em baş dizanin ku, dê ev bi pêşketina şoreşa Kurdistanê û serkeftinê re pêş bikeve.

PKK'yek ku bi şêweya rizgarvaniya netewî ve serkeftinê bidest dixe, weke ku dê şoreşa Kurdistanê bibe qonaxek mezin a sosyalîzmê, ji ber sedema parçebûna Kurdistanê jî, dê vê li ser bingeha çareseriyên netewî û herêmî bilez bi herêmî bike. Li gorî ku dê afirîneriya vê ya taktîkî ji rojevê kêm neke, dê pêşketina vê jî neçarî be.

Ev jî tê vê wateyê: Dê naveroka PKK'ê ya sosyalîst jî, valehiya gelan a bi qasî nan û avê jî hewce ye, bi bîrdoziyê dagire û wan bixe ser rêyek pêşketinek tenduristî û rizgariyek hevbeş. Di roja me de PKK heta dawî hêza vê ya pêkanê di nava xwe de dihewîne.

Hewldanên PKK'ê yên bi çalek bûne jî, her roj vê ji dost û dijminan re dide diyarkirin. Ji ber van tevan, weke ku dijminê wê pir dijwar li ser disekine, dostên wê jî pir girîng li ser radiwestin û zêde dibin.

**Êrîşa Rojavayî**
**Bi Îtîfaqa Asya Ve Tê Bersivdan**

Di vê dema blokbûna nû de PKK bi qasî zanebûnek mezin, ewqas jî pêşketinên nayên payîn jî baş şîrove dike û dê cihê xwe saxlem bike.

Li hember êrîşên Rojavayî, hêjî Rusya li ber xwe dide û bi Çînê re jî îtîfaqên nû tên pêşxistin.

Ev jî îtîfaqa Asya ye.

Dîsa li Rojhilata Navîn êrîşkariya Rojava îtîfaqek herêmî pêş dixe. Îtîfaqa ku Îran û Surî pêş xistî, vediguhere îtîfaqek herî bi îdîa ya dijber. Bersiva îtîfaqa herêmî ya serkêşiya wê Tirkiye û Îsraîl dike, ji bo hemû gelên Ereb û Îranê bûye zemînek îtîfaqa xwezayî. Elbet, ev jî ji bo şoreşa Kurdistanê dê di nava kîjan îtîfaqê de cîh bigire û ya herî girîng jî pêşketina blokbûnek wisa tê çi wateyê, dîtin, nirxandin û di navê de cîh girtine.

Îtîfaqa Asya bi gelê Rojhilata Navîn û Şoreşa Kurdistanê re veguhere îtîfaqên dewletî, dê li dijî êrîşên kapîtalîst-emperyalîst ên balkêş jî, xeta berxwedaniya herî girîng jî derbixe holê. Mirov dikare bêje dê ev îtîfaq lez pêş bikeve.

Ger Rusya zêde xwe radest neke -jixwe pêşketin jî berovajî vê dibêjin- dide diyarkirin ku asta komînîstên kevin di parlamentoyê de bidest xistî, dê wezîrtiya dewletê jî raber bikin. Kêmasiyên wan çi dibe bila be, di sosyalîzmê de israr dikin.

Welatên weke Afganîstan, Hindîstan û Vîetnamê xwezayî, welatên ku di nava îtîfaqa Asya de cîh bigirine.

Rojhilata Navîn jî, ketiye rewşek bûye baskê şerê pêşeng a Asya.

Xwezayî dê Efrîka jî weke pêveka vê blokê cîh bigire, dîsa Emerîka Latîn jî di rêze welatên hejar de cîh bigire yan jî dibe ku asta bê alî jî pêş bikeve.

Rewşa ku weke nakokiya Bakur û Başûr tê pênasekirin jî bi vê ve girêdayî ye. Lê ya esasî baskê şer Rojhilata Navîne. Her wiha dê Kurd li vir carek din bên ceribandin. Tevî hemû kêmasiyên xwe yan jî weke xirabî tê binavkirin şoreşa Îslama Îranê jî teqez dê ji aliyê emperyalîzmê ve weke şoreşek ku pêwîste bînin rê ye, lê belê dê ev jî ne hêsan be. Dîsa her çendî berxwedaniya Ereban di nava pêvajoyek lihevkirinê de be, dê ev pêvajoya lihevkirinê bi serê xwe bibe pêvajoya têkoşînek mezin. Nexasim îtîfaqa stratejîk a Tirkiye û Îsraîl her ku diçe ber bi Rojhilata Navîn û Asya Navîn ve diherike, bûye

sedem ku gelên herêmê hîn zêdetir hişyar tevbigerin. Bi vî rengî du stratejiyên beramberî hev rojane di eniyên şerên germ de weke ku şer dikin, di qadên dîplomatîk, siyasî û aborî de jî gelek pevçûnan dijîn.

Di çarçoveya blokbûn û bûna du serî ya cîhanê de, PKK berê çawa bû, ne tenê xwedî bandorek bîrdozî û polîtîke, weke hêza taktîk a stratejîk û rojaneyî jî cîhê xwe di blokbûnê de digire. Heta ev li hember stratejiya NATO jî di pêşketina Asya û Rojhilata Navîn a stratejiya wî ya esasî de, dê rola xelek bingehîn a şoreşê bilîze. Weke nûnerê xeleka herî bihêz û îdîa ya sosyalîzmê cîh digire. Şoreşa Kurdistanê jî dibe parçeya vê ya herî berhemdar û zindî. Di vê manê de dê şoreşa li ser axên Kurdistanê, di wexta berbanga mirovahiyê de mîna rola ku hatiye lîstin, lez ber bi pêkanîna rolek wisa ve diçe.

Bêguman di ramana bîrdoziya PKK'ê de ev pêşketin pêşbînine, lê ji dervî xwe jî şerê Îran û Iraqê, Şerê Kendavê, nakokiya Ereb û Îsraîlê, Balkanan û pevçûnên netewî yên li Kafkasan, her ku çûye lez dane pêvajoyê, bandor kirine û bi nêzîkbûnên taktîkî yên afirîner ve, xwe gihandiye qonaxek çareseriya bi îdîa.

Gelek karên ku pêwîste bên kirin hene. Ya herî girîng jî xebatên taktîk ên rojane ne. Dîsa di stratejiya PKK'ê de pirsgirêk tine ye. Berovajî her tim pêşketinê dijî. Wê ev di stratejiyê de bi pêşketinên hîn zêdetir bi zanebûn berdewam bikin. Dê taktîkên rojane jî bi girîngiyek mezintirîn ve bên pêşxistin.

Taktîkên şerê şoreşgerî yên li Başûrê Kurdistanê jî neçare ku bi girîngî bên avakirin. Kêmasî, tengbûnên ku di vê mijarê de tên jiyîn û peywirên ku nehatine pêkanîn pêwîste pir lez bên dîtin. Afirîneriya taktîkî di şoreşa Başûr û nava gelê wê de, her ku çûye bi qasî Iraqê jî bandor bike, neçare xwe bigihîne qonaxek û pêlekê. Pêvajoya taktîkî ya herî girîng li vir tê jiyîn û bi şêweyek pêşbînî hewldanên ku me di salên dawî de hûrûkûr meşandine, dide diyarkirin ku israra di şoreşa Başûr de ne vale ye, hem di asta netewî, hem di asta nav-netewî de xwedî wateyek mezine. Di roja me de ev jî ji her kesê re hatiye diyarkirin.

Li vir hinek peywirên girîng hem leşkerî, hem siyasî û hem jî aborî pêwîste rojaneyî pêk werin hene. Ya herî girîng PKK van deran

veguherîne baregehên leşkerî yên saxlem û bi şêweyek dijwar pêdiviyên wê pêk bîne. Pêwîste gelê Başûr pêşketinek siyasî, ango bi navek din ber bi federasyonek demokratîk ve guhertinekê bijî. Divê peywirên bi vî rengî pêk werin. Bi gelê Başûr re danûsitandinek rast, eniyek rast, taktîkên têkoşînê yên rast rojane birêxistinkirî û pişgirî li gorî rewşên guncav pêkanîn hewce dike.

Pirsgirêkên aborî yên hûrûkûr hene. Bi şoreşê re aboriya şer jî rast birêxistinkirin û wisa pêkanîn xala herî girîng bû. Nexasim em bi rewşa dawî anîna lîstoka neyênî ku faşîzma Komara Tirk Hêzên Çekîç jî kirî palpişta xwe û daxwaz dike ve rûbirû ne. Hêzê Çekîç, ango hêza NATO weke ku di radeyek mezin de hat valederxistin, ew tam binxistin jî weke peywir li pêş me disekine. Divê ev firsend jî heta dawî rast bê nirxandin. Nêzîkbûnên hevkarî yên kevnare hatine lewazkirin. Hîn zêdetir tasfiyekirin jî girînge.

Şoreşa Başûr di îtîfaqa Rojhilata Navîn de xwedî cihek girînge.

Rojhilata Navîn zemînek girînge ku hem bi Îranê, hem jî bi welatên Ereban re îtîfaqên Kurd ên balkêş lê pêş bikeve. Çi di demokratîkbûna Iraqê de, di îtîfaqa nû ya gelan ku nêzî wekhevî û azadiyê ye, çi bi lez li ser Îran û welatên Ereban bandora erênî derfetên xwe zêdetir bûye. Bêguman aliyê wê yê girîng jî Şoreşa Bakurê Kurdistanê ye. Ya ku Şoreşa Bakur bike bandorek mezine. Ger evder baregeha şoreşê be dê bandora xwe derbasî Bakur jî bike, hem leşkerî, hem jî siyasî pêşketinên mezin derbixe holê. Jixwe hêj ji niha ve ev rola ku tê lîstin di nava pêvajoya demkin a pêş me de yan dê lez pêşve biçe, yan jî dê Komara Tirk a faşîst teqez bixweza di şer de encamê bigire. Weke ku emperyalîzmê dike palpişta xwe, em jî dikarin li paş xwe ji her demê zêdetir îtîfaqa Asya û herêmê bibînin. Di vî şerî de cara yekê dê rewşek wisa berfireh bibe mijara gotinê.

Dîsa ji Komara Tirk dê qutbûna hevkarên hevnar û girêdana wê bi îtîfaqa herêmî ve pêş bikeve. Di pêvajoyek wisa ev hemû di navê de tê jiyîn, pêşveçûna mezin a şoreşa Bakur bidest bixe, nexasim şerê wê yê gêrîla bi tenduristî nirxandin û pêdiviyên wê pêkanîn, pir girînge.

Her wiha di nêvenga şer a gerim de yekîtiya siyasî ya gel û eniya wê pêşxistin, peywirek pir balkêşe.

Ya herî girîng jî şoreş derbasî nava Tirkiyê bikin û derfeta vê jî mezin bûye. Êdî gelê Tirkiyê jî di qonaxek ku nikare bê şoreş bijî de ye. Ti demê çînên serdest ên Tirk evqasî di nava bûhranê de ne jiyane, derketiye holê ku êdî neçarin pirsgirêkên gelê Tirk di nava şoreşê de bêgerîn. Êdî baş hatiye fêmkirin ku îtîfaqa dawî ya stratejîk jî girêdayî Rojava, radestbûna Îsraîlê jî dê bloka serdestiya Tirk rizgar neke. Aloziya hukûmetê ya tê jiyîn, bûhrana dewletê, ji nêz ve bi vê rewşê ve girêdayî ye.

Şoreş derbasî Tirkiye kirin, êdî bi qasî xwedî derfetên zêde ye, misogerbûna serkeftina Şoreşa Kurdistanê jî hinekê girêdayî vê ye. Zemîna ku şoreşa Kurdistanê di Başûrê Kurdistanê de bidest bixe hatiye girtin. Li Bakurê Kurdistanê jî gêrîla zemînek şoreşê ya saxlem bidest xistiye. Dikare ev zemîn hîn zêdetir bê pêşxistin. Ji bo pêşxistina wê jî derfet zêde hatine bidestxistin. Lê belê ger ev şoreş derbasî Tirkiyê bibe em yeqîn dikin, weke ku dê ev li tevahî Kurdistanê, beşên din jî serkeftina şoreşê misoger bike, dê Tirkiyê jî bixe nava rêya şoreşa ku ber bi serkeftinê ve diçe. Ber bi stratejiyek wisa rast ve çûyîn li Tirkiyê jî têkoşîna civakî pêş dixe. Yan dê rola xwe hêjayî pêk bîne, rizgariya civakî saz bike, yan jî dê di bin bûhrana giran di be de rewşa kedkar, çîna karker, karmend û gundiyên hejar nikarin bêhn bigirin, hîn zêdetir kembaxtir bibe. Bi kurtasî wê li nêvenga Tirkiyê jî yan şoreş, an sosyalîzm, an demokrasî, yan jî civakek ku faşîzmê kirî meymun ji neçarî bê jiyîn û pejirandin.

Em dibînin di roja pişgirî û têkoşîna kedkaran a nav-netewî de carek din çi ji hêla hemû mirovahiyê ve, çi jî ji hêla gelên li herêma me û ya herî girîng jî ji hêla şoreşa li Kurdistanê ve bi pêşketinên girîng, pirsgirêk û rêyên çareseriyê ve rûbirû ye. Ger PKK di vê manê de pirsgirêkên herî giran jî bijî, di rastiyê de çareseriyê rave dike.

Pêwîste kesek PKK'ê weke partiyek ku bikare meylên xwe yên hêsan lê bide axaftin nebîne, neçare weke çareseriya mirovahî, çareseriya gelan, dîsa di pirsgirêka Kurd a herî giran û di binî de mayî xwe weke çareseriyê binirxîne.

Salên dawî di nava partîbûnê de hurguliya em dijîn, hewldana ji nû ve avakirina mirovê mezin mijara gotinê ye. Bêguman di asta siyasî ya paşverû de ji bandorên civaka kevin re vekirî şerek tê sazkirin. Lê di heman demê de xisletên afirîner ên nû jî tên bidestxistin.

PKK'yîbûn civakbûne, siyasîbûne, leşkerbûne, di heman demê de avakirina mirovê nû ye.

Nexasim di nava xwe de mirovê dema nû, mirovê sosyalîst avakirin, weke peywira PKK'ê ya herî bingehîn a bîrdozî derdikeve pêşberî me. Jixwe xala ku di sosyalîzma pêkhatî de nehatî serxistin, di nava partiya xwe de karê avakirina mirovê nû weke peywir berçav negirtin, xwe bi nirxandinên giştî têr dîtin, avakirina mirovê sosyalîst ê nû, ji pêvajoya piştî rizgariya sosyalîzmê re hiştine. Ev şaşiya herî bingehîn a sosyalîzma pêkhatî bû.

Li gorî me neçare mirovê sosyalîst ji roja destpêkê ve bê avakirin. Partiya ku di nava partiyê de mirovê sosyalîst ava neke, ti carî ber bi rizgariya sosyalîzmê ve naçe, devjê ber de piştî sosyalîzmê mirovê sosyalîst ava bike, dê kesayetek mirovê bela serî ji tîpê kapîtalîzmê xetertir mirovekê derbixe holê. Jixwe tişta derketî holê û sosyalîzmê selmandî jî ji bilî vê ne tiştek dine.

Nexwe partiya sosyalîst em dev ji piştî serkeftina şer û sosyalîzmê berdin, karê ku pêwîst dikir di dema koma destpêkê de ser bixe, avakirina mirovê sosyalîst, mirovê pêşeng û hebûna vê weke karê sereke mayîndekirin bû.

Ger partiyek sosyalîst ji destê mirovên ne sosyalîst re bê hiştin, dê ew partî ji partiyek faşîst xetertir be.

Jixwe daneyên vê di nava partiyên sosyalîzma pêkhatî de derketin holê. Ji ber di partiyên sosyalîst de endam û kesê sosyalîst nabe, bi qasî civaka kevin re ye, li hember êrîşên kapîtalîzma ku xirab dike jî nikare di xeta navîn de bisekine. Dê heta demekê di xeta navîn de bimîne, lê belê dê di demek kin de di nava partiyê de bibe sîxurek çi yê kevnareyî, çi pergal, çi jî sîxurek objektîf ê pergalê. Ev jî bi serê xwe rûxînek mezin, paşverûtî û xeteriya komplogeriyê ava dike.

Yek ji xisleta têkoşîna PKK'ê jî, xwedî wê zemînêye ku van hemûyan derdixe holê. Divê hem ji her demê baştir bizanin ku şerê çînayetî yê di nava PKK'ê de tê meşandin wêdetir jî, tenê ne civakî û siyasî, bi gelemperî şerek mirov û israra me ya di vir de ewleya serkeftinê ye. Girêdayî ezmûnên me van vedibêjim, ger me evqasî bi israr şerê avakirina mirovê sosyalîst berdewam nekiriba, devjê berdin vî şerî bînin heta vê qonaxê, me nedikariya heta van rojan bînin û dê hêj di roja destpêkê de têk biçûya.

Nexasim ger ceribandina Sovyetê piştî heftî salî dihilweşe, tevî evqasî pêşketî cardin belav dibe, hilweşandina şoreşa me ya xwe dispêre mercên civakî ya herî paşverû jî pêk hatiba.

Vêca me çawa pêşî li vê girt?

Me şerê mirovê sosyalîst dijwar kir, wisa pêşî lê girt.

Me di nava partiyê de ji vê hêlê ve feraset û şerek têkoşînê ya rast bi hostane meşand, di nava PKK'ê de ne tenê hilweşîna sosyalîzma pêkhatî asteng kir, ji bo PKK pêngavan bavêje, gavavêtinên girîng pêş bixe rê vekiriye. Ev jî peywira wê ya herî sereke û rast a divê pêk were ye.

Karê destpêkê ya partiya sosyalîst pêşengiya xwe misoger bi endamên sosyalîst ve saxlemkirine.

Hewldana partiya ku kesê di nava xwe de nadahûrîne, sosyalîst nake, her kêlî mehkumî binkeftinê ye û heta vekiriye ku ber bi jirêderketinek xeter ve biçe. Xala sereke û bûyî sedema hilweşandina hemû partiyên demê yên din jî ev mijare. Wan têkoşîna avakirina mirovê sosyalîst an bi rastiyên giştî ve derbas kirin, an jî ji piştî şoreşê re hiştin. An jî cewaziyên aborî yên têr bike ve tawîz dan û wisa xwe ji nav vî karî derxistin.

Ger di partiya Sovyetê de çend sosyalîstên hêja hebûna, hemû peywirên weke demokrasiya sosyalîst, dilxweşiya sosyalîst û peywirên sosyalîst esas girtiban, ev partî wisa xirab nedibûn. Ev dewlet jî wisa weke amûrek xeter nedibûn bela serî û civak jî wisa nediriziya.

Rojane sosyalîstbûna pêşeng, xwedî girîngiyek mezine.

Ger mirov mînakek dîrokî bide; di dîroka Îslamê de, nexasim di nava têkoşîna gelên Rojhilata Navîn de, heta di nava têkoşîna mirovatiyê de bi temamî, ger olên ku hêjî îro bandorên wan mayînde ne û hêjî mucahîtên wan olan tên bîranîn, behsa ewliyayên wan tê kirin, berzbûna jiyana wan wateyekê rave dike, maneya vê ji ber bîrdoziyên wan mirovên xwe ava dikin, ji bo vê jî têkoşînek bêsînor, ziravî û hestiyariyekê raber dikin çavkaniya xwe digire. Behsa derd û kulên çil salî tê kirin. Li Îranê ezmûna Ayettulahan heye. Behsa minqibeyên ewliya tê kirin. Wateya van tevan; ew şoreş û bîrdozî bi israrek mezin karê avakirina mirovên xwe dimeşînin û didomînin. Ji ber ku ji vê jî gelek tarîqat û mezhep ava dikin, bandorên wan jî heta roja îro anîne. Jixwe li holêye ku divê di sosyalîzmê de ev hîn baştir çawa bê kirin.

**Di Sosyalîzmê De Feraseta "Besbûnê" Nabe**

Bi nêzîkbûna; "Vaye me aborî ava kir, vaye me dewlet damezirand" ve weke ku sosyalîzm nayê damezirandin, nexasim ayetullahên wê, îdeologên wê yên di nava şerê rojaneyî de, rêberên wê yên giyanwerî, rêberên wê yên bîrdozî, ger ne xwedî dewlemendiyek hemû karan bibînin, binirxînin û tevdîr bigirin de bin, dê şîroveya materyalîzma çors a şoreşa sosyalîzmê ber bi şîroveyên yekbûna bi kapîtalîst û faşîzmê ve bibe. Ger dê li vir tawanbarek bê gerîn, ev jî çavkaniya xwe ji pêşengên bîrdoziya sosyalîzmê û serweriya ku bi kesên pêşeng re heta dawî nedayîn meşandin digire.

Em di PKK'ê de weke rêber dibînin ku pêşketinek wisa dijîn. Hêjî hewl didin vê bi zewq û dildarî bimeşînin.

Me ti carî helwestek weke "bese" raber nekir.

Em niha baştir dibînin ku, şer çiqas dijwar dibe bila be, peywirên taktîkî rojane çiqas zêde dibin bila be, heta ji bo hinekan –ev di nava partiyê de jî hene- weke peywirek şer ên fantazî jî bin, her çendî bi fikarên jiyana teng ve tev bigerin bila be, çareseriya van tevan, kesayeta milîtan a sosyalîste.

Bi şerek rojane yê dijwar ve, avakirina kesayetek sosyalîst a milîtan, mezinkirin, li dijî her xeteriyê weke panzehîrê amadekirin şertê sereke ye. Her wiha pêwîste kesayeta sosyalîst a milîtan, her tim bê domandin.

Yek ji selmandinên PKKê ya herî girîng jî eve. Em pir baş dibînin ku, di asta ev pêk tê de, PKK ji aliyê polîtîk ve pêşketinek mezin raber dike. Heta taktîkên wê yên leşkerî jî hêjayî baldariyek mezin pêşketinê saz dike. Qet nebe dide diyarkirin ku pêşketinek hêsan têk neçe raber dike.

Di nava PKK'ê de pêşketina polîtîk heye. Weke ku pêşketina polîtîk di nava miletê xwe de dimeşîne, di nava gelên herêmê de jî bi şêweyek gerdûnî pêş dixe. Heta bandor li Ewrûpa û Emerîka jî dike. PKK'ya ku sosyalîst bûye, di heman demê de PKK'ya polîtîk bûyî û bandora wê ya polîtîk lez bilind dibe.

Îro miletê Kurdistanê ya pir paşverû û kesekê siûdek nedayiyê, bûye miletek polîtîk, ev jî pêşketinek girînge. Her çendî bê rêxistinî be, eniya xwe tam ava nekiribe, bê nîqaşe xwe gihantiye hêzek polîtîk a pir girîng.

Miletê Kurd, niha yek ji miletê herî zêde polîtîk ê şoreşgere.

Ev hîn zêdetir qayîm birêxistinkirin û qayîm bi enîkirin weke peywir li pêş me ye. Kurdên derve, Kurdên hundur û Kurdên li hemû beşan bi taktîkên polîtîk ên guncav ve birêxistinkirin, dîsa şêweyên têkoşîna polîtîk nekêmkirin, dê vê polîtîkbûnê hîn leztir bike û bîne astek miletê polîtîk ê bin nakeve. Pêşengiya vê heta dawî rêya vê vekiriye û derfet, çeperên vê ava kirine, pêkana vê jî êdî girêdayî qadroyên rêber û şêwaza wê ya polîtîke. Ji ber vê jî di çawanî û çendiniya şoreşgerî de qadro li her derî hene. Bes bila, bi têgihiştinek rêbertiya rast ve peywirên xwe yên polîtîk û eniyê hêjayî pêk bînin.

Kes nikare bêje bi pêşengtiya polîtîk a PKK'ê ve "derfet tengin." Bi qasî nebe nesîbê ti partiyên şoreşan, di hundur û derve, zagonî û derzagonî çeperên polîtîk ji her milîtanên PKK'ê re hatiye pêşkêşkirin. Ya girîng nirxa vê zanîn û bi rêzdarî parastina wê ye. Ger ev peywirên hewce pêk werin, bênîqaş dê serkeftinên mezin bên

avakirin. Jixwe em ji şerê polîtîk û serhildanên heyî ve vê fêm dikin. Rastiya bûna miletek ku herî zêde şoreşgerî dijî, ji aliyê her kesî, dost û dijmin ve hatiye pejirandin. Serkeftina vê ya misoger jî, neçare ku bê zanîn bi serweriya taktîkên rojane ve pêk tê.

Nexwe êdî misoger bûye PKK, partiyek polîtîk a herî afirînere, heta bilez yekbûna xwe ya bi gel re ava kiriye, polîtîkbûna wê sazkiriye, şoreşa xwe ya polîtîk di astek balkêş de bidest xistiye, teoriya polîtîka wê, esasên wê yên pêkanê û raveya şêwaza rêbertî ya herî balkêşe. Ya girîng hemû milîtan bikarin vê derbasî gel jî bikin, gel jî bikare heta dawî weke miletek şoreşger ê zane hebûna xwe bidomîne. Ev jî misoger di pêkanîna serkeftinê de bandora xwe ya diyarker raber kiriye û hîn balkêştir jî dê ev pêvajoya ku em dijîn diyar bike.

Her wiha ji ber hîn xurtir bersiva pirsa "Çawa Bijîn" bê dayîn, divê em bersiva pirsa "Çawa Şer bikin" bidin.

Yên nezanin çawa bijîn, derket holê ku nikarin bersivên bibandor û serkeftî çawa di şer de jî pêş bixin. Di rastiya civakî ya miletek heta şaneyên xwe jiyanek ji ast ketî, dîn, kole û xayîntî pejirandî de, heta ev neyê dahûrandin, parçekirin û şûna wê bersivên pirsa "Çawa Bijîn" bi bandor neyên dayîn, kes nikare şerek leşkerî û polîtîk a saxlem bimeşîne. Bi mirovên wisa bûne bela serê xwe, tîr û ribanê ji hev dernaxe, jiyanê ne bi serê xwe, hewl dide bi cihek xwe din ve bimeşîne, lingên xwe li hewa, di kêleka xeyalê jiyanê re jî derbas nabe, şerek bibandor nayê meşandin. Kesên ku hêj nikarin li hember jiyanê biserûber rêzdar bin, rêzdariya beramberî xwe bidest nexistiye devjê berdin bibe gêrîlayek sosyalîst, negengaze ku ji a,b,c'ya siyasetê jî encamê derbixin. Lewra ji aliyê me ve dahûrandina jiyana civakî, girêdayî şerê me ya parçekirina girêkên kor ên jiyana civakî, nexasim di nava malbatê de li dijî pêwendiyên wisa di rewşek hişk mayînde bûyîn, bûne fosîl, ji jiyînê derketine, bi qasî em ê nekarin weke kevneşopî jî binav bikin bi dervî jiyanê mayî re pêk tê. Heta ku di rastiya civakî û malbatî ya ji muhafezekarî jî wêdetir dirizîne, dîn û har dike, dîsa di têkîliyên jin û zilam de ketîbûn û kirêtiya mezin a

heyî neyê parçekirin, negengaze ku em bikarin di ruh û fikir de rê ji mezinbûnê re vekin.

Di demên dawî de di pêşengiya PKK'ê de me ev gav çiqas guncav avêtine, pirsgirêk ji xalek bingehîn ve bidest xistiye û pêşketinên girîng jî bi vê çekê bidest xistiye, mirov dikare hîn zêdetir aliyê wê yê gerdûnî bibîne.

Dikare ji vê re şoreşa çandê jî bê gotin.

Aliyê şoreşê yê civakî ji destpêkê ve derxistî holê, dahûrandin, li ser bingehek modela mînak jî be, pêwîste hîn zêdetir derfeta pêkanê jê re bê dayîn. Lê belê em baş dibînin ku peywirek teqez pêwîste bê pêkane, nabe ji piştî şoreşê re bê hiştin, heta ger serkeftina şoreşê tê xwestin, em neçarin di nava partiyê de şoreşa civakî, şoreşa çandî pir balkêş pêş bixin. Heta kûraniya di vê mijarê de hatî sazkirin, şoreşek civakî ya kûre. Her ku li hember her neyêniyan pêşî li asta pêwendiya civakî bê vekirin, nûbûn bên avakirin û di vê manê de dana pejirandin pêş bikeve, hingê berzbûn gengaz dibe. Neçare ku nûnerek saxlem a şoreşa civakî ya pêşerojê be. Di vir de israrkirin, ji bo şoreşa civakî wekhevî û azad pêş bikeve û di vê manê de civaka sosyalîst bi bingehên saxlem ve girêdan peywira herî esasî ye.

Ev pêşketinên ku di ti partiyên şoreşê de nehatî dîtin, di nava PKK'ê de tên dîtin. Weke şaneya herî bingehîn a civakê malbat dahûrandin, pir balkêş hat pêşxistin. Bi qasî girêdana wê ya polîtîka û leşkerî, ewqas jî aliyê wê yê dilxweşî jî derxist holê. Di malbatê de israr, dê weke saziyek civakî neyê nirxandin, weke saziyek ku siyasetê û jiyanê dixeniqîne derket holê. Dîsa weke pêwendiya herî bingehîn di nava malbatê de ger pêwendiya jin û zilam, dê-bav-zarok, heta pêwendiyên êl û binemal neyên dahûrandin, dê ti pêşveçûn çênebin, şerê ku bê meşandin jî şerê hoveber û îsyangerî derbas neke, dîsa polîtîkaya bêmeşandin jî, polîtîkaya hevkariyê derbas nake.

Ya herî xeter jî di nava partiyê de bûhranek giran hebû.

Ev bûhran çibû?

Ji ber nêzî şerek rast û polîtîkayek rast nebûn, ferasetek ku dibêje; "Ez seresere mam, teng mam, keyfkar bûm", neyênî, protestoyî û

tasfiyegerî xwe da der. Rêya derbaskirina wê jî ya rastî derket holê ku bi dahûrandinên civakî û dahûrandinên kesayetî ve gengaze.

Piştî ev hîn zêdetir hat dahûrandin hat dîtin ku, ji ber zincîrên di hundur de, zincîrên dîlbûnên di ruh û mejiyan de nehatîn parçekirin, em devjê berdin bi kesên pir bi bûhran, xwe jiyînê bêhedar re şoreşê pêk bînin, em nikarin wisa bûna belaya sere şoreşê yên mezin jî pêşî lê bigirin. Di her şoreşê de bûhranên wisa rê ji hizipkariyê re vedike. Dîsa di her şoreşê de rê ji parçebûna partiyan re vedike. Lê belê di nava me de tevî hêza bûna hizip nîne, weke janek hîn ziravtir weremketî, mîkroba penceşêrê rê ji rizandinê re vedike. Nikarin bibin nexweşek pêşketî jî. Weke nexweşiyek serekgiyanwerî û pir hovane şaneyê dikemirînin. Bi vî rengî jî protestoyek nav partî, nehewcedarî, bê eleqeyek nav partî ya qet neyê payîn heta ku rê ji windahiyên bê wate re veke, rêzdar nêzî peywirên herî hêsan jî nebûn weke nexweşiyekê xwe daye der.

Ev hemû çavkaniya xwe ji kesayetên xwe pêş nexistîn digirin. Ev kesayet di nava PKK'ê de ji bo çareseriyê hatine amadekirin. Di encama keda me de, em neçar man van dahûrînan pêş bixin.

Di encamê de ev derket holê: Li ser bingeha van dahûrînan kes dikare bijî, rêya jiyanê tê vekirin, pêwendiyên bingehîn pêşketinê saz bike, asta hest, asta rêxistinê, asta siyasî bikare pêşketinê ava bike.

Dîsa hinek pêwendiyên ku ti asta xwe ya siyasî tine ne çi rave dikin, ev şer çawa neyênî bandor dike, nexasim têkîliyên jin, zilam û malbatê nedahûrandin, di nava partiyê de çawa rê ji pirsgirêkên mezin re vedike, jixwe rewşa civakê ya nayê jiyîn çawa di nava partiyê de jî rewşek nayê jiyîn ava dike tev derket holê. Çareseriya vê jî artêşbûna jinê, rizgarkirina jinê weke pêşketinek girîng hat dîtin.

Li şûna ferasetên xwekuştinê, şoreşê ber bi mirinê ve çûyîn dîtinê, şoreş weke qeraseya vejînkirina jiyanê ye, ji bo bê zanîn çawa bê jiyîn şoreş esas tê girtin, lewra bi pêşketina vê ferasetê re ne bilez ber bi mirinê ve bazdan, ber bi jiyanek azad ve bazdanek balkêş pêkanîn, pêwîste esas bê girtin. Ev jî girêdayî hêjatiyên şer, xisletên serweriya li ser taktîkên rêxistinê û rojane ye. Kesê ku şer ser bixe, dê jiyanê jî

ser bixe, kesê ku nikare serkeftina dilxweşî û hestan bi xwe re pêk bîne, nikare şer jî ser bixe.

Bi şoreşek çandî ya wisa pir berfireh ve, me karî vê tevlî pêşketinên PKK'ê yên salên dawî bikin. Yeqîn dikim ev jî pêşketinek pir girînge, ne tenê di nava PKK'ê û di asta şoreşa netewî de, di qada nav-netewî de jî bandora wê her ku diçe weke pêşketinek baş tê hîskirin dinirxînin.

Çi ji ber roja yekîtî û têkoşîna kedkaran, çi jî ji bo amadekariyên nava PKK'ê yên em di vê pêvajoyê de dimeşînin, sosyalîzm di kesayeta PKK'ê de pêkanîn, hêviyek mezin dide.

1 Gulan 1996

**Hûnê Ji Bo Utopya Bijîn**

**"Sosyalîzm hiş û baweriya azadiyê ye,**
**Di oxira wê de zewqa xebatê ye."**

Em ê li ser pêwîstiya di sosyalîzmê de israrbûnê rawestin.
Her wiha em ê vê bikin duruşme:

Heta ku mirovatî hebe, dê utopya sosyalîzmê bi zewqa xebatê ve jîndar bibe.

Îro pergala kapîtalîst-emperyalîst weke sehwekê bi serê mirovahiyê de hatiye. Emperyalîzmê derfetên teknîkî jî ji xwe re kiriye palpiştek, bi zewqek zalimane darbeyên mezin li doza kedkaran daye û li hember hemû çeperên têkoşînê di serî de Yekîtiya Sovyetan ku, di sedsala 20. de bidest xistibû, her çendî bihurdar jî be bi zalimtiya ku biçe serkeftinê ve êrîş dike.

Bi şêweya êdî doza kedkaran nemaye, ti wateya utopya sosyalîzmê nîne, pergala heyî çarenûsa mirovatî ya dawî ye, ji vê çarenûsê nayê revîn, weke ferasetekê pêwîste heta dawî bê pejirandin, li hember mirovatî êrîşek mezin ferz dike.

Ev êrîş bi salên 1990'î re, beriya bigihê sedsala 21. ji bo yek çeperên nehatîn desteserkirin nemînin, domand û hemû hêza xwe bikar tîne.

Hema bêje hemû cîhanê, cîhana xwe, tenê bi ser serê kedkaran de, qevdek şoreşgeran de vale dike.

Hêj beriya niha, li ser komek şoreşgerên ji Perû'yê, hemû pergala emperyalîst bûn yek û tevgeriyan. Em dev ji Perû berdin, li ser gêrîlayên me, ji bo yekîneyên şerê taybet ên faşîzma Tirk ku pişgiriya nav-netewî jî girtine encamê bigirin, ji bo kelha komînîzmê ya dawî, koma pêşeng a PKK'ê hilweşînin, çawa bi dîn û har êrîş kirin em berçav bigirin, em cardin girîngiya ji nû ve pênasekirina çavkaniya me, bîrdoziya me ya rêber, ango sosyalîzmê dibînin.

Ji bo her demê û ji her tiştê girîngtir, utopya sosyalîste.

Utopya, di wateya xeyalên civakî de ye.

Her ku mirovatî dest bi derketinek pêşve kiriye, xeyalek û utopyak wê ya mezin hebûye. Civakek bê utopya, dema mehkumî jiyanek rojaneyî tê kirin, tê wateya mehkumî jiyîna koletiyek teng bûye. Dema mirovek, çînek, civakek, netewek û partiyek mehkumî bê utopya bû, ango dema hêvî, xeyal û baweriyên xwe yên bingehîn winda kir, paşve komek vale dimîne. Teknîk û hejmara artêşa wan ji ya her kesî zêdetir jî be, mehkumê belavbûnê ye. Lê yên ku îdîa û utopya wan pir mezin, gengaze ku civatek herî biçûk bi rastî jî di demek kin de serkeftinên

qet nayên payîn pêş bixin û hêzên herî xirabkar jî birûxînin. Di dîrokê de gelek mînakên vê hene.

Dema împaratoriya Roma bi hemû mezinbûna xwe ve li hember mirovan, mirovatiyê rêbazên herî xedar sepand û Hz. Îsa li dijî vê derket, bi komek hewariyên xwe ve ew şopand, piştî çarmixê ve girê da û yên mayî jî şopand, vê civakê bi îdîa û utopyayên xwe ve ruhê împaratoriya Romayê sitand. Jixwe wê demê di destê vê koma biçûk de ne teknîkek, ne jî hêzek mezin hebû. Lê belê vê komê bi têkoşînek bawermend û rikdar ve piştî demekê cîhan fetih kir. Her wiha weke tê zanîn ber bi roja me ve, hêjî vê hêza xwe diparêze. Her çendî ji cewhera wê hatibe valekirin jî, xiristiyanî di cîhanê de bîrdoziya herî bibandore.

Dema Misilmantî di nîvgirava Ereban de derket holê, ûtopyek li çola ji agir bû. Dema komek mirov bi vê utopyayê ve tevgeriya, piştî demek pir kin, nîvgirava Ereban hema bêje bû navenda împaratoriya çolê.

Marks û Engels du hevalên bi zorê zikê xwe têr dikiran. Dema utopya sosyalîzma zanistî derxistin holê, pergala kapîtalîst ji mêj ve li cîhanê serdestiya xwe saz kiribû. Piştî ku ev utopya di demek kin de bû malê karker û kedkaran Komûna Parîsê, raperîna 1905'an, Şoreşa Cotmehê û peyre jî gelek tevgerên Rizgariya Netewî heta fetihkirina cîhanê çûn.

Ev mînak jî vê şanî me didin: Utopya mafdare û dema derfeta derketin û pêşveçûna mirovatiyê dide, destpêkê hejmar çi dibe bila be, teknîk çiqas lewaz be bila be, bes bila bawerî hebe û di rêya wê de bi azweriyek mezin têkoşîn bê dayîn, teqez wê serkeftin pêk were.

Divê mirov diyar bike derketina PKK'ê jî ûtopîke.

Îro di nava refên me de, jiyana rojaneyî, îdarekirin, heta şervantî, hema bêje bûye fêrbûnek hûn tev dorpêç kirine. Vaye, ev jî şaşiyek pir tirsnake. Her kes tenezil dike bi rayeyên biçûk û derfetên ku ev raye didin ve bijî. Ev jî nêzîkbûnek pir çewt a li dijî xisleta PKK'ê ya bingehîn û cewhera wê ye.

Ev pir vekiriye: Dema me dayî despêkirin, em ti demê, bi qasî misqalekê jî bi fikir û xeyalek weke; “Dê zikê me têr bike, em ê bi rayeyên PKK’ê ve xwe xurt bigirin, dê jiyanek me ya girêdayî PKK’ê hebe” nêzî PKK’ê nebûn.

Berovajî, fikir û baweriyên me yên bêhempa hebûn û me digot; “Em ê vê bi tiştekî neguherînin.” Pîşeyên me û jiyanek me ya bi ewle hebû. Li hember vê dema me ev xeyal esas girtin, li hember me jî pergalek faşîst a mezin hebû. Teqez mezinbûna hêzê jî bi wî re bû. Dibe ku bi temamî derfetên ku em bikarin tevlî vê pergalê nebin, lê rastiyên me yên em pê serbilind û baweriya me pê dihat hebûn. Fikrên ku berjewendiyên kedkarên miletekî rave dikin, ango zanebûna sosyalîzmê û pergala baweriya ku wê ava kirî, me hesabê kesî nekir û dijmin kî dibe bila be, me jî xwe li hemberî wan şûnve neda. Me heta dawî her tiştê xwe danî holê. Bal bidinê, di destê me de çend quruş pere hebûn, me ew jî dida çend pirtûkan.

Jiyana rojaneyî ji bo me tenê amûrek ji rêzê ye. Lê belê xeyalên me, zanebûn û baweriya me ya sosyalîstî, nirxên me yên pîroz ên me bi rasteqînî diherikîne û em nikarin bê wê bikine.

Hêjî di bîra min de ye: Heqî, Kemal, Mazlûm û Xeyrî’yan misoger milîtanên mezin ên vê baweriyê bûn. Her wiha di mercên herî zehmet de ti nêzîkbûn û reftarên wan ên xemgîniyek herî biçûk bijîn, bi qasî misqalekê jî teng bibin, derdora xwe aciz bikin nebû.

Ew jiyana li ser bingeha nirxên PKK’ê yên herî pîroz rave dikin.

Ev, jiyanek ûtopîke.

Wan ji bo xeyal, ji bo îdîa, ji bo hêvî û ji bo bawerî jiyîn ser her tiştî re girt.

Wan dikariya bibin xwediyê pîşeyek baş jî, lê bi zanebûn dev ji vê berdan û misoger dizaniyan ku di vê rêyê de şahadet heye. Lê belê bi qasî misqalekê jî tirs û fikar jiyan nekirin. Her roja xwe bi çoşa cejnê ve derbas kirin. Ez her tim vê cewherê vedibêjim.

Lê mixabin dema em li PKK’yên roja me dinêrin, weke xeyal û hêviyên wan nemane!

Li ku derê rayeyek PKK'ê, li kur derfetek PKK'ê, li kur malek rehet, li kur cihek dewlemend hebe, rêveber çav diberdin wir. Hewce bike em ê van hezar carî jî bêjin.

Dev ji utopya, xeyal, hiş û baweriya PKK'ê berdan, xirabiya herî mezin em li xwe bikine. Bi ti hêcetî mafê kesekî nîne vê bike.

Hêjî gelek caran tê gotin û dibihîsin: Dibêjin; “Başe, wê zewqa vê jiyanê ya heyberî çawa be yan jî encamên pratîkî çawa derbikevin pêşberî me?” Mane di Îslamê de jî tê gotin minafiq, ev jî tam vê derdorê rave dike. Li şûna ev hewldan weke ruhê mirovan berz dike, hişê mirov ronak dike û bi qasî ti nirxên heyberî re neyê guhertin jidilbûn, dilşadî û xweşî dide mirov, bi nêzîkbûnek minafiktî bêje; “Ezê bidizim û bibim, erzan bijîm”, em navê van jî nagirin ser devê xwe. Li jiyana xwe dinêrim.

Ez, pir baş dizanim ku jiyana heyberî çiye. Ji bo çend quruş pere çiqas giriyame û naliyame, ji bo xwarinek baş jî min çawa beroş rakiriye hêjî di bîra min de ye. Lê paşê min got ji bo baweriyên min hinekê jî azadî. Vaye min di hinek pirtûkan de û zêdetir jî di jiyanê de lê geriya û dît. Îro jî li ser bingeha van lêgerînan dimeşim. Nirxên ku di zarokatiya xwe de ewqas li pey geriyam, îro ji bo min ji rêzê ne.

Ti carî xwe mezin nabînim.

Ji bo min tiştek bi qasî xeyalên diherikînin, fikrên afirîner û pratîkên pêşeng, hêjatir nabin. Tenê ev dikare min têr bike.

Ev di heman demê de li gorî utopya sosyalîst hêza jiyanê ya rakêşwer rave dike.

Ger ê herî xurt ez im, ev ji bo utopya sosyalîzmê xurte û bi wê ve girêdayî mame. Ji bilî vê misoger ti xisleta min nîne.

Di vê manê de ger PKK di roja me de tevgera herî bi îdîa ye û bûye metirsiya xewnên emperyalîst û kapîtalîzmê, ev ji ber PKK bi utopya sosyalîzmê ve girêdayî maye. Tevî hemû hewldanên dijber, ji ber feraseta sosyalîzma ku devjê bernedayî û bi zewqek xebatê ve jîndarkirine. PKK ji bilî vê, ne tiştek dine. Ger kesek jî ji her hêlê ve vê jîndar bike, ev jî serkeftina PKK'ê ya nayê astengkirine.

Bila ti kes û bi ti hêcetî ne xwe, ne jî me nexapîne. Ev ji dervî me jî dibe û di nava me de jî dibe. Em pir baş dizanin ku çi, çawa saz dikin. Me azadiyek wisa bidest xistiye, bi qasî ti hêzên di dîroka me de û kes nekare bide, me bi vê dîtiye. Tişta ku di dîrokê de ti bîrdozî û baweriyê pêk ne aniye, me bi vê utopya û bîrdoziyê pêk aniye.

Ango bi sosyalîzmê ve pêk aniye!

Dihizirim, gelo dibe hinek sedemên din em pêş xistibin? Belê, li hember kedkariya gundî rêzdarim, li hember îsyana mirovên bindest rêzdarim. Hewldana rewşenbîran jî biçûk nabînim. Lê belê ger ev ji aliyê sosyalîzma ku yekser ez rêbertiyê jê re dikim ve neyên perwerdekirin, birêxistinkirin û birêvebirin, ne ti tiştin. Rewşenbîr di nava demek pir kin de, li hember êrîşek herî biçûk, lez, ger hebin yekser dev ji hinek jêhatiyên xwe berdidin, an jî bi belavkirinê re rûbirû dihêlin. Rewşek bi pergala nikarin xwe ji têkçûnê rizgar bikin re rûbirû dimînin.

Vêca kedkariya gundî çiye?

Ji sedî salan ve kar dikin, nikarin zikê xwe jî têr bikin. Cîhana hemala ye, cîhana cotkara ye, di nava xwîn û xwêdanê de, bi qasî dixwazî bila kar bikin. Bi vê xulamtiyê nikarin tiştekê rizgar bikin. Çîna nûjen, çîna karker jî bi qasî dixwaze bila kar bike. Nikarin xwe ji bûna heyberek ku îro pergal her tiştî li ser diceribîne rizgar bike.

Li vir tiştek kême: Ji bo wateyekê rave bikin, utopya, bawerî, hiş û rêxistina sosyalîst hewce ye. Vaye, em jî dev ji vê bernadin.

Ji ber ku em israra di vê xisleta Rêbertî û bi temamî ya PKK'ê ser her tiştî re digirin, PKK îro bihêze.

PKK li hember cîhanê şer dike.

Rêbertiya PKK'ê bihêze û her tim xwe xurt dike.

Çima, ji ber ku di demek ku herî zêde sosyalîzm bi êrîşan re rûbirû dima û hemû çeperên xwe winda kirî de, bi sosyalîzmê ve girêdayî ma, li ser bingeha domandina girêdana bi zanebûn û baweriya wê ve, misoger rê ji vê re vekir û em neçarin di vir de li xwe mikur bên. Gelek ji we yên bi şermî jî be dibêje; "Yaw ev belaya sosyalîzmê ji kur derket?" –dervî me, di nava me de jî wisa ye- û dihizirin kunnekêmin.

Dixwazim pir balkêş bêjim; tişta ez ji sosyalîzmê fêm dikim, bawerî û hişê azadiyêye û di rêya wê de zewqa xebatê ye. Pêwîste hûn jî teqez van herdu têgehan fêm bikin û pêdiviyên wê pêk bînin.

Hûnê ji bo utopya bijîn, ango dê xeyal hebin.

Xeyal çine?

Dema îro welatê me û gelê me dibe mijara gotinê, bi wî re avakirina jiyan û azadiyek ku em dixwazin an jî em bikarin vînek din, mînak vînek mêtîngeriyê ya heyî bişkînin û welatek serbixwe ava bikine.

Avakirina welatê serbixwe, avakirina qada xebata serbixwe ye, avakirina qada karê serbixwe ye.

Ji bo hilberînê, avakirina çarçoveyek mezine. Welatê serbixwe eve. Her çendî weke utopya jî be, ger ev utopya hinekê pêk were, bi encama ku derbixe holê re, tu dikarî bi qasî dixwazî keda xwe azad bidî axê, hêzên hilberînê jî bi qasî bihuştê ava bike bidî karkirin.

Ev jî, dibe pêkhatina çalekiya gel a avakirina bihuştê. Welatê serbixwe û sosyalîzm eve.

Avakirina miletek azad, zanebûna wê û vîna ku dîl hatiye girtin, girêdanên ku ruhê wê şeht kirî parçekirine. Her wiha dema ev jî pêk hat, dê her demê piştî fikir û planên pêşketî, vînên xurt derbikevin holê. Dema hatin rewşa miletek wisa xwe dibîne û ji nû ve pênase dike, ev gel xwe azad bibîne û li ser axên welatê hatî rizgarkirin dest bi xebatê bike, ti esera ku ava neke nîne. Vaye utopya sosyalîzmê û utopya bihuştê hinekê jî eve.

Piştî ku xebat bi utopyayê ve hat girêdan, mînak şerê rizgariya netewî xebateke, lê ji bo utopya serxwebûna netewî, ûtopyek ji bo azadiya gele.

Rêxistinkirina gel jî xebateke.

Partî bi xwe jî, xala bi hostane û hunerkarî yekbûna xeyal û kedê ye.

Lewma jiyana partiyê, weke jiyanek mirov bifirê ye. Xeyal û keda sosyalîzmê yan jî xeyala sosyalîzmê û keda wê, ango baweriya wê bi keda azad re, bi keda mirovê azadkirî re, bi xeyal û baweriyê ve

yekbûnek çêkiriye, hêzek mezine. Rêberên sosyalîst, di vê manê de çi aborî, çi şer, çi rêxistinbûn, çi propaganda, dest bavêjin kîjan karî bila be mezin dibin. Çima? Ji ber ku li wir bi xeyalê sosyalîzmek mezin ve zewqa xebatê dibe yek wisa ye. Lehengên keda sosyalîst, lehengên hunera sosyalîst, her tim wisa derdikevin holê.

Heta ku utopya balkêş nebe, xwe neyînin asta ku bêje; "Dibe ku ez bê nan û av bijîm, lê bê xeyalên azadiyê nikarim bijîm", heta em ji xebata şoreşgerî, xebata partî û şer bigirin heta binesaziya jêr hemû kar, avakirina civaka sosyalîst, pratîk, bûyera pêkanê û xebat bi zewq pêş nekevin, mirov nikare bibe sosyalîst.

Hinek armancên pê ve girêdayî ku min her roj li ser lingan digirin hene.

Gelo welat rizgar
dibe? Ma gel azad
dibe? Gelo şer
didome?

Hinde xeyal û pratîk balkêş û herikbarin, êdî hebûna me ya fîzîkî di nava êş û janê de ye.

Li gelekan dinêrim: Hebûna wan a fîzîkî, hebûna heyberî hinde ruh û hişê wan daqurtandiye û hebûna wan a fîzîkî jî bûye balonek an jî werimiye. Pir bêberhemin û bêxêrin. Bi kotekî xebatê dikin.

Dîsa bîranînek xwe ya zaroktî bibîr bînim: Min her kar kotekî dikir. Karê çandin û pembû, nizanim ji her karî re min digot; "Nabê, ez nikarim wisa kar bikim." Ya rastî min pir kar dikir, lê min digot bi vî şêwazî kar nabe. Yeqîn dikim li wir li gorî xeyal û baweriyên min xebatek nebû. Ez jî ji xebatek wisa tengav dibûm. Çima? Ji ber ku xebatek bê utopya bû.

Dîsa xeyalek min hebû: Dema min digot; "Gelo biçim vir, nikarim vê bigirim?", yekser radibûm û ti hêzî nedikariya min bigire. Hewldanek xwe bi xeyalan ve girêdayî bû. Şûna vê ji bo pariyek nan ji dê û bavê xwe, li gorî pîvanên wan bistînim, dema dihat gotin; "Biçe vî karî bike", diketim nava bêxîretiyek mezin de û nedikariya rabim. Min nedikariya du-sê keviran bidim ser hev. Min nedikariya rabim tasek av jî bînim. Çima? Ev ji bo min di nava pergala malbatê de weke

karê biheq bû. Xebata bi şêweya; “Rabe vê bike, em ê jî vê bidin te” qet keyfa min jê re nedihat. Ne ku bêxîret bûm. Ji ber ku dema bi ser xebatek din de diçûm, weke bagerê bûm.

Vaye cewaziya du xebatan: Yek xebata ku bi îdealê ve hatiye girêdan, ya din jî bi heq an jî pergalê ve hatiye girêdan. Xebata li gorî pergala malbat an jî dewletê ye. Em çiqas ji yekê direvin, ewqas bêxîret dibin, ya din jî ewqas me bixîret û jêhatî dike ku kes nikare me asteng bike. Paşê bi tena xwe beşdarî nava vê dozê bûm. Hêjî her kes dibêje; “Me nepeniya te fêm nekiriye.” Nepeniya wî di sosyalîzmê de ye.

Piştî ku hiş û baweriyek li gorî me ava bû, min xwe bêhempa da karkirinê. Dikare bê gotin, xebatên li ser bingeha siyasî û leşkerî bi leza jetê dikim.

Min beriya niha mînakek jî da: Li gorî min, tempoya hemû polîtîka û şerkerên din û heta şerkertiya we, dişibe li çolê meşa li ser pişta hêştirê yan jî di nava me de li ser pişta kerê. Ger em di astek hîn pêşketî de hêja bibînin, meşa bi maşînek kulûstir ve, yan jî bi kamyonek modela 1950’î ve ye, ne otobûs jî. Lê em niha polîtîkayê bi leza jetê dikin. Heta hinekan digot, leza şewqê ye.

Vaye, di sosyalîzmê de xeyala di vê manê de kar dide kirin.

Nexasim ger dixwaze tarîtiya faşîzmê bike û teqez bibe serdestek û tu jî dijwar bi xeyalên xwe ve girêdayî bî, polîtîkaya te, heta leza te ya şer wê ber bi leza fûze, heta şewqê ve biçe. Jixwe ti hêza dijmin jî nikare wê bigire. Vaye, em jî vê hêzê raber dikin. Gelo ji bilî vê pênaseyek PKK’ê ya din dibe. Yan jî raveyek sosyalîzma ku di PKK’ê de pêk tê dibe? Yeqîn nakim, ji ber nikare xwe ji binkeftinê rizgar bike. Başe, em çawa gihiştin vê pênaseyê?

Her wiha di PKK’ê de pêşketina sosyalîzmê ya wisa neçar kir. Wê îdeal, xeyal û utopya te hebin. Di heman demê de wê tu di nava zewqa xebatek bêhempa de bî.

Ji bo min xebata rêxistinê zewqa herî mezine.

Berê ji bo rehet razim li wext digeriyam. Ji bo li gorî keyfa xwe, xwe dirêj bikim, nizanim li gorî keyfa xwe çi bikim, min roj

dijimartin. Niha, ev hemû ji bo min îşkencene. Her çendî beden zehmetî bijî jî, hewldanên sosyalîst, propaganda, rêxistinbûn, sazkirina pêwendiyan, welhasil rêvebirina rêxistinê û şer bûye azweriyek mezin.

Bûye zewqek.

Zewqe, ango bê wê nabe.

Dikare bê gotin, rastiya Rêbertiya PKK'ê ne tenê li gorî vê pênaseya sosyalîzmê ya giştî xwe şênber kiriye û pêk aniye. Di heman demê de sosyalîzma pêkhatî ya wê demê hatî tasfiyekirin heye, qutbûna leza pêvajoyên rizgariya netewî hene, lezek mezin a pergala emperyalîst heye, li hember van tevan xwe nû dike. Xwe li hemberî wan nûkirin li aliyekê bihêlin, ber bi şêwaz, tempo û radeyek ji serkeftin ber bi serkeftinê ve dibeze heye.

Bi mebesta vê roja kedkaran, xelata herî hêja em bidin kedkarên nav-netewî, di kesayeta PKK'ê de bi hewldanek şoreşgerî ve girêdana bi xeyalan ve, pratîkek şoreşgerî bi serkeftî û serkeftina wê misogerkirine. Xelatek ji vê hêjatir nabe. Ji ber di pêvajoyek sosyalîzm hatî tinekirin û tê gotin êdî kêr nayê de, sosyalîzma ku di kesayeta PKK'ê de pêk tê, hêzek mezine.

Pergala emperyalîst-kapîtalîst, civak li hember hemû nirxên mirovî girtiye yan jî hemû nirxên mirovî di nava civakê de xeniqandiye. Bi vê re jî nemaye, pêwendiyên mirov ên bi xwezayê re, ji bo tinekirina xwezayê, ango pêwendiya ku mirov teqez pê hewce ye, pêwendiya xweza û mirov tarûmar kiriye. Hem binê erdê, hem serê erdê ji bo mirovahî, aniye rewşek wisa ku çavkaniyên jiyanê yên hewce jî nede.

Mirovatî ji çar hêlan ve di bin gefan de ye.

Li dijî vê pergalê, rewşa sosyalîzma di roja me de ya heyî pejirandin ji bilî wateya nêzîkbûnek ketî û berovajî ketina şervanên sosyalîzmê yên sedî salan di rêya mirovahiyê de têkoşayîn û îxanetê, ne tiştek dine. Berovajî dibe ku ji her demê zêdetir nerakêşweriya utopya sosyalîzmê, devjêneberdana wê û ya herî girîng jî xebatek di şêwaza bêxîret a kapîtalîzmê de, divê şêwaza xebata sosyalîzmê ya bi zewq dakeve pêşiya her tiştî, ev jî ji bo mirovahiyê rêya sereke ya

derketinê ye. Weke ku me hêviyek mezin bi vê ve girê daye, di heman demê de bi vê jî dilxweşiyek mezin dijîn.

Me ti carî çav li ti tiştî nekir.

Li gorî darezên nirxên kapîtalîzma ku îro dibêje; “Min evqas mirov fetih kirin”, naxwazim tenezilî jiyanê bikim. Tevî ku em partiyek her tim di bin îşkenceyê de ne, tevî em berpirsyariya wê ya herî bilind di nava jana van îşkenceyan tevê de dimeşînin, zewqa vê jiyanê dayî jî bi qasî ti zewqê re neguherim, bi bawerî li xwe dinêrim, bi bawer û serbilindim. Niha bê gotin tu dikarî bi heyberek din re biguherî, devji hesaba wê kirinê berdin, naxwazim li rûyê wî kesî, bîrdozî û pergalê jî binêrim. Ne ku ji ber em xwediyê utopyek mezinin, em utopya pêş dixin, vê bilêv dikim, dîsa nabêjim di nava xebatek kedê ya pir mezin de me.

Ez serbilindiya mirovê sosyalîst û girêdana bi şêwaza xebata wê ve dijîm.

Nirx didim wê û vê jî hevgirtî dikim. Bê ku xwe bixapînim hem pir zane hem jî bi plan dikim. Ne ku ji ber di tengaviyê de me yan jî min bi vê re derfetek pêşketinê dîtiye, ji ber ku weke şêwaza jiyanek devjê nayê berdan dibînim dikim.

Nexwe di serî de weke PKK’yî dersên ku pêwîste hûn derbixin çine?

Ger gengaz be bi vî şêwazî xwe PKK’yî kirine.

Hûn behsa girêdanan dikin, her roj sond didin, bes li gorî min ger girêdanek sînordar jî be, ji bo mirov nebe milîtanek sosyalîst ê baş, ti sedem tine ne. Ger hûn milîtanek sosyalîst ê baş bin, di mijara her karê ku hûn bigirin dest de, ji ber ku her tim bi zewqek mezin kar dikin, hem bi zanebûn û bawerî ne, wê zanebûn rêya we ronî bike û bawerî jî vîna we dijwar bike. Lewra ji bo hûn nebin xwediyê meşek saxlem ti sedem nînin. Ger hûn ne durû bin, we xwe bi nexweşiyên pergalê ve şeht nekiribe, ji bo meşa we neserkeftî be, ti sedemên dijber nikarin bibandor bin. Her wiha yek ji we bi ti hêcetê nikare rave bike ku çima saxlem nemeşiya, çima nebû milîtanek PKK’ê yê rast. Gotinên weke; “Wey, vî çima ez asteng kirim, nizanim vî çi ji min kir, vaye ev xisleta

çînî ya PKK, ji PKK'bûnê derxist" bên kirin, li hember baweriyên me yên berz û keda me ya sosyalîst êrîşek dizker û dijminatî ye.

Di vê manê de karê yekemîn hûn bikin; "Ma ez sosyalîstek im? Gelo qet nebê di şêwaza Rêbertiyê de gihame vê hêzê?"

Vê pirsê ji xwe bikin û hewldana bersivê bidin. Yên nekarin bersiva destpêkê bidin, dixwazin bila dewletê jî damezirînin, nikarin bibin xwedî ti serkeftinên cidî. Belê, ma sosyalîzma pêkhatî çawa hilweşiya? Nizanim bila çend serkeftin bidest xistibin, vaye artêşên Sovyetê pir serkeftin bidest xistin, lê belê îro Artêşa Sor artêşa cîhanê ya herî jirêderketî û çekên xwe difiroşin pênc quruşî ye. Elbet dema girêdana xwe bi utopya sosyalîzmê qut bike dê wisa bibe. Jixwe serkeftinên we yên wisa mezin jî tine ne. Hêj we bi serûber pêdiviyên xebata azadî nekiriye.

Xeyal û baweriyên we yên wisa berz jî tine ne.

Hûnê dilnizm bin. Jidil bin ku bibin sosyalîst.

Hûnê bi zanebûn û baweriya wê û hewldana wê ya devjê nayê berdan ve xwe bi kesayet bikin. Ev nebê, ti nêzîkbûna we, heta pratîka we çend şeran ser bixe jî, yan jî demogokên pir mezin jî bin, zêde ti nirxa we nîne.

Ma ez çima dikarim wisa di nava PKK'ê de bibandor bim?

Behsa karên pir hêja û qîmet jî nakim. Li ser bingeha rastiyên me bi mirovan re axaftin, karek hêsane. Pêwendî pêşxistin, karê ku her kes dikare bike. Ger ev şereke, dê wir kar hîn zêdetir mezin bibin. Wate dayîna xwe û dijminê xwe, dê kûraniyê bidest bixe. Bes bila, hinekê kesayetek sosyalîst be, nayê hizirîn ku gav ne avêje. Ne wisa be, demogog be û dizkerê kedê be, yan jî gundiyek, hemalek, rewşenbîrek û zû-dereng serkeftinên wî jî hebin, di encamê de mehkumê binkeftinê ye.

Ti kedkariya gundî ji bilî rêya diziyê, nehatiye dîtin ku ber bi karsazbûnê ve çûye. Ti demogog jî, ger bi şêweya çors avakirina mirovan nebe, nehatiye dîtin ku hêzek siyasî yan jî serkeftinek leşkerî bidest xistiye. Serkeftina wî ji dizkeriya yekê û yê din jî mirovan dixapînê ye. Diz, didizin û lihev didin wisa bilind dibin û dibin ên herî mezin. Demogog jî bi derewan mirovan dirazînin, dibe ku bibin

diktator jî. Ev li cîhana me pirin, di nava me de jî her roj yên wisa dixwazin derbikevin. Lê neçarim vekirî bêjim, di şêwaza rêbertiya me de, ne bi dizkerî li pey hewldanan ketin, ne jî bi demogog derdora xwe xapandin heye. Na, qetiyen ji herduyan re jî cîh tine ye.

Gelo hûn xwe digihînin kesayetek sosyalîst ên saxlem?

Bi rastî jî hûn bi armanca kesayetek sosyalîst ve girêdayî ne?

Ger hûn dibêjin erê, wê demê xwe gihandina pîvanên rêxistinê yên saxlem dê we bibe encamê, bigihîne xet û xeyalên we. Ketina bin bandora jiyanek din nayê hizirîn.

Cardin dibêjim: Dev jê berdin wisa bi salan di nava PKK'ê de mayîn, destpêkirinek ji rêzê jî kirin, bese ku we saxlem bimeşîne.

Vaye, ma Heqî'yan sosyalîzm pir baş dizaniya? Na, bi zanebûnek pir kêm ve rê ketin, lê belê em pir baş dizanin ku pir bawermend bûn.

Vaye ma Xeyrî'yan, Mazlûm'an û Kemal'an ev ax pir baş dinasiyan? Na, lê belê wan jidil baweriya xwe bi sosyalîzm û hewldana wê tanî û bi dildarî pê ve girêdayî bûn. PKK'yiyên rasteqîn ev bûn.

Lê niha li nav refên me dinêrim: Kesên zanebûna wan çil qatî ji ya Heqî'yan, Kemal'an û Mazlûm'an bilindtir hene. Dîsa yên pratîka wan –şervanê deh-panzdeh salî jî di nav de- sed qatî ji ya wan PKK'yiyên mezin jî pêşdetir hene. Mixabin em li wan dinêrin, hemû bûne pirsgirêk.

Çima?

Ji ber ku berovajî xisletên bingehîn ên kesayeta sosyalîst ketine. Kesayet û nasnameya gelek ji wan bigumane.

Jiyana rojane û girêdana bi raye, lêgerîna heqê, bi serê xwe bûye PKK'yek. Li nava welat jî, li dervî welat jî şoreşgeriya raye, şoreşgeriya fermande, pir cuda û rewşên hema weke ruhê PKK'ê bistîne ava bûne. Ev jî her kêlî pirsgirêk çêdikin. Jixwe tiştek zêde bidin PKK'ê tine ye.

Keda xwe, evqas xwîna şehîdan heye, evqas nirxên yekserneyekser miletê me dayî heye, kesên ku nûnertiya van xisletên min hejmartî dikin, her kêlî van nirxan dikemirînin. Êdî dibêjim ti

qîmeta van tine ye. Çima? Pir vekiriye, yên di nava partiya me de yan dizin, an jî demogogin. Yên din jî kedkarên gundî yên ji rêzê û hemalin. Na, dubare dubare ji we re dibêjim ku, kesayetê sosyalîst ne wisa ye. Bêguman hûnê bêjin, partî cih an jî avabûnek ku şerê çînî herî zêde lê kûr dibê ye. Raste, pênaseya me ya partiyê wisa ye.

Partî ne cihê, yekbûna sosyalîstên çar bi çare.

Nexasim rewşek weke civak û gelê me ji civakbûnê derketiye, xisletên wê yên çînayetî têk çûne, yan jî derfetek cidî ya pêşketinê nedîtiye û hema bêje di nava partiyê de civakbûnê, siyasîbûnê û çînayetiyê dijî, pir vekiriye dê li vir şer pir dijwar derbas bibe.

Şerek rizgariya netewî û şerê çînayetî nayê meşandin.

Çima? Ji ber ku, binkeftinek çar bi çar heye. Mejî belav bûne, vîn şeht bûne. Di vê manê de şerek li ser bingeha civakî nîne. Ne tenê di civaka Kurd de, di civaka Tirk a îro de, heta di nava hemû civakên Rojhilata Navîn de rewş hinekê wisa ye. Têkoşîn an derbasî nava dewletê bûye, yan jî derbasî nava partiyê bûye. Ji ber ku li cem me dewlet nîne, derbasî nava partiyê bûye. Ji ber ku Tirk jî dewletin, derbasî nava dewletê bûye. Îro têkoşîna çînî ya Tirkiyê, di nava dewletê de yan jî bi hevkariyê tê meşandin. Li cem me jî di nava PKK'ê de tê meşandin.

Niha em baştir fêm dikin ku, ji civata berê ya rêhevalên pak zêdetir, ji ber ku bi giştî bû, hemû endamên şer dikin, me bi nakokî û pêwendiyên wan ve tevlî nava partiyê kirin. Lê divê hûn vê jî pêşî bipejirînin, yê ku ev kar wisa saz kir, rêbertiya rêxistinî bû, rêbertiya min pênaseya wê ji we re kirî ye. Rêbertiya ku xisletên sosyalîstê serwer ê wisa hatî pênasekirine. Dibe ku hûn ji çînên din hatibin. Dibe ku hûn bi pêşdarezên çîna burjuvaziya biçûk, pêşdarezên nîv-feodal, pêşdarazên gundî, hemal û rewşenbîran ve tije hatibin. Jixwe ev destpêkê wisa ye. Lê niha ev bi israr domandin, heta kirina polîtîka, kirina hêz, tê wateya meşandina şerê dizker û demogogan. Ji ber ku partiya me jî vê wisa digire dest, şerê xwe yê navxweyî dijwar kiriye.

Dema sosyalîzm dibe mijara gotinê, divê tiştek din bê servekirin: Mînak, di şerê çînayetî de Stalînê ku xwedî helwesta herî tund jî, ji ber nekarî di nava partiyê de şerek berfireh bimeşîne, hizirî pir

dogmatîk û rêbazên zextê ve pirsgirêkan çareser bike, ji ber xayînên hîn di dema xwe de ava kirî, damezirîneriya sosyalîst a mezin ber bi rûxandinê ve anî. Ne partî, avabûnek hema bêjin ji sêyan yekê cîhanê bi bandor bû, ji ber di nava partiyê de têkoşînek çînî rast nemeşand, dîsa nekarî di nava dewletê de demokrasiya sosyalîst rast pênase bike û pêş bixe, rewşên heyî qewimîn.

PKK navê, ji dîroka vê sosyalîzmê dersên dijwar derxistine.

Em bibin dewlet jî, bêguman dê demokrasiya sosyalîst çêbe.

Beriya dewletê di nava partiyê de têkoşîna çînî, ango demokrasiya li nav partiyê, me heta niha bi hostatiyek mezin ve meşand. Ger me nemeşandiba, yeqîn dikim di vê pêvajoya rûxandina dewletên sosyalîst de, wê PKK yekser birûxiya.

Ger PKK nehilweşiya ye, têkoşîna sosyalîst a di nava xwe de hem girêdayî rêgezan, hem jî esasên taktîka nû ve, ango nûkirina esasên rêxistin û têkoşînê yên rast çavkaniya xwe digire. Ma hûn kêm nûnertiya paşverûtiyê dikin? Na. Yeqîn nakim bi qasî paşverûtiya bi kesayeta Kurd re, di cîhanê de nava ti netewekî de hebe. Hatina her yeke ji we, hema weke hemû torên pêwendiyên paşverû yên sedî salan, heta nabêjim zanebûnek çînayetî ya li gorî xwe jî, di kesayeta kor de mayînê zêdetir, ti xisletek we rave nake.

Ma hûn bi fikrên zelal ve hatine?

Na!

Ma hûn bi zewqa xebatekî tên?

Na!

Hûn di refê û civakê de mane, hişê we belav bûye, vîna we şeht bûye, ancex wisa hatine.

Dema hinekê jî xwe kom dikin, ger bingeha we gundî be burjuvaziya biçûk a gundî, ger ji bajêr bin bi burjuvaziya biçûk a bajêr ve, ger xwedî bermahiyên axatiyê bin, bi ferzkariyên axatî ve, hûn ji bandorên netewa serdestin û ji bilî xisletên wan dayî we tiştek din ferz nakin. Vê jî di radeyek girîng de weke arestebûna serê xwe û ber bi min ve dibînim. Lê belê qet li nexema we ye. Çima ne di xema we de ye? Ji ber ku havêna çîna we, rastiya kesayeta we ji bo we rehete.

Mînak nabêjin; “Dikarim li gorî şêwaza Rêbertiya PKK’ê çi bihizirim, çi bikim, çawa şer bikim, çawa birêxistin bibim û propagandeya çi bikim?” Nexwe wê tu çawa bikî? Dibêje; “Li gorî şêwaza xwe.” Şêwaza te çiye? Şêwazek ji mêj ve bi erdê re bûye yek. Şêwazek ku dijmin di gava yekê de tine kiriye.

Dibêje; “Ji min evqas tê.” Dibe ji te evqas tê, lê ji bo min têrê nake. Ev têrê nake xwe jî rizgar bike. Vaye şerê çînî, ji hêlekê ve jî wisa ye. Şerê li hember ê têrê nakê ye. Hûn têrê nakin. Ji ber ku têrê jî nakin, hûn nûnertiya binkeftinê dikin.

Yê ku we pir zêde xirab dide nasîn jî nîne.

Ji we re tê gotin; ji ber we xwe li gorî lehengiya keda sosyalîzmê, utopya û xebata sosyalîzmê, emperyalîzma demê, faşîzm û mêtîngeriya wî ya di nasnameya Komara Tirk de û şerkeriya taybet a pir zelal ava nekiriye, hûn nûnertiya binkeftinê dikin. Di bin vê de çi heye? Nebesî heye. Nebesiya rêxistinbûnê, nebesiya hewldana wê û nebesiya xeyal heye.

Hûn bi jiyanek hêsan ve têr dibin. Rayeyek hêsan ji bo we dibe serkeftin.

Kesayetek fermandeya PKK’ê ya erzan ji bo we dibe her tişt. Çalekiyek biçûk, nûnertî yan jî serkeftinek biçûk, ji bo we dibe dawiya kar. Ya rastî ev ji bo me, gavên wisa zik jî têr nake. Di rastiya Rêbertiya PKK’ê de, jixwe navê serkeftinên wisa qet nayê gotin.

Her roj sedan serkeftinên min ên wisa hene. Lê nazivirim û li paş xwe jî nanêrim.

Ji xwe re dibêjim; “Ma ev serkeftinin?”

Dibêjim; “Ti carî xwe bi van naxapînim.”

Ji ber ku mezinbûna dijminên min li holê ye. Dijminê min lez pêş dikeve. Dema wisa jî dibe, ezê çawa xwe bi çend serkeftinên biçûk ve bixapînim? Lê xwe binêrin, ma tiştek bi navê pîvan maye? Nebesî di îradeyê de xwe dide der û vîn şeht bûye. Li ser vî bingehî bi we re şer dikim. Şerê ji nebesiyê gihandina têrkariyê ye. Vaye li pey wê heman weke hemû xisletên çînên din, xisletek çînî ya wisa heye.

Cardin dibêjim: Gundî jî kedkarin, hemal jî kedkarin, burjuvaziya biçûk jî kedkarin, axa jî kedkarin, lê belê keda wan têra rizgarkirina welat, civak û azadkirina gel nake.

Dê çawa çêbe?

Li gorî utopyaya sosyalîst çêbe!

Şêwaz û tempoya rastiya Rêbertiya me bi evqas xwîna şehîdan û fedekariya gel a pêş dikevê ve dimeşîne, ancex vê diyar dike. Vaye hûn dikarin kesayeta sosyalîst tenê di çarçoveya vê pênaseyê de, bikin malê xwe û dikarin bêjin; “Ez milîtanek PKK’ê yê rastim.” Ger hûn nekarin vê bikin, hûn çine? Belê, dibe ku hûn milîtanek, şerkerek bin, lê ne milîtanê PKK’ê yê rasteqînin. Heta hûn li dijî wê cîh digirin. An pir duvika wê ne, yan jî pir çep û rastê wê ne. Yan jî weke kesayetek xwe kuştinê li pêş disekinin. Weke hûn jî dibînin ev hemû tengav dikin. Ne serkeftin, ber bi binkeftinê ve dibe. Hûnê di vê manê de xwe rakin-danin û bipîvin.

Hûnê pirsa weke; “Ez di kîjan asta PKK’yîbûnek rasteqîn û milîtaniya PKK’ê de me? Di kîjan asta nasname û kesayetek PKK’ya sosyalîst de me?” jixwe bikin. Gelo pir çepêne, pir rastê ne? Gelo pir li pêşin, an jî pir li paşin? Dema ev bên pênasekirin jî hesaba me ya li gorî dijmin, hesaba me ya li gorî xeyal û utopya û pîvanên me yên xebatê hene. Li hember pirsên; “Gelo pir bi zewq kar dikim? Gelo bi zewqek mezin wate didim hemû xebatên bîrdozî, siyasî, rêxistinî û çalekiyan, xwe jî wisa dixim meriyetê?” dibêjin erê, wê demê hûn milîtanên sosyalîstin, PKK’yiyên rastin û we xwe li gorî pênaseya PKK’ê kiriye milîtan.

Belê, ev kesayet kar dike. Derfetên PKK’ê yên heyî, ji bo vê kesayetê têra sazkirina her cure serkeftinê dike û zêde ye jî. Şertê sereke bûna milîtanê partiyek wisa sosyalîste. Jixwe şertê serkeftinê ya bingehîn jî eve. Şertên din, zêdahiya hejmar, çek, xisleta vê û wê qadê ne, ev hemû jî ziravî ne û nediyarkerin.

Nexwe ger baweriya we li hember doza kedkaran hebe, li hember utopya sosyalîzma ku dê oxira wê de milyonan mirov şehîd ketin em rêzdar bin û bi rastî jî vê rojê weke roja pişgirî, yekîtî û têkoşîna

kedkarên nav-netewî dinirxînin, di şênberiya xwe de bersiva herî rast em bidin, di nava mercên nav-netewî yên rojaneyî de, li qada PKK'ê bi milîtaniyek wisa ve, her ku diçe bi meşa serkeftinek misoger ve, bi berzbûnek nayê astengkirin ve bersiv dayîne. Vaye, ev bersivek bêhempa ye. Kêm jî be ev bersiv hat dayîn, lê em ê hêjî bidin.

Em ê bi gotinên têkçûyî ve vê rojê bibîr neyînin.

Naxwazim bi têgehên sosyalîst ên nava wan vale ve, vê rojê binirxînim. Naxwazim zêde behsa gotina kedkarên erzan bikim.

Heta kerba min li hember kedkarên wisa di bin xizmeta semyana heyî de heye. Nikarim ji kedkarên wisa hez bikim. Ew koleyên demekê xwe dispartin împaratoriya koledariya herî mezin bibîr dixin, ti aliyê van yê bê hezkirin nîne. Kedkar wisa nabin!

Ger kedkar, nekarin xwe weke kedkarên rêz bên girtin, rêzdariya li hember keda xwe bi baweriyek wisa û bûna xwedî utopyek wisa raber nekin, nikarin xwe ji lenetbûnê rizgar bikin. Ger em bi rastiya gelê xwe serbilindin, ne bi lenet, bi şêweyek pak dikişînin ser dika dîrokê, ji ber em hêza bawerî û bi şerê wê ve girêdanbûnê raber dikine.

Bi vê mebestê dikarim bêjim, çi di nava partiyê de ji we tevan re, çi ji bo hemû gelê me û dostên baldar, her çendî di destpêkê de bi tena xwe jî bim, bi salan min bi vê bawerî û xeyalên xwe ve girêdayî jiyîn esas girt. Her wiha ji ber dema hewce dikir ev bi tena serê xwe bi qasî artêşekê zewqa karkirinê, min bi ser her tiştî re digirt, wisa me. Li ser vî bingehî hinek baldar nêz bûm û PKK'yî derketin holê, gelê me derket holê, her roj qat bi qat dost di nava pişgiriyê de cîh digirin. Dibe ku sibe hîn zêdetir be. Wan jî pîroz dikim û bi mebesta vê rojê silav dikim. Ji ber ku yeqîn nakim ji bilî vê ked û kedkar rêzdar bên nirxandin, dibe ku li hember karsazekî rêza min çêbe, lê belê rêza min li hember kedkarek kole çênabe. Neçarim vê jî bêjim.

Çawa ku karsaz, karsazbûna xwe dizane û dike, divê kedkar jî, kedkariya xwe bizane û bike. Dîsa li hember yekîneyên artêşa taybet a mêtînger ku li dijî me şer dikin rêzdarim, lê belê li hember gelê me bi xwe yê ku nikare li dijî wî şerê parastina xwe ya cewherî bimeşîne, xwe birêxistin bike nerêzdarim. Rêzdariya min li hember kedkar û şerkerên herî kêm dikare bi qasî dijminê xwe, artêş û şerê xwe jî bi

aqilmend û serkeftî bimeşînê ye. Misoger Rêbertiya PKK'ê wisa ye, ji bilî vê ne bila kes bê girêdan, ne jî li benda hezkirin û rêzbariyê be.

Cihê kesên kole, binkeftî û wate nedaye hewldana xwe di nava me de nîne. Bila ti carî ji me eleqe neyê payîn. Dê ti carî negihe wê hezkirin, rêzdarî, şeref û serfiraziyê, hêjayî wê nebe. Her wiha em ê ti carî wan bi serfirazî bibîr neyînin.

Nexwe dê bi kî re çêbe? Vaye bi kesên herî kêm bi qasî dijmin jiyanê hêjayî xwe dibîne, vî welatî, vî gelî bi qasî azad bike bikare bijî, dema hewce kir bikare ji bo wê her cure jidilbûnê bi lehengiyek sosyalîstî raber bike, bê ku astengiyan binase bide diyarkirin ku dikare birêve bibe, ew yê herî hêja ye. Divê bibe taca serî. Ger miletek her tim hêjayî hezkirin û rêzgirtinê be, miletek wisa, miletek serfirazî bidest xistiye. Ew milet, miletek pêşenge. Nirxa çîna ku bi navê wê jî pêşengiyê dike, nirxa çîna pêşenge, ger ew partî be, partiyek pêşenge.

Vaye, îro ji her demê zêdetir pêdiviya me bi vê heye. Ev tenê kar û kedê nadin bidestxistin, serfirazî û destê azad derdixe holê. Xeyalên azad ên em dibêjin hêvî û utopya derdixe holê.

Heta ku xeyalên azad hebin, dê destên azad jî hebin, heta ku destên azad hebin, dê destên ku kar dikin hebin, heta ku destên kar dikin hebin, dê kar jî hebe û nan jî hebe.

Qaşo astengî hene, şer hewce dike, ma xebatek ji vê hêjatir heye? Şerek wisa ye, dê van hemû zincîrên dîlgirtinê parçe bike. Nexwe ev kar, karê herî bi zewqe. Hewldanek wisa dibe ku di berdêla yekî de hezar dayînê kedek, hewldanek berhemdare, keda şere û lehengiya wê jî, lehengiya herî mezin a milete. Bi qasî di qada nav-netewî de heyî, di şênberiya xwe de jî me xwest bersivê bidin kedê, kedkaran û di vê manê de hewldanên gelê me. Me di serî de dît ku gelê me, miletek kedkare. Lê belê baş dizanin ji ber ku berovajî keda xwe dikeve, hemû nirxên keda wê ji dest hatiye girtin, xwezayî welatê wê yê ku ked lê tê hilberîn jî ji dest hatiye girtin. Vaye ji ber vê me şerek welatparêzî ya mezin hewce dît û ji bo nirxên kedê bibe yên wê bi xwe, weke miletek azad, xwe pêkanînek teqez esas girt. Ji bo vê jî pêşî pêwîstî bi partiya ku vê bidest bixe, milîtanek ku partiyekê bidest bixe, milîtanek

sosyalîst heye û dê giraniya herî mezin jî ji vê re bê dayîn. Dema ev erk para me ket, me got mîsyon û rolek dîrokî ya bêhempa ye û pejirand. Me got balkêşiyek wê ya bêhempa heye û ketin bin bandora wê. Her wiha hewldana wê jî pir berhemdare, bi şêwaz û tempoyek bêhempa ve me dest bi kar kir. Encam, vale neçû û dibe ku di dîrokê de ya herî zêde serfiraz dike, pak dike û heta ne tenê hêviyê, me şerek ku rizgariyê jî bi xwe re tîne û her tiştê xwe ji nû ve biafirînin dît. Tiştek ji vê hêjatir nabe.

Vaye, ev sosyalîzme!

Belê, ev jî di roja me de cardin doza kedkar bi zanebûna berjewendiyên xwe û di yekbûnê di partiyê de ava dikine. Weke ku dê ti doz bi qasî vê berz nebin, encamên serkeftî jî nagirin. Li ser vî bingehî hemû kedkar, gelên qada nav-netewî, her çendî hinekê hatibin tarîkirin jî, ber bi rojên îro ve bi qasî rojên wan wisa bi utopyek sosyalîstî ya bawerî ve pêş dixe, bi zewqa xebatek sosyalîstî ve jî yekîtî û pişgiriya wê, têkoşîna wê ya serfiraz silav dikim.

Em ê di nava partiya xwe de ti carî vê qirêj nekin. Her dayîm şopdarê bîrdoziyek sosyalîst a me wisa ber bi serkeftinê ve dibe, hemû polîtîka, rêxistinbûn û xeta leşkerî ya ku çavkaniya xwe ji wê digire û di şer de ber bi serkeftin û zaferê ve dibe ne. Serkeftinên me yên heta niha, tenê di nirxa destpêkê de ne. Bi mebesta vê rojê carek din dibêjin, dê şerên herî watedar û serkeftî ji vir û şûn de pêş bikevin.

Di serî de PKK'ya sosyalîst û fermandar û şervanên di qada wê ya şer de, dîsa PKK'yiyên sosyalîst ên lehengî li zindanan li ber xwe didin, sempatîzanên wan û hemû gelê me yê ku me dişopîne, bi mebesta vê rojê yeqîn dikim me bersiva herî rast daye. Li ser vî bingehî her dayîm serkeftinê hêvî dikim û silav dikim.

**"Kesê ku ancex bikare tiştekê ji xwe bide dewlemende."**

**Karl Marks**

## Baweriya Min Bi Mirov Û Mirovê Herî Baş Heye

### "Zilamê Kevnar Dikujim"

PKK rastî bi xwe ye. Heta mijara PKK'ê neyê fêmkirin, mijara rizgariya netewî ya Kurd jî nayê fêmkirin. Ev jî neyê fêmkirin, dê mijara bêçareserî be û ger hebe jî çareseriyek dê ew jî neyê fêmkirin.

Feydeye ku PKK bê lêkolînkirin. Mijara PKK'ê weke gelekan pênase kirî zêdetir, hewce dike mirov bêje PKK'yîbûnek pir cuda yan jî diyardeyek PKK'ê heye. Heta behsa PKK'yîbûnek, ku gelek PKK'yî nas dikin cudatir dikim. Ango PKK li aliyekê ya herî zehmet hatî fêmkirin û di radeyek girîng de jî nehatî fêmkirine. Nexasim çepên Tirk û rewşenbîrên Tirk, heta polîtîkvanên Tirk yeqîn nakim hinekê jî PKK fêm kiribin. Dibe ku derdorên îstîxbaratê bi awayek objektîf hinekê fêm dikin û encamê derdixin. Lê mixabin mirov nikare heman rewşê ji bo rewşenbîran û heta sosyalîstan bêje.

Yên niha pir baş min fêm dikin, hêzên îstîxbaratê ne.

Dikare bi wan re baş bê nîqaşkirin û em dikarin hinek çareseriyan jî pêş bixin. Dibe ku hinek leşkerên serê wan dişixule jî tevlî vê mijarê bibin. Lê mixabin her ku mirov ber bi derdorên sivîl, rewşenbîr, nexasim sosyalîst, çepgir ve diçe, bêfêhmatî hîn zêdetir kûre û weke înkarkirinê derdikeve pêşberî me.

Nabe ku PKK weke tevgerek dihizirin an jî danîne holê tevgerek sosyalîst be. Tevgerek cuda ye.

Îstîxbarat û leşker, ji ber qanûnên şer û neçarin bûyer û diyardeya ku pê re şer dikin baş binasin. Fesad jî ji ber şer nakin, her tiştî bi gotinên gelemperî û têgehên fesadî ve kar îdare dikin. Nirxandinek rasteqîn nayê kirin. Vê jî weke kêmasiyek mezin dibînim. Nabêjim, pesnê me bidin, berovajî rakin li erdê bidin. Lê giranî û resentiya wê danin holê, wisa vê bikin. Hewce dibînim van ji rewşenbîr, şoreşger, sosyalîst, heta Îslamparêzan re jî vebêjim. Qet nebê bi qasî endamên şerê taybet ên beramberî me, hewl bidin me fêm bikin.

Dê çima rewşenbîr, zanyar, heta sosyalîst û şoreşger jî bi qasî komên îstîxbaratê me nas nekin? Qaşo ew jî dibêjin di nava têkoşînê de ne.

PKK'yî nizanin fêr bibin. Lewra di nava PKK'ê de şerek sinir ê mezin dimeşînim. PKK'yî li hember kî şer dikin? Gelo dizanin şer bikin? Ev zelal nebûye! Bi gelemperî ne di nava xeta PKK'ê de, di radeyek girîng de û objektîf li dijî PKK'ê xetek şer tê meşandin. Bûyerek seyre!

Em dikarin hîn zêde berfireh bikin. Ya rastî ji sedî notê PKK'ê ne bi navê PKK'ê, li hember PKK'ê şer dikin. Niha jî tevî vê, rastiyek PKK'ê ya ku şer dike heye. Ev jî seyre! Niha Tirkiye jî li ser vê polîtîka saz dike. Zagona li xwe mikurhatinan derdixe, zagona jovaniyê derdixe. Her yek ji wan maseyek PKK'ê heye. Her wiha her kes dibêje tine bû, kêmek maye tine bibe, rûxiya-ber rûxînê ye. Lê belê hêjî li gorî gotinên Emerîkiyan; "Di cîhanê de rêxistina gêrîla ya herî mezin an jî rêxistina herî xeternak a Marksîstê ortodokse." Divê em nirxandinên CIA (Teşkîlata Îstîxbarata Navendî) cidî bigirin.

Hinek rêxistinên çep ên Tirk jî dibêjin; "Netewperestin, netewperestên burjuvaziya biçûkin." Ne Emerîkiyan tam pênase kirine, ne jî çepên Tirkiye rêjeyek mezin ev fêm kirine. Ne jî yên me dizanin ew bi xwe çine.

Niha tiştên ku li vir dikim danim holê, yeqîn dikim dê ji bo pênaseya PKK'ê amûrên baş bin. Ev şer li gorî min hêj ez li gund, deh salî şerek civakî bû, li dijî hinek kevneşopiyên feodal bû. Paşê, dema min gava yekem avêt bajêr, bû şerek civakî ya hîn zêdetir xwedî derdorek berfireh. Çima? Ne min yekbûnek bi darezên nirxên civaka gund re pêk anî, ne jî yekbûnek bi darezên nirxên burjuvaya bajêr re pêk anî. Dema bi dewletê re rûbirû hatim jî, yekbûnek bi dewletê re jî pêk ne anî. Jixwe ev qonax, hîn nebibûn demên ku min ji bo PKK'ê gav avêtîn.

Ger hûn dixwazin fêm bikin, ji bo xwe û min muqayese bikin, hinek serbendan didim. Nebûm gundiyek baş. Nebûm gundiyek aqilmend jî. Jixwe wê demê gundiyên me ev digot; "Bila xwedê kesekî nekê mîna kurê filankes, ji rê derketiye, nizanim kurê wî dîne."

Pênaseya min ev bû. Jixwe dema derbasî civaka burjuva bûm, bêçare bûm. Kesekî bi min re sîûda jiyanê nedidît.

Li gorî çi?

Yeqîn dikim yek li gorî quralên civaka gund bû, ya din jî li gorî quralên civaka burjuva bû.

Dema pêwendiya bi çepê Tirk re jî heman tişt derbasdar bûn. Pir vekirî bû ezê qet nebim çepgirek li gorî wan pîvanan. Aliyê vê yê seyr jî, ne tenê beriya PKK'ê û heta di nava refên çepgir de, di tevahî dîroka PKK'ê de jî rewş nayê guhertin. Partî rêxistineke, komîteya navendî, nivîsgeha polîtîk, sekreter û endamên wê yên jêr hene. Niha ev mijar jî zêde di nava me de pêş nakeve. Nêzîkbûna; "Ez zêde nikarim rêxistinê pêk bînim, nikarim navendê bikim. Nikarim polîtîkayê bi şêweyek berfireh bimeşînim" hene. Ev jî nakokiyeke. Lê tevî vê, mijarek PKK'ê ya mezin heye. Ev çawa pêk hat? Niha dewletên emperyalîst, ji PKK'ê ditirsin. Ji ber ku ditirsin, wisa êrîşên bê wate û bi hêrsa ji tirsê çêdibe dikin.

Niha di vê wateyê de pir aciz dibim ku xwe weke kes, kesê diafirîne, rêberê mezin, şef binav bikim. Lê nizanim xisletek an jî fêrbûnek min e, divê ew jî teqez bê fêmkirin, daku hûn bikarin rewşên diqewimin fêm bikin.

Her kesî pir bêhêz dibînim. Di şêwaza jiyana wan de bêhêz dibînim. Şêwaza zaroka di hemêzan de mezin dibe ye. Zarokê du caran rake-dane. Ramûse, nizanim bixe vira xwe. Li gorî min kesayet di radeyek mezin de darbe xwariye. Heta dema nakokiya malbatê berçav digirim, hestek bi min re pêş ket. Min got, xweziya ne ji vê malbatê bûma!

Paşê di mijara Kurdewariyê de min got; xweziya ne ji vê netewê bûma.

Heta ne ji vê çînê û civakbûnê bim. Paşê jî min got, ne ji vê dewletê bim. Ya rastî hestên wisa hene. Ango redkirinek heye. Pir balkêşe! Weke her kes hez dike nehezkirin, weke her kes dijî nejiyîn, weke her kes dihizire nehizirîn. Weke tê xwarin û vexwarin, nexwarin û nevexwarin. Di hemûyan de jî mijara redê, di radeya nexweşî de pêş

dikeve. Her kes duaya xwe wisa dixwîne, nimêja xwe wisa dike. Ew jî ji bo min pirsgirêkek mezin bû.
Li gorî kevneşopiyan dihat gotin; “Em keç û kurê xwe wisa bidin.” Ev ji bo min bûyerek hîn balkêştir bû. Na, wisa nabe!

Vaye sosyalîzm:

Tê gotin; “Sosyalîzm wisa ye. Teorî û pratîka wê jî wisa tê destnîşankirin!” Na, wisa nayê danîn! Her tim cewaz û dijbere! Niha dê ev rewş min ber bi ku ve biriba? Belê! Ev derdeke û tenêbûneke. Dibe ku dînbûnek be.

Kesek min hewl dida bi terbiye bim. Şiyar û baldar bûm. Ji berê ve ji bo min rêgezek bû ku, bê wate pêlî parçeyek nebatê jî nekim. Ji destpêkê ve li hember her tiştî baldariyek mezin heye. Lê tevî vê, evqasî dijberbûn! Niha dê paşê baştir bê fêmkirin, ango bi van tenê hevsengiya xwe dibînim. Li ser lingê xwe disekinim. Xwe radikimdatînim û dipîvim.

Tiştek ne li gorî ez dixwazime. Hîs û hestên min, diyar dikin ev ne wisa ye.

Ya baş gengaze, yên heyî jî li gorî vê xirabin. Rewşek hîskirinê heye. Tu li kur binêrî, teqez ez li gorî vê têgeha dualî dihizirim. Ya ji vê baştir hebû û ya li naverastê jî ya herî xirabe. Ya heyî şaşe û girêdane. Girêdana zû kes tine dike. Di derûniyê de jî wisa ye.

Di heman demê de Freudparêzek başim.

Niha min ev rêbaz pir baş pêş xistiye. Yên di hemêza dayîka xwe de, hişk hemêz dikin, dibin xweperest. Her wiha her tim dixwaze bi hêzên derve, li ser lingan bimîne. Ji ber her tim li dayîkê digere, dixwaze xwe bispêre dayîkê. Jixwe ew zarok qediya û carek din jî bi ser xwe ve naye. Mînak şêwaza hezkirinê!

Li jin û mêr gerîn. Niha ev jî girêdanek xirabe. Ya rastî koletî ye. Dema ket hundur, êdî dernakeve. Jixwe ya dimîne jî civak temam dike. Weke din jî civaka burjuva, civaka feodal û dema dor tê dewletê jixwe tinebûne. Dema mirovê Kurd, mirovê Tirk, heta mirovê Rojhilata Navîn li dijî dewletê çavên xwe rakir, ew bêçareyeke. Ji bilî destê xwe li ber veke, tiştek ji dest naye.

Ji ber hêj beriya bigihe dewletê, ew qediya ye. Li gorî min hêj dema gund bûye, yan jî stargeha malbatê de bûye, tine bûye. Şerê wê jî nîne.

Kesê şerê wî nebe, kesayeta wî jî nabe.

Ji bo mirov bibe şerker, wê tu destpêkê ne ecibînî, ango red bikî.

Dê tu bixî serê xwe hinek tiştan hilweşînî, hinek tişta jî bikî.

Ger tu xwe biecibînî, wê tu şerê çi bimeşînî? Dema te malbat û civak eciband, pêwîstiya şerkirinê ji holê radibe. Wê tu di bin navê şerkirinê de, bi lîstokan ve mijûl bibî. Heman weke di kemalîzmê de rû dide.

Ev di heman demê de dibin şêweyên bêşer a herî xirab. Bêşerbûn, rizîne, vaye weke lihev dikevin. Li Tirkiyê dûjîn û şerên nerast pirin. Hunera şerkertiyek rasteqîn nîne. Şerkertiya gel, şerkertiya sosyalîzmê tine ye. Bingehên vê yên dîrokî hene.

Şerê civakê nîne.

Çi heye? Dek û dolap! Dema li cihekê rastî nebin, derew derdikevin. Vaye li Tirkiyê dûjîn pir berfirehin. Ji ber ku şerê rasteqîn nîne, dûjîn tên kirin. Yekîtiyên ehbap-çawîşî pirin. Çima? Ji ber rêxistinek li gorî rêgez saz nekirine. Niha ev di nava me de jî di asta karesatê de ye. Jiyana li gorî teoriyê nîne. Di encamê de ev jî hejartiya ji şerê gel, şerê civak, heta şerê çîn û sosyalîzmê derdixe holê. Niha rewşa min bi van tevan re binakoke. Mezinbûn an jî cewaziya min di vir de ye.

Li gorî min, di mercên wisa de nayê jiyîn!

Bê şer nayê jiyîn!

Lê belê dîlaweriya wisa di bin navê şerkirinê de jî, şerme. Şerme ku mirov bê rêgez be.

Ya rastî pirsgirêkek xislet û exlaqê ye. Fikra min nebê jî, exlaqê min heye. Divê mirov wisa ne bê kesayet bin. Hevdu dixapînin. Min jî ev zû eşkere kirin. Ji malbata xwe dizanim. Dê û bav belengazin. Berovajî bêriyên zarokek heft salî jî dikevin. Çima ezê zêde baweriya xwe bi van bînim? Ji mirinê re amade dikin. Ne jidilin û newêrekin. Ji

ber ku bi her cure şaşiyan re dibin yek. Nexwe ezê çima weke wan bim. Dikarim weke vê gelek xisletên derûnî jî rave bikim.

Dixwazim vê bêjim: Bêşeriya giştî di nava civakê de, şûna wê şerkertiyek sexte heye. Rêgez tine, rêxistina wê tine.

Hz. Muhemed ji şerê êş û şerê nefsê re dibêje; “Cîhad-i Ekber.” Ango şerê biçûk, şerê di van eniyan de tê kirine. Şerê herî mezin jî li hember cewhera xwe, şerê dimeşînine. Her wiha hinek kesayetên Îslamê yên mezin wisa derxistin holê. Ewliya, fermandar û rêber hinekê jî wisa ne.

Di dîroka ewliya de mînakên vê pirin. Dîroka Pîr’an bi mînakên vê ve dagirtiye. Yê dixwaze dikare di pirtûkan de sedan bibîne. Niha di nêvenga Tirkiyê de ev hat tinekirin. Şêwaza mezinbûnê karesate! Serdestiya Komara Tirk a bîrdozî, di radeyek tirsnak de kes dixe. Dîsa ew malbat û civaka sivîl a bandor dike, ew jî weke siya dewletê ne, şopdarên wî ne û mirov zêdetir şeht dikin. Çepê Tirk ne eciband. Gelo çi dieciband? Lêgerîna wî çawa bû? Kûr nebû. Dibe ku feodalîzmê jî xwest mînakekê peyda bike, vaye herî dawî nizanim kapîtalîzma Rojava ji bo wan modelek başe. Dibe ku ger tiştek din a nû derbikeve, çav li wê jî bikin. Niha di vir de dîsa xwe nedîtin heye.

Di şêwaza min de taklîd nîne. Wê tu pêkanînê, di nava xwe de pêk bînî û xwe bibînî.

Neçare şerê te yê navxweyî dijwar be. Li gorî min hesabxwestin û pevçûnên we yên hundurîn pir lewazin. Yek milîtanê me naxwaze li ser pratîka xwe bihizire. Ditirse! Niha li kesayetên ku em lêpirsîna wan dikin dinêrim, tim vê dibêjin; “Yê min hez neke, PKK’ê hez nake. Yê ji min hez bike, dê PKK’ê jî hez bike. Yê ji min hez bike, dê gel jî hez bike. Yê ji min hez bike, dê mirov jî hez bike. Ez her tiştim.” Şerek hundurîn û şerek sosyalîst nîne. Di nava xwe de zêde qure bûye. Her ku mezin dibe, kariyer jî qure dibe. Xwe pir diecibîne.

Niha ez dibêjim tam, nebûme zilam. Ti aliyê min ê bişibe zilam nîne. Di wateya hûn fêm dikin de, nebûme zilam. Niha jî muqayesa vê pir baş dikim. Ji bilî vê rêyek me ya din nîne, em zilamê sexte bin bixin. Camêr, çar bi çar zilamtiyê ferz dike. Niha ez zilamtiyê baş dizanim. Di nav de dîktatorî heye, gelek kirêtî heye.

Zilamtiyê şîrove dikim.

Zilam dikujim.

Ya rastî hewce dikir ev rêgezek bingehîn a sosyalîzmê bûya. Kuştina zilam, kuştina desthilatî ye. Kuştina serdestiya yek alî û newekheviyê ye. Li wir jî kuştina nexweşbîniyê ye. Heta her ku diçe kuştina faşîzmê, dîktatorî û destpotîzmê ye.

Vaye çima keç tevlî refên me dibin? Çima tên? Ji ber ku min hinekê ev zilamtî derbas kiriye, lewra tên. Ev pir vekiriye.

Zilamê kevnar bin dikeve.

Ev jî weke di rastiya Zeynep Kinaci'yan de derketî holê, rê ji girêdanek mezin û lehengiyek mezin re vedike. Ya ku ew ber bi bûyerek wisa ve bir, zilamtiya ku me bin xistiye. Niha ev aliyek vî karî ye. Ez dibêjim, çima nebûm fermandarek weke wan? Ti halê min ê fermandariyê bike nîne. Niha xwe ber baya fermandariyek wisa ve berdaye, yê ku bikuje dikuje, yê ku bihêle dihêle, girtin û berdan di destê wî de ye. Ji bo rawestandina wî, neçarim ku xwe danim holê, bi zorê jî be kesek hewl didim xwe li hember xeta leşkerî li ser piyan bigirime.

Hewl didim kemalîzmê pir baş dahûrînim. Ez yên ku weke kemalîzmê sexte mezin bibin asteng dikim. Dibêjim; "Ax heval, ez nebûm zilamê yekem, wê tu çawa bibî zilamê duyem?" Ne xerîbê van helwestame. Xeyalên hemûyan vale derdikeve. Dibêjin; "Tu çawa wisa dibêjî, me evqas hêz bidest xistiye, evqas zanebûn bidest xistiye, evqas çalekiyên leşkerî lidar xistin, evqasî bihêz bûn, tu hêjî rola zilamtiyê nalîzî, ma rêbertiyek wisa dibe?" Ez dibêjim; "Belê, ez rêberek wisa me." Meqanîzmaya min wisa ye. Nexwe dê weke gelek caran li Rojhilata Navîn derketî holê yan dîktatorî û qelleştî, ango bê ku çîna hev nas bikin dê hevdu tasfiye bikin.

Li vir ev derdikeve holê: Îdarekirina yekîtîxwaziya min girêdayî çiye? Helwestek bêhempa ya yekîtîxwazî ye. Ji aliyekê ve wan tehrîkî şer dikim, ji aliyê din ve jî aresteyî kamilbûn, aheng, xwerûbûn û armanc dikim. Bal bidinê helwestek pir tehrîk dike û serhildêrî ye. Xisletek din a Rêbertiyê, pir dilnizme.

Gelo dikarim bibim zilam? Hêjî wisa me. Vê di nava xwe de jî pêk tînim. Ji ber ku min ser xist, nav û şanê min derket jî, xwe têr nabînim. Nexwe dê ev hest min tine bike. Kerba min li hember vê heye.

Pêwendiya di navbera zayendan de; bêguman xebata ku sosyalîzm piştî vê û herî zêde ezê li ser rawestime. Heta yeqîn dikim dê sedsala 21. bibe sedsala ku, herî zêde pêwendiyên di navbera zayendan de hatî vesazkirine. Weke ku şoreşa dijber a yekem di qada cînseltî de hatiye kirin, şoreşa herî mezin û dawî jî, dê pêwendiya zayendan de pêk bê. Encamek din ez gihiştimê, pêwendiya di navbera zayendan de weke tê zanîn zêdetir, xwedî xisletek tevlîhev, mêtîngirî, zextê vedişêre û bi gelemperî dike. Heta ji nakokiya çînan û nav-netewî zêdetir xeterî di nava pêwendiyên zayendan de veşartiye. Her wiha pir giştî ye. Bi qasî mirov bêje kes nemaya, mirov ji vê re bûne amûr. Nexwe dema pêş qada ku herî zêde li ser xebatên azadkirinê, pêşketinên şoreşgerî û vesazî bên meşandin, qada pêwendiya di navbera zayendan de ye.

Evqas ji ol zêdetir weke tabuyekê tê hizirîn. Hewce dike mirov bi ser vê de biçe. Di nav xebatên min bi xwe de, xalek girîng ku li ser radiwestim eve. Bi ol ve jî mijûl bûm, lê bi qasî lêhûrbûna xwe ya li ser pêwendiyên zayendan tengav nebûm. Cahiltî di asta herî pêşde ye. Dîsa di radeyek bilind de li vê qadê gef li jiyanê tê xwarin û tê kirêtkirin. Ya herî girîng jî aramî û hêza jiyana civakê, girêdayî vesazbûna van pêwendiyane.

Di tevahî dîroka civaka çînayetî de, her hêza mêtînger hinekê zayend jî mêtiye û çewsandiye. Li vir ji çînekê wêdetir, em bi nakokiyekê re rûbirû ne. Her wiha ger xisletên xwezayî û cewaziya di navbera zayendan de jî bê servekirin, xirab bikaranîna van –hem ji aliyê zilam, hem ji aliyê jinê ve- bibe mijara gotinê, yeqîn dikim bi qasî nakokiya herî bingehîn a civakê, ewqas jî weke nakokiya yekemîn û herî berfireh derdikeve pêşberî me. Her çîna hatî, tevkariyek ji vê re kiriye. Koletî hinekê, feodalî hinekê, kapîtalîzm hinekê mêtiye û emperyalîzmê bi şêwazek hîn cudatir mêtîngerî kûr kiriye. Her wiha berdewamiyek wê ya wisa heye, negengaze ku mirov netirse. Yek ji aliyê min ê herî bi aqil, li hember vê xwe parastina min

ve hat fêmkirin. Jixwe jin ji mêj ve jinbûnê derketiye. Zilam jî çi şêwe zilam be, rewşek ku zêde nas nakime. Li gorî min her du alî jî di bin îşkencê de ne.

Min di vê mijarê de hinekê xwe azad kiriye. Her wiha rizgar kiriye. Ez azadiya xwe bi qasî tiştekê re neguherim hêja dibînim. Di wateya kevnar de bi çavek zilamtî li xwe nanêrim. Ger hûn di rewşa min de bûna, we li ber xwe nedida. Ji ber zilamtiya xwe qetiyen we nedikariya li ber xwe bidin. Jiyanek pir zehmete. Lê belê ji bo min, jiyanek şoreşgerî ya pir hêja ye.

Hêjî ji bo min pêwendiya bi jinê re, lêgerîna jinê pirsgirêk û hewldanek cidî ye. Li hember jinê xeteriya bûna zilamek kevnar, ji bo min pir girînge. Her tim li ser helwest û fikir dihilberînim.

Bi qasî naskirina civakê bi xwe, neçarim kesan jî binasim. Dîsa neçarim girêdana wê bi siyasetê re saz bikim.

Mijarek hesase: Ya herî girîng jî bûye pirsgirêkek herî bingehîn a civakê. Mînak pirsgirêka şêniyan, bi serê xwe pirsgirêka civakê ye. Hilberîn û ax têrê nake, lewra di vê mijarê de misoger pêdivî bi çareseriyan heye.

Weke din jî nehezkirin jî di astek pêş de ye. Zayend pir hêsan xerîbî hev dikevin. Ev jî di radeyek berz de wesfa jiyanê dixe. Li gorî min ev jî xeteriyek pir cidî ye. Di vê mijarê de pêdivî bi exlaqek nû heye. Xirabûnek tirsnak heye. Ya herî girîng jî nejiyîn tê jiyîn. Biyanîbûnek mezin heye. Di van xalan de hêj gelek gavên ku sosyalîzm bavêje hene. Di vê mijarê de pêwîste hîn zêdetir giranî ji afirandina mirovê sosyalîst re bê dayîn.

Pirsgirêka cînseltî, ji aliyê mamosteyan ve jî pirsgirêkek herî zêde hatî paşguhkirine. Feraseta Marks û têkîliya wî, misoger têkîliyek di çarçoveya sînorên burjuva de bû. Bi hezkirin û evîna xwe ve ew derbas nekiriye. Stalîn beramber jinê, tam feodaleke. Lenîn jî di vê mijarê de burjuvayek biçûke.

Pirsgirêka cînseltî weke mijarek civakê nenirxandine. Jixweber negirtine dest. Lê belê niha her tişt ji bo me diyar dike ku, ev mijar wisa jixweber nayê destgirtin. Heta ku pirsgirêka zayend neyê

çareserkirin, pirsgirêka siyasî çareser nabe, demokrasiya civakî çareser nabe. Ger tu nekarî bi zayenda beramber re yan jî pêwendiyên xwe yên bi zayenda ku pê re di nava jiyanê de yî û hemfikrî vesaz bikî, gelo dikarî kîjan demokrasiyê vesaz bikî. Tu dikarî kîjan demokrasiya siyasî pêş bixî?

Zilamê ku jinekê di bin serdestiya xwe de digire, nabe demokrat.

Xalên di pêwendiyan de, yan girêdayî xerîzeya çors pêş dikeve yan jî girêdayî bîrdoziya malbatperestî pêş dikeve. Vaye her kes zewiciye, ez jî bizewicim. Li gorî min ji sedî not li ser vî bingehî pêş dikeve. Tenê ji bo kevneşopiyeke. Vêca xerîzeyê jî têkil vê bike, ji sedî not û neh, têkîliya di navbera zayendan de wisa derketiye holê.

Ev pirsgirêkek mezine û wê dema pêş dijwartir be. Ji hev cihebûn, dev ji hev berdan, nexwestina bûna xwedî zarok, di astek pêş de ye. Niha li Rusya û welatên sosyalîzma pêkhatî lê pêş ketî, xirabûnek mezin tê jiyîn. Nexwe ev li ser vê pirsgirêkê hatiye girtin û çewsandin.

Hêj jinê pênaseya xwe nedîtiye.

Hêj jina ku tine bûyî, pêk nehatiye. Çawa hêj mirovê sosyalîst pêk nehatiye, jina sosyalîst jî pêk nehatiye. Navê jinê heye, lê ew bi xwe nîne. Yan jî şêweya wê ya çors heye, ew bi xwe nîne. Cînseltiyek çors heye, dîsa ew bi xwe nîne. Ango gelek gavên ku bên avêtin hene. Avakirina kesayeta sosyalîst çiqas zehmet be, pêşxistina jina sosyalîst, têkîliyên jin û zilamê sosyalîst jî ewqasî zehmete. Ji ber ku tabu heye, her kes di vê mijarê de hir cahile. Li vir kevneşopî û xerîze pir serdeste. Ev jî pir xetere.

Jin her tim nêzî çîn, netew û kesê bindeste. Ango nabê ku ji vê pergala hatî avakirin berpirs bê dîtin. Sedema wê jî pir vekiriye. Ji ber ku ev vesazbûn di bin însiyatîfa zilam de hatine pêşxistin. Jin heta dawî bêxêr û li kêleka kar hatiye hiştin. Lewra mêtîngerî ji holê rakirin, pêşketina aşitî, di derbarê pergalên hêjayî jiyînê de jin, bi şoreşê re eleqedare û dê zayîna wê jî li ser vî bingehî pêk were.

Di nêvenga aşitiyê de, di nêvenga jiyana hîn zêdetir dewlemendkirinê de, jin dikare pêşbikeve. Lê belê di nêvengên şer de, zilam xurt dibe û pêş dikeve.

Ji ber ku yê zilam dike zilam, şer bi xwe ye. Ev di heman demê de rewşek cinawirtiya xeter rave dike. Sosyalîzmê çiqasî zor ji holê ranekiribe, ji hêla jinê ve jî pêwîste, di kesayeta zilam de zora ku şênber bûye ji holê bê rakirin. Dema pergala sosyalîst hat sazkirin, di heman demê de wê zora ku bi navenda zilam ve girêdayî jî bê derbaskirin. Dê ev jî çibe, di heman demê de derbasbûna ber bi kesên azad ve herikbûn be. Derbasbûna kesê azad, di heman demê de, dê bibe xwe azadkirina jinê jî. Niha ya rastî di vê qonaxê de çiqas bi wêjeya sewdaweriyê ve bikevin nava vî karî bila be, zêde gavek ku jin bavêje nîne. Her wiha tu çiqas biçewsînî bila be, tu nikarî malbat ewqas baş jî ava bikî. Herdu jî pir xeterin. Zilam çiqas li ser jinê xwedî gotin û namûsê be bila be, ev jî diyar dike ku, di vî karî de jî tiştek veşartî heye. Ji ber ku herdu jî ne bi tenduristî ne, ev têgeh pir kirine tabu û perestî. Lewra hewce dike nêvenga xwezayî bê girtin.

Ji ber vê ezê cardin xwe bispêrim teza mirovê sosyalîst. Mirovê sosyalîst, mirovê ji xwe bawere. Mirovê sosyalîst jêhatiye. Mirovê sosyalîst bedewe. Dev ji mirovê sosyalîst nayê berdan. Di têkîliyên jin û zilam de jî, ev hewce ne. Dema têkîlî bi zext û zorê pêk hat, misoger dê xirabûn pêş bikeve. Ger mirovê sosyalîst bê afirandin, wê demê dê tu pêwendiya bedew jî biafirînî.

Bila her kes yekser ne li benda pêwendiya azad be. Heta bila nehizire ku kesek pir bêhempa ye. Hêj ez bi xwe di van mijaran de nikarim bibim zilamê kevnar. Hewl didim bibim sosyalîst, lê belê ev jî di nêvenga heyî de zehmete. Lê dîsa jî ev hewldan bi xwe çoşek mezin dide min. Her wiha ji zilamê herî zêde ji xwe razî wêdetir xurtim û bi qasî bikarim hemû jinan bandor bikim, min dike xwedî îdîa.

Ya rastî her ku mirov azad dibe, hîn wêrektir paşverûtiya xwe dibîne. Li gorî min ê azad nebe, paşverûtiyê jî nabîne. Nikare cidî be û kamil be. Lewra nikare bibe çavkaniya hezkirin û rêzdariyê. Ji ber ku hinekê asta azadiyê pêş ketiye, ji bo min ev pêwendî baştir tê fêmkirin. Teoriyê dihilberînim û ji xwe jî pir bawerim. Em ji fêmkirina derûniya şerkerekî bigirin heta fêmkirina qral. Xwe sipartina

pêwendiyê ve, dikarim vê baştir dahûrînim. Ya herî girîng jî, hinekê jî li gorî vê pêwendiyê xwe serbixwe dikim. Vê jî hêzek bêhempa da min.

Niha ti artêşê, bi vî şêweyî jin û zilam ne anîne cem hev. Çi li gorî feraseta kevneşop, çi jî li gorî quralên şer û artêşa nûjen, divê ne wisa be. Lê çêbû. Hemû hevalên me wer dihizirin ku ev hemû ji dervî pergalê jixweber pêş ketine yan jî gelek xwe dixapînin.

Pergalek min ava kirî heye. Di nava vê pergalê de ya tê rûxandin çiye? Her tişte. Ezmûnek berz û şerê egîdiyek mezine. Dê ev jî heta şerê bedewbûnê biçe.

Rewşa min cuda ye. Ez ne ji wan cureyên zilamên hûn nas dikine. Hûn nikarin bi qasî min cînseltiyê dahûrînin û bi qasî min jinê binirxînin.

Çil salin li ser lêhûr dibim. Li gorî min jin û zilam beramberî hev her yek weke belengazekê ye. Dibêjim; “Gelo hûn dikarin li hev binêrin?” Bê ku şerim bike û bifehma li hev nêrîn pir girînge. Bi fêmkirinê li hev nêrîn, hîn girîngtire. Lê mixabin ev tine ye.

Nexasim kes naxwaze yeqîn bike, bi jinê re aliyek pir girîng heye. Hebe jî xerîze û serdestiya wê ye, ev jî pir xetere. Ev jî bi şêweyek yek alî ye. Teorî jî derxistiye, mafe, raye ye û kevneşopiye. Heta xisleta herî bingehîn a dij-demokratbûnê neyê şikandin, zilam nayê demokratkirin. Ger tu nekarî rêgeza demokrasiyê bi zilam re pêş bixî, tê wateya tu îxanetê li demokrasiyê dikî.

Ger em bikarin vê pêwendiyê evqasî hêja pêş bixin, misoger yekîtiyê jî li gorî vê rêgezê saz bikin, ma wê nebe hêzek bêhempa? Di derbaskirina hemû şaşiyan de, dê nebe gavek mezin? Ma dê nebe zemîna herî saxlem a demokrasiya hevgirtî? Ma dê pêwendiya jin û zilam jî nebe zemîna vê malbatê û her wiha nebe gava bingehîn ber bi aştiyê ve diçe? Nexwe pêwendî evqasî girîngin. Lê niha yê me bê amadekarî ye. Ji keç û xort re jî dibêjim; ger pêwendiyên we yên li ser bingeha rast bibînim, ezê di astek berz de we pîroz bikim.

Di civakê de tawane ku keç bê destûr gavê bavêje ber devê derî. Lê belê di nava me de li serê çiyan hatine astek ku bikarin li kêleka hev razin. Dibêjin; “Tu berx û gur bi hev re didî jiyîn.” Ev fişalin.

Vaye rastiya şer li holê ye. Ji hêla jin û zilam ve nakokiyeke. Ne nakokiyek wisa çavkaniya xwe ji xisleta zayend an jî xwezayî digire. Niha zanist jî her ku diçe eşkere dike. Pêwîste em vê nakokiyê derbixin hole.

Her şer zehmete. Şerê mêtîngerî zehmete. Şerê li dijî axatiyê zehmete. Şerê di têkîliyên jin û zilam de zehmete. Jixwe yên dibêjin; "Hêsane", vaye vê rewşa kevnar derdixin holê. Çima têkîlî di rojekê de ber bi xirabûnê ve dibe? Çima kirêtî heta noqê ne? Îxanet jî di nav de, rê ji evqas rewşan re vedike. Ji ber ku şerê di nava wê de nizane, şerê jinê yê bi wê re, şerê wekhevî û azadiya bi wê re nizane, ne di ferqê de ye, dema ne di ferqê de ye jî, hêsan dibîne. Xwe dispêre rayeya xwe, keyspereste. Ev li Tirkiyê bi navûdenge. Jinek eyarkirin çawa pêwendiya xwe bi keysperestiyê ve heye, em dizanin ku hema di her têkîliyê de xwe dide der.

Modela dewletek Eflatun jî hebû. Modelek îdeal bû. Em neçarin li gorî sosyalîzmê wê modelê pêş bixin. Yeqîn dikim di nava wê de tenê beg û jin tine ne. Jixwe kole qet tine ne. Wê di navê de hemû kedkar hebin, jin hebin, lê model ji bijareya Eflatun hîn zêdetir pêşveçûyî be. Dê ev jî çawa çêbin;

Belê, sosyalîzm bijartine. Bê ku evqasî bê çewsandin berzbûn bijarebûne. Vêca wê tu vê bijarebûnê çawa pêk bînî? Vaye ev dana fêmkirin, şerek mezine. Li gorî vê pêwendî jî, şerek hîn berztire. Xweziya afirînerên pêwendiyên wisa hebûna.

Berdêla jinek anîna vir bû jiyana min a çil salî. Her wiha min zilamtiya xwe jî rojê hezar carî xeniqandiye. Ma ez jinê didim zilamê weke te vale. Ger jina te jî be, ezê ji destê te derbixim. Niha gelek ji wan lîstokan dikin, jinê bi xwe ve girê didin. Jinê, jinwariya xwe bikar aniye û zilam bidest xistiye. Van cidî nagirim. Ji ber ku bedewbûn tineye, wekhevî tineye, jidilbûn tineye, hemû xapînokin. Yekê serî tewandiye, pir serî dane tewandin, yekê jî bi pereyên xwe bawer kiriye, yekê jî baweriya xwe bi zora xwe aniye, yekê jî baweriya xwe bi cînseltiya xwe ya çors aniye.

Li jinekê gerîn, li pêwendiyekê gerîn tiştek xweşike.

Ji bo her kesî li bedewiyê gerîn, tiştek xweşike. Li Çînê jî be lê gerîn tiştek xweşike. Em qet li gorî milet û çînayetî nehizirin. Xeteriyê pir şênber dibînim. Ger tu nekarî di vê pêwendiyê de pergalê saz bikî, neku milîtan bi salan bidî şerkirin, tu nikarî rojekê jî bidî şerkirin. Ne wisa bikarî keçê li ser lingan bigirî, tu nikarî rojekê jî li ser lingan bigirî. Li vir rêgez û pergal pir û pir girînge. Ma hûn dizanin hêsan pejirandin dibe ku derê? Dişibe bêmafî û bêyî ku şerê wê bimeşîne desteserkirina tiştekê. Mane ji bo jinê dibêjin; "Milkê herî hêja ye." Ger tu tenê bi hêza rêxistinê jin an jî zilam bidest bixî, her tişt tine dibe.

Di demên dawî de têgehek din ku dixwazim pêş bixim, şoreşa hezkirinê ye. Li cem Kurd komkujiya hezkirinê heye. Ne tenê nêzîkbûnên mêtîngerî yên ji kerba dikuje, di nava xwe de jî komkujiyek ji kerba dikuje heye.

Hezkirinên wêrek tine ne, hebin jî pir dikin kole. Min demek dirêj nirxandina vê kir û di encamê de rêya hezkirinê, jiyana ku hezkirinê gengaz dike, vaye bi wê ve girêdayî pêşvebirina şer çêbû.

Wisa şênber hezkirina min a li hember mirovekî tine ye. Ya rast zehmete ku mirovê heyî hez bikim. Lê dema vî mirovê şênber û mirovê razber bi hev ve girê didim, xiroşek û çoşek ku dijîm heye. Ji aliyekê ve yekgirtina hêvî û şênberiyê pêk tê. Bi min re çavkaniya hezkirinê eve. Ger ew pêşnekeve, nikarim yek deqê li cem bisekinim. Ya ku hêviya wê tine negengaze ku carekê jî hez bikim. Vêca min ev li gorî hunera xwe ya şer pêk anî. Dema gav bi gav hêvî pêk anî, ez heyranê wê mirovê dimînim. Heta dikarim xwe jî weke heyranê wê mirovê binirxînim.

Li vî welatî, di nava vî gelî de, em ne di wê rewşê de ne ku wisa rehet rawestin û ji me re bêgotin mirovin. Li cihek ku evqasî îşkence, komkujî, hejarî lê heyî, ti mirov nikare bêje ez mirovim û rehet li cihê xwe raweste. Kî ji vî mirovê şênber re bêje; "Ez jê hez dikim", li gorî min şaşiya herî mezin dike. Yek şert heye, wî hinekê bi hêvî û armanc ve girê bide û bixe tevgerê. Dema baş meşiya, bi hostane meşiya û giha serkeftinê, mirovê ku mirov pîroz bike ye. Li ser serê min cihê wî heye.

**Azadî; Bi Kuranî Bûyera Xwe Pêkanînê Ye**

Niha ez kîme û çime? Gelo dixwazim bibim çi? Tişta ecêb jî yeqîn nakim ku kes hewl bide min binase. Ne diyare her kesê ku tê, gelo min dixapîne yan jî xwe dixapîne.

Min ev got: Binêrin navê min hatiye bihîstin û otorîteya min jî zêde pêş dikeve. Lê hûn nirx nadin min. Xalek seyre, lê rastiye. “Hûn bi qasî baweşîna bizinekî jî nirx nadin min. Cixare dikêşin, lê bi qasî dûxana wê jî nirx nadin.” Çima? Tenê feyde jê digire. Xwedî hêzim, tên dixwazin tiştekê ji wî bigirin. Ev jî pir xetere û vaye ez jî vê dibînim.

Hinek dibêjin; “Qrale.” “Gelo qral çawa dihizirin?” Qral quralan pir baş saz dikin û ev jî li Rojhilata Navîn di asta bêhempa de ye. Xwe dixemilînin û datînin-radikin, ger otorîteyek wisa pêş ketibe, deh cureyî jî li ser wê zextê dikin û kes jî nikare nêz bibe. Jixwe yên tên vir jî dihizirin ku bi mezinbûnek wisa re rûbirû bimînin, lewra hema direcifin. Ez bi xwe jî wisa me. Diçim cem hinek otorîteyan. Lê heta nava xwe direcifim.

Dixwazin rêzdariyekê pêş bixin, lê di radeya herî bilind de durû ne. Dibêje; “Ez hatim.” Lê belê ez jî niyeta di bin navê rêzdariyê de yekser eşkere dikim. Tişta ji rêzdariyê fêm dike, hinekê hêz girtin û qutkirine. Niha di nava partiyê de em ji navenda me bigirin, heta tevlîbûnê nû, heyrantiya wan a ji rêbertiyê re bi temamî yan xwe perestina hêze, yan jî li peye ku ji wê hêzê hinek tişt qut bike.

Ger xwe bi ber li gorî otorîteya heyî û perestiya hêzê ve berdim, dikarim bibim qralek baş. Vê dibêjim: “Bi qasî qralan bandora min heye.” Mixabin ji aliyek din ve jî dibêjim, halê min ê bibe zilam jî nîne. Nakokiyê wisa bilêv dikim. Di bûyera Kurd de, zilam zêde nakin qral. Di bûyera Kurd de, jêhatiyek têra qraltiyê bike nîne. Zehmete ku civak vê hêzê raber bike. Ji ber ew hêz ji dest hatiye girtin.

Dibe ku di civaka Tirk de hebe. Ji avakirina serok re guncave û têrkare. Di civaka me de bexşandina hêzek wisa nîne. Hîn zêdetir diziya hêzê diyarkere. Jixwe di navenda me de yan jî di nava partiya me de, vê zêde dibînim. Her ku xwe dirêj dike dibêje; “Hinekê jî ez bigirim.” Şêwaza dayînê jî neraste. Ger şêwaza dayînê li gorî demokrasiyê û sosyalîzmê be, evê pir baş be. Dê demokrasî pêş bikeve, sosyalîzm pêş bikeve. Lê belê dema dide weke xulaman dide. Weke hemalekî dixwaze para mezin daqurtîne.

Kesên ku dijmin dixwaze bandor bike hene. Pir zelal dibînim. Li nava çavên min dinêre û dibêje; “Rêberê min, tu nebî ez nikarim bijîm.” Dahûrînek raste, lê di bin vê gotinê de çi veşartiye? Rêbertî kêm–zêde ev hêz kûr kiriye, êdî li gorî hostatiya xwe, li gorî çalekiya xwe ya rêvebirinê, wî pir baş dibîne. De vêca em navê vî camêrê xwe bikin; “x.” Di jiyana xwe de çil teqleyan jî bavêje, kes jê re nabêje; “Merheba xanima filankes, camêrê filankes.” Bes di nava PKK’ê de li gorî xwe di hinek gavan de bilind bûye, qonaxek girtiye û vê dildariyê bi xwe re dibîne: Dibêje; “Çi merîfet bi min re hene. Kesê ku duh kesî ne dixist dewsa tiştekî de, çawa li ser deh hezaran serdestiyê dike. Nexasim mirovan çawa heta mirina xwe dide girêdan.” Vaye evîndariyek wisa çavsor pêş dixe. Lê dîsa jî dibêje; “Gelo kî min tam ji vê rewşê asteng dike?” Niha di vir de êdî ez hêdî hêdî li pêş wî dibim asteng. Qanûnek din a Rojhilata Navîn derdikeve holê. Wê tu bibî qral, lê belê kesê beriya xwe jî hilweşînî. Ya rastî ger hinek din bi demokratîk be, tika dikim, dibêjim; “Ez dixwazim xizmeta we bikim. Ezê bi te re rêxistinê parve bikim. Em bi te re biryar, şêwaz û tempo nîqaş bikin. Em bi hev re bikin. Bila mezinbûna raye ji we re be.” Na! Yan wê tu bibî evdek qral ê baş, an jî wê tu qral hilweşînî. Tam şêwazek Rojhilata Navîn a bêhempa ye. Tam dij-demokratîk û zalimtî ye. Ev jî di pratîka xwe de pêk aniye. Vêca heta çi demê bi min ve girêdayî ye? Diyalektîka Rojhilata Navîn pir baş dizanim, di radeyek girîng de wê tu ziraviyan raber bikî. Rêzdariya wî qediya ye û dibêje; “Rêberê min hezkirin, rêzdarî û girêdanên bê dawî.” Yeqîn dike, lewra vê dibêje.

Dixwaze bibe qral. Gelo qralek çawa? Qralê komedî! Di siyaseta ez dimeşînim de ev negengaze. Mixabin çand eve. ji Tirk fêr bûye, ji rastiya civakî ya Rojhilata Navîn fêr bûye, tiştek din jî nayê hişê wî. Dil û mejiyê wî temamî bi vê dagirtiye. Ez zehmetiya herî mezin beramberî van kesan dijîm. Li gorî keda xwe sosyalîste, teoriya sosyalîst pir baş daxive. Qaşo ji nav gel hatiye, belengazeke, sêwî ye û wisa mezin bûye. Ger vê rastiyê bibîr bîne, divê teqez demokrat û sosyalîst be. Lê belê dema li gorî xwe jî gavên siyasî hilkişiya, tu

nikarî wî bigirî. Hûnê bêjin; “Çanda kapîtalîzmê û çanda demokrasiyê tine ye.” Ev hemû rastin. Wê bê gotin; “Vaye rastiya Rojhilata Navîn wisa ye”, ev jî raste. Lê tevî vê, ma em nikarin ser bixin? An jî em ê bikarin vê serdemê derbas bikin?

Ma ez kî dixim dewsa Seleheddîn, an jî kî nizanim çi dikim. Vaye min rojnameyek dît û dibêje; “Ger Mao bi Îslamiyetê re yek bike, nizanim dê çawa bêhempa be. Fûzeyên teknîka Rojava jî nikarin tiştekê bikin.” Qet hewce nake îdîayek min a wisa hebe. Lê belê weke kesek pratîkê û lêhûrbûnek diyarker li ber xwe didim.

Dixwazim bêjim, di nava şêwazek berxwedaniya sosyalîst a pir seyr de me. Ev rewşek bûna qral an jî nebûnê derbas dike. Ji pîvanên civakê yên kevnare re serî netewandin, li gorî min hîn girîngtire. Kerba min jî li hember guhên ji rêzê heye. Qet niyetek min nîne, bibim qralek wisa.

Belê dikarim bibim çi? Hûnê bêjin; “Rastî eve.” Mezinbûna herî navdar jî wisa ye. Ji sedî not û neh a serdest jî eve. Ev rastiyek ku pêwîste li ber çavan bê girtine, lê belê li gorî min azadî dîsa jî xalek girînge. Pêwîste di vê mijarê de civak cidî bê girtin.

Qet naxwazim we biçûk bibînim. Azadîxwazan cidî digirim û li hember wan rêzdarim. Lê tevî vê, di mijara azadî û sosyalîzmê de rewşa we dilşewat dibînim.

Di vê mijarê de jî we tevan biçûk dibînim û hema hema xwe bi tenê dibînim. Divê ev tenêbûn weke qraltî neyê nirxandin. Hûn dikarin bêjin; “Kedkarê bêhempa yê di meşa azadî û sosyalîzmê de bi tenê maye”. Ji ber ku hûn ji kur lêkolîn dikin bikin, min tevahî jiyana xwe, weke kesayetek xwe bi xwe rêve dibe derbas kir. Bes qral ne wisa ye. Qral li ser milê hinek din bilind dibe. Yan li ser milê miletekî, yan jî li gorî ol dibe, yan jî hêzên ku wî radikin hene. Bi min re bi qasî misqalekê hêzek wisa nîne. Ji heft saliya min bigirin heta roja îro, di pîvanek bêhempa de, rewşa min dişibe seknek karbidestiyek cambazî ve, yan jî bi meşek kesê ku li kendalan dimeşê re, hevsengiya xwe bi xwe ava kirî û dayî meşandine. Keda sosyalîst misoger heye. Hostatiyek hem fikrî hem jî pratîkî heye. Dilziraviyên mezin hene, azwerî, dildarî, rik, kerb, hezkirin hemû hene.

Heyranim bi mirovê ji rêzê re bim. Lê belê hewl didim mirovê mezin jî fêm bikim. Ne xerîbê wan im. Ev hemû, bi min re weke şêwazek jiyanê ye.

Ez siyasetê qet ji bo serkeftinên sînordar, nav û şanê nakim. Partî jî, artêşê jî ji bo wê nademizirînim. Xwe li gorî pîvanên sosyalîst azadkirin, ji bo min pêkhatinek bêhempa ye.

Gelo azadiyê çawa fêm dikim?

Behsa hinek rastiyan dikim. Li gorî hinekan xeta siyasî ye, li gorî hinekan xisleta demokrasî ya vê xetê ye, xisletek wisa ya sosyalîste, ev xisleta çandî ya aborî ye. Niha ev jî ewqasî negirîngin.

Azadî bi kûranî bûyerek xwe pêkanînê ye. Dikare weke xwe li hember her tiştê ku ji sedî salan ve bi sazî kiriye û hatiye fêrkirin ravekirin û kirina vînek, bê pênasekirin. Hûn dikarin asta emperyalîst jî bi serve bikin. Her kes dizane sazîbûnên mêtîngerî û axatî çiqas rê ji bertekan re vekiriye û me jî li dijî van têkoşîna bîrdozî, siyasî û rêxistinî ti carî kêm nekiriye.

Teorîsyenek pir başim, pêkhînerek pir baş ê xeta siyasî me. Rêxistinbûnek têrkar, pir kêm şiyar nêzî uslup û xîtabê xwe bûyîn, hemû hene. Lê ev ji bo min tenê ya heyî rizgarkirine yan jî bersiva yên derdora me dayîne, heta ji bo mijûlkirina wan e.

Karê esasî hinek din cuda ye. Dema xwe pêk tînim, lêhûrbûn û xwe bi ezmûna rastiyan re derbaskirin tiştek cuda ye. Mînak, şêwaza siyasetkirina çepên Tirk pir gelemperî ye, zêdetir bi şêwe ve mijûl dibin. Li xwe mikurhatinek di derbarê cewher de nîne. Vê hema hema ji bo hemû avaniya me jî dibêjim. Mikurhatin pir sextekarî ne, hinekê jî ji bo xwe veşartinê ye. Ya rastî divê ne wisa be. Qet nêzî xwe jî nabe. Ger nêz bibe jî, ji mêj ve wêran, tine û xilas bûye. Ji ber ku ditirse, yekser derbasî parastina kesê kevin dibe. Ev hemû ji hêla min ve tên fêmkirin û çareser dikim.

Kesê ku van hemûyan evqasî digire dest, di wateya kevnar de devjê berdin bibe qral, qralên wisa rûxandin yek karên wî yên rojane ye. Ev jî li hember kesên bê vîn û evdale.

Min şerê xwe yê destpêkê li dijî van rewşan destpê kir û li dijî saziyên ku jê ditirsiyam, li gorî van kevneşopiyan jiyîn û mezinbûnê meşand. Wê demê di nêvenga gund de ji bo min digotin; “Dînê çolê.” Wisa gelek nav li min kirin. Xoşa min neçû. Ti carî kêleka civînên wan ên evdalan re derbas nebûm. Bihizirin, wê demê wisa li holê teorî û milîtanî jî nebû. Tenê zarokek ji rêzê yê gundî naxwaze bikeve nav wê civatê. Dema dikeve navê jî, ji bo tiştên cuda diçe, gelo gotinek balkêş heye yan na? Misoger ger ezê tiştekê peyda bikim diçim.

Hemû tevgerên min, li gorî daxwazên azadî yên kesin.

Li dijî ferasetên evd û kole yên kevnar, şerek dijwar heye. Dê ev min ber bi kur ve bibin? Bi qasî tê dîtin, di şênberiya Kurd de dengvedana miletekî pêk aniye, gelê herî kole, ku her kes di nava şaşwaziyê de bû, niha xwe gihandiye rewşek miletê ku li gorî pîvanên cîhanê şer dike. Ne tenê pêwendiyên xwe yên mêtînger, rewşa mêtîngeriya di ruhê wê de jî, ancex bi vî şêwazî dikare bê şikandin.

Ger şêwaza min bigihê, dê bişkîne. Negihije, misoger nikare tiştekê jî ser bixe. Li gorî min ev modelek di rastiya Rojhilata Navîn de ye. Ma hûn azadiyê dixwazin? Gelo dikarin hinekê weke min bikin? Min di nava xwe de pergal saz kiriye. Ev jî pergalek li gorî zaniste, dilxweşî, felsefê ye, li gorî sosyalîzmê ye.

Her tim ji raya giştî û avaniya me re dibêjim ku cidî bigirin. Lê mixabin cidî nagirin. Çima nagirin? Ji ber nêvenga ku lê mezin dibin, ew dîl girtine. Vaye mane gotin; “Tu jiyanê ji me didizî.” Pergalê jî got; “Hûn tev ji rê derxistin.” Ya rastî hem nava me, hem dervî me heman zimanî daxive. Lê belê, tevî vê pir bibandorim. Yeqîn dikim ev hinekê jî diselmîne ku me pergalek peyda kiriye.

Modela Kemalîst û modelên otorîteya li Rojhilata Navîn pir berfireh, modelên ku ti carî tenezil nakime. Jixwe qet nêzî desthilatbûna wisa jî nabim.

Ya rastî weke kes dixwazim bijîm. Divê kesek nehizire ku kes înkar dikim. Civaka ku kes bikare bipejirîne, tam sedema şere. Lê belê ji bo jiyana kes jî, damezirandina civakekê jî misoger sedema şere. Pêwîste civak kesê xwe têr bike yan jî kesê xwe berçav bigire. Ev di sosyalîzma pêkhatî de bi temamî hat paşçavkirin. Tiştek wisa hat kirin,

kes di nava civakê de helak bû. Em dikarin ji vê re bêjin dijdemokrasî. Misoger em vê napejirînin. Civak ji bo min, civakek ku ezê bikarim bipejirînim û baştir lê henase bigirime.

Dixwazim bîranînek xwe bibîr bixim. Ez çûbûm welatek sosyalîst, min dît ruhê min teng dibe. Qet ne di wê astê de bûm teoriyekê û rexneya sosyalîzma pêkhatî jî bikim. Bes bêhna min teng bû. Min got di vir de tiştek heye. Cihê ku ruhê min lê teng dibû, li gorî min nabê sosyalîzm. Min nakokiya xwe derxist holê.

Pêwîste civak misoger rastiyek ku henase dide kes bê ravekirin. Elbet kes jî piştî qonaxek diyar, pêwîste bizane ku azadî jî bi teşegirtina civakî ve girêdayî ye. Li hember pêşketina civakî hevbeşiya civakî û kes zêde nepixandin pir xetere. Evqasî pêşketina dijdemokratîkbûnê, ji ber nêzîkbûnên kes ên zêde li hember civakê ye.


Niha yekdestdarên emperyalîst li ser mirovahî xeteriya herî mezine. Çima? Hêzek wisa takekesî bidest xistine û bi teknîkê ewqas xurt bûne, nirxên civakî yên herî pîroz, ango nirxên ku mirov dikin mirov û pêwendiyên xwezayê, pêwendiyên civak û xwezayê ber bi rûxandinê ve anîne.

Ji ber vê ahenga yekdestdariya civakî xirab dike, xisleta nakokiyan bi temamî hatiye guhertin. Nakokiyên çînî û nakokiyên netewî di plana duyem de mane. Ev di heman demê de cinawirbûna kese. Ya ku mirov dike civak û her wiha heta roja îro anî, hemû nirx rûxandin, civakê dihilweşîne û pêwendiya wê ya bi xwezayê re parçe dike. Encam jî, tam heywanbûne. Ya rastî di sosyalîzma pêkhatî de, hinekê jî cinawirê civakê pêş ket. Em dikarin ji vê re bêjin cinawirê dewletê jî. Li Emerîka jî cinawirên takekes pêş ketin.

Ne bi navê civakî kes înkarkirin raste, ne jî gotina her tişt ji bo civakbûn û dewletê raste. Li cem Tirk jî kes, sifire. Bîrdoziya “Her tişt ji bo dewletê” serdeste. Jixwe ji ber ku vî kesî misoger ti rêzdariya cîhanê bidest nexistiye, her kes hov dibîne. Derbaskirina van, bi qasî ji nû ve destgirtina kes, ewqas jî dê rê ji pêşketina kes a tenduristî re veke. Lewra divê civak jî berçav bê girtin. Misoger divê pêwendiya kes û civak di vê çarçovê de, bi nêzîkbûnek bernameyî, rêxistinkirî û

şerî ve bê vesazkirin. Yeqîn dikim ez di vê mijarê de hem xwedî ezmûnim hem jî zana me.

Baweriya min bi mirov, heta mirovê herî baş jî tê. Ya rastî afirandin, bi min re di asta azweriyê de ye. Şev û roj karê min bi mirov ve mijûlbûne. Çine ew karên cewherî? Bi bîrdoziya wê ve mijûlbûne. Bi asta wê ya rêxistinî ve mijûlbûne. Ger lehengê cîhanê û xweşik jî be, ger aliyê bîrdozî, rêxistinî û pêkanê nebe, ezê bêjim kêrî pênc quruşan nake û pir hêrs bibim. Bi qasî pêwîste şêwaza mezinkirina mirovê sosyalîst bi rêgez be, neçare hostatiya wê ya pratîkî jî hebe. Mirovê ser dixe wisa derdikeve holê. Dema te mirovê ser dixe afirand, wê tu tevgera rizgariya netewî jî û sosyalîzma zanistî jî derbixî holê.



*“Rewşek ku her kes dibêje PKK ya min e, lê PKK ne ya ti kesî ye ava dikim.*
*Lê belê PKK bi temamî ya te ye. Hemû PKK ya min e,*
*Lê di heman demê de tiştek ne ya min e.*
*Ev, PKK weke hêmanek taybet nedîtine.*
*Ev jî, sosyalizm bi xwe ye.”*